

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DI ROMANÊN EREBÊ ŞEMO DE FOLKLORA
KURDÎ

Ebubekir GÖREN

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mardîn 2013

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmze)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmze

.....

Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê

(Mor)

NAVEROK

KURTE	VI
ÖZET	VIII
ABSTRACT	X
PÊŞGOTIN	XII
KURTEBÊJE	XIV
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

1. EREBÊ ŞEMO: JIYAN, BERHEM Û KESAYETIYA WÊJEYÎ	18
1. 1. Ji yana Erebê Şemo.....	18
1. 2. Kesayetiya Wêjeyî ya Erebê Şemo.....	23
1. 3. Berhemên Erebê Şemo	31
1. 3. 1. Roman.....	29
1. 3. 2. Çîrok.....	45
1. 3. 3. Helbest	45
1. 3. 4. Senaryo.....	47
1. 3. 5. Werger.....	48
1. 3. 6. Rêziman.....	48
1. 3. 7. Maqale.....	48
1. 3. 8. Rojnamegerî.....	49
1. 3. 9. Radyovanî.....	51

BEŞA DUYEM

2. DI ROMANÊN EREBÊ ŞEMO DE FOLKLORA KURDÎ	54
2. 1. Kevneşopî.....	54
2. 1. 1. Taybetmendiyên Sosyolojîk ên Civaka Kurdan.....	54

2. 1. 2. Keç Revandin.....	60
2. 1. 3. Keç Xwestin.....	62
2. 1. 4. Berdêl.....	63
2. 1.5 . Niqirkirin.....	64
2. 1. 6. Qelen.....	65
2. 1. 7. Dawet.....	66
2. 1. 8. Pêşiya Bûkê Girtin û Bexşîş Xwestin.....	68
2. 1. 9. Govend.....	72
2. 1. 10. Alavên Xemla Jinan.....	74
2. 1. 11. Xwarin.....	75
2. 1. 12. Dara Miraza.....	78
2. 1. 13. Remildarî.....	78
2. 1. 14. Bijîjkî.....	80
2. 1. 15. Xwîndarî.....	81
2. 1. 16. Lîstik.....	82
2. 1. 17. Mêrxasî.....	82
2. 1. 18 Jinxasî.....	84
2. 1. 19. Zêmar.....	85
2.1.20. Piştî Mirina Mêrê Wê Rewşa Jinê.....	89
2. 1. 21. Mêvandarî.....	89

2.1. 22. Nêçîr.....	91
2. 1. 23. Newroz.....	92
2. 1. 24. Çavînî Bûn.....	92
2. 1. 25. Dewrêşên Gerok.....	93
2. 1. 26. Rojên Taybet.....	93
2. 1. 27. Hêmayên Olî.....	94
2. 1. 28 Cejna Beranberdanê.....	94
2. 1. 29. Cotkarî.....	100
2. 1. 30. Esmen- nasî.....	100
2. 1. 31. Jiyana Aborî.....	101
2. 1. 32. Jiyana Koçeriyê.....	102
2. 1. 33. Naskirina Giyayan.....	107
2. 1. 34. Kon.....	108
2. 1. 35. Avahî.....	108
2. 1. 36. Xalîçe û Kulav.....	110
2. 1. 37. Seyrana Bindarokê.....	111
2. 1. 38. Zibare.....	112
2. 1. 39. Xwedîkirina Hespan.....	113
2.2. Wêjeya Devkî.....	113
2. 2. 1. Gotinên Pêşîyan.....	113

2. 2. 2. Biwêj.....	117
2. 2. 3. Şibandin.....	129
2. 2. 4. Dua.....	133
2. 2. 5. Nifir.....	135
2. 2. 6. Sond.....	138
2. 2. 7. Dengbêjî.....	140
2. 2. 8. Stran.....	141
2. 2. 9. Helbest.....	146
2. 2. 10. Xeberoşk.....	148
2. 2. 11. Çîrok.....	149
ENCAM.....	156
ÇAVKANÎ.....	158

DI ROMANÊN EREBÊ ŞEMO DE FOLKLORA KURDÎ

Ebubekir GÖREN

KURTE

Gören, Ebubekir, “Di Romanên Erebê Şemo de Folklorê Kurdî”, Teza Masterê. Şewirmend: Hayrullah ACAR, XIV+169

Folklor, ji hêmayên çandî û wêjeyî yê gelan pêk tê. Bi riya folklorê jiyana, serpêhatî, adet, raman û baweriyên gelan şênber dibin. Di nava gel de; çîrok, destan, pêşgotin û biwêj, bi hezar salan tîr vegotin û neqil kirin. Ev hêma, bi riya ziman tîr parastin û berdewam kirin. Dîsîplîna folklorê jî van hêmayan dicivîne, disenifîne û dinirxîne. Bi riya folklorê agahiyên derbareyî nîrxên gelan de tîr zanîn. Folklor, bi vî awayî gencîneyeke bêhempa ya vegotinê wêjeyî ye.

Cureya romanê ya ku îcadeke wêjeyî ya serdema nûjen e, hewceyî gencîneya folklorê ye. Loma jî bîngeha gelek romanên ji folklorê hatine standin. Romanûsê Kurd Erebê Şemo jî, folklorê Kurdî ji bo berhemên xwe kiriye bîngeh. Wî bi nivîsandina romana bi navê “*Şivanê Kurmanca*” deriyê qadeke nû ji bo wêjeya Kurdî vekiriyê. Ji ber ku Şivanê Kurmanca romana Kurdî ya pêşîn e.

Di vê xebatê de, jiyana Erebê Şemo, berhemên wî û folklorê Kurdî ya di romanên wî de weke mijar hatine standin. Xebat, ji xeynî pêşgotin, destpêk û encamê, ji du beşan pêk tê.

Di beşa destpêkê de, li ser wate û naveroka folklorê hatiye sekinîn. Folklor, bi taybetiyên wê yê bîngehî hatîye teswîr kirin û tîkiliyên wê yê bi ziman, çand, dîrok û wêjeyê re hatine destnîşan kirin. Li vir, pêşketinê mezîna di qada vegotin û nivîsê de yê ku ji dema çandê devkî û vir ve derketine pêş, hatine vegotin û guherînê şeweyî û naverokî yê di herikîna dîrokê de hatine nîrxandin. Ev yek bi pêşketina endustrî, humanîzm û Şoreşa Fransayê ve hatiye girêdan û mijar heya derketina hunera romanê hatiye anîn. Hunera romanê jî li gorî dîroka wê û wateya wê ya ji bo kesan û neteweyan hatiye nîrxandin û tîkiliya wê ya bi folklorê re hatiye eşkere kirin. Di dawiyê de jî romana Kurdên Kafkasyayê bi karakterîstîka wê ya bîngehî hatîye vegotin û sedemên vî karakterîstîkê hatine rave kirin.

Di beşa yekemîn de, li ser jînenîgarî, kesayetiya wêjeyî û berhemên Erebe Şemo hatiye sekinîn. Romanên Şemo, bi taybetî, ji aliyê çandî, folklorîk, dîrokî û edebî ve hatine nirxandin.

Di beşa duyemîn de, hêmayên folklorê Kurdî yê di romanên Erebe Şemo de hatine civandin û hêma, li gorî qadên wan hatine senifandin. Ev hêmayên folklorîk, li gorî çand û adetên Kurdan hatine rave kirin û şîrove kirin

Di beşa encamê de, aliyên Erebe Şemo yê ji xeynî romanûsiyê hatine destnîşan kirin. Gotarên wî yê di rojnameyan de hatine weşandin, xebatên wî yê radyovaniyê, xebatên wî yê di qada ziman de û tekoşîna wî ya siyasî hatiye vegotin.

Peyvên Sereke: Erebe Şemo, Romana Kurdî, Folklorê Kurdî, Kurdên Kafkasyayê, Wêjeya Kurdî ya Kafkasyayê, Folklorê Kurdên Kafkasyayê.

EREBÊ ŞEMO'NUN ROMANLARINDA KÜRT FOLKLORU

Ebubekir GÖREN

ÖZET

Gören, Ebubekir, “Erebê Şemo'nun Romanlarında Kürt Folkloru”, Master Tezi. Danışman: Hayrullah ACAR, XIV+169

Folklor, halklara ait kültürel ve edebi öğelerden oluşur. Folklor yoluyla halkların yaşamı, deneyimleri, adetleri, düşünce ve inanışları somutlaşır. Öykü, destan, atasözü ve deyimler, binlerce yıllık süreç içinde anlatılır ve nakledilir. Bu öğeler, dil ile korunur ve devamlılıkları sağlanır. Folklor disiplini de bu öğeleri toplar, sınıflandırır ve değerlendirir. Folklor yoluyla halkların edebi öğeleri öğrenilir. Bu yönleriyle folklor, eşsiz bir edebi anlatım hazinesidir.

Modern dönemin edebi bir icadı olan roman türü, folklorun hazinesine muhtaçtır. Bu yüzden ki birçok romanın kaynağı folklordan alınmıştır. Kürt romancısı Erebe Şemo da, eserlerinde Kürt folklorunu temel almıştır. O, yazdığı “Şivanê Kurmanca” adlı romanıyla Kürt edebiyatı için yeni bir alanın kapısını açmıştır. Çünkü “Şivanê Kurmanca” ilk Kürtçe romandır.

Bu çalışma, Erebe Şemo'nun hayatı, eserleri ve romanlarındaki Kürt folklorunu konu edinmiştir. Çalışma, önsöz, giriş ve sonuç kısımları hariç, iki bölümden oluşur.

Giriş bölümünde, folklorun anlamı ve içeriği üzerinde durulmuştur. Folklorun temel özelliklerine ve onun dil, kültür, tarih ve edebiyat ile bağlantılarına işaret edilmiştir. Burada, sözlü kültürlerin ortaya çıkışından bu yana, anlatım ve yazım alanlarındaki büyük gelişmelerden bahsedilmiş ve tarih boyunca sözlü anlatım alanındaki biçimsel ve içeriksel değişimler gözler önüne serilmiştir. Bu gelişim seyri sanayi devrimi, hümanizm ve Fransız ihtilali ile ilişkilendirilmiş, konu modern roman sanatının ortaya çıkışına kadar getirilmiştir. Roman sanatı da onun tarihine ve bireyler ve uluslar için anlamına göre değerlendirilmiş ve onun folklor ile bağlantısı ortaya konmuştur. Son olarak da Kafkasya Kürt romanı, onun temel karakteristiği ve bu karakteristiğin nedenleri irdelenmiştir.

Birinci bölümde, Erebe Şemo'nun yaşamı, edebi kişiliği ve eserleri üzerinde durulmuştur. Şemo'nun romanları, özellikle, kültürel, folklorik, tarihi ve edebi yönlerden değerlendirilmiştir.

İkinci bölümde, Erebe Şemo'nun romanlarındaki Kürt folkloru öğeleri bir araya getirilmiş ve bunlar alanlarına göre sınıflandırılmıştır. Bu folklorik unsurlar Kürt kültürü ve adetleri açısından açıklanıp yorumlanmıştır.

Sonuç bölümünde, Erebe Şemo'nun romancılık dışındaki yönleri ele alınmıştır. Erebe Şemo'nun gazetelerde yayınlanmış makaleleri, radyo ve dil çalışmaları ve siyasi mücadelesi üzerinde durulmuştur.

Anahtar Sözcükler: Erebe Şemo, Kürt Romanı, Kürt Folkloru, Kafkasya Kürtleri, Kafkasya Kürt Edebiyatı, Kafkasya Kürtleri Folkloru.

KURDISH FOLKLORE IN EREBÊ SHAMO'S NOVELS

Ebubekir GÖREN

ABSTRACT

Gören, Ebubekir, "Kurdish Folklor In Arab Shamo's Novels", Master Thesis.
Supervisor: Hayrullah ACAR, XIV+169

Folklore consists of cultural and literary elements that belong to the Nations. By folklore peoples' life, experiences and traditions, ideas and become concrete. Story, epic, proverb, and idioms of thousands of years old are told and expressed. Articles are protected and the language mentor ing items. Folklore discipline also collects, classifies and evaluates these elements. By them folklore peoples' literary elements are learned. These aspects of folklore, a unique treasure of literary narration.

Novel type that is a literary invention of the Modern era, needs folklore's Treasury. This is why the subject of many of the novel's is taken from the folklore. Kurdish novelist Arab Shamo, based his literary works on the Kurdish folklore. He wrote "*Şivanê Kurmanca*" which opened the door for Kurdish literature have led to a new field. Because "*Şivanê Kurmanca*" is the first Kurdish novel.

In this study, the life and literary works of Arab Shamo are discussed. Except preface, introduction and conclusion sections of the work, it consists of two parts.

In the introduction, we focus on the meaning and content of folklore. Main characteristics of Folklore and its language, culture, history and literature with connections are pointed. Since the emergence of cultures here, interpretation, narration, and the spelling issue referred to major developments and changes in formal and contextual spoken throughout history field in front of the eyes was laid. This development in the course of, the industrial revolution, humanism and the French Revolution is associated with and the topic has been brought up to the emergence of the art of the novel. The art of the novel also means that individuals and Nations according to its history and to its connection with the evaluated and its folklore. Finally, the basic characteristic of the novel of Caucasian Kurds, with it's main character and the reasons of this characteristic is scrutinized. .

In the first section, life, the literary personality and the literary works of Arab Shamo emphasized. His novels, especially have been assessed from sides of culture, folkloric, historical and literary.

The second section, the elements of Kurdish folklore that are taken from Arab Shamo's novels, have been brought together and they are classified according to two fields of them. These elements have been realised and interpreted according to Kurdish culture and traditions.

In conclusion, Arab Shamo's aspects apart from novelist are described. It is focused on his articles published in newspapers, his radio and linguistic studies and political struggle.

Key Words: Arab Shamo, the Kurdish Novel, the Kurdish Folklore, the Caucasian Kurds, the Caucasian Kurds' Literature, the Caucasian Kurds' Folklore.

PÊŞGOTIN

Wêje, qada vegotina serpêhatiya mirovan e. Ew, bi naveroka xwe behsa serkeftin, binkeftin, hêvî, daxwaz, kêfxweşî û nexweşiyên gelan vedibêje. Wêje, ji bo mirovan riya ragihandina hest û ramanan e. Mirov, bi riya wêjeyê, serpêhatî û şahidiyên xwe vedibêjin û bi vî awayî vî barî ji ser milê xwe datînin, wê giraniyê ji ser dilê xwe radikin. Ji ber ku, ew tiştê mirov bixwaze bibêje û nebêje, li ser dilê wî/wê dibe tengî, li ser milê wî/wê dibe giranî. Dema mirov ew tişt ragihand, vegot, qise kir, wê demê ev tengasî diqede û mirov aram dibe. Wêje jî, di dîroka mirovahiyê de bûye sahneya vegotina jiyanê. Bi vî awayî bûye dermanê bêdengiyê. Bêdengiya mirov aciz dike. Bêdengiya neçariyê...

Di vê peywira wêjeyê de, di serdema nûjen de, rola herî girîng a wêjeyê ketiye stûyê cureya romanê. Roman, bi naveroka xwe bûye sahneya ragihandina hest û bûyerên mirovan û neteweyan.

Romana Kurdî di sala 1931an de, bi romana Erebê Şemo ya bi navê *Şivanê Kurmanca* dest bi rêwitiya xwe kiriye û ji wê rojê pê ve bûye cihê vegotina serpêhatiyên gelê Kurd. Romana Kurdî, di van 82 salan de ji çanda Kurdan, serkeftin û binkeftinên wan, çand û hunera wan hêmayên bêjimar derbasî nivîsê kirine û ew di dîrokê de qeyd kirine.

Gelê Kurd, ji ber sedemên siyasî di bin desthilatdariya dewletên cuda de dijî. Kurdan, di her dewletê de weke civakê ciyê xwe girtine û bûne yek ji bingehîn nûnerên wî welatî. Ev civakên kurdan, ji ber sînorên di nav wan de hatine çêkirin ji hev dûr û bêagah mane. Ji ber vê yekê jî, her civaka kurdan a di nav sînorên dewletekê de, bûye xwedî dîrok û serpêhatiyeye taybet. Wêjeya wan jî bûye ekoleke serbixwe ya wêjeya Kurdî. Yek ji van ekolan jî ekola Kurdên Kafkasyayê ye. Kurdên Kafkasyayê, di serdema Osmaniyan de, ji ber sedemên siyasî ji niştiman koçî wê herêmê kirine û piştî Şoreşa Cotmehê derfeta pêşxistina ziman û wêjeya xwe dîtine. Rewşenbîrên vê civakê, gelek berhemên hêja, di serî de jî roman ji bo wêjeya Kurdî nivîsîne. Bêşik, ji romanûsên vê ekolê yê herî girîng û herî navdar Erebê Şemo ye. Şemo, bi nivîsandina yekemîn romana Kurdî bûye pêşengê romana Kurdî. Wî, bi riya romanê civaka ku têde dijî, ji her aliyan ve analîz kiriye û vegotiye. Şemo, di vê pêvajoyê de herî zêde ji folklorê Kurdî sîd wergirtiye. Ji ber ku yek ji riyên herî baş ên naskirin û analîzkirina neteweyekê folklor e. Folklor, nasnameya civakan e, hafizaya wan a hezar salan e û têde hemû nirxên wan cî digrin. Ew, sahneya jiyana civakê ye. Ji bo wêjeyê jî yek ji çavkaniyên herî xurt e. Ji vê çavkaniyê gelek berhemên girîng hatine dayîn.

Di wêjeya Kurdî de, nexasim di ekola Kafkasyayê de, folklor, ji bo nivîskaran bûye kaniyeke bi bereket. Nivîskarên vê êkolê, ji folklorê gelê xwe gelek alav standine û berhemên giran bûha dayîne. Beşek ji van berheman jî romanên Erebe Şemo ne. Şemo, him bi romanên xwe yên Kurdî, him jî bi naveroka romanên xwe yên Kurdewarî rêberî ji bo hevçaxên xwe û peyrevên xwe kiriye.

Ev xebat, di beşa yekemîn de jiyana Erebe Şemo û berhemên wî vedibêje. Beşa duyemîn jî, ji romanên Erebe Şemo hêmayên folklorê Kurdî dihewîne. Di vê xebatê de me xwest em alavên folklorê Kurdî yên di romanên Erebe Şemo de cî digrin tespît û rave bikin. Bi vî awayî me xwest em dîmeneke civaka ku Erebe Şemo di romanên xwe de vegotiyê deynin holê û rewşa vê civakê analîz bikin.

Di amadekirina vê tezê de şêwirmêndê min Dr. Hayrullah Acar gelek alîkarî û rêberiya min kir. Wî, di hemû merhaleyên nivîsandina vê tezê de rê nîşanî min da. Ez ji bo piştgiriya wî spasdar im. Her du mamosteyên min ên juriyê Prof. Dr. Ahmet Tari û Doc. Dr. Tahirhan Aydın jî bi tecrube û rênîşandanên xwe alîkariyên giranbûha li min kirin. Her wiha peywirdarê hînkirinê Zulkîf Ergîn jî di heyamên destpêka xebatê û nivîsandinê de pêşniyarên girîng li min kirin. Ez ji bo alîkariya wan jî pir spasdar im.

Ebubekir GÖREN

Mêrdîn/ 2013

KURTEBÊJE

amd.: amadekar, edîtor

b.n.: Berhema navborî

bnr.: binêrin

c.: cild

ç.: çap

h.b.: heman berhem

h.g.: heman gotar

hwd. her wekî din

j.: jimare

K.T.: Komara Tirkiyeyê

r.: rûpel

s.x.l.: Silava Xwedê li ser be.

TDK: Türk Dil Kurumu (Saziya Ziman a Tirk)

wer.: wergêr

hwd.: her wekî din

YKSS: Yekîtiya Komarên Sovyet ên Sosyalîst

DESTPÊK

Folklor, hemû nirxên madî û manewî yên neteweyekê ne. Gel, di pêvajoya bi hezar salan de, li hemberî jiyanê, mirinê, zewacê, koçberiyê, şer û aşitîyê, li hemberî bûyerên rojane hinek nêzîkbûn saz dikin. Ev nêzîkbûn bandora xwe li ser folkloran wan, çand û baweriyên wan dike. Netewe, bi vî awayî jiyanê li gorî xwe watedar dikin, wateyekê li her qewimandinê tînin û encamekê ji wê qewimandinê derdixin. Ev jî ji bo wan, ji bo paşerojê dibe tecrube. Gel, bi vî awayî tecrubeya xwe ya bi hezar salan di çand û folkloran xwe de qeyd dikin. Ev qeyd jî bi riya ziman tê kirin. Bi vî awayî zimanê gelan jî li gorî jiyan û serpêhatiya wan berfireh dibe.

Folklor, her çiças ji tecrube û pêk anînê jiyanê bên jî, di navbera folkloran gelan de ciyawaziyên mezin hene. Sedemên vê ciyawaziyê wiha dikarin bîn şîrove kirin: Gelên cîhanê hemû ne di heman baweriyayê olî de ne. Her wekî tê zanîn ol, di jiyanan gelan û kesan de xwedî bandoreke pir mezin e û şikl dide jiyanê. Bo nimûne, di hinek olan de xwarina goştê ajalên guneh e. Loma jî, di civakên bi vê baweriyê de ne, çanda goşt xwarinê pêşneketiye yan jî gelek qels maye. Lê di civakeke weke Kurdistan de ya ku piraniya wan misilman in û baweriyayê wan goşt xwarinê qedexe nake, berovajî bi riya sedeqe û qurbanê teşwîq dike, di çanda wan a xwarinê de goştê ajalên ciyekî girîng digire.

Sedemeke din a ciyawaziya folklorê erdnigarî ye. Erdnigarî, bi bandora xwe gelek taybetmendiyên gelan diyar dike. Gel, nikarin tu caran, bi tevahî ji bandora erdnigariyê xwe rizgar bikin. Doğan Aksan, ji bo vê taybetmendiyê mînakeke pir balkêş dide:

“Di erdnigariya gelê Eskîmo de ax tune. Welatê wan bi qeşa û berfê tijeh e. Ew, ger ji welatê xwe dernekevin, tu carî axê nabînin. Loma jî di zimanê wan de peyva “axê” tune ye.” Ji ber ku ew peyv, ji bo wan lazim nebûye. Dewsa axê, ew her tim qeşayê dibînin loma jî ji bo me ax çî be ji bo wan jî qeşa ew e.”¹

Bo nimûne: “Ew axa ku ji çal kolanê derket holê, li vir hatiye kom kirin.” Ger em bixwazin vê hevokê wergerînin zimanê Eskîmoyan divê em wiha bêjin: “Ew qeşaya ku ji çal kolanê derket holê, li vir hatiye kom kirin.” Erdnigarî li ser çanda

¹ Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1., wêşanên TDK, Ankara, 2007, r. 65.

libasan jî bandoreke mezin dike. Bo nimûne, dibe ku yekî Brezîlyayî di jiyana xwe de tu car cilên stûr wernegirtibe, ji ber ku avhewayaya wir mûson e û tu carî sermayaya zêde nabe. Lê ji bo yekî Sîbîryayî, ev rewş berojavî ye. Sîbîryaya welatekî gelek sar e û her tim berf nebare jî li erdê ye. Ji ber vê yekê, yekî Sîbîryayî ji hemû kesî bêtir û baştir dizane kîjan cil mirov germ digire. Lê yekî Sîbîryayî belkî tu caran tîşortekî pîqut wernagire û nabîne. Ev mînak jî bandora erdnigariyê ya li ser çanda libasan destnîşan dike. Ciyawaziya folklorê gelan bi du sê sedeman nikare bê rave kirin. Me xwest ku em tenê hinek mînakên bidin. Folklor, bi van taybetiyan him nêrîna gel a li hemberî jiyana him jî şeweya jiyana wî ye. Bi vî awayî folklor, hêmayên çandî yên neteweyekê û adetên wê; hûrgiliyane û kûrahî lêkolîn dike. Taybetiya herî girîng a folklorê ev e.² Loma, her çend îro peyva folklorê di gelek aliyên kevneşopîya netewî de tê bikar anîn jî; ji tore, cil û bergên milî yên kevin, xwarin û vexwarin jî têde, hemû berhemên çandî, weke folklorê tê pênase kirin.³ Hêmayên folklorê jî di zimanê gel de şênber dibin. Ji demên klasîk û vir ve gelan, nêrîn, tecrube û nirxên xwe bi riya ziman neqil kirine. Ev berhem, ger bi awayekî hunerî hatibin neqil kirin, wê demê dibin berhemên wêjeyî.

Wêje, bi vegotin û nirxandina bûyer û hestan dest pê kiriye. Hunermendan, bûyerên ku dîtine, yan jî bihîstine; hestên ku hîs kirine, bi riya kilam û destanan ji bo gel gotine. Ev yek bûye destpêka wêjeya devkî. Wêjeya devkî, bivê nevê, bi nezmê destpê kiriye û di demeke dirêj de desthilatdarî nedayê tu şiklên din ên vegotinê. Helbestê, heya pêkhatin û mezinbûna romanê serdestiya xwe domand.⁴ Di vî warî de jî folklor derdikeve pêş. Ji ber ku hema bêje hemû berhemên folklorîk menzûm in û ev taybetî, ji bo neqilkirin û berdehamiya hêmayên folklorîk şertekî bingeş e. Folklor, bi awayekî berbiçav, xwedî menzûmeke taybet e.⁵ Hêmayên folklorê, bi vê menzûma xwe ya taybet, karîne, di nav civakên ji nivîsê dûr de jî bi sedan, bi hezaran salan bijîn û nifş bi nifş bînin neqil kirin. Wêje jî, di destpêkê de, vê taybetiyê dihewîne. Ew jî ji bo parastina hêmayên xwe menzûmê bi kar tîne. Bi vî awayî şewaza wêje û folklorê dişibin hevdu. Him wêje him jî folklor dikarin di cureyekê de bînin senifandin, ev cure jî menzûm e.⁶ Ji ber ku berhema ziman a menzûm, ji ya mensûr gelek hêsantir tê ji ber kirin û vegotin, ev taybetmendî ji bo van hêmayan

² Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Weşanxaneya Gerçek, İstanbul, 1999, r. 10.

³ İzzeddîn Mûstafa Resûl, *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanên Aras, Hewlêr, 2010, r. 11.

⁴ J. Ong Walter, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, Weşanên Metis, ç. 5., İstanbul, 2010, r. 7.

⁵ Vladimir Propp, *Folklor/ Teori ve Tarih*, Weşanên Avesta, İstanbul, 1998, r. 14.

⁶ Propp, h. b., r. 13.

pêwîst bû. Ev berhem di nav gel de hêsantir belav jî dibe. Ji ber wê jî, hema bêje, hemû berhemên wêjeya devkî menzûm in. Piştî serdemêke dûr û dirêj a wêjeya devkî, wêjeya nivîskî destpê kir. Lê wêjeya nivîskî ne ji sifrê destpê kir. Wê wêjeyê, bi hezaran berhemên wêjeya devkî li ber xwe dît û cara pêşîn ew neqlî nivîsê kirin. Ji ber ku malzemeyên ku neqlî nivîsê dihatin kirin menzûm bûn, piraniya berhemên nivîskî yê klasîk jî menzûm bûn. Vê kevneşopiyê jî heya serdema nûjen dewam kir. Bi destpêka serdema nûjen re, ango sedsala 17 û 18an, bi taybetî li Ewropayê, pêşîn li Îtalyayê dût re jî li Fransa û Îngîlîstanê, êdî vegotina menzûm hate terikandin û pexşan kete rewacê. Berhemên klasîk di encama hişmendiyeke kolektîf a civakê de derdiket holê û taybetmendiyên vegotina devkî dihewandin lê berhemên nûjen, di encama pêvajoyên takekesî de derdiketin holê. Her wiha ev kes civak yan jî koma civakî ya di nav de jî temsîl dikirin. Ji ber vê jî, wêjeya ji folklorê zayî, ew ê yan zû yan dereng diya xwe ya ku ew gîhandî biterikandiya ango bibûye dîsîplîneke serbixwe. Ji ber ku wêje, berhema hişmendiyeke cuda ye. Ev hişmendî ev e: Wêje ji aliyê kesên wiha ve tê nivîsandin ku berhemên xwe bi riyên kesane dinivîsin û him hawîrdora xwe him jî gelê xwe temsîl dikin.⁷

Li gel hişmendî û şiklê afirandina berhemên, mijarên berhemên jî guherîn. Mijarên berhemên klasîk bêtir ji serpêhatiyên gelan koçberî, şer û hwd. pêkdihatin. Evîn weke mijarekê dihat bikaranîn lê ji wê evînê jî mabest ne evîna beşerî, evîna Îlahî bû, nemaze di wêjeya rojhilatî de... Piştî ku li welatên Ewropayê bajarvanî û humanîzm pêşket, nivîskaran, dibe ku cara yekemîn, berê xwe dan jiyana takekesan. Heya wê serdemê, hestên takekesî, nêzîkbûnên wan, çûn û hatin, bahoze û bagerên di dilên wan de pêk dihatin, di wêjeyê de hindik cî digirtin. Lê ji wir û pêde, takekes bû lehengê sereke yê wêjeyê. Bi vê pêşketinê re, ew qalib û qaîdeyên wêjeya klasîk hatin rexnekirin. Ew, weke zordariyan hatin dîtin. Nivîskaran gotin: Çima em ramanên xwe bi van ristan, qalib û qaîdeyan vebêjin! Çima em nêrînen xwe di nava van têlan de hefskirî bihêlin. Em dixwazin ramanên xwe azad bikin û bê qalib û qaîde wan ragihînin. Ji ber ku jiyana, bi taybetî jî jiyana kesane, li tu qalib û qaîdeyan nayê. Jiyana herkesî orîjînal e û ew nikare bi sînoran bê tengkirin. Bi van qebûlan, li rojava, hunera romanê pêşket. Roman, bû qada vegotina jiyana takekesî. Pîvana sereke ya romanê ragihandina rasteqîn a jiyana takekesî ye ku ev mijareke nû ye. Cureyên wêjeyê yê beriya romanê, guncaviya pratîkên adetî weke pîvana herî bingeîn a

⁷ Propp, h. b., r. 27.

heqîqetê dipejirandin. Berovajî vê roman, cureya wêjeyî ya herî xurt e ku takekesîti û nûjenîxwaziyê dihewîne.⁸

Ev guherîna mezin, di encama pêvajoyên mezin ên civakî yê weke ronesans û reformê de pêkhatin û nêrîna li hemberî takekesan ji binî guherî. Ronesansê ji bo endamên civakê nasnameyeke nû aniye holê. Pêvajoya pêkhatina takekesîti û pêvajoya takekesan a veqetîna ji komên civakî; encamên guherînên siyasî, aborî û epîstemolojîk ên di sedsala 17 û 18an de ye.⁹ Her wiha di vê serdemê de matbaa îcad bû û bi hezaran pirtûk hatin çapkirin. Di nav gelên Ewropî de jî rêjeya xwendevanan zêde bû. Xwendevanî, êdî ne taybetmendiya hinek çînan bû. Weke encameke xwezayî ya vê pêvajoyê jî di nav gel de xwendina pirtûkan zêde bûye. Di sedsala 18an de gelek çavdêr tespît dikin ku di nava gel de baldariya li ser xwendinê zêde bûye. Di nava civakê de rêjeya xwendevanan jî zêde bûye.¹⁰ Lê romanê nekarî xwe ji sedî sed ji vegotina klasîk rizgar bike. Belkî di şiklê vegotinê de bi serket, lê gelek mijarên xwe ji wêjeya klasîk wergirt. Ne tenê ji wêjeya klasîk, ji folklorê jî romanê gelek mijar û naverok standin. Hêmayên folklorê yê di nav gel de bi awayekî devkî çiyê xwe digirtin; yê weke destan, stran, helbest, çîrok, gotinên pêşiyar, biwêj û hwd., di romanê de jî ji bo xwe cî dît. Ne tenê berhemên devkî, di heman demê de rîtuêlên gelan, bawerî û qebûlên wan, xebatên wan ên aborî, adetên wan jî bûn mijara romanê. Cureya romanê, bi vî awayî ji folklorê gelek alav standin. Lê dîsa jî romanê taybetiya xwe ya bingeşîn parast û jiyana takekesî û bajarî kir mijara xwe ya sereke.

Romanê, bi vî awayî weke qada herî azad û xurt a takekesiyê ya di wêjeyê de rêwîtiya xwe berdewam kir. Lê piştî ku li welatên Ewropa pişesazî pêşket û her netewe li azadiya xwe geriya, wateya romanê hinekî berfireh bû. Di sedsala 18an de Şoreşa Fransayê pêk hat û vê şoreşê, bandor li hemû gelên cîhanê kir. Împaratoriyên bi sedan sal in dijîn, hilweşiyar û li ser kaviên wan bi dehan netewe dewlet hatin avakirin. Van netewe dewletan jî bi pergalên xwe yê siyasî, aborî û perwerdehiyê civaka xwe “gîhiştandin”. Ji ber ku ji bo avakirina neteweyekê, li gel sînorên siyasî, pêwîstî bi wêjeyê netewî hebû. Loma ji bo miletbûyîna du tişt lazim in: Firehkirina sînoran zimanê xwe û çêkirina wêjeya xwe. Damezrînerên netewe dewletan jî pir baş dizanin ku neteweyê mecbûr e bi rêya afirandina wêjeyê, sînorê zîhnê xwe fireh

⁸ Ian Watt, *Romanın Yükselişi*, Weşanên Metis, İstanbul, 2007, r. 14.

⁹ Haşim Ahmedzade, *Ulus ve Roman*, Weşanên Pêrî, İstanbul, 2004, r. 22.

¹⁰ Ian Watt, h. b., r. 39.

bikin û weke entelektuel nîşanî gelê xwe bidin ku zimanê wan bi têra wêjeyê dike û vî zimanî bikin xwedî îtîbar.¹¹ Ji hemû cûreyên wêjeyê jî, herî zêde roman xizmeta vê yekê dike. Siyasetê netewe ava nekir, lê ziman û wêjeyê, weke cure jî roman, netewe ava kir. Şêweya teswîrê ya romanê, rê da ku mirov civakeke taybet ango neteweyê teheyul bike.¹² Bi vî awayî netewe dewletan hemû pergala xwe ya perwerdeyê li gorî vê bîrdoziyê avakirin. Nifşên nû, bi nîrxên netewî gîhiştin. Wêje jî, ji wir û pê de, bi nîrxên netewî hate şikil kirin. Naverok, bi hest û bûyerên netewî hate dagirtin. Di vê pêvajoyê de jî romanê peywira herî girîng li ser milên xwe dît. Roman, di serdema netewe dewletan de bû hunera herî berçibav a wêjeyî ya gelan. Ew ji bo avakirina nasnameya netewî bû alava herî xurt a wêjeyî. Di vê qonaxê de jî folklor hate hawara romanê. Ji ber ku folklor, weke me li jor bi berfirehî gotibû, bi taybetmendî û naveroka xwe xasî gelan e. Folklorê her neteweyê cihê ye. Wêjeya gelêrî ji folklorê zayî jî berdewamiya çandê dike ku çanda gel ji bandora çandên biyanî dûr maye û hemû taybetiyên herî kevn di xwe de vedişêre, lewma karakter an ruhê neteweyê dihewîne û xurt dike.¹³ Ji ber ku netewe yan jî nasname bi dijberiyên tînan ava kirin, ew ciyawazî jî ji bo damezrînerên nasnameyên netewî alavên bêhempa ne. Damezrînerên vê bîrdoziyê her tim ciyawaziya derdixin pêş: Em ji wan cuda ne, ji ber ku zimanê me cuda ye; em ji wan cuda ne, ji ber ku baweriya me cuda ye; em ji wan cuda ne, ji ber ku nîjada me cuda ye... Ev yek herî baş bi gotineke Ereban dikare bê rave kirin: Li hemberî birayê min ez; li hemberî pismamê min ez û birayê min; li hemberî yekî biyanî ez, birayê min û pismamê min. Nasname, an takekesî be an giştî be, aliyekî girîng ê wê ew e ku neçarî “ê din” e. Tu nasnameyên azad tune ku ferqa xwe ya ji nasnameyên din li ber çavan negire. Nasname, li ser cudahiyan tê avakirin.¹⁴ Bi van taybetiyên modernîzmê dişibe romanê. Herikîna dîrokî ya modernîzmê û romanê, bi awayekî gelek balkêş, weke du çemên paralel pêk tê. Ev herdu çem carinan dikevin nav hevdu û li hinek ciyan jî ji hev vediqetin lê tu carî ji hev zêde dûr nabin. Loma jî îdiayên derbareyî bilindbûna romanê û modernîteyê de dişibin hev. Di her du rewşan de jî, derketina wan, naveroka wan û pênaseyên wan dişibin hev. Aliyê herî balkêş ê romanê û modernîteyê ew e ku koka herduyan jî, dirêjî guherînên epîstemolojîk ên sedsala 17 û 18an dibin. Don Kîşota Cervantes (1547- 1616) a ku di sala 1605an de hatiye weşandin, weke romana yekemîn tê qebûl kirin. Romanên pêşîn ên Henry

¹¹ Gregory Jusdanis, *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, Weşanên Metis, İstanbul, 1998, r. 76.

¹² Ahmedzade, h. b., 10.

¹³ Jusdanis, h. b., r. 106.

¹⁴ Ahmedzade, h. b., r., 19.

Fielding (1707- 1754) û Daniel Defoe (1659- 1731) ku di sed sala 18an de hatine nivîsandin û pirtûkên siyasî yên Descartes (1596- 1650) û Kant (1724- 1804) ku berhemên bingehîn ên destpêka modernîteyê ne, di heman serdemê de hatine nivîsandin.¹⁵

Encameke din a vê modernîzmê neteweperwerî ye. Ev hest jî, bi şoreşa Fransa li cîhanê belav bûye û her netewe, yan zû yan dereng, li ber bayê vê hestê ketiye. Di nav Kurdistan de, ger hinekî dereng be jî, ev hest belav bûye. Gerçî hêj di demên klasîk de hinek şairên Kurd jî bal kişandine li ser neteweperweriyê, lê vê hestê heya demeke nêzik ne di nav gel de ne jî di nav desthilatdarên Kurd de ciyê xwe negirtiye.

Di vê mijarê de helbestvanê herî navdar Ahmedê Xanî (1651- 1707) ye. Xanî, di helbestên xwe de balê dikişîne ser bêdesthilatdariya Kurdistan û li hemberî vê rewşê şaş û metal dimîne:

Ez mame di hikmeta Xwedê da

Kurmanc¹⁶ di dewleta dinê da

Aya bi çî wechî bûne mehrûm

Bil cumle ji bo çî bûne mehkûm¹⁷

Di vê mijarê de helbestvanê duyemîn Hacî Qadirê Koyî (1815- 1897) ye. Koyî, helbestvanekî Soran e û berhemên xwe jî bi zaravayê Soranî nivîsîne:

Le ber bêîtîhadî bûne miskên

Le axir da wekû zanîwne heldên

Le mabeynî kilaw sûr¹⁸ û kilaw reş,¹⁹

Perîşan û diyar in mîslî gay beş,

Her Kurd in eger çî pakî merd in,

¹⁵ Ahmedzade, h. b., r. 21.

¹⁶ Serhedî ji bo tevahiya Kurdistan peyva Kurmanc bi kar tînin. Ahmedê Xanî yê Agirî û Erebe Şemo yê Qersî jî di berhemên xwe de gava behsa Kurdistan bikin Kurmanc dinivîsin.

¹⁷ Ahmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 37.

¹⁸ Kolos sor: Osmanî, Tirk.

¹⁹ Kolos reş: Îranî, Faris.

Pamalî zemanê mîslî gerd in.²⁰

Xanî û Koyî, piştî destnîşankirina rewşê, riya rizgariyê jî vedibêjin:

Xanî:

Ger dê hebûya me ittîfaqek,

Vêkra bikira me înciyadek²¹

...

Tekmîl- i dikir me dîn û dewlet.

Tehsîl- i dikir me ‘ilm û hikmet.²²

Koyî:

Ta rêk nekewin qebîlî ekrad,

Her wa debine xerabeabad.

Enwa’ê Millet le gewre ta çûk

Xemlîwe memalîkî wekû bûk

Yek berg in û yek ziban û yek reng,

Bê keybet û ‘eyb û ‘ar û bê deng.²³

Xanî, piştî van tespîtan berpirsiyarê vê bindestiyê weke mîr û begên Kurd destnîşan dîke û bi awayekî tund wan rexne dîke:

Teb’iyyetên wan eger çi ‘ar e

Ew ‘ar- i li xelqê namidar e

²⁰ Ji ber bîyekîtiyê bûne miskîn
Di dawiyê de di wî halê tê zanîn de ne.
Di navbera kolos sor û kolos reşan de,
Perîşan in û diyar e dişibin gayê beş.
Kurd tenê paqij û merd in,
Ew bindestên zeman, ên weke koleyan in. Hacî Qadirê Koyî, *Dîwan*, Edîtor: Arîf Zêrevan, Weşanên Nefel, Stockholm, 2004, r. 150.

²¹ Înciyad: Li pey hev çûn.

²² Xanî, h. b., r. 40.

²³ Heya ku ‘eşîrên Kurdan li hev nekin,
Ewê malên wan wiha di serê wan de hilweşe.
Hemû mîletan ji mezin heya biçûk
Welatê xwe xemilandine weke bûk
Yek laş in, yek ziman in û li hev dîkin,
Bi dostanî, bê şerm kirin, bê îhtiyat dijîn. Koyî, h. b., r. 113.

Namûs e li hakim û emîran,
Tawan çî ye şa'ir û feqîran?²⁴

Di rêzika dawiyê de Xanî, neçariya xwe ya li hemberî rewşê vedibêje. Koyî jî li hemberî rewşê di heman neçariyê de ye û difikire ku wî peywira xwe pêk aniye:

Be şîr û xame dewlet payedar e,
Emin xamem heye, şîr nadiyar e.

Wezîfey xom be cê hêna tamamî,
Be şîrî dewlete millet nizamî.²⁵

Her du helbestvan jî, berhemên xwe bi Kurdî dinivîsin û sedemên vê yekê jî wiha vedibêjin:

Xanî:
Da xelq- i nebêjîtin ku Ekrad,
Bê me'rîfet in, bê esl û bunyad.

Enwa'ê milel xwedankitêb in,
Kurmanc- i tenê di bê hesêb in.²⁶

Koyî:
Her Kurd e le beynî kullî millet,
Bê behir e le xwendin û kîtabet.

Milletî bê kitêb û bê nûsîn,
Xeynî Kurdan nîye le rûy zemîn.²⁷

²⁴ Gerçî bindestbûna gelên din şerm e,
Lê ev şerm ya serokên Kurdan e.
Ev kêmahiya hukumdar û mîrên Kurdan e.
Sûcê helbestvan û hêjaran çî ye? bnr. Xanî, h. b., r. 38.

²⁵ Dewlet bi şîr û pênuşê tê damezrandin.
Min pênuş heye lê şîrê min ne diyar e (tune).
Min peywira xwe bi tamamî bi cî anî,
Lê dewlet bi şîr tê damezrandin. bnr. Koyî, h. b., r. 150.

²⁶ Xanî, h. b., r. 41.

²⁷ Tenê Kurd in di nava hemû gelan de,

Bi vî awayî Xanî û Koyî hêj di sed sala hivdeh û nozdehan de behsa neteweperweriya Kurd kirine lê ji bo ku ev hest di nava gel de cî bigre, divê li hêviya şerê cîhanê yê yekemîn bihata mayîn. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn, bandora vê hestê hêdî hêdî li ser Kurdan jî çêdibe. Ji ber ku ew ji aliyê netewe dewletên mîna Îran, Êraq, Sûrî, Tirkiye û Ermenîstanê ve hatine dorpêç kirin û di nava wan de têkilî lawaz in û siyaseta dewletên desthilat bandoreke mezin li ser pêşketin û pêşneketina wan dike, ev pêşketin di nav civakên Kurdan de bi heman rengî pêk nehatiye.

Yek ji van civakên kurdan jî civaka Kurdên Kafkasyayê ye. Kurdên Kafkasyayê, piranî, di serdema Osmanîyan de neçarî koçberiyê bûne û xwe spartinê welatê Kafkasyayê.²⁸ Vê civaka Kurd, demeke dirêj jiyanêke paşdemayî û piranî ji xwendin û pêşketinê dûr, jiyanêke koçer û gundî derbas kir. Berovajî Kurdistana Başûr, li wir dema azadî destpê kir, çîneke ronakbîr tune bû. Piraniya wan gundî û koçer bûn û rêjeya xwendevaniyê jî ji hezarî yek bû.²⁹ Di dawiya sed sala nozdehan de bayê guherînê li welatên Kafkasyayê jî da û vî bayî di destpêka sed sala bîstan de bi Şoreşa Cotmehê encam da. Vê şoreşê di tevahiya cîhanê de deng da û bandora wê li hemû herêma Kafkasyayê jî belav bû. Yekîtiya Komarên Sovyet a Sosyalîst li herêmeke gelek fireh desthilatdarî damezirand û Kurdên herêmê jî ketin bin vê desthilatdariyê de.³⁰ Desthilatdariya Sosyalîst, prensîba Şoreşa Fransayê ya “azadiya gelan” diparast û sîstema xwe jî li gorî vê prensîbê ava kir. Komar, weke konfederasyon hatibû birêxistin kirin û her gel, bi komara xwe di nav konfederasyonê de dijiya. Herêma Laçînê jî ku niha di nava Azerbaycan û Ermenîstanê de dibe mijara nîqaş û pevçûnê, bi şeş salan (1923- 1929) weke “Kurdistana Sor” hate binav kirin û ji bo Kurdan xweserî hate ava kirin.³¹

Di serdema Sovyetan de, Kurdan, weke her gelî, derfet dîtin ku ziman û çanda xwe pêşde bixin. Kurdî, weke zimanê perwerdeyê hate pejirandin û pirtûkên dersê yê Kurdî hatin nivîsîn.³² Di nava civaka Kurdan de ya ku heya wê demê paşde mayî

Bêpar in ji xwendin û pirtûkan.

Miletê bêpirtûk û bînivîs,

Ji xeynî Kurdan li ser rûyê asîman tune. Koyî, h. b., r. 156.

²⁸ Herman Taels: *Eski Sovyetler Birliği'nde Kürtler*, wer. Nadire Işık, Weşanên Pêrî, İstanbul, 2001, r. 40.

²⁹ Cristine Allison ve Philip Kreyenbroek, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2008, r. 112.

³⁰ Taels, h. b., r. 40.

³¹ Ezîzê Ziyô Bedirxan: *Kızıl Kürdistan*, wer. Hejarê Şamîl, Weşanên Pêrî, İstanbul, 2010, r. 11.

³² Hüseyin Can: *Sosyalist Sovyetler Birliği'nde Kürtler*, Weşanên Pêrî, İstanbul, 2005., r. 55.

bû, gelek rewşenbîr, nivîskar gîhiştin. Kesên weke Erebê Şemo, Qanatê Kurdo, Casimê Celîl xebatên girîng ên wêjeyî, hunerî, zanistî û çandî kirin li ser dîrok, wêje, ziman û çanda Kurdî. Xebatên li ser Kurdî ji gelek aliyan ve hatin kirin. Radyoya Êrîvanê weşana Kurdî kir, rojnameya Riya Teze bi Kurdî û tîpên latînî hate weşandin, bi dehan roman û pirtûkên çîrok û helbestan hatin nivîsîn. Li ser Kurdî, xebatên akademîk hatin kirin. Alfabe ya Kurdî ya bi tîpên Latînî û Kirîlî hate çêkirin. Li ser rêziman û rastnivîsa Kurdî pirtûkên hêja hatin nivîsîn. Ev xebat hemû ne bi awayekî ji xeyrî qanûnî, berovajî vê bi alîkariya dewletê ya madî û manewî dihatin kirin.

Kurdên Kafkasyayê, di qadên cur be cur ên mîna wêje, folklor, huner û zanistê de berhemên girîng dayîne. Vê civaka Kurdan, dema li herêmê azadî bidestxistin civakeke paşdemayî bû û xwendevan û ronakbîr di nav wan de gelek kêmbûn.³³ Piştî gîhandina ronakbîrên Kurd, îcar ji bo berhemên wêjeyî pirsgirêka naverok û mijaran derket holê, ji ber ku Kurdên herêmê, ji wêjeya Kurdî ya klasîk neagahdar bûn û li dayik nişîmanê jî, rewşê destûr nedida ku ew têkiliyê bi hevçaxên xwe re deynîn. Dewletên desthilatdar ên weke Tîrkiye, Sûriye û Îranê qedexa û zexteke tund li ser hemû nirxên kurdewariyê pêk dianîn. Civaka Kurdên Kafkasyayê jî neçar ma ku mijarên xwe ji folklorê gelê xwe bigrin: Ji ber ku tu pêwendiya wan bi Kurdistanê re tune bû. Agahiya wan jî, hema bêje, ji wêjeya klasîk a Kurdî tune bû. Loma jî wêjeya Kurdên Sovyetê li ser bingeha folklorê destpê kir.³⁴ Ji ber vê sedemê, li Kafkasyayê piraniya xebatên Kurdolojîyê di warê folklorê de hatine kirin. Bo nimûne, Tenê Haciye Cindî sî pirtûk li ser folklorê Kurdî weşandiye.³⁵ Her wiha, di Radyoya Êrîvanê de jî gelek berhemên folklorê Kurdî yê weke stran, destan û hwd. hatine weşandin.³⁶ Di wê êkolê de gelek stranbêjên navdar gihîştine û di gelemperiya Kurdan de bûne xwedî îtibar. Dengbêjên wekî Aramê Tîgran, Karapetê Xaço, Efoyê Esed, Şeroyê Biro bi salan hêmayên folklorê Kurdî yê weke kilam, stran û destan di Radyoya Êrîvanê de digotin.³⁷ Endamên wê êkolê, ne tenê di weşana radyoyê de, di romanên xwe de jî mijar û şeweya vegotinê ji folklorê xwe wergirtine. Romanûsên endamên wê êkolê û berhemên wan wiha bîna rîz kirin:

³³ Cristine Allison û Philip Kreyenbroek, h. b., r. 112.

³⁴ Amîr Hassanpour, h. b., r. 245.

³⁵ Tosinê Reşîd, "Li Welatekî Azad Rûmeta Mirov Heye", Bîr, j. 2., Havîn, Îstanbul, 2005, r. 103.

³⁶ Celîlê Celîl, "Radyoya Kurdî li Yerîvanê û Bingehdanîna wê", Bîr, j. 2., Payîz, Îstanbul, 2005, r. 191.

³⁷ Eskerê Boyik, "Nihêrîna li Ser Kurdên Sovyetê, Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê 15- 18 Tîrmeh 2010", Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011, r. 75.

Erebê Şemo:

1. Şivanê Kurmanca (1935)
2. Jiyana Bextewar (1959)
3. Dimdim (1966)
4. Hopo (1969)

Eliyê Evdîrehman:

1. Xate Xanim (1958)
2. Gundê Mêrxasa (1968)
3. Şer Çiyada (1989)

Ahmedê Hepo:

Birîn (1966)

Haciyê Cindî:

Hewarî (1967)

Se'îdê Îbo:

Kurdên Rêwî (1981)

Egîdê Xudo:

Dê û Dêmarî (1986)

Ezîzê Gerdênzerî:

1. Fincana Ferfûrî (1990)
2. Bingeh (1996)

Wezîrê Eşo:

Pamp (1996)

Eskerê Boyik:

1. Xezeba Xwedê, Beşa Ewilîn (2004)
2. Xezeb, Beşa Duwemîn (2008)

Tosinê Reşîd:

Mestûre, Serê Wê Hêjayî Tacê Bû (2005)³⁸

Van romanûsan romanên girîng ên naveroka wan Kurdewarî û folklorîk dane. Di nav vê civaka Kurdan de berhemên şanoyê jî ji aliyê van nivîskaran ve hatine dayîn:

Haciyê Cindî:

Qûtiya Du Dermana (1932)

Ahmedê Mirazî:

Zemanê Çûyî (1935)

Wezîrê Nadirî:

Reva Jinê (1935)

Di qada helbestê de jî berhemên girîng hatine dayîn:

Casimê Cefîl:

1. Elegez (1954)
2. Beyt- Serhatiyên Kurdan yê Evîntiyê (1955)
3. Kanya Dê (1957)
4. Ocaxa Min (1966)
5. Kilamên Çiya (1970)
6. Oda Kurda (1975)
7. Kurdên Bengî (1980)
8. Kofiya Diya Min (1984)

Şikoyê Hesen:

1. Qalçîçek (1961)
2. Tembûra Kurda (1965)
3. Meremê Dil Kul (1970)

³⁸ Helîm Yûsiv: *Romana Kurdî*, Weşanên Ronahî, Diyarbakır, 2011, r. 61- 62.

Ferîkê Ûsiv:

1. Çavkanî (1961)
2. Gula Elegezê (1964)
3. Lîrîka (1967)
4. Ûsivê Nebya (1973)
5. Narê (1977)
6. Hisretdefter (1984)
7. Dinya Delal (1987)

Di qada helbestê de gelek kesên din ên mîna Karlanê Çaçanî, Rizalyê Reşît, Egîdê Şemsî, Tosinê Reşît, Çerkezê Reş, Elîxanê Memê, Sehîdê Îbo, Simoyê Şemo û Ûsivê Beko berhemên hêja dayîne.³⁹

Em ê li vir cî bidin du helbestên ji wêjeya Kurdî ya Kafkasyayê ku ev her du berhem di derbareyê rewşa civakî û siyasî ya serdemê de fikrekê dide xwendevanan. Helbesta pêşîn ya Şikoyê Hesên (1928- 1976) e:

Zimanê Kurdî

Bi xeml û rewş e,

Şîrîn û xweş e,

Zimanê Kurdî.

Bi xweş awaz e

Letîf û naz e,

Zimanê Kurdî.

...

Beyta Feqî ye,

Şewta Xanî ye,

Zimanê Kurdî.

...

Mertala me ye,

Rast pêşmerge ye,

³⁹ Eskerê Boyik, "Nihêrîna li Ser Kurdên Sovyetê", r. 74.- 75.

Zimanê Kurdî.⁴⁰

Di vê helbestê de tê dîtin ku Kurd girîngiyê didin zimanê xwe. Helbesta duyemîn jî me ji nav helbestên Karlênê Çaçanî (1929- 2012) wergirt ku ew jî di derbareyê rewşa serdemê de fikrekê dide xwendevanan:

Gulanê Ra

Dibişkivin dar û kulîlk,
Deşt û zozan dixemilin,
Bi gul- sosin û deştê şîn,
Avêd kaniya dikin xuşîn.

...

Û dikişin hertim aza,
Deste- deste xort û qîz,
Ji Meydana Sorê⁴¹ eyan,
Kubar girtî kewêd spî.

Û tîn awa pêl ser pêla,
Beyraqêd sor destê wan da,
Palê sale li tev gundîya,
Xweş distrên ji her alîya⁴²

Di vê helbestê de jî bandora rejîma Sosyalîst xuya dike. Helbestvan, di rêzikên xwe de pesnê rejîmê dide û rejîmê weke çavkaniya kêfxweşî û azadiyê destnîşan dike.

Di nava vê civaka Kurdan de, di warê xebatên nivîskî de, Qanatê Kurdo (1909-1985), piştî Erebe Şemo, herî zêde hêjayî qalkirinê ye. Prof. Dr. Qanatê Kurdo, li ser mijarên weke rêziman, ferheng û antolojî berhemên gelek girîng nivîsîne: Yekemîn pirtûka wî ya Kurdî “*Gramatîka Zimanê Kurdî ya Kurt*” e. Ev pirtûk di sala 1936an de tê çap kirin. Piştî vê pirtûkê, teza wî ya doktorayê ya li Zanîngeha Lenîngradê ya bi mijara “*Çêbûna Kirdarên Bargiran di Zimanê Kurdî de*” di sala 1941an de tê weşandin. Kurdo, dûvre pirtûka xwe ya bi navê “*Rêzimana Zimanê Kurdî*” di sala

⁴⁰ Şikoyê Hesên, *Payîz û Ba*, Berhevok, amd. Tosinê Reşîd, Weşanên Avesta, İstanbul, 2008, r. 67-68.

⁴¹ Meydana Sor a navdar a Moskowayê.

⁴² Selim Temo Ergül: *Kürt Şiiri Antolojisi*, Agora Yayınları, İstanbul, 2007, c. 2., r. 894.

1957an de diweşîne. Di sala 1960an de “*Ferhenga Kurdî- Rûsî*” ya ji sî û çar hezar peyvan pêk tê diweşîne. Di sala 1950an de Vladîmîr Mînorsky kovar û rojnameyên soranî dide wî û ew destbi fêrbûn û lêkolîna zaravayê Soranî dike. Duvre jî li ser zaravayê Soranî du pirtûkan dinivîse. Di sala 1978an de pirtûka bi navê “*Rêzimana Zimanê Kurdî Ser Bingehên Zaravên Kurmancî û Soranî*” dinivîse. Piştî vê berhemê, di sala 1983an de jî “*Ferhenga Rûsî- Soranî*” dinivîse. Berhema dawiyê ya Qanatê Kurdo, antolojiya bi navê “*Tarîxa Edebiyata Kurdî*” ye ku ev berhem di sala 1983yan de hatiye weşandin.⁴³

Kurdên Kafkasyayê berhemên giranbûha dane. Wan, derfet dîtine ku li ser hemû nirxên gelê xwe bixebitin û berheman bidin. Ji bo weşandina pirtûkên Kurdî, di weşanxaneyê Dewletê ya Ermenîstanê de, beşa weşanên kurdî hate vekirin.⁴⁴ Di navbera salên 1921 û 1980yan de li YKSSê 377 pirtûkên Kurdî hatine çap kirin.⁴⁵ Di navbera salên 1921- 1960an de jî 239 pirtûkên Kurdî li YKSSê hatine weşandin. Di vê serdemê de, bi 83 pirtûkan, herî zêde di qada perwerdeyê de pirtûkên Kurdî tên weşandin. Sedema vê yekê ew e ku bi demeke dirêj li herêmê perwerdeya Kurdî tê dayîn. Piştî bi 67 pirtûkan wêje tê. Pirtûkên din jî bi van mijaran hatine çap kirin: 28 pirtûk derheqê Matematîkê de, 24 pirtûk derheqê Marksîzm, Lenînîzm, damezrînerên van bîrdoziyan, dîroka Partiya Komunîst û dîroka YKSSê de, 8 çandinî, 7 bijîjkî, 5 hûqûq, 5 erdnîgarî, 4 zanistên xwezayê, 2 zanistên perwerdeyê, 2 aborî, 1 ateîzm, 1 botanîk û 1 jî beytarî.⁴⁶

Kurdên Kafkasyayê, gava derfeta xebatên rewşenbîrî dîtine ev derfet gelek baş bikaranîne û di qadên cur be cur de berhemên girîng dayîne. Li gel kêmasiyên mîna nebûna kevneşopiya nivîsê, nebûna çîneke xwendevan û bêagahiya ji berhemên dayik niştîmanê, vê civaka Kurd ji bo dîrok û wêjeya Kurdî ekoleke dewlemend ava kiriye.

Di hemû berheman de pêwîst bû pesindayîna sîstema Sosyalîst û pesindayîna serokên desthilatdariyê yên wekî Lenîn (1870- 1924) bihata kirin. Ev taybetmendî him di romanên Erebe Şemo de him jî di romanên din ên romanûsên Kurd ên li Sovyetîstanê de xuya dike. Yek ji armancên sereke yên romanên Eliyê Evdîrehman, Hacıyê Cindî, Seîdê Îbo, Egîdo Xudo û Erebe Şemo; îspatkirina çêtirbûyîna

⁴³ Tosinê Reşîd, “Qanatê Kurdo” Bîr, j. 7, Havîn, Îstanbul, 2007, r. 70.

⁴⁴ Eskerê Boyik, “Nihêrîna li Ser Kurdên Sovyetê”, r. 72.

⁴⁵ Amîr Hassanpour, h. b., r. 339.

⁴⁶ Amîr Hassanpour, h. b., r. 339.

sazûmana sosyalîzmê ya ji kapîtalîzmê ye. Romanûs, di berhemên xwe de rewşa berî sosyalîzmê û ya dema sosyalîzmê rûberî dikin û sosyalîzmê weke riya rizgariyê ya ji paşdemayîn, ne wekhevî û zordariya serdestan dest nîşan dikin.⁴⁷ Li gel vê taybetmendiyê, nivîskarên Kurd ên wê serdemê, weke nivîskarê her gelî, di nivîsên xwe de cî didan hestên netewî. Navenda berheman çand, huner û jiyana Kurdan bû.⁴⁸ Li vir pirsgirêkek derket holê. Nivîskarên Kurd, di wê serdema azadiyê de derfeta nivîsandina berheman dîtin lê ji ber şertên ne guncav, tu têkiliya wan bi niştîman re tune bû. Li dayîk niştîmanê jî, bi taybetî li Bakur, qedexeyeke hişk li ser çand, ziman û wêjeya Kurdî hebû. Li Başûr xwendin û nivîsandina Kurdî serbest û di rewacê de bû, wêjeya li wir pêş diket jî, bi piranî, bi zaravayê Soranî bû. Ji ber ku Kurdên li welatê Sovyetê Kurmanc bûn, vê pêşketinê bandor li wan nedikir. Li Başûrê Biçûk, li Şamê, Celadet Bedirxan û hevalên wî xebatên girîng ên zimanî yên bi Kurmancî û li ser Kurmancî dikirin, lê ji ber ku di nava wan de Îran û Tirkiye hebûn, wê ekolê jî zêde feyde neda Kurdên Sovyetê. Ji ber van sedemên ne guncav, nivîskarên Kurd ên li welatê Sovyetan, him ji nivîskarên Kurd ên hevçaxê xwe him jî ji kevneşopîya wêjeya xwe ya klasîk neagahdar bûn.⁴⁹ Bi van sedeman jî, wan nivîskaran berê xwe dan folklorê gelê xwe. Wan; stran, çîrok, helbest, destan û hwd. hemû nirxên xwe yên netewî heya ku ji destê wan dihat, derbasî nivîsê kirin û ji mirinê rizgar kirin. Radyoya Êrîvanê bi salan hêmanên folklorê Kurdî li welatê Sovyetê û welatên hawirdor weşandin. Ev weşan, bi taybetî ji aliyê Kurdên Bakur ve weke hungiviyê hindik ango tişteke giranbuha hat şopandin û guhdarkirin. Sedema vê jî wekî me li jor got, qedexe û zexta tund a li ser hemû nirxên Kurdan bû. Rojnameya Riya Teze jî bi riya çapemeniyê, gelek berhemên giranbiha gîhandin xwendevanan û derbasî nivîsê kirin.

Romanûsên Kurd ên wê demê jî, yên mîna Erebe Şemo (1897- 1978), Eliyê Evdîrehman (1920- 1995), Heciyê Cindî (1908- 1990), mijar û naveroka berhemên xwe ji folklorê gelê xwe standin. Wan di berhemên xwe de cî dan nirxên Kurdan ên destan, çîrok, helbest, gotinên pêşîyan, biwêj, xeberoşk, bawerî, adet û hwd. Di encama vê pêvajoyê de jî, lîteratureke dewlemend derket holê ku bi hemû alîyan, jiyana Kurdên herêmê vedibêje. Ji vê lîteraturê jî çar romanên Erebe Şemo, nimûneyên pêşeng in. Ji ber ku Şemo, him di civakê de, him jî di nav tevahiya

⁴⁷ Haşîm Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, Weşanên Avesta, Îstanbul, 2011, r. 20.

⁴⁸ Tosinê Reşîd, h. g., r. 74.

⁴⁹ Amir Hassanpour, h. b., r. 245.

Kurdan de, yekemîn kes e ku romana Kurdî nivîsiye. Şemo, piştî vê romana xwe ya bi navê Şivanê Kurmanca, sê romanên din jî nivîsîne û ew kirine malê dîrok û wêjeya Kurdî. Şemo, di van romanên de cî dane gelek hêmayên bêjimar yê folklora Kurdan.

Me di vê xebatê de hewil da ku em li ser van hêmayên folklora Kurdî yê wî di romanên xwe de nivîsîne bisekinin. Me, hêma li gorî qadên wan senifandin û ew li gorî çanda Kurdan ravekirin û nirxandin. Me xwest em dîmenekî fireh ê folklora Kurdî ya di romanên wî de tîn gotin bigrin. Bi analîz û tespîtan jî taybetiyên bingehîn ên folklora Kurdên herêmê danîn ber çavan.



BEŞA YEKEM

1. EREBÊ ŞEMO: JIYAN, BERHEM Û KESAYETIYA WÊJEYÎ

1. 1. Jiyana Erebê Şemo:

Erebê Şemo di 23yê Çiriya Pêşî ya 1897an de li gundê Sûsîzê hatiye dunyayê. Ev gund bi navçeya Dîgorê ya bajarê Qersê ve girêdayî bû. Bajarê Qersê, di encama şerê 1877- 1878an yê di navbera Împaratoriya Osmanî û Împaratoriya Rûsyayê de ketibû bin desthilatdariya Rûsan de û vê rewşê heya şerê yekemîn ê cîhanê dewam kir. Dûv re Qers ket nav sînorên komara Tirkîyê ya nû ava kirî de⁵⁰. Gundê Sûsîzê gundekî Kurdên Êzîdî bû. Malbata Şemo jî malbateke Êzîdî bû. Şemo, navê bavê wî ye. Bi vî awayî Erebê Şemo tê wateya Erebê kurê Şemo. Ereb lawê malbatê yê sêyemîn bû. Malbata wî ji eşîra Heseniyan bû. Ev malbata Heseniyan, malbateke şêxan a Êzîdî bû lê weke hinek malbatên şêxan ên din dewlemend nebû.⁵¹ Her wiha vê malbatê weke hinek malbatên din ên şêxan dîn ji bo malê dinyayê bikar nedianî. Erebê Şemo jî ev yek tu carî nekir û di temamê jiyana xwe de jî li hemberî kesên wisa têkoşîn da.⁵² Ji ber ku malbata wî malbateke xîzan bû, bavê wî her tim şivanî, gavantî û rênçberî dikir. Erebê Şemo jî vê yekê piştrast dîke û wiha dibêje:

“Diçû ber dewarên xelkê. Wî li wê qezaya kurdan, li gundên Molokanan,⁵³ Adirbêcanan,⁵⁴ Huruman⁵⁵ û Ermenan rênçberî dikir. Salekî şivan bû, sala dî gavan û bi teherekî ebûra zarokên xwe dikir.⁵⁶”

Erebê Şemo, di zaroktiya xwe de li dibistaneke Rûsan dişixule. Ew polê paqij dîke. Ji bo dibistanê çî pêwîst be ew diçe bajêr dikire û tîne. Li wê dibistanê xwendevaneke bi navê Marûsya alfabeya zimanê Rûsî dide Ereb û bi alikariya wê, Ereb, di demên xwe yê vala de hînî xwendin û nivîsandina Rûsî dibe. Dema mamosteya dibistanê jî vê hewildana Ereb dibîne, kêfa wê jê re tê û wî bêpere wekî xwendevan digire. Bi vî awayî ew dibe xwendevanê wê dibistanê. Di demekî kin de

⁵⁰ Rohat Alakom: *Kars Kürtleri*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2009, r. 21.

⁵¹ Eskerê Boyik, “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, İstanbul, 2007, r. 17.

⁵² Temûrê Xelîl, “Erebê Şemo: Rûspîtiya Gelê Kurd”, W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, İstanbul, 2007, r. 29.

⁵³ Rûsên Xaçparêz lê ne Ortodoks.

⁵⁴ Azerî.

⁵⁵ Rûm, Yewnan.

⁵⁶ Erebê Şemo, *Şivanê Kurmanca*, Weşanxaneya Lîs, Diyarbakır, 2009, r. 53.

dibe xwendevanekî herî li pêş.⁵⁷ Ereb hêja di zaroktiya xwe de rastî dijwariyên jiyane hatiye.⁵⁸ Li ber xwendina xwe re di malên dewlemendan de yê weke Rûs, Ermen, Tirk, Hurum... dişixule. Ji ber ku tu ji van dewletiyên bi zimanê Kurdî nedizanibûn, Ereb neçar ma ku zimanên wan hîn bibe. Loma jî wî bi heft zimanên biyanî baş dizanî: Rûsî, Ermenîkî, Tirkî, Yewnanî, Azerîkî, Almanî û Gurcîkî. Her wiha hay ji orf û adetên van gelan jî hebû. Zanîna ev çend zimanan ji bo wî dibû avantajeke mezin.⁵⁹

Di pevçûnên Rûs û Tirkan ên di şerê cîhanê yê yekemîn de, artêşa Rûsan li kêleka gundê wan çadirên xwe vedigire. Pê dihesin ku di wî gundî de xulamekî Kurd heye ku bi zimanê Kurdî, Tirkî, Rûsî û Ermenîkî dizane. Wê demê kesên wisa pir kêr bûn. Wê gavê gazî wî dikin û wî di artêşa Rûs de dikin wergêr. Ew navbera salên 1914- 1916an de di artêşa Rûs de wezîfe digre. Piştî ew diçe Sاریqamişê û di çêkirina riya hesinî de du salan dişixule. Di wan du salan de ew bi gelek kesên Rûs ên xwende, yê xwedî bîr û hişmendî û fikrên şoreşger re dibe nas, hevaltiya wan dike, pirtûkan dixwîne, dinyaya wî ya zanebûn û fikirdanîna wî fireh dibe. Bîr û baweriyên Bolşevîkan nêzîkî ruhê wî tên. Ew beşdarî karên wan ên siyasî û rêxistinî dibe. Ji ber van xebatan wî diavêjin girtîgehê. Lê li wir gelek namîne. Rayedarên dewletê wî lêkolîn dikin û hîn dibin ku ew Kurdekî Êzîdî ye, dibêjin yekî wisa nikare ji siyasîyê evqas fêhm bike û bibe Bolşevîk û wî berdidin. Piştî ji girtîgehê derdikeve ji bo demeke kin li gundê xwe Sûsîzê dimîne û ji wir, bi dizî, derbasî Rûsyayê dibe. Diçe bajarê Stavropolê. Wê demê di Rûsyayê de Şoreşa Cotmehê pêk tê û partiya komunist desthilatdariyê dixê destê xwe. Erebê Şemo jî dikeve nava artêşa Sovyetê ya nûavakirî ku jê re Artêşa Sor dihat gotin. Di gel artêşê beşdarî şerê di navbera Bolşevîkan û leşkerên Çar de derdikeve, dibe. Di vî şerî de du caran birîndar dibe û bi tîfoyê dikeve û li nexweşxaneyê tê tedawî kirin.⁶⁰ Di sala 1918an de ew êdî endamekî Partiya Komunist a Rûsyayê ye. Şemo, difikire ku bêyî xwendina bingehîn ew nikare bi kêrî gel û partiye bê û bîr û baweriyên xwe bîne serî.⁶¹ Bi vê armancê ew di sala 1920an de diçe Moskovayê û di Zanîngeha Lazaryan de çar salan dixwîne. Di sala

⁵⁷ Eskerê Boyik, h. g., r. 18.

⁵⁸ Nevin Güngör Reşan: *Navdarên Kurd*, Weşanên Doz, İstanbul, 2008, r. 144.

⁵⁹ Rohat Alakom, h. b., r. 97.

⁶⁰ Bavê Nazê, "Hevpeyvîna bi Erebê Şemo re ya Berî 25 Salan", Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, İstanbul, 2007, r. 18.

⁶¹ Eskerê Boyik, h. g., r. 19.

1924an de vedigere Ermenîstanê. Li Ermenîstanê jî desthilatdariya Sovyetê li ser kar e. Ew jî di Navenda Partiya Komunîst a Ermenîstanê de wezîfe werdigre.⁶²

Hukumeta Ermenîstanê ji bo pêşxistin û hînkirina zimanê Kurdî piştgirî dikir. Hukumetê dixwest Kurdan ji şûndemayîna aborî û çandî rizgar bike û ji her aliyan ve alikariya wan bike. Di wê demê de piraniya Kurdên Ermenîstanê di jiyana koçerî de bûn. Di nav wan de kesên xwende pir kêm bûn. Orf û adetên kevin rê li ber pêşketinê digirtin. Di vî warî de Ermenan pir alikariya Kurdan dikirin. Ew mamosteyên Ermen ên ku piraniya wan Kurdî dizanî bi hizkirin diçûn gundên Kurdan û xwendin û nivîsandin hîn wan dikirin. Ji bo pêşketina gel kadroyên xwende digîhandin.⁶³

Erebê Şemo jî dikeve nav vê xebata girîng. Di nav gelê xwe de karê perwerdeyê û ronakbîriyê dike. Li gundan; dibistan û pirtûkxaneyan dide avakirin. Pirsgirêkên wan digihîne hukûmetê. Li dijî adetên bêkêr û li peymayên hukûmdariya berê yên feodal têdikoşe. Di derheqê jiyana kurdan de di rojname û kovarên komarê de maqaleyan dinivîse. Di 5ê Meha Hezîrana 1924an de li Zozanên Elegezê civîna “Kurdên Nepartîvan” tê lidarxistin. Di civînê de Erebe Şemo, wekî nûnerê Partiya Komunîst a Ermenîstanê axaftinekê dike. Mijara axaftina wî jî “Vladîmîr Îlyîç Lenîn û Miletên Biçûk” bû.⁶⁴

Di sala 1927an de Hukûmeta Ermenîstanê biryar dide ku alfabeyeke Kurdî bide amade kirin. Ev alfabe wê li ser tîpên latînî bihata damezrandin. Ji bo vê xebatê jî du kes hatin wezîfedar kirin: Îshak Maragulovê Kurdîzan ê ji eslê xwe Aşûrî û Erebe Şemo.⁶⁵ alfabeya ku wan çêkir, bi hin ciyawaziyan, nêzîkî alfabeya Celadet Bedirxan bû. Ji ber ku hinek tîpên vê alfabeyê ji Kirîlî hatibû standin, ji ya Celadet Alî Bedirxan cuda dibû.⁶⁶ Xebata Şemo û Maragûlov bi navê “*Xwe Xwe Hînkirina Zimanê Kurdî*” hate çap kirin. Bi vê berhemê pêvajoya guhertina alfabeya Kurdên welatê Sovyetan ji alfabeya Ermenîkî ber bi alfabeya Latînî ve destpê kir.⁶⁷

⁶² Reşan, h. b., r. 144.

⁶³ Eskerê Boyik, h. g., r. 19.

⁶⁴ Eskerê Boyik, h. g., r. 19.

⁶⁵ Reşan, h. b., r. 144.

⁶⁶ Îbrahîm Seydo Aydogan, “Hin Nirxandin û Îstatîstîkên li Ser Romana Kurdî”, r. 1., 2005.

http://www.amidakurd.net/nuce/75_sal_%C3%BB_197_roman%C3%AAAn_kurd%C3%AE_kurman_c%C3%AE, (20 Adar 2012.)

⁶⁷ Eskerê Boyik, h. g., r. 19.

Di wê demê de Erebe Şemo û Maragulov ji bo hînkirina alfabeya Kurdî û xwendina Kurdî li dibistanan û gundan dersan didin. Di wê demê de di nav Kurdan de kesên xwendevan gelek hindik bûn. Bi armanca ji holêrakirina vê neyînîyê, pêwîstî bi rojnameyê Kurdî hebû. Di sala 1930yan de Rojnameya Riya Teze bi vê mebestê hat damezrandin. Erebe Şemo û hevalên xwe gund bi gund, bajar bi bajar hejmarên vê rojnameyê gerandin û gîhandin destê Kurdan. Bi vî awayî dixwestin ku hejmara kesên xwendevan zêde bibe.

Erebe Şemo, bi xêra xwendina bi Rûsî û têkiliyên xwe yê bi Partiya Komünîst re kete têkiliyan. Hewl da ku ciwanên Kurd li Rûsyayê perwerdeya bilind bibînin. Bi însiyatîfa wî di sala 1928an de komeke xortên Kurd ji Gurcistan û Ermenîstanê hatin şandin Lenîngradê bo xwendinê. Van ciwanan xwendina xwe li wir qedandin û weke nişçeke ronakbîr ji bo gelê xwe xizmetên pir mezin kirin. Bo nimûne, Qanatê Kurdo yek ji wan xwendevanan bû û ew bû kurdologekî hêja. Şemo, bi gelek rewşenbîr, siyasetmedar û nivîskarên hevçaxê xwe re hevdîtin pêk tîne. Bo nimûne, bi Lenîn re hevdîtinek pêk anî û li ser rewşa Kurdan bi wî re peyivî.⁶⁸ Loma jî wêjeya Rûsî bandoreke mezin li ser wî kiriye. Wî bi Maksîm Gorkî re jî dema ku Gorkî tê Ermenîstanê hevdîtin pêk aniye û Gorkî di destê wî de destnivîsa romana “Şivanê Kurd” dibîne û lê dinêre. Dûvre jî wiha dibêje: “Gelê Kurd bi zimanê nivîskarê xwe, Erebe Şamîlov qise dike.”⁶⁹

Erebe Şemo her wiha di sazkirina rojnameya Riya Teze de jî xebateke berbiçav dide. Vê rojnameyê, di sala 1930yan de li serbajarê Ermenîstanê, Êrîvanê dest bi weşanê kir. Ew, yek ji rêveberên rojnameyê yê herî çalak bû. Di heman salê de li Êrîvanê amadekariyên ji bo perwerdeya Kurdî hebûn. Bi armanca gîhandina mamosteyên Kurdî jî li Zanîngeha Pişkafkasyayê beşa ziman û wêjeya Kurdî tê vekirin. Ji bo serokatiya vê beşê jî Erebe Şemo tê peywirdarkirin. Ew di wê beşê de xebateke girîng dide ji bo gîhandina mamosteyên ziman û wêjeya Kurdî. Dûv re ew dest ji vî karî berdide. Ji bo xwendinê diçe Lenîngradê. Ew di Enstîtuya Dîroka Çandê de weke xwendevan tê qebûl kirin. Di heman demê de di Enstîtûya Felsefê, Wêje û Dîrokê de dersên zimanê Kurdî dide.⁷⁰

⁶⁸ Bavê Nazê, h. g., r. 34.

⁶⁹ Eskerê Boyik, h. g., r. 19.

⁷⁰ Reşan, h. b., r. 144.

Di sala 1931ê de bi Rûsî Şivanê Kurd dinivîse. Heman berhem 1935an de ji aliyê Şemo ve vê carê bi Kurdî tê nivîsandin û çapkirin. Şivanê Kurd, romaneke otobiyografîk e. Serpêhatiyên nivîskar, salên wî yên dijwar vedibêje. Bi vî awayî Şivanê Kurd bi tevahî vegotina serpêhatiyên Ereba e.⁷¹ Di sala 1934an de li Êrîvanê konferansa kurdolojiyê tê lidarxistin. Şemo, di vê konferansê de jî wezîfe digre.⁷²

Di sala 1937an de Yekîtiya Sovyetan dikeve bin rêveberiya Stalîn. Bi milyonan kesên bêşûc dibin qurbanên vê heyamê. Kurdên Sovyetê jî ji vê yekê ziyaneke mezin dibînin. Ew, ji axa xwe tîr derxistin. Her wiha gelek rewşenbîrên Kurd surgûnî Sîbîryayê tîr kirin. Yek ji van rewşenbîran Ereba Şemo ye. Ew di sala 1937an de bi emrê Stalîn surgûnî Sîbîryayê tîr kirin. Bi vî awayî di jiyana wî de serdemekî nû ya pir dijwar dest pê dike. Di bin giraniya siyasî de, ew jî li wêrekî xezabî mîna Sîbîryayê ku şertên hewayê û jiyana wîsan in ku mirovên heja û xurt jî nedikarî li berxwe bidin dema jiyana xwe ya herî aktîf û berhemdar de ew dikeve devê surê, serma û dijwariyên sirgûniyê. Li wir, pêwîstiyên jiyana wî herî sade jî ji bo kesên sirgûnkirî nehatibûn amade kirin. Bi wî awayî ku kî çû kî ma. Di van şert û mercan de ji xwe qala xwendin û nivîsandinê qet nedikarî bê kirin. Armanca yekane ya hemû sirgûniyan ew bû ku ji sermayê, ji birçîbûnê û ji zordariyên siyasî xwe biparêzin û jîndar bimînin. Loma Sîbîrya ji bo gelek sirgûniyan dibû goristan. Ji ber ku wan kesan xwe li ber serma û dijwariya wê derê nedigirtin û jiyana xwe ji dest didan. Lê Ereba Şemo xwedî serpêhatiyên zehmet bû. Wî, li wir li ber xwe da û nemir. Ev serdem, dişibîya demên zaroktî û civantiya wî. Ji aliyê din ve Şemo, bi tu awayî nedixwest zimanê xwe ji bîr bike. Bi vê armancê jî di hucreya xwe de ji bo xwe çîrokên Kurdî digot.⁷³

Di sala 1956an de Stalîn mir. Piştî nozdeh salên zindanî û sirgûniyê Şemo ji girtîgehê tê berdan. Şemo hîn dibe ku yekî Kurd ew bi xayîntiyê gilî kiriye. Lê Ereba Şemo ew neda dadgehê. Nexwest ku tu kes bibêje: Kurd giliyê hev dikan.⁷⁴ Ew vedigere Erîvanê. Xebatên xwe yê wêjeyî, civakî û rewşenbîrî berdeham dike. Pir hewl dide ku wendahiya nozdeh salan telafî bike û projeyên di hişê xwe de pêk bîne.

⁷¹ Eskerê Boyik, h. g., r. 19.

⁷² Reşan, h. b., r. 144.

⁷³ Eskerê Boyik, h. g., r. 20.

⁷⁴ Temûrê Xelîl, h. g., r. 29.

Erebê Şemo, pêşengekî xebatên wêjeyî û zimanî yên Kurdên Kafqasyayê bû. Gelek rewşenbîrên mîna Tosinê Reşît, Babayê Keleş û Wezîrê Eşo peyrewên wî ne û xebat û berhemên xwe de ji wî gelek sûd wergirtine.

Erebê Şemo ji aliyê Rûsyayê ve hêjayî xelatên “Alaya Sor” û “Dostiya Gelan” hatiye dîtin. Di Akademiya Kurdan a Zanyarî ya Bexdayê de weke endam hatiye qebûlkirin.⁷⁵ Erebe Şemo, di sala 1978an de, di 81 saliya xwe de diçe ser dilovaniya xwe. Ew, bi merasîmeke mezin li Goristana Êrîvanê, li cihê ku mirovên bi nav û deng ên komarê tînan vaşartin, hatiye veşartin. Li navenda Êrîvanê, li ser dîwarê xaniyekê jî dinivîse ku Rewşenbîrê Kurd Erebe Şemo Şamîlov li vê malê ji sala 1963yan heya sala 1978an jiyaye.⁷⁶

1.2. Kesayetiya Wêjeyî ya Erebe Şemo:

Erebê Şemo, di sala 1897an de li Gundê Qersê Suzisê hatiye dinê. Di dema ji dayîkbûna Erebe Şemo de amadekarî û têkoşîna ji bo Şoreşa Cotmehê dewam dikir. Civaka Rûs, di nav gengeşiyê mezin de bû. Erebe Şemo di vê serdemê de mezin bûye. Civaka wî dîtiye, civaka ew di nav de mezin bûye jî civakeke wisa bû ku, gel di bin zilm û zora beg, axa û şêxan de bû. Ji bo kesên xizan jiyan gelekî zehmet bû. Desthilatdaran bi riyên ciyawaz keda wan dixwar. Ew bi xwe di nav kêf û xweşiyê de dijîyan lê kesên gundî û xizan di nav feqîrî, birçîtî û tazîtiyê de bûn. Şemo, di nav civakeke wisa de mezin bû. Wî, zehmetî û neheqiyên di nav civakê de him dîtin him jî ev zehmetî û bêmafî li wî bi xwe jî hatin kirin. Di romanên wî de bandora van serpêhatiyan baş tê xuya kirin. Erebe Şemo di nava derd û kulan de jiyaye. Ji ber hindê gelek rind gelş û sergêjîyên civata Kurd jî zanibûye. Wî hinek tiştên ku bi çavên xwe dîtin û bi guhên xwe bihîstine, daxistiye û kiriye malê mêjûyê.⁷⁷ Şemo, bi xêra şixulîna di dibistaneke Rûsan de, hînî xwendinê dibe. Ew, her wiha di sala 1920an de diçe Moskovayê û di Zanîngeha Lazaryan de çar salan dixwîne. Bi edebiyat û zimanê Rûsî tê perwerde kirin.⁷⁸ Bi vê perwerdeyê rêya nivîskariyê li ber wî vedibe. Ew Perwerdeyê klasîk a dibistanê nabîne. Şemo, di jiyana xwe de li gelek gund û bajaran şixuliye. Ji ber taybetiya herêma lê dijî ku Ermenistan e û li wir

⁷⁵ Xelîlê Çaçan, “Miletê di Heyra Wî de Bû”, W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Îstanbul, 2007, r. 27.

⁷⁶ Enîse Şîrîn û Azad Zal, “Dosye: Erebe Şemo”, W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Îstanbul, 2007, r. 16.

⁷⁷ Zeynel Abidîn Zinar, “Nivîskarê Kurd, Kedkar û Sûxrewanê Wêjeya Kurdî Erebe Şemo”, Kovara W, j. 15., Îstanbul, 2007, r. 35.

⁷⁸ Eşkerê Boyik, h. g., r. 22.

gelek gelên cuda dijîn, hînî zimanên wan gelan bûye. Ev yek ji bo wî xaleke bivê nevé ye. Ji ber ku wan, bi zimanê Kurdî nedizanî û Şemo neçar dima ku zimanên wan hîn bibê. Wî heft ziman dizanibû: Kurdî, Ermenîkî, Tirkîya Osmanî, Rûsî, Gurcîkî, Almanî û Azerîkî.⁷⁹ Vê pirzimanîyê bandor li ser zimanê wî yê kesane û romanên wî kiriye. Loma di romanên wî de peyvên Rûsî û Ermenîkî hene.⁸⁰ Her wiha gelek peyvên Tirkî jî di romanên wî de tên dîtin. Zanîna zimanan, ji bo wî dibê derfeteke şixulîn û gerînê jî. Şemo, di şerên Rûs û Osmanîyan de di nav artêşa Rûs de weke tercuman wezîfe digre û li wir mehê 25 manat didin wî.⁸¹ Her wiha Şemo, li gel zimanê gelên herêmê, çanda wan jî hîn dibê û di romanên xwe de ne tenê cî dide jiyana gelê xwe, her wiha cî dide jiyana gelên cîran jî. Gelên ku navên wan di berhemên Erebe Şemo de cih digirin û li herêma bûyer diqewimin dijîn ev in: Kurd, Ermen, Ecem, Tirk, Rûs, Gurcî û Rûm. Ew bi hev re li ser heman axê dijîn. Di navbera wan de dostanî heye lê bi şer ev dostanî ji aliyê serdestan ve tê xera kirin.⁸²

Ziman û wêjeyên van gelan bandoreke mezin li ser berhemên wî kiriye. Em ji romanên Ermenîkî yê ku bo Kurdî yan jî bo Tirkî hatine wergerandin hîn dibin ku wêjeya Ermenîkî jî bandor li Erebe Şemo kiriye. Ji ber ku piraniya romanên Ermenîkî yê wê demê jiyana koçerî û gundîtiyê ji xwe re kirine mijar.⁸³ Romanên wî ne tenê “pirzimanî” û “pirçandî” ne her wiha pir welatî ne jî. Romanên wî li gelek welatan derbas dibin. Şemo, ji ber tercumanîya xwe, komunîstîya xwe û zindanbûna xwe welatên cûr be cûr dîtine û di romanên xwe de cî daye wan welatan. Qada ku bûyer mijara romanên Erebe Şemo, bi giranî herêma Serhedê ye. Bûyer piranî li wê herêmê diqewimin. Paşê ev qad fireh dibê, digihîje heya Moskowayê, Ûkrayna û Belarûsê. Mirov dikare bêje ev qad ji Sîpanê Xelatê heya Sîbîryayê ye. Piraniya Kurdên Kafkasyayê li Ermenistan û Gurcistanê nîştêcih in. Erebe Şemo jî bi piranî jiyana Kurdên li Ermenistanê dijîn ji xwe re kiriye mijar.⁸⁴

⁷⁹ Temûrê Xelîl, h. g., r. 29.

⁸⁰ Haşim Ahmedzade, “Di Romanên Kurdî de Guherînên Şeweyî û Babetî.” Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê 15-18 Tîrmeh 2010, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011, r. 40.

⁸¹ Zeynel Abidîn Zinar, h. b., r. 33.

⁸² Serwer Denîz, “Her Ew Hesret û Ew Xwezî”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Îstanbul, 2007, r. 45.

⁸³ Ayhan Meretowar, “Kesayetiya Edebî ya Erebe Şemo”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Îstanbul, 2007, r. 42.

⁸⁴ Serwet Denîz, h. g., r. 45.

Her çiqas di romanên wî de gelên din jî cî bigirin, lehengên sereke û piraniya lehengan Kurd in; her wiha mijarên romanên ji jiyana û dîroka kurdan tînin standin. Em di berhemên nivîskarî de rastî berxwedana etnîkî tînin, çanda neteweyî ya gelê Kurd, bi awayekî xurt mora xwe li zîhniyeta berhemên wî daye.⁸⁵ Ev rewş, gotina Kawa Nemir a “Em her çiqas cil û bergê biratiya gelan lê bikin jî roman, ji hemû şaxên din ên edebî zêdetir bûye qonaxeke netewbûnê”⁸⁶ tîne bîra mirov. Şemo, tu carî guhê xwe ji bo pîrsgirêkên gelê xwe nagire û dibe berdevkê gelê xwe. Erebe Şemo, cihekî berfireh dide înkarkirina hebûna Kurdan a ji aliyê dewletan ve. Her wiha di van romanên de zilma ku axa û begên Kurd li gel dîke jî cihekî girîng digire.⁸⁷ Ew, ji bo gelê xwe jiyaneke bextewar daxwaz dîke. Xwezî û daxwaza Erebe Şemo her ew xwezî û ew hêvî bû: Jiyaneke bextewar; weke mafê her mirov û gel e.⁸⁸ Şemo, di romanên xwe de ji bo gihîştina vê bextewariyê jî rê nîşan dide. Ew, di romanên xwe de piranî xwe di nav şerekî li dijî “yên din” yên ne- Kurd de dibîne. Ev taybetmendiya romanên wî, îdfîaya “Hemû berhemên wêjeyî yên dinyaya sêyemîn, nemaze roman, alegoriyên netewî ne”⁸⁹ piştrast dîke. Bi vê sedemê jî di romanên wî de siyaset ciyekî mezin digire. Mijarên serdest ên romanên wî, bi nasnameya Kurdî û bi siyasetê ve têkildar e. Di romana Kurdî de aliyên siyasî yên serdest delîleke îlawe ye ku palpiştiya argumana siyasîbûna wêjeyê dîke.⁹⁰ Ev yek taybetiyeke wêjeya nûjen a Ewropî ye ku Şemo jî li gorî vê rêbazê berhemên xwe daye. Kevneşopîya gelperweriyê ku ji nav welatên Ewropayê za, çawan ku bandora xwe li ser gelên din ên cîhanê kir, wisan jî li zana û welatparêzên Kurdan jî kiriye. Ew neteweperwerî jî ji hingê ve bûye kevneşopîyeke bingehxurt.⁹¹ Şemo, bi naveroka romanên xwe û bi Kurdî nivîsandina wan, romanên xwe kirine nîrxên netewî. Wexta mirov li romanên wî dinêre, mirov vê taybetiyê bi awayekî eşkera dibîne. Erebe Şemo, bi kitekit li ser jiyana civakî disekine. Ji rabûn û rûniştinê bigire heya şîn û şahiyana qala her tiştî kiriye. Roj û adetên girîng yek bi yek di berhemên xwe de tomar kiriye. Mirov dibêje qey nexwestiye ev nîrxên ji bîr kirin.⁹²

⁸⁵ Ayhan Meretowar, h. g., r. 42.

⁸⁶ Kawa Nemir, Pêşgotina Hopo, Weşanên Lîs, Amed, 2007, r. 11.

⁸⁷ Haşim Ahmedzade, h. b., r. 49.

⁸⁸ Serwet Denîz, h. g., r. 46.

⁸⁹ Haşim Ahmedzade, h. b., r. 40.

⁹⁰ Haşim Ahmedzade, h. b., r. 40.

⁹¹ Ayhan Meretowar, h. g., r. 42.

⁹² Serwet Denîz, h. g., r. 46.

Ev taybetî ji bo nivîskarên hevçaxên Şemo yên ku nûnerên ekola Kafkasyayê bûn jî derbasdar e. Nivîskarên Kurd ên salên siyî, êdî yên berê nîn bûn. Wan xwe bi xwe perwerde kirin, xwe gîhandin, guherîbûn. Kurdiya xwe xurt kiribûn û bi ser da jî bûbûn pisporên edebiyata bedew... Destan û romanên bi naveroka Kurdî, bi ruhê Kurdî dagirtî yên zimanê li gorî fikrandina xwerû Kurdî, kirin berhemên hêja, vê carê bi asta hunerî û bedewiya bilind dane xwendevanên xwe.⁹³

Şemo, di ciwaniya xwe de, dema di çêkirina rêya hesinî ya Erziromê de dişixule, rastî kesên komunîst tê û fikrên wan ên civakî û siyasî ji wan hîn dibe. Ev îdeolojî li Şemo baş tê û ew jî wan fikran qebûl dike. Şemo bi vî awayî dibe yek ji endamên partiya komunîst. Ev biryar li ser nivîskariya wî jî bandorên mezin dike. Ji ber ku Şemo, di berhemên xwe de riyeke sosyalîst û realîst digire û vê yekê wiha vedibêje: “Rêbaza min a edebî realizma sosyalîst e. Lê çima? Ji ber ku ez bi xwe riyalîst û sosyalîst im. Di nêrîna min de, ev rêbaz dikare hemû aliyên jiyane ronî bike.”⁹⁴ Realîzma sosyalîst, di piraniya berhemên serdema sosyalîst de xwedî bandoreke bingehîn e. Ev ji destnîşankirina çawaniya hunerê bêtir destnîşan dike ku divê huner çawa be. Li gorî vê rêbazê rastiya ku huner destnîşan dike, rastiya civakî ye. Ev rastî di nava rastiya şoreşger de têdîtin.⁹⁵ Bandora vê rêbazê di hemû berhemên wî de xuya dibe. Şemo, di hemû berhemên xwe de bi awayekî pesnê sosyalîzmê dide. Ji xwe di wê serdemê de tenê berhemên ku pesnê sosyalîzmê didan dihatin çapkirin. Loma jî ev yek ji bo Şemo xaleke bivê nevé bû. Lê Şemo, ji dil ev yek kiriye; loma di gotina wî ya li jor de jî tê dîtin ku ew realîst û sosyalîst e. Şemo, di qada jiyana siyasî de jî aktîvîsteke çalak e. Weke her nivîskarî, Erebe Şemo jî şahidê dema xwe ye. Gava mirov berhemên wî dixwîne, mirov gelek bûyerên wê demê tê de dibîne. Ew, gelek hêlan ve li ser rewşa civakî ya wê demê sekiniye û rewşa serdemê ragihandiye xwendevanan. Tenê rewş tespît nekiriye, her wiha sedemên pirsgirêkan jî gotiye û riya çareseriyê jî nîşan daye. Em ji jiyana û berhemên wî dizanin ku ji bo çareserkirina pirsgirêkan jî ji dil û can xebitiye. Lê di hêlekê tenê de na, di gelek hêlan de. Ji polîtîkayê bigre heya perwerdehiyê, ji weşangeriyê bigre heya nivîskariyê, her tim weke serkêşekê xebitiye.⁹⁶

⁹³ Cihan Roj, “Pirên Şikestî û Îzolasyona Gewr”, Kovara W, j. 15., Tirmeh- Gelawêj, İstanbul, 2007, r. 39.

⁹⁴ Bavê Nazê, h. g., r. 32.

⁹⁵ Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi*, Weşanên İletişim, ç. 19. İstanbul, 2009, r. 53.

⁹⁶ Serwet Denîz, h. g., r. 43.

Şemo, di vê pêvajoyê de ne bêalî ye û çepera wî ya siyasî gelek diyar e. Erebe Şemo, Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst a Ermenistanê bû. Ji ber vê yekê jî berhemên wî di bin siya siyasetê de ne.⁹⁷ Ev xal, ne bi Şemo sînorkirî ye. Tevahiya wêjeya kurdî ya wê demê li Kafkasyayê pêşketî li ser vê rastiye hatiye hûnandin. Romanên Kurdî yên pêşîn, xusûsî romanên realîst û sosyalîst in. Sedema vê, ji ya wêjeyî wêdetir (Meta- literary) e. Bi gotineke din, derketina romana Kurdî, ne encama guherînên civakî û epîstemolojîk ên hundirîn bûn. Li Yekîtiya Sovyetan, piştî Şoreşa Cotmehê ya ji ber ku Kurdên wê derê dikaribûn ji hin mafên ziman û çandî îstîfade bikin, romanên Kurdî yên pêşîn ji aliyê aktîvîstan ve yên endamên partiya komunîst a Sovyetan bûn, hatine nivîsîn. Eşkeraya ku armanca wan nivîskarên ew bû ku baweriyên xwe derxin pêş. Di encama wê de romanên wan, taybetmendiyên nimûneyên realîzma sosyalîst, bi awayekî din “hizirkirina nivîskar, ruhê partiyê (partînost) û nêzî gel (norodnost) û pêşveçûna hunerî derxistin pêş. Romanên sosyalîst realîst li pey çareseriyê pirsgirêkên ezêlî yên di rastiya civakî de, hûmanîzmaya aktîf û tevgerên civakî- siyasî pêşverû digeriyan.⁹⁸

Azadiya wê demê ji bo gelan derdikeve pêş, ji bo Kurdan jî derfeteke erênî bi xwe re tîne. Derketina romana Kurdî li welatê Sovyetan ku tu kevneşopîya nivîsandina bi Kurdî tune bû, nîşan dide ku hokerên ji ziman û wêjeyî wêdetir e. Bi gotineke din, azadiya rêjeyî ya Kurdan a xwe îfadekirinê û hebûna piştevanekî fermî dikare hevkarîya hilberandina berhemên wêjeyî bikin.⁹⁹ Bi gotineke din, lîteratûra wêjeyî ya Kurdî ya li Welatê Sovyetan pêşketî, ne encameke ronensansa nav xweyî û hestiyariyên wêjeyî derket holê. Civaka Kurdan a li herêmê di şertên guncav ên siyasî û civakî de ji bo pêşketinê firsendek dît, piştgiriya dewletê jî wergirt û berhemên baş derxistin holê.

Di hemû berheman de jî îdeolojiya sosyalîzmê cî digirt. Di berhemên sosyalîst de, endazyariya civakî weke yek ji armancên sereke tê qebûlkirin. Romanên sosyalîst jî qaîdeyên realîzma sosyalîst dişopînin ku bi taybetî doktrînen wê, afirandina hemwelatîyên nû yên Sovyetan armanc dikin.¹⁰⁰ Li gorî realîzma sosyalîst, rastiya ku huner vedibêje, rastiya civakî ye. Lê ev rastî, di nava pêşketina şoreşê de tê dîtin û ji

⁹⁷ Helîm Yûsiv, *Romana Kurdî*, Weşanên Ronahî, İstanbul, 2011, r. 11.

⁹⁸ Ahmedzade, h. b., r. 18.

⁹⁹ Haşim Ahmedzade, h. b., r. 38.

¹⁰⁰ Haşim Ahmedzade, h. b., r. 49.

bo perwerdeya çîna karker tê bikaranîn.¹⁰¹ Ji bo vê armancê jî di berhemana de karakterên îdeal tînin teswîr kirin. Romanên Şemo jî mînakên vê rêbazê ne. Karakterên romanên wî xwedî karakterên bibiryar û rasterast in.¹⁰² Ev rêbaz, ne tenê di teswîrkirina lehengan de, di hunandina romanên de jî derdikeve pêş. Ji ber ku Erebe Şemo romanên xwe bi terzekî realîst nivîsandîye. Bûyerên ku ji bo berhemên xwe hîlbijartîne, yan beşek ji jiyana wî ne yan jî serpêhatiyên kesên din in ku ew ji wan re bûye şahid. Di romanên wî de surrealîzm tune ye, realîzm heye. Di romanên wî de bawerî heye. Îdealîzm her li pêş e. Mîna romanên klasîk ên sedsala bîstî, ew qehremanên xwe ji nava rastiya jiyane diafirîne. Bûyeran derdixe pêş.¹⁰³ Di dema rejîma komunîst de berhemên naverokên wan sosyalîst, di warê çapbûn û belavbûnê de destûr û piştgiriya dewletê distand. Her wiha desthilatdariya komunîst ji bo kêmaran jî hinek maf dabû. Ev yek ji bo Kurdên Sovyetê bû derfeteke bêhempa. Wan, heya wê demê tu derfeta pêşvebirina ziman û wêjeya xwe nedîtibûn. Ji xwe ew ji ber zordestiya Osmanîyan koçber bûbûn û ji welatê xwe dûr dijiyan. Ev nêzîkbûna dewletê rê li ber xebatên wêjeyî vekiribûn. Rewşa Kurdên li Yekitiya Sovyetan di deh salên pêşîn ên Şoreşa Cotmehê de û çalakiyên wan ên ji aliyê dewletê ve dihatin fînanse kirin, rê li ber derçûna romana Kurdî ya yekem vekir.¹⁰⁴ Bi xêra vê derfetê, li derveyî welat ekoleke girîng a wêjeya Kurdî derket holê. Erebe Şemo jî yek ji nûnerên vê ekolê bû û wî bi romana xwe ya bi navê Şivanê Kurmanca romana Kurdî da destpêkirin û bi gotina Bavê Nazê, unvana bavê romana Kurdî heq kir.¹⁰⁵ Ekola Kafkasyayê di vê rewşa erênî de berhemên girîng dan wêjeya Kurdî. Bi dehan roman, çîrok û antolojî hatin nivîsandin. Xebatên rêziman, alfabe û ferhengsaziyê hatin kirin. Endamên vê ekolê, ji ber sedemên siyasî û erdnigarî ji wêjeya li welat derketibû pêş, bêxeber bûn. Kurdên Kafkasyayê heya destpêka salên 30yan di bin îzolasyoneke gelek tund de bûn. Ji aliyê netewewan ve hatibûn dorpêç kirin. Loma jî ji aliyên din ên welat, ên weke başûr, bakûr, binxet... bê xeber bûn. Her wiha ew ekol, ji berhemên li van navendan derketine holê ji bêxeber bûn.¹⁰⁶ Ev ekol, ji ber ku ji welat dûr bû û xwendin û nivîsandin di nav gel de gelek dereng belav bûbû, ji kevneşopîya wêjeya klasîk bêpar mabû. Nivîskarên vê ekolê, heya demeke nêzîk, ji helbestvanên

¹⁰¹ Berna Moran, *Edebiyat Kuramları ve Eleştirisi*, Weşanên İletişim, ç. 19. İstanbul, 2009, r. 53.

¹⁰² Haşim Ahmedzade, h. b., r. 49.

¹⁰³ Edîp Polat, "Ji Aliyê Teknîka Romanê ve Dimdim û Erebe Şemo", Kovara W, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, İstanbul, 2007, r. 37.

¹⁰⁴ Haşim Ahmedzade, h. b., r. 48.

¹⁰⁵ Remezan Alan, *Bendname*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2009, r. 196.

¹⁰⁶ Helîm Yûsiv, h. b., r. 60.

klasîk ên weke Cizîrî, Xanî û Feqî û ji berhemên wan bêxeber bûn. Haya Kurdên Ermenistanê bi giştî û ya ronakbîrên wan, ku nû rabûn, gihîştin, ji wê edebiyata Kurdî qet nîn bû ku di sedsalê navîn û nû de li Kurdistanê çêbûbû. Belkî navê yên weke Ahmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran jî nebihîstibûn, êdî wê çawa naveroka berhemên wan bizaniyan.¹⁰⁷ Bo nimûne, kilasîkên Kurdî gelek dereng li wir çap kirin: *Mem û Zîn* (1961), *Şêxê Senanî* (1965) û *Zembîlfiroş* (1983). Ev berhemên klasîk, bi wergera wan a Rûsî hatin çap kirin. Li gel wergera wan a Rûsî metnê wan ên Kurdî yên bi tîpên Erebi jî pêve hatibûn dayîn.¹⁰⁸

Ev rewş ji rastiya jiyana demê tê: Awayê pêvajoya pêşketina wêjeya Kurdî, li Kafkasyayê di bin îzolasyoneke reş de mûmên xwe pêxist. Endamnê vê ekolê, di zikê welatan de welatên biçûk afirandine. Ji ber mercên kembax wan nikaribûne li ser riya nivîskarên beriya xwe bimeşin. Ew derfet di destê wan de tune bûye ku wêjeya xwe ya rabirdûyê ya nivîskî bikin bingeh.¹⁰⁹ Van sedeman karakterê wêjeya Kurdî ya li Kafkasyayê pêşketî jî diyar kiriye: Ji ber vê yekê jî Edebiyata Kurdî ya li Ermenistanê pêşketî, weke ya netewî, li ciyekî vala, xik û xalî bingeh girt. Ew bi vê fikrê weke edebiyateke bi temamî xwerû ya nû hate avakirin.¹¹⁰

Ji ber ku nûnerên vê ekolê ji wêjeya xwe ya nûjen a dûrî wan û ji wêjeya xwe ya klasîk ya derveyî zanîna wan, bêagah bûn, neçar man ku mijarên xwe ji jiyana gel bistînin. Her wiha di berhemên xwe de zimanê gel bi kar bînin. Ji ber wê jî zimanê berhemana, zimanê gel e. Gel çawa diaxive, wisan nivîsiye. Mirov dikare bibêje bêjeyên ku bi kar anîne ji her herêmê hilbijartine. Ewqas ku bêje û şewayên ji Kurdên Başûr ên Bahdînî ku Zaravayê wan Kurmancî ye, bêjeyên weke Kurdêd, hevalêd, jinêd, kilamêd... di romanên wî de cih dirigirin. Lê devoka serdest, a Serhedê ye.¹¹¹ Sedemeke din jî ya nivîsandina bi zimanê herêmî rêbaza realîzma sosyalîst e. Ji ber ku armanca vê rêbazê bi rêya wêjeyê perwerdekirina gel e. Ji xwe gel bi piranî nivîsandin û xwendinê nizane, îcar ew ê çawa zimanê wêjeyê yê asê fêhm bike. Ji ber vê sedemê jî, nivîskarên realîzma sosyalîst her tim hewl dane ku di berhemên xwe de zimanê gel bikar bînin. Bi gotineke din, di sosyalîzmê de wêje ji bo gel tê nivîsandin.

¹⁰⁷ Cîhan Roj, h. g., r. 39.

¹⁰⁸ Amir Hassanpour, h. b., r. 245.

¹⁰⁹ Cîhan Roj, h. g., r. 39.

¹¹⁰ Cîhan Roj, h. g., r. 39.

¹¹¹ Abdurahman Baqir, "Ji Şivantiyê Ber bi Zanyariyê ve, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, İstanbul, 2007, r. 48.

Dema zimanên van romanên jî tê analîz kirin, hewildanên eşkere hene ku zimanê gel bi kar bînin. Ev dîsa taybetiyeke serekî ya şêwaza realist e ku ji xemilandinên retorîk dûr disekine û zimanê rojane û standartên axaftina ‘adetî bikar tîne. Pexşana sade, taybetiyek hevpar a romana Kurdî ya Kafkasya ye. Ev cure pexşan, hema bêje xwe bi temamî bi zimanekî teswîrî û nîşandar sînor dike. Navên romanên wî jî navên rasterast in. Bo nimûne Şivanê Kurd, Dimdim... Navên romanên wî ne weke romanên bi navê li ser baranê tînin nivîsandin razber in, berovajî vê şênber in.¹¹²

Bikaranîna zimanê herêmî, ji bo lêkolînê materyalên baş derdixe holê. Erebe Şemo, zimanekî gelek xwerû bi kar tîne. Di xwendinên baldar de tê dîtin ku gelek peyvên ku niha nayên bikaranîn cî digrin. Bikaranîna ziman a bi vî awayî romanên wî ji bo ferheng çêker, ziman-nas û lêkolîneran dibe çavkaniyeke girîng.¹¹³ Nivîsandina bi zimanê herêmî, dibe sedemê hinek pirsgerêkan jî. Bo nimûne, di warê rêzimanî de gelek kêmahî hene. Di peyvsaziyê de jî ji rêzê derketiye. Bo nimûne şûna bibêje “herin nêçîrê” gotiye “herne nêçîrê” di dewsa “kaniyên çiyê” de nivîsandiye “kanîne çiyê”. Di sazkirina hevokan de jî çewtî hene: “Eskerê Sor tijî gund bûye.” Ji vê mabest ev e: Gund tijî Eskerê Sor bûye. Şemo, di romanên xwe de daçek jî bikar neanîne. Mînak: “Sertîp zû zûka kincên xwe xwe kir.”¹¹⁴ Ji vê jî mabest ev e: Sertîp zû zûka kincên xwe li xwe kir. Bêjeyên ku bingeha xwe ji Tirkî digirin, di kurmanciya Erebe Şemo de bi awayekî xerakirî cî digrin.¹¹⁵ Mînak, lêkera Tirkî, düşünmek (fikirîn) ji aliyê Erebe Şemo ve weke “düşürmüş kir” tê bikaranîn. Ew, bêjeya degme (hêjayî) jî bikartîne. Her wiha nivîsandina bi zimanê herêmî, di hunandina vegotinê de jî dibe sedema sivikî û ji wêjeyiyê dûriyê. Ji ber ku di romanên wî de rêzkirin (collocation), yanê bi awayekî adetî rêzbûn an kombûna peyvên derdikeve pêş.¹¹⁶ Şemo, di hemû romanên xwe de rêbazeke vegotina klasîk bikartîne. Vebêj, hemû bûyeran dibîne û dizane. Ne tenê di romanên Şemo de, di hemû romanên Kurdî yê pêşîn de dîtineke îlahî (omniscient: nivîskar her tiştî dibîne û dizane) serdest e.¹¹⁷ Destpêkên romanên Şemo jî dişibin hev. Romanên wî, bi gelemperî bi teswîrkirina xwezayê dest pê dikin. Ji xwe wî bi xwe jî gelekî ji çol û

¹¹² Haşim Ahmedzade, h. b., r. 39.

¹¹³ Abidin Parilti û Özlem Galip, *Kürt Romani*, Weşanên Sel, İstanbul, 2010, r. 30.

¹¹⁴ Abdurahman Baqir, h. g., r. 48.

¹¹⁵ Edîp Polat, h. g., r. 37.

¹¹⁶ Haşim Ahmedzade, h. b., r. 40.

¹¹⁷ Haşim Ahmedzade, h. b., r. 38.

çiyar, gul û giyayan hez kiriye.¹¹⁸ Serdemên ku Şemo ji bo romanên xwe kirine mijar, serdemên şer û pevçûnên mezin in. Civak û herêm her tim di nav “ji nû ve avakirinekê” de ne. Loma jî romanên wî, ji xeynî Hopo, ne romanên serdemên asayî ne; romanên serdemên awarte ne. Nivê pêşîn ê sedsala bîstan, hê ji sedsala nozdehan jî kambaxtir bû. Şerê Cîhanê yê yekemîn dest pê dike. Herêm û civaka ku Erebê Şemo li ser sekinî jî eniyeke şer pêk tîne. Piştî şer jî eniyeke şoreşê ye. Aloziyên şerê yekemîn û şoreşê hêja neqediyane, şerê Cîhanê yê duyemîn jî digire ser. Mirov dikare bibêje di wê heyama ku Erebê Şemo li ser sekiniye de, jiyaneke civakî ya asayî tune ye. Her tim rewşa avarte heye.¹¹⁹

Şemo, van pevçûn û guherînên mezin di romanên xwe de bi awayekî balkêş vedibêje. Him bîranînên xwe him jî xwendin û bihîstinên xwe dike bin xizmeta vê vegotinê. Ji ber ku bîra wî digihîşt asteke fewqelade. Çaxa bi yekî re xeber dida, heya çend bavê wî nas dikir û yê hemberê wî bi wan zanebûnan şaş û metal dima.¹²⁰

1.3. Berhemên Erebê Şemo

1.3.1. Roman

1.3.1.1. Şivanê Kurmanca

Şivanê Kurmanca, yekemîn romana Kurdî ye. Romana Kurdî bi vê berhemê dest pê kiriye. Ji aliyekî din ve, ji ber du berhemên wêjeyî yên li Kurdistanê Başûr hatine çapkirin yekemîn romantiya *Şivanê Kurmanca* tê nîqaşkirin. Ji van du berheman a pêşîn berhema Ahmed Mûxtarê Caf a bi navê “*Meseley Wîjdan*” e. Ev berhem, dikare weke çîrokeke dirêj bê hesabandin. Ji aliyê bûyer û lehengan ve, pir zehmet e ku ew weke roman bê hesabandin. Ger ev berhem weke roman bê qebûl kirin jî, erê ew di sala 1927an de hatiye nivîsandin lê di sala 1970yan de hatiye weşandin. Bi vî awayî sala weşandina wê, sî û pênc sal piştî *Şivanê Kurmanca* ye.¹²¹ Loma jî ev berhem nikare weke yekemîn romana Kurdî bê hesabandin. Namzeta duyemîn (bi *Şivanê Kurmanca*, ya sêyemîn), ya yekemîntiyê ji bo romana Kurdî “*Nazdar ya Kiçî Kurd le*

¹¹⁸ Edip Polat, h. g., r. 37.

¹¹⁹ Serwet Deniz, h. g., r. 46.

¹²⁰ Temûrê Xelîl, h. g., r. 25.

¹²¹ Haşim Ahmedzade, h. b. r. 52.

Ladê” ye.¹²² Nivîskarê berhemê Mihemed Alî Kurdî, sê beşên vê berhemê heya sala 1936an di kovara “Rûnakî” de weşandiye. Lê di wê salê de weşana kovarê bîdawîbûye, beşên mayîn ên berhemê ne êdî di tu kovarê de ne jî weke pirtûk nahatine weşandin.¹²³ Bi vî awayî berhem nîvço maye û nebûye xebateke bidawîbûyî. Ji ber van sedeman em *Şivanê Kurmanca* weke romana yekemîn a Kurdî dipejirînin. Em ê niha li raboriya weşandina vê romanê binêrin.

Şivanê Kurmanca, di sala 1931an de ji aliyê Erebe Şemo ve bi Rûsî tê nivîsandin û heman salê tê weşandin. Ev berhem bi navê Rûsî *Kurdiskî Pastûx* (Şivanê Kurd) li Lenîngradê, ji aliyê Weşanên Moloday Grandya ve tê çap kirin. Pirtûk 64 rûpelan e. Di sala 1935an de Erebe Şemo vê pirtûkê ji nûve û bi Kurdî dinivîse. Pirtûk di heman salê de li Êrîvanê, ji aliyê weşanxaneya hukumetê ve bi tîpên kirîlî tê weşandin. Roman ji 155 rûpelan pêk tê. Ev pirtûk, ne wergera *Kurdiskî Pastux* a bi Rûsî ye ya ku beriya wê çar salan hatibû çap kirin e, lê xebateke orîjînal e. Ji xwe ji ferqa hejmara rûpelan jî ev yek eşkere tê dîtin. Diyar e ev roman, yekemîn romana Kurdî ye û unvana Bavê Romana Kurdî daye Erebe Şemo. Di sala 1935an de romana Erebe Şemo di heman salê de bi Kurdî nivîsî bû, bo Rûsî hate wergerandin û çap kirin. Erebe Şemo, di sala 1959an de romana xwe ya *Şivanê Kurd*, li ber çavan derbas dike. Hinek beşan lê zêde dike û wê bi navê *Berbang* diweşîne. Ev pirtûk, li Êrîvanê, ji aliyê Weşanên Heypetratê ve hatiye waşandin û 280 rûpel e. *Şivanê Kurd*, di sala 1964an de cara duyemîn bo Rûsî û bi navê *Kurdiskî Pastux* hatiye wergerandin. *Şivanê Kurd*, di sala 1972yan de cara sêyemîn, ji aliyê Erebe Şemo û Ostogorskaya ve, bo Rûsî tê wergerandin. Ev werger ji aliyê Weşanên Destkay Lîteratura ve, li Moskowayê tê çapkirin. Di sala 1976an de çapa duyemîn a pirtûkê jî tê weşandin. Pirtûk 208 rûpel e. *Şivanê Kurd*, cara pêşîn di sala 1977an de bo zimanê Tirkî tê wergerandin. Roman, bi navê *Kürd Çoban*, ji aliyê Weşanên Özgürlük Yolu ve, li Stenbolê tê çap kirin. Ev di heman demê de yekemîn çapa wê ya li Tirkiyê ye û yekemîn romana Kurd e ku li Tirkiyeyê tê çap kirin. Di sala 1986an de ji aliyê Weşanên Komkarê ve bi navê *Der Kurdische Hirt* (Şivanê Kurd) li Kolnê bo Almanî romanê tê wergerandin û çap kirin. Wersiyona romanê ya bi navê *Berbang*, weke cara duyemîn di sala 1988an de li Stokholmê ji aliyê Weşanxaneya Kurdistanê ve tê çap kirin. Di sala 1989an de Enstîtuya Kurdî ya Parîsê romanê werdigerîne Frensî û bi

¹²² Berhem bi zaravayê Soranî hatiye nivîsandin. Navê wê bi Kurmancî “Nazdar yan Keçeke Kurd ya li Gundekî” ye.

¹²³ Haşim Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2011, r. 52.

navê *Lé Berge Kurde* (Şivanê Kurd) diweşîne. Di sala 1990an de Weşanên Riya Azadî, li Kolnê vê romanê bi navê *Şivanê Kurd* diweşîne. Di sala 1993yan de roman, cara duyemîn bo zimanê Tirkî tê wergerandin. Weşanên Kaynak, li Stenbolê romanê bi navê *Kürt Çoban* diweşîne. Di sala 1994an de Weşanên Deng, romanê li Tirkîyê cara yekemîn bi zimanê wê yê orjînal ango bi Kurdî diweşîne. Roman bi navê *Şivanê Kurd* li Stenbolê tê weşandin. Di sala 2005an de roman, cara duyemîn li Tirkîyê bi Kurdî, ji aliyê Weşanên Aram ve li Stenbolê tê weşandin. Di sala 2006an de roman, li Hewlêrê ji aliyê Weşanên Aras ve tê weşandin. Di sala 2009an de roman, cara sêyemîn li Tirkîyê bi zimanê wê yê orjînal, lê vê carê ne li Stenbolê lê, li Amedê, ji aliyê Weşanên Lîs ve tê çap kirin. Ev çap 201 rûpel e. Weşanxaneyê di vê çapê de cî daye orjînalê romanê ya bi tîpên kirîlî ku di sala 1935an de li Êrîvanê hatiye çap kirin.¹²⁴

Roman, weke otobiyografiyekê hatiye nivîsandin. Şemo, ji zaroktiya xwe destpê kiriye û jiyana xwe vegotiye. Şiklê vegotinê ezî/minî ye. “Dîtineke îlahî” serdest e, ango nivîskar her tiştî dibîne û dizane. Roman, bi devoka Serhedê hatiye nivîsandin. Her wiha ji ber pir çandîya herêmê Şemo romanê de behsa gelek gelan dike. Têkiliyên wan ên di navbera hev de vedibêje û nêrîn û baweriyên wan ên derbareyê jiyana de neqil dike. Di romanê de gelek peyvên Rûsî, Ermenîkî û Tirkî hene. Ev jî pirzîmaniya Şemo û berhemên wî nîşan dide.

Şemo, nivîskarekî realîst û sosyalîst e. Ev yek bi awayekî eşkere di Şivanê Kurmanca de xuya dike. Bo nimûne, di romanê de behsa begên kurdan tên kirin . Her yek xwediyê çend gundan e. Çend keriyên pezên wan hene. Heta ku karê wan hebe gundî nikarin tu karê xwe bikin. Karê wan ê navmalê jî ji aliyê jin û qîzên gundiyan ve têkirin. Mafê tu kesî tune ku devê xwe li ber wan qul bike û bibêje pit. Ku yek bêhemdê xwe be jî çewtiyekî bike çermê piştê wî bi daran ve radibe. Ew dikarin bi dek û dolaban heqê şivanan nedin, bi ser de wan deyndar derxin û ji çend salan carekê kulavekî nû ji wan re nestînin. Di zivistanên xedar de ew şivanê niv tazî ji serma nexweş dikevin û dimirin. Lê dîsa jî deyndarê beg in. Lewre wî şivantiya xwe nebiriye serî û mafê wî

¹²⁴ Mûstafa Aydogan, “*Destpêka Romana Kurdî, Şivanê Kurmanca*, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2007, r. 5.

yê mirinê tune ye. Ku deyndar bimire wê ew deyn ji can û cesedên jin û zarokên wî bê derxistin.¹²⁵

Nêrîna Şemo ya li hemberî beg û axayan hişk e û bi yekserî wan nebaş nîşan dide. Her wiha gundî û kesîban (belengaz, feqîr) jî bi yekserî baş û mafdar nîşan dide. Li cem wî axa, beg, serekeşîr, dindarên êlan tev zulimkar, talanker, neheq, merîvkuj û bêwijdan in. Gundî, pale, kesîb û belengaz jî kesên pozîtîv in.¹²⁶ Ev teswîrkirina reş û spî rê li ber hinek rexneyan jî vedike. Helbet di nav axa û began de merîvên neheq ên xerab hebûne, lê derheqê tevan de xerab nivîsandin, qelsiyeke wan nivîsan e. Ewî rind dizanîbû ku di nav navên *Şivanê Kurd* de bi xerabî daye navên wisa hene ku êlên xwe ji qirê xilas kirine, anîne gihandine Ermenistanê. Wan jî mîna her kesî zehmetî, belengazî kişandine. Heta niha jî navên hinekan di nav Kurdên Ermensîtanê de bûne efsane. Kilam avêtine ser wan û ew bi keder tîbîranîn ku di salên Sovyetê yê ewilîn de komunîstan û Komsomolan, belesebep çiqas neheqî li wan kirine.¹²⁷

Şemo di *Şivanê Kurmanca* de, cî dide jiyana koçer û gundiyan Kurd. Di romanê de nivîskar gelek delal jiyana Kurdan a koçeriyê dide nîşan. Gelek cih daye dostanî û hogirtiya pale û gundiyan bindest ên gelên cîran.¹²⁸ Şemo, di gel vê yekê, ji ber ku di herêmê de gelên cuda jî dijîn, vê rastiya piştguhê xwe re navêje û di romanê de cî dide jiyana û adetên wan gelan jî. Ew ne tenê derheqê jiyana Kurdan de, lê wisa jî derheqê gelên wê herêmê yê din de gilî dike. Kifş dike ku hejarî û zordarî miletîyê nas nake. Zalimê her gelê weke hev in, hejar jî weke hev in.¹²⁹

1.3.1.2. Jiyana Bextewar

Jiyana Bextewar, romana Erebe Şemo ya duyemîn e. Di sala 1959an de hatiye weşandin. Raboriya weşandina vê romanê wiha ye. Wergera wê ya Ermenîkî, di sala 1961an de li Êrîvanê tê çapkirin. Roman 359 rûpel e. Di sala 1964an de duyemîn çapa vê wergerê tê weşandin. Ev çap ji 335 rûpelan pêk tê. Roman, di sala 1964an de ji aliyê Erebe Şemo û M. Demikovoy û M. Çaçanovskogo ve bo Rûsî tê wergerandin. Roman, ji aliyê Weşanên Sevnski Pisatel ve li Êrîvanê hatiye çap kirin. Roman 464 rûpel e. Piştî çapa yekemîn di sala 1971an de çapa duyemîn a romanê tê weşandin. Ev

¹²⁵ Serwet Denîz, h. g., r. 44.

¹²⁶ Eskerê Boyik, h. g., r. 22.

¹²⁷ Eskerê Boyik, h. g., r. 22.

¹²⁸ Eskerê Boyik, h. g., r. 22.

¹²⁹ Eskerê Boyik, h. g., r. 21.

çap ji 454 rûpelan pêk tê. *Jiyana Bextewar*, di sala 1990an de li Stokholmê ji aliyê Weşanên Roja Nû ve tê weşandin. Di sala 1994an de Weşanên Deng romanê li Stenbolê diweşîne. Ev çap 253 rûpel e.¹³⁰

Ev berhem jî weke *Şivanê Kurmanca* ji bûyerên rast hatiye hûnandin. Bûyerên di romanê de hatine dayîn, ji aliyê nivîskar ve çêkirî, yanê berhemên fikrandina wî nîn in. Ew tev ji jiyana Kurdên Sovyetê hatine hildan. Ev bûyer pêk hatine, qehremanên wisa hebûne. Nivîskar bi xwe jî ku di romanê de weke lehengê bi navê Misto cî digre, ne tenê şahid e, şerkerekî aktîf ê wan bûyeran e. Bo nimûne, Misto di romanê de dibe serleşkerê şareza, digihîje ritbeya leşkeriyê ya bilind û ji bo mêrxasiya wî navê Mêrxasê Yekîtiya Sovyetan didinê. Ji serokatiya leşkeriyê ya herî bilind, ji Emerîk û dayika Rihanê¹³¹ re nameya razîbûn û pîrozbahiyê tê. Ev agahî ji jiyana Erebe Şemo bi xwe ne.¹³²

Şemo, di romanê de hûrgiliyane çanda Kurdên Kafkasyayê nîşan dide. Di romanê de gelek orf û edet, şîn, şayî bi hûrgilî hatine nivîsandin. Bo nimûne, dema derheqê mirina Xudêda de dinivîse, wisan bi hostatî derbaskirina şîna wî û hildana cinazeyê wî dike ku tê bibêjî şîn li ber çavên xwendevanan tê kirin. Çawa li ser cinaze, distirên, kotelê çawa girêdidin,¹³³ jin guliyên xwe dibirin û didin cinazeyî. Hewarî çawa tîn û wan çî cureyî pêşwazî dikin. Xêrê çawa didin. Wisa jî qelen birrîn, dawet, bîndaroka ciwanan, cejna beranberdanê, cejna li nav gund, gera kosegeliya.¹³⁴ Ev hemû tiştên etnografîk û adetên wisan in ku niha gelek ji wan hatine ji bîr kirin.¹³⁵

Di romanê de gelek bûyerên mîna koç, şer, dawet, şîn, şoreş û hwd. cî digrin. Dikare bêgotin ku bi tomerî ev roman bi bûyeran dagirtî û kûr e. Jiyana gelê Kurd ya wê demê ya dîrokî, pir dijwar û bi guhertinên bingehîn destnîşan dike. Li ser wan destan û pêşketinan disekine ku di hukumdariya Bolşevîkan de bûne para Kurdan.¹³⁶ Ev zêdebûna bûyeran, heta astekê dibe sedema tevlîheviyê jî. Roman, tu dibêjî qey cêrga bûyerên li pey hev rêzkirî ne. Rêyeke ji aliyê nivîskar ve kivşkirî, yan pîlankirî,

¹³⁰ Enîse Şîrîn û Azad Zal, Dosye: Erebe Şemo, Kovara W, j. 15, Tîrmeh- Gelawêj, Diyarbakır, 2007, r. 16.

¹³¹ Ev herdu kes lehengên romana Erebe Şemo Jiyana Bextewar in. Rihan diya Emerîk e. Emerîk, di Artêşa Sor de leşker e. Di şerê Cihanê yê Duyemîn de şer dike û di wî şerî de tê kuştin.

¹³² Eskerê Boyik, h. g., r. 24.

¹³³ Kotel girêdan: Dema yek dimire cilên wî li peykerekê tê kirin û tê gerandin.

¹³⁴ Kosegelî, lîstikeke ritûelî ya Kurdan e ku di navbera 20- 30yê Gulanê de tê pîroz kirin.

¹³⁵ Eskerê Boyik, h. g., r. 24.

¹³⁶ Eskerê Boyik, h. g., r. 24.

ji kîjanê re gotiye bila bûyer bi wî alî de herin û xwendevanan li pey xwe bibin, naxuye.¹³⁷

Ew bûyerên ku di *Jiyana Bextewar* de cî digrin, li welatên cûr ber cûr derbas dibin. Bûyerên romanê ji Enteba Sîpka destpê dikin heta diçin digihîjin qezaya Qersê, navçeya Elegezê; bajarên Tiflîs, Lenîngrad û Moskowayê. Herba Almanya û Rûsyayê. Behsa bi dehan qehremanên pozîtîf û negatîf; bûyerên biçûk û mezin tên kirin. Gelek orf û edet, eyd, şîn, şahî... bi hûrgilî hatine nivîsandin.¹³⁸

Şivanê Kurmanca otobiyografiya nivîskar e. *Jiyana Bextewar* jî dîrokçeya eşîreke Kurdan e ku ji ber zilm û zora Osmaniyan ji welatê xwe koç kirine û çûne Rûsyayê. Roman, weke dîrokçeya Eşîra Sîpkan e. Nivîskar, naveroka romanê ji jiyana êleke Kurdan a Sîpka girtiye. Bûyerên dîrokî yên der û dora sed salan ji xwe re kiriye hîm û li ser wê hîmê guhestinên bingehîn nîşan dide, yên ku jiyana kurdên wê herêmê de qewimî bûn. Qehremanê romanê yê sereke Emerîkê ye û bûyerên sereke li dora qedera malbata wî û Kurdên wê herêmê pêk tînin, xasma êla Sîpkan. Nivê sedsala nozdehan, nakokiyên olî, civakî dikevin navbera evdên wê êlê. Zilm û zora dewleta Osmaniyan jî zêde dibe. Malbata Emerîkî û Sipkiyên Êzîdî tev mecbûr, cî û warên kal û bavên xwe, milk û malên xwe dihêlin, direvin qezaya Qersê, ku wê demê di bin bandora dewleta Rûs de bû. Koçberiya ber bi warekî nû ve bi xwe re dijberiyên nû tîne. Rast e, hukumdariya Rûsan mîna ya Osmaniyan neheq, bê wijdan û zalim nîn bû. Li cem wan hinek qewl û qanûnên civakî hebûn ku evdên sade jî ji zulma neheqan xweyî bikin. Lê li wir jî evdên kesîb, belengaz, xebatkar dihatin pelçiqandin. Li wir jî hukumdarî li aliyê axa, beg û zengînan bû. Li wir jî nakokiyên di nav civakê de, li dijî feqîr û xebatkaran dihatin bikaranîn.¹³⁹

Şemo romana xwe ya bi navê *Jiyana Bextewar* jî weke romana xwe ya bi navê *Şivanê Kurmanca*, bi devoka Serhedê dinivîse. Roman, bi Kurdiyeke xwerû hatiye nivîsandin. Nivîskar, hewl nade ku zimanê xwe zehmet bike, berovajî dixwaze hêsan bike ku herkes jê fêhm bike. Zimanê romanê paqij e, zelal û dewlemend e. Şêweya vegotina wî weke ya çîrokbêjan e. Dema xwendina romanê meriv nikare ji şîrovekirina bûyerên heweskar biqete. Tebîyet di bin qelema wî de tê bibêje hişyar

¹³⁷ Eskerê Boyik, h. g., r. 24

¹³⁸ Eskerê Boyik, h. g., r. 24.

¹³⁹ Eskerê Boyik, h. g., r. 23.

dibe, reng û rewşên bedew ên nedîtî xuya dike û xwendevan heyr dihêle. Dîmenên ciwan ên delal, ên xwezaya çiya û baniyên Serhedê di romanê de pir in. Dema mirov dixwîne her demsala wî welatî bi bedewî, xêr û bêr, bi dijiwariyên xwe tîr ber çavan.¹⁴⁰ Lê dîsa jî di romanê de hinek qelsî û xeletî balê dikşîne. Bo nimûne, di nav zimanê romanê yê delal de, carna hevokên şaş ên ne kurmancî tîr dîtin, tê bibêjî ji zimanê Ermenî yan jî Rûsî xelet wergerandine.¹⁴¹ Şemo, weke ku di Şivanê Kurmanca de dike, di Jiyana Bextewar de jî lehengên reş û spî derdixe pêşiya xwendevanan. Silêman Beg û Evdila Beg ên bira ku du lehengên vê romanê ne kedxwarên herî har in. Kî desthilat be ew xulamên wî ne. Bi hêza xwe û bi alîkariya ji dewletên mîna Rûsya, Osmanî û Ermenîstan digirin, gel diçewisînin. Gel dişêlînin. Hem bertîla xwe distînin hem jî ya rayedarên dewletê, pariya nan ji gewriya xîzanan derdixin û ji Sultanê Romê yan ji leşkerên Taşnakan re dişînin. Ew torin in an jî tov rind in. Qaşo tovê wan û bav û kalên wan ji tovê gel rindtir e. Lê tu li rastiye binihêrî tovê herî bi ziyar û xurî ye wan e. Ku tovê wan neriziyabûya, gava ku ji birçîna dest û lingên mirovan diwerimîn, dimirin û neveşartî diman., wan dawet lidar nedixist û nan û avên giran nedidan malmezinên wek xwe. Erebê Şemo rewşa wan wiha daye xuya kirin: Gava ku ji ber derê Resûl Axa bîna nanê petî û qeliyê kete nava gund, çend kesîb, jin û zarên birçî temûl nekirin, hatine ber mala wî. Ciyê qelî diqelandin dûr ve sekinîbûn stûyê xwe xwar kiribûn lê dinihêrîn. Waxtê te li wan meriyê birçî dinihêrî, ew pirçûkirî bûn, çavên wan çûbûne kort, dest û piyên wan werimîbûn. Ji dûr ve meriv tirê xurt bûne, hema ku meriv nêzikî wan dibû, dihate xuyakirinê wekî ewana werimîne.¹⁴² Şemo, bi vî awayî serdest mehkûm kirine. Ev yek encameke komunîstiya wî ye. Ji ber ku nivîskar bi rêbazên realîzma sosyalîst nêzikî bûyeran û qehremanên xwe dibe. Di nivîsara xwe de bi temamî siyasî ye, rind tê dîtin ku ew komunîst e. Hewl dide nîşan bike ku qehremanên wî yê pozîtîf tim serkeftî û pozîtîf bin. Ew ji aliyê heysiyetê ve bê qusir in, xebatçî û paqij in. Zana ne. Ji bo heqiyê, pêşdaçûyîne, edlayê, dostaniya gelên bindest şerkariyê dikin. Bi fikra wî serkeftin û pêşketina civakê tenê bi riya siyasî ya komunîst dikare miyaser bibe. Ew bawer e ku tek bi baweriyên Marksîzm û Lenînîzmê, riya Sosyalîzmê gelên weke Kurdan, ên bindest dikarin azad bibin.¹⁴³

¹⁴⁰ Eskerê Boyik, h. g., r. 24.

¹⁴¹ Eskerê Boyik, h. g., r. 24.

¹⁴² Serwet Denîz, h. g., r. 44.

¹⁴³ Eskerê Boyik, h. g., r. 24.

Nêrîna Şemo ya siyasî, bi hemû aliyên xwe dadiwerive ser romanê. Ew, di her fîrsetê de aliyê xwe eşkere dîke û ji bo rizgariyê jî, Sosyalîzmê weke rîya yekem û yekane nîşan dide. Rewşa xîzanan her tim xerab e lê piştî şoreşê hinekî diguhere, baş dibe, bîna mirovan der tê. Weke gelên din, Kurd jî ji vê pêşveçûnê gelek xebatan dikin. Bingeha civakeke nû datînin. Gelek tiştên ku gihîştine roja me berhemên van xebatan in. Bi taybetî jî xebatên di hêla perwerdehiyê de. Lê ev dem jî zêde najo, şerê cîhanê yê duyemîn digire ser. Dîsa hinek diçin û venagerin mala xwe. Zarokên wan sêwî dimînin. Weke ku tê zanîn piştî şoreşê êdî beg û hempa namînin. Kar û bar, rez û pez tev dibin yê gundiyan. Pergala kolxozvaniyê¹⁴⁴ li gundan serdest e.¹⁴⁵

Şemo, deşîfre kirin û mehkûm kirina sazûmana civaka kevin ji bo xwe weke peywîreke bingehîn dibîne. Ji ber vê yekê jî bêmafîyên beg û axayan di her fîrsetê de tîne ziman. Hinek bac û xeracên ku tîne standin: pêşkêş, teşîr, maledû, bêgar, dîş kîrasî¹⁴⁶, xugî, xerca begîtiyê, beşa dextê, beşa koçeriyê, suxre, qemçûr. Di nava Kurdan de hinek adetên kevin hêja li welatê Romê hebûn, bo nimûne, kê keça xwe dida mêr, pêwîst bû ji wî qelenê bavê keçikê ku distend teqez hinek bigihîsta beg. Xortê ku dizewicî, ewî jî pêşkêşek dida beg. Wekî malxwê malê bimira mîrata wî gerekê du par bigihîsta beg. Lê mêriyê mîna Evdila Begê, qet tiştê nedihîşt ji zarê wî meriyê mirî re.¹⁴⁷

Şemo, hinek baweriyên kevin ên ku gel paş de dihêle jî eşkere dîke. Bo nimûne di nava civakê de Kurd tenê weke hemal, dergevan û xulam tîne dîtin. Ev axaftina jêr vê yekê diçêspîne: “Rojekê Sehîd¹⁴⁸ merama xwe ji axê xwe re got, wekî ew diwaze bixwîne. Axê wî Gurcî bû, xwediyê pastaxanê bû, bi hêrs li Sehîd nihêrî û got: Wekî tu bixwînî lê kê bixebite? Ancax pera qezençkî xwe xwedî bikî. Perê bavê te hene, wekî te bide ber xwendinê? Ji wê şûnda Kurd gişk hemal in, xulam û dergevan in, çi te, çi xwendin e.”¹⁴⁹

Her wiha ew li hemberî hinek pêşqebûlên civakî derdikeve û dixwaze ew ji holê bînin rakirin. Kurdên ku li gundan dijîn ajalvanî û çandiniyê dikin. Bi piranî jî yê xîzanan ji tu karên din fêhm nakin. Dema di sedsala nozdemîn de jî diçin bajaran, karên

¹⁴⁴ Kolxoz: Pergala xebata hilberandina hevbeş a Yekîtiya Komarên Civakparêz ên Sovyetan e. Di heyra rejîma sosyalîst de, li gund û navçeyan hatiye damezrandin.

¹⁴⁵ Serwet Denîz, h. g., r. 44.

¹⁴⁶ Dîş kîrasî (Kîrêya diran): Gava ku wezîfedarekî Osmanî tê li mala yekî nan dixwe kirêya diranê xwe ji xwediyê malê distîne.

¹⁴⁷ Serwet Denîz, h. g., r. 45.

¹⁴⁸ Sehîd lehengekî romana Hopo ye.

¹⁴⁹ Serwet Denîz, h. g., r. 46.

herî zehmet û bêqîmet dikin. Lê sedem ne tenê ev bû. Beg û axayan bi destê şêx û melayan gelek baweriyên çewt di nava gel de belav dikirin û ew bawerî di mejiyên mirovan de jî bi cî dibûn. Lê bi naskirina der û dorê re ev bawerî hildiweşin. Bo nimûne bavê Sehîd wiha dibêje: “Tereqê me jî dibêjin: xwendin ji me re guneh e. Nizam çima ji hemû miletan re ne guneh e, her me re guneh e.”¹⁵⁰

Şemo, ne tenê sedemên paşde mayînê vedibêje û riyên çareseriyê nîşan dike, her wiha ji bo rizgariya gel têkoşîn jî dide. Kurdên ku piştî şoreşê dest bi xwendinê dikin xwe û dinyayê tev nas dikin û dixwazin ku ji gelên cîran paş de nemînin, dest bi xebateke baş dikin û di demeke kin de digihîjin hevalên xwe. Ev yek jî bi saya xîretkêşên weke Erebe Şemo pêk tê. Yek ji lehengên romanê¹⁵¹ Misto ku Erebe Şemo bi xwe ye, wiha dibêje: “Adirbêcana, Tatara, Ûzbekî û miletêd mayîn bi saya partiya komunîstan û dîwana Sovêtê elîfbayê latînî seva zimanê xwe çêkirine. Mekteb vekirine. Zarêd wan bi zimanê xwe dixwînin; gazete û kîtêva neşir dikin, çima kul me ketiye, em jî nikarin wisa çêkin.”¹⁵²

Yekane armanca wî rizgarî û şadiya gelê wî ye. Xwezî û dawxaza Erebe Şemo her ew xwezî û daxwaz e: Jiyanê bextewar, weke ku mafê her mirov û her gelî ye.¹⁵³

1.3.1.3. Dimdim

Dimdim, romana Erebe Şemo ya sêyemîn e. Di sala 1969an de hatiye weşandin. Raboriya weşandina *Dimdimê* wiha ye. Roman, di sala 1969an de li Êrîvanê, ji aliyê Weşanên Heypethtratê ve tê weşandin. Ev çap 572 rûpel e. Di sala 1972an de roman bo Rûsî bi navê *Krêpost Dimdim* (Kelha Dimdim) tê weşandin. Erebe Şemo û L. Ostogorskay roman wergerandine Rûsî û Weşanên Destkay Lîteratura jî li Moskowê çap kiriye. Ev çapa yekemîn a Rûsî 208 rûpel e. Piştî çapa yekemîn di sala 1976î de çapa duyemîn a romanê tê weşandin. Ev çap jî 208 rûpel e. Di sala 1974an de roman ji aliyê Erebe Şemo û N. Gorskay ve bo Rûsî hatiye wergerandin. Weşanên Destkay Lîteratura di sala 1974an de li Moskowayê vê wergerê çap dike. Werger ji 208 rûpelan pêk tê. Di sala 1978an de roman, bi navê *Dimdim* bo Ermenîkî tê wergerandin û li Rewanê tê weşandin. Werger 218 rûpel e. Roman, di sala 1983an de li

¹⁵⁰ Serwet Denîz, h. g., r. 46.

¹⁵¹ Ji romanê mebest wersiyona Şivanê Kurmanca ya bi navê Berbang e.

¹⁵² Serwet Denîz, h. g., r. 46.

¹⁵³ Serwet Denîz, h. g., r. 44.

Stokholmê, bi tîpên latînî, ji aliyê Weşanên Roja Nû ve tê çap kirin. Di sala 1984an de Şukur Mistefa romanê werdigerîne zaravayê Soranî. Ev werger ji aliyê Qorî Zanyarî Kurd ve, bi navê Dimdim, li Bexdayê tê çap kirin. Werger 316 rûpel e. Di sala 2007an de Weşanên Lîs, li Amedê bi navê *Dimdim* romanê diweşîne. Çap, ji 256 rûpelan pêk tê.¹⁵⁴

Her sê romanên din ên Erebe Şemo, mijarên xwe ji bûyerên, li gorî dema nivîsê, aktuel digirin. Mijarên di van romanên de tîpên gotin yan Şemo bi xwe dîtiye yan jî nîfşa pêşiya wî dîtiye. Lê *Dimdim*, mijara xwe, li gorî dema nivîsê, ji bûyereke dîrokî ya ji du sed û pêncî salan kevintir digire. Şemo, bi vê romanê cara yekemîn bûyereke dîrokî kiriye mijara romanên xwe. Ev bûyer, di sedsala 17an de li Çiyayê Dimdimê û derdora wê pêk hatiye. Weşandina vê romanê bûyereke berbiçav bû ku nivîsandina bedew a bûyereke dîrokî ya ewilîn e. Ne ku bi tenê di nav Edebiyata Kurdên Sovyetê de lê di ya tevehîya Kurdan de.¹⁵⁵ *Dimdim*, çiyayekî rojhilatê Kurdistanê ye. Destana *Dimdim*, bi sedan salan di nav gel de, di civatan de, di şevbihûrkan de ji aliyê dengbêjan ve bi awayekî menzûm hatiye vegotin. Ji bo romanê weke hîm destan, beyt û serhatiya zargotina Gelê Kurd a bi nav û deng Kela Dimdim hatiye weşandin. Ev beyt û serhatiya di nav zargotina Kurdên Sovyetê de pir hizkirî ye. Li odeyan, di nav civatan tim dihate gotin. Çîrokbêjan him bi stran, him jî bi cureyê şîrovekirin digotin.¹⁵⁶ Ev destan di rodyoya Êrîvanê de jî hatiye weşandin. Ev destan ji aliyê helbestvan Fêrikê Ûsiv ve weke radyokompozîsyon hatiye amade kirin û bi radyoya Êrîvanê salên dirêj hatiye dayîn.¹⁵⁷ Bi van taybetiyên xwe Şerê Dimdim, di nav gel de bûyereke navdar e. Ji ber wê jî gelek wariantên wê hebûne. Ev wariantên destanê yên ji aliyê dengbêjan ve dihatin gotin, gelek taybetî û bûyerên awarte dihewandin. Şemo, ev wariant hemû nirxandine û ew bûyer kiriye mijara romaneke nûjen. Wî, taybetî û bûyerên awarte ji çîrokê derxistiye û bûyer, gîhandiye terza romanê. Romanûs ew çîrokên xiyalî, fantastîk ku di destana gelêrî de hene derheqê dîtina zêran, çêkirina kelê, li dor navê peyva “çengzêrîn”¹⁵⁸ û bûyerên din, yên nayên bawer kirin daye aliyekî, ji romanê derxistiye, naverokeke hawaskar a realîst

¹⁵⁴ Enîse Şîrîn û Azad Zal, h. g., r. 16.

¹⁵⁵ Eskerê Boyik, h. g., r. 25.

¹⁵⁶ Eskerê Boyik, h. g., r. 25.

¹⁵⁷ Eskerê Boyik, h. g., r. 25.

¹⁵⁸ Ji bo serokê Kela Dimdimê Xano bêjeya çengzêrîn tê bikaranîn. Tê gotin ku Xano, di dema çêkirina kelê de bi çengan zêr li karker û hostayan belav kiriye loma jî ev nav lê hatiye dayîn.

afirandîye.¹⁵⁹ Serkeftin û ciyawaziya romana Şemo jî ji vir tê. Ji ber ku gelek varyantên wê ji aliyê Kurdzanan ve ji nav gel hatine nivîsandin û çapkirin. Hinek helbesvtanên Kurdên Sovyetê gotine, ew veçêkirine û ji xwe re kirine helbest û destan. Lê pêwîst e bi heqî bê gotin ku qîmetê wan nivîsarên ku li ser naveroka beyt û serhatiyên gelêrî¹⁶⁰ ji aliyê nivîskarên Kurdên Sovyetê ve hatine nivîsandin pir nizm e. Hema bêje ji her aliyê efirandariyê ve ew ji yên gelêrî dadixin. Gerekê bi rastî bê gotin romana Erebe Şemo ji wan cuda dibe... Mezmezka destana gelêrî di romanê de hatiye xweyîkirin. Bûyer, nexş, ewaz tev dora wê mezmezkê hûnandiye. Xemleke Kurmancî ya bi dilê xwe lê kiriye û heykelekî edebî yî nemir ji gelê xwe re afirandiye.¹⁶¹ Şemo, piştî ku mijar aniye forma romanê, îcar vegotina xwe jî li gorî rêbazên romanê hûnandiye. Wî, bi peyvan, di romanê de karakterên xwe ewqas bi hostatî xêz kiriye ku xwendevan dibêje qey wan hemûyan ji nêz nas ve dike. Ew, wan lehengan him bi taybetiyên wan ên fîzîkî, him jî yên takekesî û fikrî gelek baş xêz dike. Di romana wî de ji xeynî Xanoyê Çengzêrîn xwendevan rastî gelek qehremanên hizkirî tîn, yên mîna Hemze Çawîş, Xaçoyê Ermenî ku topan çêdike. Koçoyê Kal, Mîr Sadiq, Şêx Zade, Cewzo, Sêvdînê Lawê Xano, Zafîna Jina Posto, Dîlber û gelekên din... Wisan jî li ber xwendevanan tê bibêjî derê dîwana Şahê Ecem, Şah Ebas vedibe. Li wir jî rastî tirs û xofê, qelpîtiyê, kînê, neyartiyê tîn.¹⁶²

Di romanê de Şemo, bi temamî ji vegotina binezm destbernedaye. Wî, di rûpelên romanê de cî daye gelek helbest û stranên derbareyî mijarê de. Bi vî awayî wî him berdewamiya vegotinê pêk aniye him jî xwendevan ji tama vegotina binezm haydar kiriye. Balkêş e ku di vê romanê de Erebe Şemo gelek kilam û helbest jî bi kar aniye. Di van helbestan de hestên qehremanan tîn zimên, di stranên de evîndarî vedije û her wisan, şer û qehremanî, trajedî, şikestina berxwedana kelê, şewitandina xan û malên Kurdan, xwe kuştina qehremanan tê zimên. Erebe Şemo bi alikariya helbest û stranên nahêle ku xwendekar aciz bibe û herikbariya berhemê bişikê.¹⁶³ Serkeftineke din a Erebe Şemo di romana *Dimdim* de ew e ku Şemo, mekan û bûyer jî bi awayekî pir serkeftî teswîr kirine û li ber çavên xwendevan şênber kirine. Di romanê de Kela Dimdimê bi çarsû, bazar, dikan, qawexane, hostexane, kuçe û meydanên xwe mîna dîdemekî zindî tîne ber çavên xwendevanan. Nivîskar ew wisan nitirandine ku tê

¹⁵⁹ Eskerê Boyik, h. g., r. 25.

¹⁶⁰ Ne ku tenê Dimdim wisan jî yên din.

¹⁶¹ Eskerê Boyik, h. g., r. 25.

¹⁶² Eskerê Boyik, h. g., r. 26.

¹⁶³ Edîp Polat, h. g., r. 38.

bibêjî bajarekî hasê yî bedew î biçûk e. Li dorê gund û eşîrên Kurdan e. Xelkê xebathez bi kar û barên xwe ve mijûl e. Sira mezinayî û serkeftina Xanê Çengzêrîn ew e ku ew li aliyê heqiyê û qencyê ye. Xwestina wî edlayî û aramiya welatê wî ye. Yekîfî û tifaqa xelkê Kurd kirine mîna kulmeke pola. Kurd xeynî ji biratiyê, wekhevîyê û jiyana ‘edil tu tiştî ji kesî naxwazin û nahêlin tu qewet azadiya wan ji wan bistîne. Lê aliyek kela dimdimê azadîhez e, aliyê din di Tehrana rengîn de Şahê ecem ê devxwînî bi qetil û qan e. Daweta Şah e. Xwedê dizane daweta wî ya çendan e. Bûk keçeke çardeh salî ye. Di dawetê de jî Şah û neyarên Kurdan derheqê wêrandina Kela Dimdimê de difikirin. Şênbûn û azadiya wî warê Kurdan tirs û kîn kiriye dilê Tehranê de. Bi riya casûsan, dek û fenan, zorê, kuştinê, hevkarîya tevî Sultanê Romê... Her mecal tê ceribandin ku Kurdan di nav xwînê de bipelçiqînin. Nivîskar bi nimûneyan xwendevanan dide bawer kirin ku eger tifaq di nav Kurdan de hebe, Kurd piştî hev bigirin, li hev xwedî derkevin kes bi wan nikare.¹⁶⁴

Bi van taybetiyan *Dimdim*, romana herî serkeftî ya Erebe Şemo ye. Şemo, bi vê romanê hostatiya xwe ya di warê romanûsiyê de îspat kiriye. Romana xwe, li gorî rêbazên romana nûjen hûnandiye û ew kiriye yek ji girîngtirîn berhemên wêjeya Kurdî.

1.3.1.4. Hopo

Hopo, romana wî ya dawî ye. Di sala 1969an de hatiye weşandin. Di sala 1990an de Weşanên Roja Nû ew li Stokholmê çap kiriye. Weşanên Lîs jî di sala 2007an de li Amedê çap kiriye. Çapa Lîsê ji 264 rûpelan pêk tê.¹⁶⁵

Erebê Şemo, bi çar romanên xwe, yek ji berhemdartirîn romanûsên Kurd e. Taybetiya wî ya sereke ya weke “nivîskarê yekemîn romana Kurdî” wî ji wan ên din cihê dike. Şemo, bi çar romanên xwe, dîmenên zindî ji serdemên vegotî datîne ber çavên xwendevanan. Di damezrandina “dunyaya romanê” de serkeftî ye. Bi taybetî *Dimdim* ji vî alî ve berhema wî ya herî li pêş e. Ew, bi awayekî serkeftî bajar-keleyekê, gundên dora wê, jiyana wê herêmê hevok bi hevok xêz dike. Her wiha têkoşîna li hemberî dagirkeriya Farisan jî gelek serkeftî vedibêje. Romana wî ya bi navê Hopo jî ji aliyê teknîka romanê ve serkeftî ye. Lehengên wê baş hatine teswîr

¹⁶⁴ Eskerê Boyik, h. g., r. 26.

¹⁶⁵ Enîse Şîrîn û Azad Zal, h. g., r. 16.

kirin. Di vê romanê de ji her sê romanên din zêdetir diyalog hene û Şemo ev diyalog gelek serkeftî di pelên romanê de bi cî kirine. Xwendevan carina xwe ne weke ku pirtûkekê dixwîne hîs dike, xwe weke filmekê temaşe dike hîs dike. Şemo, di romana xwe ya bi navê *Jiyana Bextewar* de cî daye bi sedan bûyeran. Ji ber ku wî, ev roman bi bûyeran fitisandiyê, tam û kalîteya romaniya wê kêma bûye. Şemo, bi bûyer û serpêhatiyên *Jiyana Bextewar* de, dikarî sê romanên binivîse. Wê demê ew neçar jî ne dima ku romanê bi bûyeran tijeh bike. *Şivanê Kurmanca*, romana wî ya yekemîn e. Ji serî heya binî jiyana koçerî û gundîtiyê dihewîne. Şemo, di vir de gelek taybetmendiyên vê jiyane daye. Kêmahiya herî berbiçav a vê romanê ew e ku Şemo, hinek peyvên Tirkî bikaranîne. Wî, paşê ev kêmahiya xwe dîtiye û di sê romanên xwe yên peyrevê *Şivanê Kurmanca* de dêbila van peyvên Kurdî bikaraniye. Bi taybetî gotina “min dûşûrmîş kir” bi gotina “ez fikirîm” guhertiye. Lê dema bi gelemperî li zimanê Erebe Şemo yê di romanên xwe de bikaranî binêrîn, ewê zimanekî serkeftî û Kurdiya paqij derkeve holê. Şemo, bi Kurmanciyeke zelal û nêzî zimanê gel nivîsiye. Di çêkirina lehengan, hûnandin û bi peywendkirina bûyeran de jî serkeftî ye.

Erebê Şemo, di *Hopo* de berovajî her sê romanên xwe yên din, jiyaneke aram vegotiye. Di her sê romanên wî yên pêşîn de şer, pevçûn, şoreş, guherînen mezin, hilweşîn û hwd. hene lê di vê romanê de bûyer kêma in. Dîsa li gorî her sê romanên din, di *Hopo* de gelek diyalog cî digrin. Şemo, bi awayekî serkeftî roman bi diyalogan hûnandiye û tama romanbûna wê gelekî zêde kiriye.

Di her sê romanên pêşîn ên Erebe Şemo de civak her tim di nav ji nûve ava kirinê de ye. Lê di romana *Hopo* de rewş cuda ye. Şemo, di romanê de jiyana gundekî Kurdan a di dema sosyalîzmê de vedibêje. Li gund, sîstema kolkozvaniyê hatiye avakirin û gundî bi awayekî serfiraz û ji dil di karên gund de dişixulin. Zilma beg, axa û şêxan ji holê rabûye. Ji xwe serdema desthilatdariya wan qediyaye. Şerên mezin jî yên mîna şerên yekemîn û duyemîn ên cîhanê di paş de mane. Civak, di nav aramî û serfiraziyê de ye. Li gel ji holê rabûna desthiladariya axa û began û hatina sîstema sosyalîzmê, di nav civakê de xwendin belav bûye. Ciwanên gundên Kurdan diçin bajarên weke Êrîvanê, Moskowayê, Tiflîsê, xwendina bilind diqedînin. Dibin endazyarê çandiniyê û hwd. û vedigerin gundê xwe. Li gundê xwe di xebata kolkozê de dibin rêvebir. Gava ku mirov vê romanê dixwîne, mirov guherîna di nav civakê de

bi awayekî berbiçav dibîne. Pergaleke nû ava bûye. Mercên jiyanê hêsa bûne. Gundî bi xwe dikin û bi xwe dixwin. Ji xaniyên bin erdê derketine. Teknîka herî pêşketî di hilberînê de dixebitînin. Zarok tev dixwînin. Ji bo zarokên ku hîna naçin dibistanê bexçeyên zarokan hatine ava kirin. Her wisa têkiliyên nav malbatê jî guherîne. Jin xwedî maf û rayê ne. Lehenga bi navê Zînê mînaka guherîn û pêşveçûna jinê ye. Ew keçeke sêwî ye, xwendiyê û bûye endazyara çandiniyê û ji bo pêşveçûna gelê xwe ji dil û can dixebite.¹⁶⁶ Ev guherîn û pêşketina di nav civakê de ji aliyê hemû nûnerên wê ve nayê pejirandin. Li hemberî van guherînan hinek nerazîbûn jî derdikevin holê. Bo nimûne:

“Ez ku niha li cahilan dinihêrim, dibînim cahilên din in, ne mîna wexta me ne. Kê dikaribû turiş bikira, wekî bûk li kêleka xesiya xwe rûnên, devên xwe vekin, nan û kevçî bibe gebola xwe û tevî wê nê bixwe û bi ser de jî pê re xeber bide. Niha êdî eyb hatiye hildanê û kesek ji kesekî şerm nake. Wekî mezinên me ji gorê rabûna û ev yek bidîtana, wê bi dest xwe re ziravqetî bibûna û dîsa têketana gorê.”¹⁶⁷

Şemo, di romana *Hopo* de cî daye gelek adetên Kurdan. Xwestiyê ku jiyana wan a civakî bide nas kirin. Wî di vê romanê de jiyana civakî bi kitekit girtiye dest. Ji rabûn û rûniştinê bigire heta şîn û şahiyana qala her tiştî kiriye. Roj û adetên girîng yek bi yek di berhemê de tomar kiriye. bo nimûne, ji mirina Xwedêda¹⁶⁸ wiha qal dike: “Li Çelayê, gundê Ermeniya, tabût dabûne çêkirinê. Wextê Xwedêda kirine tabûtê bîst û neh gulî li serê jina jêkiribûn, anîn dane ser tabûta wî. Xort ketne bin tabûtê û ber bi gorê çûn.” Yê ku van rêzikan bixwînin wê bizanibin ku “kezîkur, porkur, serê (porê) min meqes û dûzan kirino!” ji bo rewşên çawa tên gotin û çima ev peyv ketine nav zimanê me. Ji ber ku Kurd li welatên cihê dijîn û asta wan a civakî cihê cihê ye; mirov dibêje qey niha gelek cudahî ketiye navbera wan. Lê bi qasî ku em ji berhemên Erebbê Şemo hîn dibin ne wisa ye. Mînakeke din ev e: Dema mêvanekî tê malekê, cîran, ji bo hînkirina ka kî ye ew mêvan, bi hinceta standina xwê, ar û hwd. diçin wê malê.¹⁶⁹

Şemo, bi vê romana *Hopo* wêneyekî jiyana gundên Kurdan ên li dora Çiyayê Elegezê wergirtiye. Guherîn û pêşketina di civakê de pêkhatî vegotiye. Xwezî û

¹⁶⁶ Serwet Denîz, h. g., r. 46.

¹⁶⁷ Erebbê Şemo, *Hopo*, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2007, r. 91.

¹⁶⁸ “Xudêda” lehengekî romana *Hopo* ye.

¹⁶⁹ Serwet Denîz, h. g., r. 46.

daxwaza wî ya jiyaneke bextewar ji bo wî û gelê wî ku di her sê romanên xwe yên pêşîn de digot, di vê romanê de dibe rastî. Gel digihîje azadî û wekhevîyê ku ew mafên wî yên herî xwezayî ne.

1.3.2. Çîrok

1.3.2.1. Kurdên Elegezê

Ev çîroka dirêj, di sala 1936an de hatiye weşandin. Behsa jiyana Kurdên li der û dora Çiyayê Elegezê dijîn dike. Pirtûk ji aliyê weşanxaneyê Hukûmeta Ermenîstanê ve hatiye çapkirin. Ev berhem peyhatiya romana *Şivanê Kurd e*. Şemo di vir de jiyana xwe ya di pey damezrandina sîstema Sovyetê re vedibêje. Qehremanê çîrokê Erebe Şemo bi xwe ye. Li vir bi navê Misto derdikeve ber xwendevanan. Li vê derê êdî Misto xebata perwerdeyî, kulturî û çandî di nav gundiyên feqîr û belengaz de dike, li dijî wan kesan derdikeve yên ku weke dijminê çîna proleteriyê tînan zanîn: Kurdên zengîn, kûlak, axa, beg û desthilatdarên berê. Her wiha li dijî adetên kevin ên ziyandar jî derdikeve. Ji bo pêşketina civakê xebata perwerdeyî, çandî û civakî dike.¹⁷⁰

1.3.3. Helbest

Bavê Nazê, di sala 1977an de, salekê pêşiya mirina Erebe Şemo, bi wî re hevpeyvînekê çêdike. Bavê Nazê, ji Erebe Şemo dipirse ku ew helbestan dinivîse yan na. Şemo, bersiv dide û dibêje: “Erê, lê ji bo xwe.”¹⁷¹ Di çavkaniyan de ji xeynê vê helbestekê tu helbestên Erebe Şemo cî nagirin. Her wiha li ser helbestkariya wî jî tu agahî nayê dayîn. Tenê Feqî Huseyîn Sagniç di pirtûka xwe ya bi navê “*Dîroka Wêjeya Kurdî*”¹⁷² de cî dide helbesteke Erebe Şemo. Helbest ev e:

Te Na Bînim

Çiya har in,

Bi neyar in,

Bê xedar in,

¹⁷⁰ Eskerê Boyik, h. g., r. 21.

¹⁷¹ Bavê Nazê, h. g., r. 32.

¹⁷² Feqî Huseyîn Sagniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2002, r. 525.

Bê mecal in.
Ji bo te birîndar in,
Bi hawêr in,
Sedem te ye em dinalin.

Tên û diçin zivistan.
Ba û bexoz.
Berf û baran.
Bi hesreta dilan,
Dîtina çevan,
Çev digerînim li hawîrdoran,
Te nabînim serê çiya û şaxan.

Tên û diçin bihar,
Li welatê bindestan.
Ax diwelide,
Çem dişuxin,
Erd û ezman dikişin,
Li xewa giran,
Dixemilin,
Banî kulîlkên Kurdistan...

Destpê dike govend û dîlan,
Çev digerînim li nav milan,
Te nabînim li nav civînan.

Tên û diçin havîn,
Hêvî û heyîna belengazan.
Dikalin mêrg û deşt,
Dipijiqe xêr û bereket,
Ji nav eniya kedkaran.
Çev digerînim li nav xebatkaran,
Li zevî û newalan,
Te nabînim nav hevalan.

Tên û diçin payîz,
Bi zarîn û axîn.
Stûxwehr in dar û ber,
Hiznî ye welat bi seranser.

Dibêjin vaye dîsa hat,
Zivistana har û xedar.
Dicivin tev hêvîdar,
Te nabînim li nav kar.

1.3.4. Senaryo

1.3.4.1. Kurdên Ermenîstanê

Erebê Şemo ji xeynî roman, çîrok û helbestan, di warê senaryo- nivîsiyê de jî xwedî berhem e. Wî, bi navê “*Kurdên Ermenîstanê*” senaryoyek nivîsandiye. Bi senaryoya wî ev filma dokumanter hatiye kişandin. Çiqas jî film pesin û propagandaya jiyana Sovyetê ye, dîsa ew ji dokumantên hêja ye ku, ji kû derê welat bin gelek rewşênbîrên Kurd dikarin wê demê bi zindî bibînin.¹⁷³

¹⁷³ Eskerê Boyik, h. g., r. 26.

1.3.5. Werger

1.3.5.1. Koçekê Derewîn

Yek ji berhemên nivîskarê piralî Erebê Şemo jî wergera piyeseke ye. Şemo, ev piyesa bi navê “*Koçekê Derewîn*” a ji aliyê nivîskarê şanoyê yê Ermen Aleksander Araratyan ve hatiye nivîsandin, di sala 1930yan de wergerandiye Kurdî.¹⁷⁴

1.3.6. Rêziman

1.3.6.1 Alfabeya Xwe Bi Xwe Hînbûna Zimanê Kurdî

Erebê Şemo di warê rêzimanê de pirtûkek nivîsandiye û navê pirtûkê “*Xwe Bi Xwe Hînbûna Zimanê Kurdî*” ye. Ev pirtûka alfabeyê di sala 1929an de hatiye weşandin. Piştî biryara hukumeta Ermenîstanê ya perwerdeya Kurdî Erebê Şemo û Îshak Maragulovê Kurdîzan ku ji eslê xwe Aşûrî ye, ev alfabe amade kirine. Ev berhem, li Ermenîstanê ji bo perwerdeya Kurdî bû materyaleke bingehîn.¹⁷⁵

1.3.7. Makale

Erebê Şemo endamekî komîteya navendî ya Partiya Komunîst ya Ermenîstanê bû. Wî, hinek broşûr û makale di warê komunîzmê de nivîsîne. Makaleyên wî yên bi navê “*Emrê Lenîn*”, “*Riya Şoreşa Oktobirê*” û “*Kolxoz û Karê Wê yê ji Gundîya re*” di sala 1930yan de hatine weşandin. Makaleya wî ya bi navê “*Li Ser Peywendiyên Feodalî di Nav Kurdan de*” di sala 1936an de hatiye weşandin. Makaleyên wî yên bi navê “*Çirûskên Şoreşa Oktobirê*” û “*Şerê Tarîlka*” jî di sala 1972yan de hatine weşandin.¹⁷⁶

Ev şeş berhem weke broşûr û makale hatine nivîsandin. Ji nivîsê mebest pesindayîna sîstema komunîst û serokê wê Lenîn e. Ev berhem di rojnameya Riya Teze de bi Kurdî, Rûsî û Ermenîkî hatine weşandin. Dezgehên çapemaniyê yên wê demê di bin kontrola rejîmê de bûn û pêwîst bû di weşanan de pesnê rejîmê bê dayîn. Ji xwe Şemo bi xwe Endamekî Partiya Komunîst bû û di hemû berhemên xwe de, kêman jî zêde, pesna rejîmê û rêberên wê daye, di van nivîsaran de Şemo hewl dide gelê paşdemayî şiyar bike û derfetên rejîmê bi wan bide nasîn. Her wiha mirovan

¹⁷⁴ Enîse Şîrîn û Azad Zal, h. g., r. 16.

¹⁷⁵ Eskerê Boyik, h. g., r. 19.

¹⁷⁶ Enîse Şîrîn û Azad Zal, h. g., r. 16.

derbareyê dujminên wan ên feodal û kevneperest de agahdar bike û riyên tekoşînê nîşanî wan bide.¹⁷⁷

1.3.8. Rojnamegerî

1.3.8.1. Rojnameya Riya Teze

Ev rojname, di sala 1930yan de li paytextê Ermenîstanê Êrîvanê hatiye damezrandin. Ermenîstan wê demê di bin desthilatdariya rejîma Sovyetan de bû. Hejmara yekemîn a rojnameyê 31ê Adara 1930an de tê weşandin.¹⁷⁸ Riya Teze, weke weşana fermî ya Partiya Komûnîst a Ermenîstanê derdikeve. Loma jî rojname bi piştgiriya dewletê tê çap kirin û naveroka wê jî di bin kontrola dewletê de ye. Di rojnameyê de pêwîst bû pesnê rejîma komûnîst û rêberên wê bîn dayîn.¹⁷⁹ Di rojnameyê de li gel nûçeyên siyasî; nivîs û dosyeyên li ser çand û dîroka Kurdan jî dihatin weşandin. Bi vî awayî vê rojnameyê bi naveroka xwe ya neteweperwer, bandoreke mezin li ser civaka Kurdan a li Sovyetîstanê kiriye.¹⁸⁰

Di hejmara 8emîn a kovara Hawarê ya di 12ê Îlona 1932an de hatiye weşandin de qala vê rojnameyê tê kirin. Celadet Alî Bedirxan bi navê Herekol Azîzan derbarê vê rojnameyê de wiha dinivîse:

“Rojnameyeke Kurmancî, bi herfên nû, bi Kurmanciyê xwerû, li Rewanê, di şikleki spehî û çeleng de derdikeve. Vê paşiyê çend hejmarên wê gîhiştine destê me. Çavên me pê ronî bûn, dilê me şa û geş bû. Kurmancên Rewanê ji xeynî rojnameyê çend pirtûk jî derxistine. Me sê çar roj mijolahîya xwe bi wan kirin. Ji nav rûpelên wan ên taze û ter bîna kulîlkên çîyayê Elegezê, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav resmên wan de, şal û şapikê Kurdî, xencer û pişt-xencera kal û kalikên me dihatin dîtin. “Rêya Teze” wekî navê xwe taze ye, nû ye, nûbar e. Lê ji Hawarê kevintir, bi ‘emr jê mezintir e. Hejmara wê ya paşîn ku gîhiştîye destê me ya pêncî û nehan e. Di gel ku Riya Teze rojnameyeke dehrojî ye, ji salekê derengtir destbi derketinê kiriye. Herekol Azîzan.”¹⁸¹

¹⁷⁷ Eskerê Boyik, h. g., r. 20.

¹⁷⁸ Tosinê Reşîd: “Kurdên Yekîtiya Sovyetê: Berê û Niha”, Kovara Bîr, j. 12., Zivistan, İstanbul, 2010, r. 206.

¹⁷⁹ Fethullah Kaya: *Kürt Basını*, Weşanên Hîvda, İstanbul, 2010. r. 160.

¹⁸⁰ Rohat Alakom, h. b., r. 433.

¹⁸¹ Fîrat Cewerî, *Hawar*, Weşanên Nûdem, Stokholm, cild 1., r. 165. Ev nivîs, ji aliyê me ve li gor îmlaya îroyîn hatiye serast kirin.

Piştî çêkirina alfabeya Kurdî ya bi tîpên Latînî, ev rojname ji bo zêdekirina xwendevanan di nav civaka Kurd de weke dibistanekê hatiye dîtin. Riya Teze, Yekemîn rojnameya Kurdî ya bi tîpên latînî ye. Bi riya vê rojnameyê, him gel ji pêşketinên girîng agahdar bûye, him di nava gel de xwendin zêde bûye him jî hestên neteweperweriya Kurd di nav gel de belav bûne.¹⁸² Pêşiya weşana vê rojnameyê, bibiryara hukumeta Ermenîstanê, ji bo Kurdan alfabeyeke latînî hate amadekirin. Erebe Şemo di sala 1928an de, li gel Îshak Maragulovê Kurdîzan vê alfabeyê amade dike. Piştî bi vê alfabeyê rojnameya Riya Teze tê weşandin û Şemo di vê rojnameyê de jî xebatên girîng dike. Bi makaleyên xwe û hewldanên xwe hêz dide rojnameyê. Her wiha ew, rojnameyê li herêma Kurdan, gund bi gund digêrîne û bêpere belav dike. Armanca Şemo, bi vê xebatê ew e ku di nava gel de xwendin û xwendevanî zêde bibe û gel ji pêşketinên rojane haydar bibe.¹⁸³

Di sala 1935an de Stalîn dibe serokomarê Sovyetîstanê. Bi desthilatdariya wî, di nav komarê de serdemekî reş û tarî destpê dike. Zext û zordariyên rejîmê digihîje asta herî jor. Bi hezaran kes sirgûnî Sîbîryayê tê kirin. Gelek rojname û kovar tînen qedexeyê kirin. Rojnameya Riya Teze jî ji vê pêla qedexeyê kirinê para xwe digre û bi hijdeh salan (1937- 1955) tê qedexeyê kirin.¹⁸⁴ Piştî mirina Stalîn, weşana rojnameyê ji nû ve destpê dike û heya hilweşîna Yekîtiya Sovyetan bi awayekî xurt didome. Rojname heftiyê du hejmar tê weşandin. Di vê serdemê de tîraja rojnameyê derûdora çar hezar e. Rojname him li tevahiya Yekîtiya Sovyetan tê belav kirin him jî heya Ewropa, Dewletên Yekbûyî yên Emerîka û Kanadayê jî hejmarên wê tînen şandin.¹⁸⁵ Bi vî taybetiya xwe Riya Teze rojnameyê navnetewî ya Kurdî ye. Hema bêje tevahiya hejmaran jî bi awayê abonetiye ji bo xwendevanan tînen şandin.¹⁸⁶ Di sala 1992yan de, Yekîtiya Sovyetê hildiweşe û piştgiriya dewletê tê birîn. Di encama ji holê rabûna piştgiriya dewletê de, rojname bi pirsgirêkên aborî ve rû bi rû dimîne.¹⁸⁷

Ev rojname, bi weşana xwe ya di navbera heştê û sê salan rojnameya herî temen dirêj a Kurdî ye.¹⁸⁸ Riya Teze, ne tenê bi temenê xwe her wiha bi reqema hejmarên

¹⁸² Eskerê Boyik, h. g., r. 20.

¹⁸³ Eskerê Boyik, h. g., r. 20.

¹⁸⁴ Eskerê Boyik, h. g., r. 20.

¹⁸⁵ Sami Tan ve diğêrleri: *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Weşanên Tarih Vakfı, İstanbul, 2010, r. 150.

¹⁸⁶ Tan, h. b., r. 150.

¹⁸⁷ Alakom, h. b., r. 433.

¹⁸⁸ Alakom, h. b., r. 433.

xwe jî xwedî rekora çapameniya Kurdî ye. Rojname, ji çar hezar û pêncsed hejmaran bêtir derketiye.¹⁸⁹ Ev reqema hejmaran bala Amîr Hassanpour jî dikişîne: “Hejmara herî zêde ya Riya Teze ye ku di heftê Cotmeha 1985an de gihîştîye sê hezar û heştê û neh hejmaran. Li hemberî derbasdariya çapemeniya Kurdî, ev hejmar nuqteyê girîng e.”¹⁹⁰ Rojname, di serdema weşana xwe ya yekemîn de (1930- 1937) bi tîpên latînî tê weşandin. Di serdema duyemîn de (1955- 2001) bi biryara hukumeta herêmî ya Ermenîstanê bi tîpên kirîlî tê weşandin. Ji sala 2001an û vir ve rojname dîsa bi tîpên latînî tê weşandin.¹⁹¹ Lê rojname bi pirsgirêkên aborî yên tund re rû bi rû ye. Tîraja wê ya ku di serdema Yekîtiya Sovyetan de çar hezar bû niha daketiye pêncsedî. Her wiha rojname pêşîn li tevahiya Yekîtiya Sovyetê û Avrûpa û Amerîkaya Bakûr dihat belav kirin û xwendin lê niha tenê di nav sînorên komara Ermenîstanê de, ew jî bêpere tê belav kirin. Rojnameya ku serdema Yekîtiya Sovyetê de hefteyê du hejmar derdiket piştî hilweşîna Sovyetan mehê carekê derdikeve.¹⁹²

Rojnameya Riya Teze, bi dîroka xwe ya dûr û dirêj û bi zehmet, dîrokçeya Kurdên Kafkasyayê ye. Qedera wê û Kurdên herêmê hevpar e. Ji nav çûn û hatinên siyasî û civakî rojnameyê jî para xwe standiye. Her çiqas di serdema xwe ya dawîn de di rewşeke zehmet de mabe jî, Riya Teze, bi arşîva xwe ya 83 salan, ansîklopediyeke dewlemend a Kurdolojiyê ye.¹⁹³

1.3.9. Radyovanî

1.3.9.1. Radyoya Êrîvanê:

Radyoya Êrîvanê di nava Kurdan de efsaneyek e. Sedsala XXan, ji bo gelê Kurd sedsaleke biêş û zehmet bû. Dewletên desthilat mafên Kurdan ên nasnameyî qebûl nedikirin û ji bo bişavtin û ji holê rakirina nirxên Kurdan ên weke çand, ziman û mûzîk polîtîkayên tund bikardianîn. Di serdemeke wiha de Radyoya Êrîvanê, bi taybetî ji bo Kurdên Bakur, bû riya xwe gihîştina çand û zimanê wan. Ev weşan, di dema qedexeya tund de hate hewara Kurdan. Vê radyoyê him moral da wan him jî ji bo paşerojê hevî û daxwazên wan zindî hiştin.

¹⁸⁹ Alakom, h. b., r. 433.

¹⁹⁰ Amir Hassanpour: *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2005, r. 382.

¹⁹¹ Eskerê Boyik, h. g., r. 20.

¹⁹² Alakom, h. b., r. 433.

¹⁹³ Alakom, h. b., r. 433.

Li welatê Sovyet, weşanên radyoyê yên Kurdî pêşîn di navbera salên 1923 û 1929an de, di serdema otonomiya Kurdistanê Sor de hatin kirin.¹⁹⁴ Di hejmara bîst û heftemîn a Hawarê de ya ku di 15î Nîsana 1941an de hatiye weşandin de, derbareyê vê weşanê de wiha dinivîse:

“Me çend caran ji îstasyoneke Kafkasê stranên Kurmancî bihîstine. Lê heya niha me nezaniye ew kîjan îstasyon e, kengê û li ser kîjan pêlan weşanê dike. Me gumana Rewanê kiriye. Me hêvî ji xwendevanên xwe heye heke pê dizanin bila ji me re bidin zanîn da ku em agahiyên vê îstasyonê di Hawarê de biweşînin. Hawar.”¹⁹⁵

Ev weşana radyoyê, hinek caran tê rawestandîna lê di sala 1954an de, piştî mirina Stalîn, bi awayekî fermî dîsa dest pê dike.¹⁹⁶ Weşan, di serî de panzdeh deqîqe ye, paşê dibe nîv saet û paşê jî bi saet û nîvê tê dirêj kirin. Vê weşana radyoyê, ji bo jiyîna çanda Kurdî ya di bin talûkeya wendabûnê de, gelek bandorek erênî kir. Kurdên Ermenîstanê her tim bi weşana vê radyoyê hatin nasîn. Dema wextê weşana radyoyê ya piştî nîvro bihata (11:45- 12:15) herkesê bala xwe dida radyoyê û li benda van sê peyvan dima: “Êrîvan xeber dide!” Di weşanan de, stranên gelêrî; serpehatiyên li ser xerîbî, mêrxasî û şer; nûçe û şîroveyan siyasetî cî digirtin.¹⁹⁷ Lê ji hemû beşan bêtir weşanên mûzîkê bala Kurdan dikişand. Di radyoyê de stranên dengbêjên mîna Meryemxan, Ayşeşan, Aslıka Qadirî, Egîdê Cimo, Şeroyê Biro, Mihemed Arif Cizrawî, Karapeto Xaço dihatin weşandin û di nava gelemperiya Kurdan de stranên wan dihatin ji ber kirin û gotin.¹⁹⁸

Arşîva vê radyoyê, ji bo mûzîka Kurdî bûye çavkaniyeke pir dewlemend. Di arşîva radyoyê de zêdetirî du hezar stranên Kurdî hatine tomarkirin.¹⁹⁹ Aliyeke din ê girîng ê radyoyê damezrandina hişmendiya kolektîf bû. Di demeke ku ziman û çanda Kurdî û hebûna gelê Kurd dihat înkâr kirin de, vê radyoyê ji bo parastin û pêşxistina hişmendî û nixirên netewî û neqilkirina van nixirên ji bo nifşên nû roleke girîng lîst.

¹⁹⁴ Amir Hassanpour, h. b., r. 429.

¹⁹⁵ Firat Cewerî. *Hawar*, c. 2, , r. 695.

¹⁹⁶ Fethullah Kaya, h. b., r. 160.

¹⁹⁷ Rohat Alakom, h. b., r. 435.

¹⁹⁸ Hasan Akboğa, “*Radyoya Êrîvanê*”, Kovara Kürt Tarihi, h. 4. Kanûn 2012- Çile 2013, İstanbul, 2013. r. 18.

¹⁹⁹ Alakom, h. b., r. 435.

Kurdên ku ji hev dûr û ji hev bêagah bûn bi riya vê weşanê di heman hestiyariyê de li hev dicivyan. Vê radyoyê ji bo standartkirina Kurdî jî bandorên erênî dikir.²⁰⁰

Radyoya Êrîvanê gelek bandor li ser Kurdên Sovyetistanê û yên li Kurdistanê kiriye. Di wan salan de ji serbajarê Iraqê Bexdayê û ji bajarê Kurdistana Îranê, Êrîvanê jî weşanên radyoyan ên Kurdî hebûn lê wan her du weşanan, weke radyoya Êrîvanê bandor li ser gelemperiya Kurdan, bi taybetî jî li ser Kurdên Bakur, nedikir. Ji ber ku weşanên wan her du radyoyan Soranî bûn û van weşanan bala Kurdên Kurmanc nedikişand. Lê weşanên Radyoya Êrîvanê seranser bi Kurdî û bi zaravayê Kurmancî bû.²⁰¹ Sedemeke din jî ya navdarbûna radyoya Êrîvanê ew bû ku radyoyê di weşanên xwe de gelek cî dida hêmayên folklorîk ên Kurdewariyê yên weke kilam, çîrok û destan. Ji wê radyoyê gelek kilamên dengbêjan belav bûne û di nava Kurdan de cî girtine. Her wiha hunermendan, alavên mûzîkê yên Kurdan bikar di anî. Lê radyoyên Bexda û Urmîyê ne xwedî vê taybetmendiya bûn. Wan, di weşanên xwe yên mûzîkê de bêtir enstrûmanên Faris û Ereban bikar di anî.²⁰² Erebe Şemo jî xebatkarekî Radyoya Êrîvanê bû. Wî, bi salan ji bo pêşxistin û dewlemendkirina weşanên radyoyê hewil daye.²⁰³

²⁰⁰ Hasan Akboğa, h. b., r. 18.

²⁰¹ Amir Hassanpour, h. b., r. 428.

²⁰² Eskerê Boyik, h. g., r. 25.

²⁰³ Eskerê Boyik, h. g., r. 25.

BEŞA DUYEM

2. DI ROMANÊN EREBÊ ŞEMO DE FOLKLORA KURDÎ

2. 1. Kevneşopî

2. 1. 1. Taybetmendiyên Sosyolojîk ên Civaka Kurdan

Civaka Kurdan a Erebê Şemo di romanên xwe de vedibêje, ji aliyê sosyolojîk ve ji eşîran pêk tê. Ev eşîr, her çiqas di serdema nûjen de ji bo netewebûnê weke astengiyê xuya bikin jî, di dîrokê de aliyên wê yên erênî bêtir in. Eşîr, ji bo malbat û kesan, ji bo piştevaniyê gelek girîng bû ye. Eşîr, ji bo aramî û ewlehiya giyanî û malî bûye alavê xurt. Loma jî bê eşîrî yan jî ji eşîrê dûr xistin, di civakê de weke cezayê yan jî neyîniyê pir mezin tê dîtin. Bo nimûne: “Kurdê ku (tê) berdanê ji eşîrê, an jî qebîleyê derxistin, paşê tu eşîr, tu qebîleyên Kurdan wî hilnadin nava xwe.”²⁰⁴

Di nava civakê de, ji bo kesên pîrsgirêka aborî dijîn hinek pere ji bo alîkariyê dikare bê kom kirin. Ji bo vî pereyî “recû” tê gotin. Di devoka Botanê de ev pere weke “bêş” tê binav kirin. Dema malbatek kete nav tengasiyê mezin a aborî, di nav civakê de ji bo wê malbatê pere tê kom kirin û bi vî awayî malbat ji tengiyê tê rizgar kirin. Ev mînakeke girîng a piştevaniya civakî ye. Erebê Şemo jî di romana xwe ya bi navê Jiyana Bextewar de ji bo vê taybetmendiyê mînakekê destnîşan dike:

“Wan çend salêd paşîn wan ra lev nehat. Kes nizane çawa nexweşî kete mala wan: mêr û jin alîkî dimirin, pez û dewar alîkî qir dibû. Te digot tebîyete ew raçev kiribû. Yeke wan nedibû dudo. Çend cara gundiya kir, ku recuyê bidnê, çawa qeyda eşîra Kurda, lê Emerîk û Sertîk qayîl nedibûn.”²⁰⁵

Di adetên Kurdan de, mirov qurûtî avê nabe,²⁰⁶ Kurd avê bi çengan vedixwin:

“Xano ber bi kaniyê çû, wî dît eskerek qurûtî kaniyê dibe, avê vedixwe. Xano çû nêzikî wî, got:

²⁰⁴ *Dimdim*, r. 154.

²⁰⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 47.

²⁰⁶ Qurûtî avê bûn: Vexwarina avê ya ji kanî û robaran a ku bêyî bikaranîna dest, qedeh û hwd. tê kirin.

“Xortê delal, ji meriv tirê tu ne Kurd î? Çima tu nizanî Kurd avê bi çengan an pê kulman vedixwin? Hela lê binihêr!

Xano nêzîkî kaniyê bû, berê destên xwe şûşt, paşê bi çengên her du destan av vexwar.”²⁰⁷

Kurd, li erdê nan dixwin. Şêweyekî rûniştina vê sifrê jî heye: “Apê Emerîk, kerem ke tev me nan bixwe. Emerîk bi qeydê dê û bava, qeydê eşîrê, çok da erdê, parî nan hilda û xwarin xwar.”²⁰⁸

Di jiyana civakî ya berî modernîzmê de, axa û beg serdest in û zorê didin gel:

“Hela tu lê binêre, wekî merîk bimre, nîvê mîrata wî mirî digihîje beg. Wekî yek qîza xwe bide mêr, ji qelendê wê qîzê para Silêman begê tê da heye. Yê qîzê dixwaze, ew jî pêşkêşê dide wî.”²⁰⁹

“Nav kurmanca da edetêd kevne hila li welatê Romê hebû, besa xeberê, kê qîza xwe dida mêr, gerekê ji wî qelenê bavê keçîkê ku distend erhede (teqez) hinek bigihîşa beg. Xortê ku zewicî, ewî jî pêşkêşek dida beg. Wekî malxê malê bimra, mîrata wî gerekê du par bigihîsta beg.”²¹⁰

“Her maleke dewletî, sê çar malê kesîb xwera bê heq dida xebatê; pez diçêrandin, jina hirî dirêst, dişûşt, şedikir, kincê wan dişûştin, dew dikilan, pesarî û qirş bona ardû top dikirin. Çend mêra sibê hetta êvarê xwe hûr dikir bona pêz, ancax pêra digîhand; hinek diçûne karvîn, hinek miqatî hespêd kihêl dibûn. Her yekî xebatek dikir. Hetta zarê hûr jî bê xebat nediman. Ew xebat tev bona kerî nan û tasek dew bû. A bi vî tiherî beg û axalera, şêxa û mella xûna wan belengaza dimêt, dixwar.”²¹¹

Eşmoyê Eso got:

“Wextê me lava ji Egîd begê kir, wekî malê me ji me nestîne. Me kulfetê lape sere ji nava êlê anî, wekî xwe bavê ser dest pîya yan laçika xwe ber veke, bavê ser pîya, çewa qeydê me eşîraye, lê tu lava dîlekî ber Egîd begê ber tişteki nedihate hesabê...

Egîd begê qamçiyê xwe hejand û digot:

Kî neyne ezê çermê piştê wî rakim, tijî xwê bikim.”²¹²

²⁰⁷ *Dimdim*, r. 208.

²⁰⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 21.

²⁰⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 25.

²¹⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 127.

²¹¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 103.

²¹² *Şivanê Kurmanca*, r. 196.

Kal, ji bo veşartina spî bûna porê xwe hine bikar tînin: “Têlê spî ketibûne sûretê wî û temorîya wî. Simêlê xwe û temorîya xwe hine dike, wekî kalbûna wî nexwêne.”²¹³

Mêr, dixwazin nesla wan qut nebe û zuriyet li pey wan bikeve: “Gunê min stuyê bavê te be, tu Mihemedê min mezin bikî, bizewicînî bira ez bê zuret nemirim.”²¹⁴

Bi edetê eşîra, jinên Kurd, navê mêrê xwe di nav gel de nabêjin. Ev şerm tê dîtin. Li vir jî navê wî nabêje: “Bêje Mistefa begê, mal xirav mirîye.”²¹⁵

Di rûpelên romanên Şemo de taybetmendiya civaka Kurd a bavkanî (ataerkîl, paderşahî) xuya dike:

“Cîyê mêr lê hene, heqê jina tune bêne wê derê. Hukumetê deng nedaye wana, eva jî ne civata gund e, tu bêyî xeberdî, here şuxule te ew e, wekî tu tepka bikutî, çêleka bidoşî, tendûrê dadî, çi te gilîyê dîwanê ketîye?”²¹⁶

“Loma dibêjin jine bêaqil in, tu nizanî Lenîn bo na me çi şerekî mezin dike.”²¹⁷

Di nava gel de stran gotina jinan şerm tê dîtin:

“Ji Şûretê xwestin ku ew stranekê bêje.

Şûretê got:

“Ez çawa bistrêm, ne şerm e?”

Jineke hebekî sere got:

“Çima şerm e, ne em tenê li vir in!”²¹⁸

Li gorî adetan, di dawetan de, ger jin biçe destê mêrê xwe pêwîst e biçe destê wî ye çepê. Ji ber ku govend ber bi aliyê rastê ve dimeşe û aliyê rastê aliyê pêşiyê ye. bi awayî jin, ger biçe destê mêrê xwe jî naçe pêşiya wî:

²¹³ *Jiyana Bextewar*, r. 50.

²¹⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 84.

²¹⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 85.

²¹⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 117.

²¹⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 154.

²¹⁸ *Hopo*, r. 130.

“Cemîle hat kete destê mêrê xwe. Çawa ku edetê Kurdan bû, wa ye hat kete destê çepê.”²¹⁹ Dema mirovek, agahiyeke erênî bîne, adet e mirov diyariyekê bide wî/wê:

“Posteçî Ahmed hate mal silav da wana û got:

“Apê Emerîk, eva nama Sehîd, te ra şandîye. Meta Rihan ka mizgînîya min!

Rihanê gote posteçî:

Ahmed, mizgînîya te ser çavê min be, ezê mizgînîya te cote gore bidim, de rûnê taştê bixwe.”²²⁰

Di perwerde kirin û hînkirina adetan de guh kişandin rêyeke cezayê ye: “Cewo digote min: “Tê bîra te, çewa li çolê ber dêwêr û malda min guhê te dikişand, tu hînî marîfetê dikir.”²²¹

Zarok, di ber çavên dê û bavan, ger ew bîn sî- çil salî jî, her tim zarok in û dê û bav naxwazin û ew ji wan dûr bibin:

“Dîya min û bavê min şikîyatê xwe ber xûşka mine Gogê kirin:

Eme idî kalin, xebat me nabe, çavê me Xwedêye, pey Xwedêra vî tayê tenêye, ew jî me dihêle, diçe Ûrisêtê.

Goga xûşka min, qîzeke zafe aqile, ewê caba dê û bavê min da, got:

Idî mêre, tu wê ber tendûrê cem we rûnî. Bira sax be, bira dûr be, we xêre, kûre- kûra we ye.”²²²

Di adetên Kurdan de gava qîzek yan jî jinek zilamekî biyanî bibîne pêwîst e ew rûyê xwe ji wî babide. Bo nimûne: “Gava ku Dîlber ji nişkê ve çav bi Qurşût ket, wê, bi edetên kal û bavan, berê xwe guhest, piştî xwe da wî.”²²³ “Wextê nêzikî derê odê bûn, bûka Emerîkê çûk, Xezal ji odê derket, bûkê hevekî ji şerma xwe şaş kir, sekinî, paşê destê xwe da ber rûyê xwe derbaz bû çû mal.”²²⁴

²¹⁹ *Hopo*, r. 152.

²²⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 241.

²²¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 65.

²²² *Şivanê Kurmanca*, r. 156.

²²³ *Dimdim*, r. 29.

²²⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 23.

Di civatên Kurdan da mirovên rîspî her tim li serê dîwanê rûdinin. Ên din jî li binê dîwanê rûdinin û ji bo xizmetê amade ne. Lê mirovên nefîs biçûk, çiqas kal bin jî, gava ku hatin dîwanê û dîwan tijeh dîtin, ji ber ku naxwazin tu kesî aciz bikin, li cihekî vala rûdinin û li hemberî israran ber xwe didin û rûnanin serê dîwanê. Şemo ev yek wiha vegotiye:

“Qadî Beg di nava cimaetê de, li bintara gişan rûniştibû, ji ber ku dereng hat û ne mirovekî qure bû erhede here li jorê rûnê. Rûspiyan kir nekir, Qadî Beg ji binpiya dîwanxaneyê ranebû û neçû jorê.”²²⁵

Sehîd çawa cahilekî eşîra û hurmet, qedrê merîyê ji xwe mezintir digirt û nedihîşt, wekî kalê li îstasyona peya be, here çayê bîne, yan jî xwarina mayîn bikire. Ew diçû zûzûka danî.”²²⁶

Her wiha, zarok jî, çend salî bin ferq nake, gelek hurmetê didin dê û bavê xwe: “Kurê wî hevtê- heystê salî bûn, lê hê ber bavê va cigara nedikişandin.”²²⁷

Di romanên de behsa kesên ji yekê zêdetir jinan re zewicî ne tê kirin:

“Bavê Qurşût hê di saxiya xwe de ew zewicandibû, paşê Qurşût di sa cend caran zewicibû, sê jinên wî hebûn. Dilê wî ketibû Dîlbera çav û birû belek, ew çend car bûn mirov dişandine mala Mexsûd, wekî Dîlberê ji xwe re nîşan bike.”²²⁸

“Du jinê Siloyê Horê hebûn. Bêze û Werdek.”²²⁹ Di civakê de bira û bav weke parastvanê qîzan tê dîtin: “Nebî ji te tirê, wekî tu bazarbaşî yî, tu dikarî qîzan jî bi zorê biwî? Tu dizanî çar birayên min hene, ewê te mîna rûviyan post bikin! Pak bide aqilê xwe!”²³⁰ Di rûpelên romanên de behsa xebat û adetên şev û rojê jî tê kirin:

“Kî dihat li dîwanxaneya Xano rûdinişt, kêf fikir. Qehwe, xwarin, fincanên şerbetê, pilaw, qeliya sêlê, kivav û fêkî tijî li ser text bû. Li sazê dixistin, dengbêjan û aşiqan kilamên mêranyê û rojên çûyî digotin, hinekan beytên Feqiyê Teyran digotin, hinekan jî, ji Ehmedê Xanî, ji Mem û Zînê digotin.”²³¹

²²⁵ *Dimdim*, r. 111.

²²⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 204.

²²⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 49.

²²⁸ *Dimdim*, r. 28.

²²⁹ *Şivanê Kurmanca*, 94.

²³⁰ *Dimdim*, r. 29.

²³¹ *Dimdim*, r. 43.

“Cewoyê kal, hevalê bavê min bû. Orta wî û bavê min zaf xweş bû. Şevêd zivistanê dirêj dihate mala me, ber tendûrê rûdinişt, ji emrê xwe, dîtina xwe mera gilî dikir. Carna jî mera çîrok digotin.”²³²

Di romana Dimdim de, biryar û nûçeyên girîng ji bo gel bi riya telalan tê îlan kirin:

“Xano got:

“Dewrêşan qir bikin! Lê vî cahilî bihêlin, dest nedin wî.

Hema wê rojê, li Kela Dimdimê û li gundên nêzik telalan çûn kirin gazî:

“Ha werin, ha werin! Sibehê zû werin meydanê, hûnê bibînin casûsên Şahê Îranê wê di sêpêyan de dardabikin, ha werin!”²³³

Di Dimdimê de civaka Kurd ji eşîran pêk tê. Ev eşîr, weke konfederasyonekê bi Xanoyê Çengzêrîn ve girêdayîne:

“Qasidên Xano bi nava eşîra giran ketin, gazî mezinên çil û çar qebîleyan kirin. Mezinên wan qebîleyan bi sileh, tundurist û bi xulamên xwe li Kela Dimdimê civiyan. Xano li meclîsê nihêrî, got:

“Ji we tirê min gazî we kiriye ji bo şuxulêd eşîrê?

Na maqûl, me jî bihîstiyê, wekî Şah Ebas dîsa eskerekî giran dişîne ser me şêr.”²³⁴

Şemo, bi hostayî civak şopandiye û encam û analîzên ku ghiştiyê, bi riyên balkêş radigihîne xwendevanan:

“Tarî ji zûde ketibû erdê. Ezman sayî bû. Xano di nava heşîniyê û kulîlkan de hebekî veleziya, wî destên xwe dan ber serê xwe û li hewayê dinihêrî. Ezman tijî stêrk bûn. Ew stêrk hinek cot cotî bûn, hinek kom komî bûn û hinek jî tenê bûn. Te digot qey keçên Kurdan in, li pey govenda bindarûkê belav bûne: Ewên cot cot, ew heval in, ji xwe re cuda bûne û sirra xwe ji hev re vedikin û dibêjin. Ewên ku kom kom bûne, ew navnûçikan li hinekan dikin û xeybên hinekan dikin. Lê ewên tek tek, ew jî mîna wan keçan, ên ku dê û bavên wan ew bêyî

²³² *Şivanê Kurmanca*, r. 65.

²³³ *Dimdim*, r. 68.

²³⁴ *Dimdim*, r. 195.

dilê wan nîşan kirine ji bo ku qelenê pirr ji kalê heftê salî bistînin, Lewma ew cuda milûk bûne û di halê xwe de ponijîne, êdî tu giliyên wan tunene ji hevalan re bibêjin.”²³⁵

Hinek malbatên Kurda, wekî malbatên fireh tê teswîr kirin ku bav, dê, kalik, dapîr, kur, bûk û nevî di heman malê de dijîn:

“Li gundê Dêrikê da mala Emerîkê dima. Du birê Emerîkê hebûn. Hersê bira zewicî bûn, her bira du- sê kurê wan hebûn, wana ew kur jî di malê da zewicandibûn. Mezinê malê Emerîk bû. Ji mala Emerîkê derdiket neh- deh mêre xebatçî, xên ji bişkûrî (zarok) û jinan.”²³⁶

2. 1. 2. Keç Revandin

Ji demên kevin û pê de, di çanda Kurdan de, keç revandin ciyeke girîng digire. Mela Mehmûdê Bazîdî (1797- 1867) jî balê dikişîne li ser vê taybetmendiya civaka Kurd û wiha dibêje: “Keç revandin, di nav ekradan de ‘eyb nîne.”²³⁷

Di civaka Kurd de keç revandin bi du cureyan pêk tê :

Yan keç û xort ji hev hez dikin lê malbata wan destûr nade wan ku bizewicin, ew jî weke rêya dawiyê direvin. Yan jî xortek ji keçekê hez dike lê qîz ji wî hez nake. Ew xort, wê keçê direvîne. Piraniya keç revandinan weke cureya yekemîn pêk tê û qîz bi dilê xwe diçe. Bazîdî jî balê dikişîne li ser vê nuqtayê:

“...Lakîn bi riza. Bê riza keçê nabî. Wekû keç û kurî hevdu hebandin û bav, da (dê û bav) nedane wî kurî, îcarê kur ewê keçê direvîne.”²³⁸

Keç revandin, di navbera du malbatan de gelek caran bûye sedema aloziyan. Ew malbata ku keça wan hatiye revandin, çi bi dilê xwe revîbe, çi bi darêzorê hatibe revandin, xwe mexdûr dibîne û bi hêrs e. Her wiha di nav cîran û mirovên xwe de jî sernizm bûye. Ji bo ji holê rakirina vê mexdûriyeta wan, hinek rêbazên çareseriyê hatine pêşxistin. Bo nimûne, ew malbata ku xortê wan keç revandiye, keçeka xwe bi xortekê malbata keçikê re dizewicine û bi wî awayî malbat li hev tên. Yan jî ew

²³⁵ *Dimdim*, r. 217.

²³⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 12.

²³⁷ Mela Mehmûdê Bazîdî: *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, Amd. Jan Dost, Weşanên Nûbihar, Îstanbul, 2010, r. 53.

²³⁸ Bazîdî, h. b., r. 53.

malbat, bi armanca qelen hînek pere dide mala bavê keçikê û bi vî awayî li hev hatin pêk tê.

Xortê ku keçek revand, wê dibe bajar yan jî gundeke dûr û xwe dispêre malbatekê. Ev malbat wan vedişêre û li wan xwedî derdikeve. Qet wan radestî malbata qîzê û hwd. nake. Şer jî bikin, kuştin jî bibe, wiha ye. Kurd, kesên ku xwe spartine wan radestî tu kesî nakin. Dû re mehra wan tê kirin û ew tên zewicandin. Ger malbat li hev bîn, bûk û zava vedigerin warê xwe lê ger li hev hatin pêkneyê, wê demê bûk û zava neçar dimînin bi salan yan jî heya dawiya emrê xwe dûrî warê xwe bimînin. Bazîdî jî li ser vê mijarê disekine û wiha dibêje:

“...Kur ewê keçê direvîne, dibine mala axayekî û yanê şêxekî . Û xweyêd keçê bi pey dikevin. Eger li rê rast hatî, keçê û kurî herduyan dikujin. Eger rast nehatî, selamet çûn, êdî xweyê keçê qadirê tişteki nabî. Îcarê ew axa û şêx, ko keç û kur çûyîne malê, dikevîne mabeynê. Eger malê wî kurî jî tunebe jî kîsê xwe û yane ji cîranan mîqdarekî malî û dirav berhev dikin diçine mala xweyê keçê û rica dikin. Elbette sulha wan dikin. Û ewê keçê li wî kurî mar dikin û dijminî radibe.”²³⁹

Şemo jî, di romanên xwe *Dimdim* û *Hopo* de behsa keç revandinê kiriye:

“Ji Zadîneyê re digotin, “Xanim”, ji ber ku ew bi rastî jî keça began bû. Hê bi keçî dilê wê û nêçîrvanê navdar î mîrxas, Posto, ketibû hev du, lê dê û bavê wê nedixwestin keça xwe bidin xortekî beytû yê nêçîrvan ê ku zivistanê post li xwe dikir. Posto Zadîne Xanima çav û birû belek, havîne revand, bire zozanan. Dê û bavê wê pê hisiyar, wekî wî nêçîrvanî keça wan revand. Şekir Begê bavê Zadîne Xanimê bîst xulam siwar kirin, li pey Posto şandin û gote wan: “Hûn wî kûçikî bikujin, porê keça min jî jê bikin û bînin cem min!”²⁴⁰

“Jiyana wê, hate ber çavên wê. Kete bîra wê, çawa dilê wê û Sadiq kete hev du; li ser hev du bengî bibûn. Lê dê û bavê wê nedixwestin wê bidine Sadiq. Dixwestin wê bidine mirovekî ji wê mezintir û ji Sadiq dewlemendtir, ji bo ku qeleneke pîrr bistînin. Lê wê soz da Sadiq û pê re reviya. Çûn Axirkelekê, li wê derê, li gundekî Ermeniyar çend salan xebitîn. Dema ku bi têra xwe pere ketin destên wan, hatin gund, bi edetên wan, dê û bavê wê êdî mecbûr bû li hev bihatana. Lê ew pereyê ku çend sal bûn qezenç kiribûn, tev dane qelen. Rût û tût man. Lê xema wan nebû, bi mirazê xwe şa bûbûn.”²⁴¹

²³⁹ Bazîdî, h. b., r. 53.

²⁴⁰ Erebe Şemo, *Dimdim*, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2007, r. 234.

²⁴¹ Erebe Şemo, *Hopo*, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2007, r. 118.

2. 1. 3. Keç Xwestin

Civaka Kurd, girîngiyê dide zewac û malbatbûnê. Di adetên Kurdan de rituelên di vê mijarê de zehf in. Yek ji van jî jin xwestin e. Keç xwestin destpêka avakirina malbatekê ye. Bi gotina pêşiyar destpêka daxwazkirina lêzîmîyê (mervatî, eqrebatî) ye. Ji ber vê yekê ye ku gava diçin qîza yekê dixwazin, dibêjin: “Em dixwazin bibin lêzîmîyê we.” Di vê adetê de jî, weke hemû adetan hinek qalib û biwêj pêşketine. Şemo jî dema qala jin xwestinê dike van biwêjan bikartîne:

“De wekî ji wê derê heta vira hûn hatine bona wê yekê, qîzeke min qurbana lingê Evdila begê kir. Wextê Resûl axa ev gilî gotin, teva gote Resûl axa:

Makûl rûyê te spî be, malî ava, Xwedê bimbarek- pîroz ke”²⁴²

Gelek eşîr, gund û malbat, dixwazin keçên wan bi kesên biyanî re nezewicin. Ev yek, ji bo wan weke kemahiyekê, wendahiyekê tê dîtin, bo nimûne:

“Sertîb tu caran giliyên nepak negotibû Xezalê, lê îro got:

Ev tev şuxulên tene. Emê lê binihêrin çawa keçikê ji gundê me bivin.”²⁴³

Di ber jin xwestinê re, ew kesê ku daxwaza lêzîmîyê dike, ger li malbatê biste (samîmî) be û bi xwe bawer be, îsrar dike ku bersiva erênî ji dê û bavê qîzê bistîne:

“Sertîp got: Apê Xudo keremke nan bixwe!

Na, wekî te gofiye gereke qeyde û edetê eşîra da, heta tu soz nedî min, wekî tuyê Cemîlê bidî nebîçirkê min, ez nanê te naxum.”²⁴⁴

Di xebata keç xwestinê de, di serî de her du malbat gelek bi xef tevdigerin. Heya ku ji destê wan tê naxwazin tu kes li wan bihese ku ew xebateke wisa dîkin. Her du malbat jî bi sedemên cuda vê yekê dimeşînin. Malbata lawik, naxwaze tu kes pê bihese ku ew diçin qîza filan kesî ji bo kurê xwe dixwazin. Ew dibêjin ku ger xelk pê bihese, dibe ku hinek kesên din ên dixwazin vê qîzê ji bo kurê xwe bixwazin jî biçin xwestinê, yan jî mirovên wan li hemberî vê yekê bîn. Yan jî hinek kesên xêrnexwas

²⁴² Erebeh Şemo, *Jiyana Bextewar*, ç. 2., Weşanên Deng, İstanbul, 1994, r. 56.

²⁴³ *Hopo*, r. 215.

²⁴⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 171.

biçin cem mala qîzê û bêbextiyan li malbata wan bikin ku ev kar pêk neyê. Her wiha dibêjin ger malbata qîzê ji me qelenekî pir mezin bixwaze û em nekarin vî qelenî bidin û dev ji vî karî berdin, wê demê em ê bimînin di rewşeke zor de. Malbata qîzê jî naxwaze ev amadekarî bê bihîstin, ji ber ku ger pirsgerêkeke derbikeve û pêvajoyê zewacê encam nebe, wê demê hinek kesê bibêjin: Gelo çima vana dev ji vî keçê berdan? Ji ber van sedaman, her du malbat jî naxwazin di serî de tu kes ji vî xebata wan agahdar bibe. Lê dema ku soz hate birîn û gustîl li tiliya qîzê hate xistin, rewş diguhere. Her du malbat jî dixwazin her kes vî yekê bibihîse û her kes bibe şahidê vî zewacê. Ewqas ku, qelenê bê şahid tê dayîn, weke nedayî dikare bê qebûl kirin û nîşana hatî kirin jî nehatî bê dîtin. “Kengê te qelen daye min? Kanê şahidê te? Kengê xwezgîniyê te hatne qîza min, nîşan kirine û qelen jî kifş kirine?”²⁴⁵ “Em çawa bikin, wekî ev nîşan kirin bi qayde bibe? Lazim e wekî merivekî din jî li vir hebe, wekî nîşan kirina me bibe bi edet û qaîde.”²⁴⁶ “Min dixwest, çawa edet e, merivê sisiyan jî wexta nîşankirinê hebe û gustîla nîşaniyê têkine tiliya wê.”²⁴⁷ Mîna me li jor destnîşan kirî, têxistina gustîlê bi armanca nîşanê weke destpêk û misogerkirina zewacê tê dîtin: “Zelêxê got: Ez çi bibêjim? Rastiyê bibêjim? Ez hatime te ji Hesenê xwe re nîşan bikim, gustîla nîşaniyê têkime tiliya te, mîna edetên me Kurmancan.”²⁴⁸ Piştî nîşan kirinê jî, şerbetek tê vexwarin, da ku ev destpêk bibe wesîleya rojên şirîn: “Mezin dibêjin, berê wexta nîşankirinê, bi kasa şerbetê vedixwarin. Xezalcan, ez jî vî şêrînahiyê hildidim, belkî²⁴⁹ şêrînahiya wiha timî li mala we be û li mala xêrxazan be!”²⁵⁰

2. 1. 4. Berdêl

Berdêl cureyeke zewicandinê ye. Sedema derketina wê, qelenê pir e. Ew ciwanê ku derfetê wî tune qelenekî giran bide, xwişka xwe bi birayê qîza ku dixwaze pê re bi zewice re dide zewicandin û bi vî awayî her du malbat, ji dayîna qelenê rizgar dibin. Bazîdî qelenê wiha rave dike:

²⁴⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 130.

²⁴⁶ *Hopo*, r. 207.

²⁴⁷ *Hopo*, r. 209.

²⁴⁸ *Hopo*, r. 206.

²⁴⁹ Şemo, di romanên xwe de peyva belkî di wateya îşîle de bikartîne.

²⁵⁰ *Hopo*, r. 210.

“Û di nêv ekradan berdêlî jî dikin. Mesela: Yek xweha xwe dide yekî û xweh wî ji boy xwe distîne, û yaxo keça xwe dide yekî û keça wî ji boy xwe distîne. Yanî mubadele dikin. Herkesek ji wan mesrefa daweta xwe dibîne.”²⁵¹

Şemo jî, di Jiyana Bextewar de ev rastiya civakê nivîsî ye. Her wiha sedema vê yekê jî di rêzikan de destnîşan kiriye:

“Sinco xortekî êtîm bû, pîredîya wî ew mezin kiribû, dest teng bû, ewî xwişka xwe kiribû berdêlî. Gerekê xwişka xwe bida Heboyê Ûsib, xwişka wî jî xwe ra banîya. Çimku herdu kesîb bûn, malê wan tune bû, wekî qelen bidana, jin xwe ra banîna. Mirina Xudêda daweta wan herdu xorta ew du sal bûn paşda xistibû. Rokê herdu xorta bi qaydê edetê eşîra, berxek hildan, çûne mala Sibhanê, dilê wan kirin, îzin xwestin. Sibhanê îzna wan da wekî ew herin deweta xwe bikin. Herda soz da hevdu, wekî roja îne sîyarê Sinco bên dergistîya wî bivin. Sîyarê Hebo jî bên dergistîya wî bivin. Usa jî kirin. Roja îne mala herdu xorta da ringînîya def û zurnê bû.”²⁵²

“Gele cahilêd kesîb havijîya²⁵³ xwe wê lêhatina Sinco û Hebo danîn, digotin: Wele bextê mêrika birî xwişkê wan hebûn, bê qelen zewicîn. Lê xwişkê hineka ji me tune, emê kengê haqas pez destxin, wekî qelen bidin û bizewicin?”²⁵⁴

2. 1. 5. Niqirkirin

Niqirkirin, nîşankirina du zarokên berşîr e ku dê û bavên wan dibêjin: Em soz didin, dema keça me/ kurê me mezin bûn û hatin ber zewacê emê wan bizewicînin. Bi vî rengî, dê û bavê wan zarokên di dergûşê de wan nîşanî dikin. Mela Mehmûdê Bayezîdî jî ji berhema xwe ya hêja ya bi navê “*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*” de cî dide adeta niqirkirinê û wiha dinivîse:

“Wekû ji boy mirovekî keçek welidî û ji boy mirovekî jî kurek welidî, heman di roja wiladetê da ewê keçê didine wî kurî. Heta ew kur û keç balix dibin, êdî men’î²⁵⁵ û poşmanî nabit. Îcarê daweta wan herdukan dikin.”²⁵⁶

Di Jiyana Bextewar de mînakeke niqirkirinê heye û wiha ye:

²⁵¹ Bazîdî, h. b., r. 41.

²⁵² *Jiyana Bextewar*, r. 79.

²⁵³ Xwezî pê anîn

²⁵⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 80.

²⁵⁵ Asteng kirin.

²⁵⁶ Bazîdî, h. b., r. 41.

“Destpê kirin, nan xwarin, paşê jî şerbet vexwarin, bona pizmamtiya wan şîrnayî derbazbe. Wextê nan xwarin kuta kirin, dê bistan²⁵⁷ ji devê qîza xwe derxist anî cem Xudo. Ewî temezîke²⁵⁸ hevirmişê Îranê ji paşla xwe derxist, bi destê xwe serê Cemîla yek salî wa girêda, paçkir û got: Bûka min, de bira emrê te û Cimoyê min hevra bigihîje, mîna kulîlka ber çavkanîya, ew kulîlkê ku heta berf jî dikeve ew naçilmisin, bira hûn herdu jî usa bin.”²⁵⁹

2. 1. 6. Qelen

Qelen, ew mal yan jî pere ye ku di ber nîşanî kirinê de, malbata qîzê ji malbata lawik daxwaz dike. Di Jiyana Bextewar û Şivanê Kurmanca de ev mijar tê gotin: “Tu jî qelenê qîza xwe bêje, kivş ke, çika em jî bizanbin. Qelenê qîza min sed pêncî mîyê bijarexas, du ga, hespeke zînkirî, tivingek, sê xelat.”²⁶⁰ Qelen dayîn, li gel wan pêwîstiyên din, weke îşareteke nîşanîkirinê jî tê dîtin: “Kengê te qelen daye min? Kanê şahidê te? Kengê xwezgînîyê te hatne qîza min, nîşan kirine û qelen jî kifş kirine?”²⁶¹ Bazîdî jî balê dikişîne li ser vê yekê: “ Weqtê îbtida²⁶² Keçekî ko dixwezîn, wekû dan, hespekî bi taxim herêkirin²⁶³ distînin. Paşê şêrînî vedixwin û paşê nîşan dikin û qelenêd wan dibe.”²⁶⁴

Her çiqas qelen, di civakê de ciyê xwe girtibe jî, li hemberî vê adetê, bi taybetî ji aliyê ciwanan ve, bertek tîn nîşan dan û rexne tîn nîşan kirin. Ciwan, vê yekê qebûl nakin û qelenî weke hinceteke pere standinê dibînin

“Lao, qelen şerîfetêda maye, hetta pêxembera jî qelen da ye, çewa ez bê qelen bidme mêr?

Karê digot:

Na bavo, qelen dê û bavan derxistîye bona kara xwe, me notila pêz xwera difroşin.”²⁶⁵

Her wiha qelen, dibe sedemê zewicandina keçên çardeh salî bi kalên heftêh salî re jî:

“Letîfê kal, gelekî gerya bû û gelek jî dinyayê da dîtibû, digot:

²⁵⁷ Mijmijok.

²⁵⁸ Tulbent.

²⁵⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 172.

²⁶⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 59.

²⁶¹ *Şivanê Kurmanca*, 130.

²⁶² Di destpêkê de.

²⁶³ Erêkirin, pejirandin.

²⁶⁴ Bazîdî, h. b., r. 67.

²⁶⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 126.

Heyran, derheqa qelen de ne Quranê da heye, ne jî qewla da. Qelen bega, mela û şêxa derxistîye bona kara xwe. Çima hûn navînin: ew merî heye du- sê jinê wan heye. Hena kalê xurifî qîzê çardeh salî distînin, çimku ewe dewletî ne, dewleta wan heye, didin qîza xwe ra distînin. Lê yê me tune, em nikarin bidin, bê zewac dimînin.”²⁶⁶

2. 1. 7. Dawet

Dawet, şahiya zewacê ye. Dema jin û mêrek dizewice merivên wan, nas û dostên wan beşdarî vê şahiyê dibin. Dawet, piştî xwestin û nîşanîkirinê pêk tê. Di vî warî de jî, adetên di hezar salan de hatî hûnandin hene. Civak, vê xebatê jî li gorî çanda xwe û kevneşopiyên xwe pêk tîne:

“Qeyde û edetê wê eşîrê wa bû: Kê dewet bikira, wextê bavê bûkê, cab (cewab, bersiv) bida wana wekî îro sîyarê bûkê wê bîn. Wî merî ra dibên rûvî. Ew mêrî gerekê usa here, wekî kesek wî nebîne, têkeve mala bavê bûkê, lê wekî “rûvî” ber dêrî bivînin, derva bivînin, avê serda bikin, sebetê dikine sêrî, davêne nava herîyê, yanê cêr dikine piştê meriya didine ser, çawa qerawil (nobedar) dişînin ji kanîyê cêre av bînin. Lema wî mêrî ra dibên rûvî. Ew mêrî gerekê usa derk û fesal here, wekî kesek wî derva nebîne, lê hema ku rûvî lingê xwe avîte pişt şemikê, idî heqê kesekê tune jê xeberde, cahil û jin top dibin, laqirdîya dikin, pêşkêşa wî didinê da.”²⁶⁷

Şeva pêşîya bûk birinê hevalên bûkê, cîran û lêzimên mala bûkê tîne wê malê:

“Odeya Zînê ji êvar da tijî qîz û bûk bûn. Hinek ji wan nivê şevê çûn malên xwe. Hinek qîz jî, wê şevê ji cem Zînê neçûn. Ew man, ku kincên wê yên dawetê sibehê lê bikin, paşê dereng nekevin, ji ber ku wê sibehê zû bîn pey wê!”²⁶⁸

“Bêmal got: Em li vir bona du mirazan top bûne, bona du dilên ku ji hev du hezkirine, ên ku ji îro bi şûn de bextêd xwe bi hev re girêdidin, bi sidqê xwe yê cahîl î sax. Belkî hûn pak û hezkirî bijîn û bi hev re hezkirî ‘emrê xwe derbas bikin û bibin xweyê ewlêd. Belkî ew jî bibîn wê hezkirina we, ji we hezbikin û xelkê der û cînar we bibîn û ji we nexşê jiyane pak hildin û hîn bibin..!”²⁶⁹

²⁶⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 80.

²⁶⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 64.

²⁶⁸ *Hopo*, r. 255.

²⁶⁹ *Hopo*, r. 258.

“Mêvanan ku li vir kêf dikirin, dixwarin û vedixwarin, lê li ber dêrî, ringîniya def û zurnê bû. Govend digeriya, xort û ciwanan dilîst. Cemîlê çû Zînê anî, kire orta xwe û Cimo, reqîsîn.”²⁷⁰

Li gorî adetan pêwîst e ew kesên hatine bûkê bibin, qedrê wan bê girtin, loma jî tê xwestin pêşîn di maşînê de ew rûnin: “Mêvano, bila berê ewilîn berbû rûnên di maşînan de, paşê hûn rûnên, qeydeyê kal û bavan ji bîr mekin!”²⁷¹ Ji bo bûk û zava du’aya serfirazî û bextewariyê tê kirin:

Wê rojê, gundî giş derketibûn derve û bi dilekî bi eşq î hezkirî Zînê verêkirin. Maşînen gişan bi rê ketin. Cimaetê gişî bi hev re got:

“Oxir be ji te re Zînê! Bi bextewarî û bi ‘emrekî rind bijî..!”²⁷²

Gava ku giş otoyên de rûniştin, Bêmal got:

“Bila çûyîn û hatina we bi silametî be, bila şabûneke wiha li ber derê we be!..”

Vexwendiyên hemûyan bi hev re li Bêmal vegerandin:

“Daweta we kirî bila bimbarek î pîroz be, bila bûk û zava jiyîna bextewarî, ‘emrekî rind î delal derbas bikin. Heta ku sax bin, bila zuriyeta wan jî ‘emreke wiha derbas bike!”²⁷³

“Here, belkî tu di ‘emrê xwe de tu xerabiyê nebînî, xweyî zar û kulfet bî.”²⁷⁴

Tu astên dawetê bê lîstin, bê def û zurne derbas nabe: “Maşînen wan, ku bi rê ketin, def û zurneyê destpê kir. Dengê def û zurneyê vê sibehê kete berê çiya û zinaran, te digot qey ew çend def û zurne ne lê dixin.”²⁷⁵

“Bû ringîniya def û zurneyê, otomobîl bi rê ketin. Ew bi têra xwe wext bû Zînê biribûn, lê li gund hê ringîniya def û zurnê bû, xort û ciwanan govend girtibûn, dilîstin. Hopo dîsa ketibû sergovendiyê û destmala xwe dihejand, govend digerand.”²⁷⁶

Gava bûk ji malê derdikeve, pêwîst e hinek alikariya bûkê bikin: “Zînê ji mala wê derxistin. Her du berbû li dora wê bûn. Anîn ber otoyên ku Zînê lê rûnê.”²⁷⁷

²⁷⁰ Hopo, r. 259.

²⁷¹ Hopo, r. 254.

²⁷² Hopo, r. 261.

²⁷³ Hopo, r. 254.

²⁷⁴ Hopo, r. 260.

²⁷⁵ Hopo, r. 254.

²⁷⁶ Hopo, r. 261.

Merivên bûkê, li pey bûkê hêstir dibarînin. Naxwazin qîza wan ji wan dûr bikeve, biçe. Nerazîbûnê nîşan didin. Ewqas ku, carekê zilamekî qîza xwe nîşanî kiribû. Dawet çêbû û qîza wî bû bûk û birin. Lê zilam li mal digiriya, dixwest qîza wî li cem wî bûya. Îcar cîranekî wî heye, navê wî Salihê Têlî ye. Salihê Têlî sê keçên xwe zewicandine. Bavê keçikê yê nû keçika xwe zewicandî qêr dike û dibêje: Salhê Têlî! Salhê Têlî! Tu çawa bi hev ve mayî! tu çawa yek parçe mayî! Tu çawa qet bi qet nebûyî. Her wiha bavê keçikê dijûnan li zavayê xwe dike bê çima qîza wî ji wî standiye. Bi vî awayî, di piraniya zewacan de, xwediyên bûkê digirîn:

“Cemîle, ew jina ku Zîne di mala wê de dima û çend jinên mayîn hêsir barandin, giriyan. Xezalê bi şalika xwe hêsirên çavên xwe paqij kir. Bêmal bi ken got:

“Heyran hela hûn li van jinan binihêrin! Hêsirên wan her gav hazir in. Gelo ew wisa zû hêsirên ji kû tînin?”²⁷⁸

Demên berê de, ne mîna niha bi otomobîlan xêlî dihatin û bûk dibirin. Bi dehan, bi sedan suwarî dihatin û bûk dibirin:

“Kal û pîrên ku li derve sekinîbûn, digotine hevdu:

“Hela lê binihêre! Qe hespek tune! Lê berê? Berê gava ku dibû dawet, gişke siyar bûn, didane cirîdan, diketine mecalê. Hespa kê kihêl e, meriv heyran û hijmekar bû li wê dawetê binihêriya. Ax, kanê ew wext, kanê ew eşq?”²⁷⁹

Bûk jî, li gorî adetan, li mehînekê suwar dikirin. Li mehîne suwar dikirin ji ber ku mehîn mê ye û nîşaneyê zayîne û zayendiyê ye.

2. 1. 8. Pêşiya Bûkê Girtin û Bexşîş Xwestin

Dema xêlîvan ji mala bavê bûkê wê dibin û ber bi mala zava ve birêdikevin, di rê de ji wan bexşîş tê xwestin. Zarok, bi keviran rêyan digirin û pereyan dixwazin. Piranî jî, pereyên xwe distînin û rê vedikin. Li jêr jî adetekî mîna vê hatiye neqilkirin:

²⁷⁷ *Hopo*, r. 260.

²⁷⁸ *Hopo*, r. 260.

²⁷⁹ *Hopo*, r. 254.

“Bi qayde û edetê Kurda, şivan yan gavan yan jî maçgir, gaki yanê berxekê dibê pêşîya bûkê, pêşkêşê dixwazin. Serdewet pêşkêşa wan dida. Golikvanê gundê Evdila begê ku dît bûk tînin, ewî golikeye rind bijart, anî ser rîya bûkê.”²⁸⁰

“Vexwendî giş li ber maşînên xwe sekinîbûn, bi gotina Bêmal re di maşînên xwe de rûniştin, lê Hopo pêşîbirrî li maşîna Zînê girt, got:

“Çawa? Dêmek hûn qîza destebirakê min hema wisa bê welen û bê dermalî biwin? Gelo qe bûye?

Bêmal, çawa serdewetî bû, wê dest kire berîka xwe, hinek pere derxist û da Hopo.”²⁸¹

Di adetan de wateya her tiştêkî heye:

“Bi rê de dengê def û zurneyê qe nehate birrîn, heta ku hatin Darebiyê. Maşîna bûk û def û zurne tê de, rast hat li ber derê Zelêxê sekinî. Zelêxe ji xênî derket pêşîya bûkê, çocika xwarinê di dêst de, bilind kiribû, direqisî. Çawa mezinan digot: “Ew çocikek nîşan dide, ku her du mirazên xwe wê di hebûnê de derbas bikin.”²⁸²

Dema bûkê diînin mala zavayî, zava, bi bira zava û vexwendiyar ve li ser banê xanî, li hêviya bûkê ye. Li vir jî adet û bawerî dikevin dewrê:

“Zava li ser xanî bû, dara zavê bi êmiş xemilandibû û destê birazavê de bû. Çend heval miqatî kolozê zava dibûn wekî kesekî nerevîne. Wextê bûk anîn ber dêrî peya kirin, dîya zavê Zeytûn xanim, çocikek dest da pêşîya bûkê; koçerî, tiringê dilîst, direqisî. Tebaxek anîn danîn ber lingê bûkê, ewê lingê xwe li tebaxê xist, şikênand. Paşê lingê avête piş şemika Evdila begê. Wê gavê ra bû qirçînîya gulla, tiving agir dikirin, êmiş direşandin. Serdewetî û birazavaya perê hûr direşandin. Xelkê êmiş û pere top dikirin. Ew jî bona wê yekê, wekî bûk diçe hundurê malê çav lê nekevin.”²⁸³

Piştî bûk diçe mal de, zava û hevalên wî ji ser ban tîn xwar, merhaleyê nû destpê dike:

²⁸⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 67.

²⁸¹ *Hopo*, r. 261.

²⁸² *Hopo*, r. 262.

²⁸³ *Jiyana Bextewar*, r. 68.

“Malê da bona bûkê çît- perde girêdabûn. Bûk birne pişt perdê dane rûniştandinê. Çawa ku bûk çû hundur, zava jî ji ser xênî peya kirin, heval- hogirê wî dorê, çû ser doşeka xwe rûnişt.”²⁸⁴

“Zava Sadiq begê bû. Rûniştibû li oda çûk, delak serê wî şax-şaxî kur kiribû, çêkiribû mînanî bostana. Heval û hogirê wî dihatin, her yekî pere didan, serê wî didane kur kirinê. Birazavê wî jî dara zavê diniqiland, hazir dikir.”²⁸⁵

Zava, wê rojê gelek bi qedr û qîmet e. Di civatê de cihê herî xweş didin wî û lîstikên mala birazavayî destpê dikin:

“Sadiq begê bi edeta êla Sipka bû “padşa” ser doşekê rûnişt. Birazava kêlekê rûniştibû. Mêrek anîn ji hirîya spî- qerqaş, jêra simêl- rûyê dirêj çêkirin. Ew bû qazî. Mêrek jî anîn, kincê jina lêkirin, kofî dane sêrî, xêlî avîtnê ser çavê wî. Ew jî bû jina Qazî. Ji wan ra digotin “Kose- gelî”. Lê Kose- gelî çi laqirdî bikira, gerekê kesek nexeyidîya. Çar merî kincê eskera li xwe kiribû, ber Sadiq begê sekinîbûn. Çawa me got: Zava ku ser doşekê xwe rûnişt, tê hesabê çewa padşê ser text rûniştî. Qazî jî bi jina xwe va cem bû. Eskerên wî bi şûr- qema ber sekinîbûn, hêvîya hukmê “padşê” bûn.”²⁸⁶

Di hemû dawetan de xwarineke dewlemendî tê dayîn. Hemû vexwendî wê xwarinê dixwin Ev jî îşareta bereket, kêfxweşî û zehfîyê ye:

“Nan (xwarin, xurek) hazir bû. Gazî mêvana kirin. Mêvan odêda cî nedibûn, nanê mêvana hema li bêderê danibûn. Gava ku nan xwarin, kuta kirin, li odê du textê mezin dane rex hevdu, cihêzê bûkê anîn nîşanî cimaetê û serdewetî kirin. Wextê cihêz nihêrîn, dane alîkî, gerekê cihêz bibrana bidana ser erebê, birê bûkê hat, ser cihê rûnişt, dewa pêşkêşa xwe kir. Qelender hat, zêrek da, paşê birê Elîfê ser cihêz rabû, izin da cihêz bibin daynine ser erebê. Herdu berbûya bûk anîne ber dêrî derxin, dîsa pêşîya bûkê sekinîn, nehiştin bûkê ji mal derxin, heta pêşkêşa wan nedan, lê wexta bûk derket, yekî qepî- zep²⁸⁷ milê xwe hildabûn, digot: “Yan bira derkevne gulaşê (gureş, pereçûnkî) yan bira du zêra pêşkêşa min bidin.” Qelender merîkî zef tima bû, nedixwest du zêra bide. Cahila nihêrî lê kesî turiş²⁸⁸ nekir, here gulaş bigre. Qelender xwe xwe çû gulaşê. Qelender berê merîkî pir qewet bû, lê Qelender nizanbû wekî ew idî kalekî heftê heştê salî ye. Gulaşgir û Qelender hevdu birin- anîn mînanî du gamêşa. Gulaşgir ji gundê Resûl axa bû. Navê wî Hutê bû. Ewî du cara Qelender ji cî

²⁸⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 68.

²⁸⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 64.

²⁸⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 61.

²⁸⁷ Gir, mezin.

²⁸⁸ Cesaret.

hejand wekî hilde, bavêje lê Qelender xwe giran digirt, diçirçirand. Paşê hemêz kir û anî li erdê xist. Bû pîrçînîya cemaetê, li Qelender kenîyan. Ji cimaetê deng dihat: Hela binêrin, timayî çawa merîya bênamûs dike. Kê dîtîye, serdewetî xwe xwe rabe gulaşê. Serdewetî gerek dest têke cêva xwe û pere bide, ne ku ji timayê xwe xwe derkeve gulaşê.”²⁸⁹.

Piştî xwarinê govend dest pê dike:

“Wê êvarê heta sibê safî bû, govend bernedan, dilîstin. Li orta gomê dikeke bilind çêkiribûn bona komsêr, Evdila begê û maqûla. Çend merî bi şiveke dest da zarêd nas didane rûniştandinê, wekî nekne qare- qar. Zava ketibû ser govendîyê. Nişkêva ber derê gomê bû ringînîya defa Likoyê Mirtiv, derî vebû, bûka xêlîkirî anîn kirne govendê, xwera- xwera şabaş didan. Wextê liko bûk anî, def- zurne kubarê lêdixist, ker bû. Govend Likoyê mirtiv gerand. Timê digotin, wekî gava Likoyê mirtiv defê dixê, mirîyê gorê jî radibine reqaşê.”²⁹⁰

Bûk û zava jî, gelek caran di daweta xwe de dilîzin:

“Ji nişkê ve dengê defê hat, derî vebû; bûk li pêşiyê bû, li aliyê rastê berbûk bû. Zînê anîn kirin destê zavê û govend geriya. Defçî her car nêzîkî bûkê û zavê dibû, paşê çomaxê defê dibir ser serê bûkê û zavê, bilind dikir û bi dengê zîz digot:

“Şabaş, şabaş, şabaş..”!

Heta ku sibeh safî bû, govend wisa digeriya... Sê roj û sê şevan daweta Zînê û Hesên kirin.”²⁹¹

Şabaş, yek ji adetên dawetan e ku mirov pere dide sazband ji bo xatirê bûk zava yan jî kesek din. Sazband jî vê eşkera dike: “Qasimê Dirbas zêrek ser serê Zeytûn Xanimê ra şabaş da, ay şabaş malî ava, sed car malî ava.”²⁹²

Di gelek zewacan de, bûk û zava pêşiya nîkahê hevdu nabînin. Dê û bavên wan, yan jî ew kesên wan dizewicînin wan dibînin û biryara zewaca wan didin:

“Ew sê roj û sê şev bûn ringînîya def- zurnê bû. Şeva paşîn serdewetî hat, xêlîya bûkê hilda. Xelkê li bûkê û zavê nihêrîn. Zava qe bûk nedîtibû, teze bin çava ra li dergistîya xwe dinhêrî.”²⁹³

²⁸⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 67.

²⁹⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 69.

²⁹¹ *Hopo*, 263.

²⁹² *Jiyana Bextewar*, r. 61.

Piştî xwarin û govendê, di roja dawîn a dawetê de, ew kesên ku vexwendiyên dawetê ne, hinek pere didin mala zavê ku ew mesrefa wan li vê dawetê kiriye hinekî li ser wan sivik bibe. Ji bo vî pereyî di devoka Botanê Sersibehî tê gotin:

“Roja çara nanê dawetê danîn. Kî vexwendî bû, gerekê bihatana nan bixwarana, pere bavîtana ser nanê Evdila Begê. Merîk ber texte rûniştibû, dikire gazî eyan dikir, wekî kê çiqas pere yanê zêr avîte ser nanê Evdila begê.”²⁹⁴

2. 1. 9. Govend

Kurd, gelek ji govendê hez dikin. Bi dehan, bi sedan qaydeyan govend digirin:

“Sertîb gote sazbandan: “Heyrana we me, bi qaydeyê şerani lê xin! Sazband bi qaydeyê şerani²⁹⁵ lê xistin. Govend ku welgeriya serî wê qaydeyê, ji dûr ve te digot qey pêlên behran ên nerm û kaw dimelişin.”²⁹⁶

“Hopo got: “Ez heyrana we me, ca bi qaydeyê sêpê²⁹⁷ lêxin.” Hopo, li ser govendiyê bû. Him dilîst him ji digot: “De hûn bavê min kiribin, lê xin, îro roja lêxistinê ye, roja çok nerm kirinê ye.”²⁹⁸

“Du govend gerîyan, çimku ew mexlûqetê giran govendekê de cî nedibûn.”²⁹⁹ “Ev çend roj bûn Sertîb def û zurne girtibûn, her êvar keç û xort dihatin klûbê an jî mala ku Zînê tê de dima, dicivyan, ji xwe re bi eşq derbas dikirin. Ji ber ku hê gihadirûnê dest pê nekiribû.”³⁰⁰

“Roj êdî ji nîvro dageriya bû. Li ber vê tava biharê ya xweş, keç û xortan govend girtibûn, li ber dengê tulumê koçerî³⁰¹ dilîstin.

Dema ku çend fetlên koçeriyê lê xistin û westiyan, Hopoyê kal destmala xwe derxist, kete ser govendiyê û gote sazbandan:

²⁹³ *Jiyana Bextewar*, r. 69.

²⁹⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 70.

²⁹⁵ Di vê lîstikê de lîstikvan, destê hevdu digrin û milên wan jî digihîjin hevdu. Lîstikvan, li gorî meqamê, xwe yan bi pêş de yan jî bi paşde ditewînin.

²⁹⁶ *Hopo*, r. 153.

²⁹⁷ Di vê lîstikê de lîstikvan di her carê de piyê xwe yê rastê sê caran li erdê dixê.

²⁹⁸ *Hopo*, r. 153.

²⁹⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 61.

³⁰⁰ *Hopo*, r. 253. Di gundan de dema gihadirûnê de herkes dixebite. Loma jî pêşiya serdema gihadirûnê şahî û lîstik tên kirin.

³⁰¹ Di vê lîstikê de lîstikvan, destên xwe datînin ser milên hevdu.

“Ca ez heyrana we me, bi qaydeyê Gulê Narîne³⁰² lê xin! Hopo, ku govend gerand, te digot qey xortekî çardeh salî ye. Wî lingên xwe bi kaw avêtin, te digot qey di ser cemedê re dişemite.”³⁰³

“Wê rojê, ji êvar de dengê def û zurneyê qet nehate birrîn, heta ku sibeh safî bû. Curecure qaydeyên lîstikê lê dixistin: Her bi qaydeyê Gulê Nêriyê, Şêraniyê, her bi qaydeyê Sêpê, Koçerî; carînan bi qaydeyê Ermeniyên û bi yê mayîn direqîsîn.”³⁰⁴

Govend, piranî, di dawetan de tê gerandin, lê bi sedemên cûr be cûr jî govend tê gerandin:

“Wexta ku telîma eskerî kuta dibû, xort timî diketine cirîdê, kilam distran û bi kêf dihatine bajêr. Îro jî, Hemze Çawîş gote wan:

“Xortêd siwar wê têkevîne cirîdê, lê zîlamêd peya wê govendê bigirin, bireqîsin.”³⁰⁵

“Destê def- zurnê derketibûn rasta binya mala, qayde cirîdê lêdixist. Malxwê mala, mêvan û hine mêrê meraq ku derketibûne binya mala, temaşa cirîdê dikirin.”³⁰⁶

Sazbendên Kurdan di lêxistinê de gelek hoste bûne û dikarin kesên ne dildar jî bînin govendê: “Weleh Miraz li zurnê dixê, miriyên di goran de jî direqîsin, wisa baş lê dixê.”³⁰⁷

“Dengê zurna wî usa zîz dihat, usa nerm dikişand, te digot dilhinavê merîya tîne xwarê. Du cîya def- zurne lêdiket heta nîvro dagerîya: Ji şayê, eşq û dengê def- zurnê bibû “heşer-meşer”. Calihêd dilketî ketibûne destê hev, bin çavara domamê xwe dinihêrîn.”³⁰⁸

Hinek caran, govend bê saz û def û zurne tê girêdan. Ew kesên dilîzin dibin du beş. Beşek jî wan du rêzikan jî kilama govendê dibêjn, beşa din jî li wan werdigerînin:

“Govend gerandin, dilîstin, xort û qîza kilamêd hevra digotin, yê mayîn jî lê vedgerandin.”³⁰⁹

³⁰² Ev cure lîstik bi terzê giran tê lîstin. Di ber lîstinê re stran jî tê gotin.

³⁰³ *Hopo*, r. 188.

³⁰⁴ *Hopo*, r. 262.

³⁰⁵ *Dimdim*, r. 53.

³⁰⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 61.

³⁰⁷ *Dimdim*, r. 181.

³⁰⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 61.

³⁰⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 70.

“Dengê tuluma Sûto nişkêva hate birînê, lê du xorta hevra destpê kirin, du qîza lê vedgerand:

“Çi bejneke li ser xaniya, bejnê lê, bejna kê...

Çi qazeke li ser xaniya, bejnê lê, bejna kê...

Ez vê bejnê lê mame tima, bejnê lê, bejna kê...”³¹⁰

“Gulê nêrîmê, ha nêrîmê, Gulê nêrîmê, ha nêrîmê,

Gulê nêriya xingexing e, canê nêriya xingexing e.”³¹¹

2. 1. 10. Alavên Xemla Jinan

Erebê Şemo, di romanên xwe yên dimdim û Jiyana Bextewar de behsa alavên xemla jinan kiriye:

“Li bajêr, curecure dukan hebûn. Di dukanên etaran de, hebûn mor,³¹² bişkrok,³¹³ derzî, têt, qeytanên³¹⁴ rengrengî, qotik,³¹⁵ destmalên ser destan, temezî,³¹⁶ bercênîk,³¹⁷ torên³¹⁸ stuyên jin û keçan û gelek tiştên mayîn.”³¹⁹

“Di lingên wê de, xirxal³²⁰ bûn, lê ew xirxal ne mîna hemû xirxalên lingan bûn. Ew mîna bazinên zendan pehn û bi ber bûn. Ji zîvê xas bûn, çend qaşên sor î kaw di xirxalan de bûn. Qolekî zêran li ber eniyê bû, qotikeke reş î dirêj di ber sûretê rastê re daliqiyabû, serê qotikê ji çeneyê hebekî derbas bûbû. Finoyê wê giş diravkirî bû. Qurnefîlek³²¹ di bêvila wê de bû, ew jî zêr bû û qaşeke sor lê bû. Curecure dêreyên³²² xas î etlez, qenawiz³²³ bi kobekê³²⁴ neqîşandî

³¹⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 14.

³¹¹ *Dimdim*, r. 181.

³¹² Morî.

³¹³ Qumçe.

³¹⁴ Şelît

³¹⁵ Rêzika morîk yan jî zêran. Jin vê zînetê bi yazmeya xwe girêdidin û heya eniya wan tê.

³¹⁶ Yazma, şelpe.

³¹⁷ Rêzika morîk yan jî zêran. Jin vê zînetê bi temeziya xwe ve girêdidin û heya eniya wan tê.

³¹⁸ Xelke.

³¹⁹ *Dimdim*, r. 21.

³²⁰ Bazinê lingan.

³²¹ Qaranfîl, xezem: Guharê zêr jan jî zîv e ku jin li pozê xwe dixin.

³²² Kirasê ku pêşiya wê vekiriye û li ser libasên din tê wergirtin, ‘entari.

³²³ Qenawîç, qumaşê neqş kirî.

³²⁴ Etek.

lê bûn, di nava guliyên wê de kespikên³²⁵ bera û nivîşteke tilismê tê de dardakirî bû, wekî çavên xerab lê nekevin. Tora stûyê³²⁶ wê karîbarên qîçik bûn û mircanên sor tevîhev bûn.”³²⁷

“Qîzêd Sîpka çav û buryê xwe kilda bûn. Kofiyêd rind bi temezîyê û şemaqîyê³²⁸ hevirmûşê³²⁹ Diyarbekirî xemilandîbûn û dabûne serê xwe. Qotik ber sûretê xwe da berda bûn. Singê wanî teyî sedefkirî bû, kurtikêd etlez³³⁰, yan qanawiz li xwe kiribûn, dêrê wanê reng- rengî, govek- govek niqûşandibûn, lingê hineka bi kondere bûn. Xort jî kolosê³³¹ tiftika sipî dabûne serê xwe, dora kolosa şer û şimaqî girêdabûn, rêşîyê şer û şimaqîya dihat, dikete ser milê wan, meriv heyr û hijmekar bû wan cahila binihêrîya”.³³²

“Jinekî qemer î kofikêl î qure, stûyê wê tijî morî û mircan, di destên wê de bazinên bexdayî ber bi wî hat.”³³³ “Kembereke zîv î zêr kildayî li piştê bû.”³³⁴ “Aha min aniye kembera qaşkir, zîv û zêr î kildayî, xizêmên³³⁵ zêr î xişikirî, guharên zêr, du qol zêrê seriyân.”³³⁶ “Pozê wê teze qul kiribûn bona qerefila û xizêma.”³³⁷

2. 1. 11. Xwarin

Di her çar romanên nirxandî de jî behsa çanda Kurdan a xwarinê tê kirin. Di vir de du xalên girîng hene:

1. Piraniya xwarinên Kurdan ji goştê pez pêk tî. Sedema vê yekê jiyana wan a aborî ye ku piraniya Kurdên herêmê bi ajalvaniyê mijol dibin û di mitbexa wan de goşt ciyekî gelek girîng digire.
2. Behsa cûr be cûr giya tê kirin. Ev jî tê wê wateyê ku li Kurdistanê gelek cureyên giyayên ku dikarin bî xwarin şî dibin.

Me got, piraniya xwarinan bi goşt in. Bo nimûne, di Dimdimê de gava sûka bajêr tê teswîr kirin, wiha behsa xwarinxaneyan tê kirin:

³²⁵ Şînok, Heşînok, keskok, keskik, çavşîn, çavşînok, moriya nezerê.

³²⁶ Zîncîra zêr yan jî morikan e ku jin li stûyê xwe dialînin.

³²⁷ *Dimdim*, r. 251.

³²⁸ Yazma, şelpe.

³²⁹ Hewrişim.

³³⁰ Mîntanê (gomlekê) ji atlasê.

³³¹ Kumê mêran ê ji kulav tê çêkirin.

³³² *Jiyana Bextewar*, r. 14.

³³³ *Dimdim*, 99.

³³⁴ *Dimdim*, r. 29.

³³⁵ Xizêm: Alavê zêr yan jî zîv ê ku jin li pozê xwe dixin.

³³⁶ *Dimdim*, r. 91.

³³⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 76.

“Ji cem van xwarinxaneyan, timî bêhn û buxzên xwarinan wisa xweş dihat, mirov ku nêzikî wan dibû, wekî qet ne birçî bûya jî, me’de wî vedibû,³³⁸ ji ber ku li vir qelî, tolme, kifte, qeliya sêlê, qeliya şivanan a di nava hûrê pêz de çêkirî, taskivav, kivavên şîşan, rişte, savarê goşt û birinc, bîşî, şilik, helîse, gulolik û xwarinên mayîn çêdikirin.”³³⁹

“Li vir, xwarinxaneyên ji bo kesîban jî hebûn. Di van xwarinxaneyan de, hazir dikirin ji serî û lingên pêz û dêwêr serpê, ji nava dilê pêz û dêwêr, çawa digotin, hûrpizûr, qeliya rûviyan û dilhinav hazir dikirin. Pîlava ji garis, avsîr û gelek tiştên mayîn î erzan.”³⁴⁰

“Hê bêmalê gotinên xwe ne qedandibûn, şîşên kivavan li ser texte hatin danîn û kizîn ji şîşên kivavan dihat. Di pey kivavan re, qeliya sêlê hat, bi sîrmastê çêkirî; di pey qeliya sêlê re, pelava³⁴¹ lepeke bi goştê çêkirî anîn.”³⁴²

“- Kerem ke makûl! Min qeliya sêlê hema hêşka hazir kir. Ji goştê berxa par e, kavira yek sale ye.”³⁴³

“Li mala Resûl begê tendûr dadabûn; nanê genim, kade lêdixistin, alîkî jî mirtoxe³⁴⁴ çêdikirin. Ber derê wî sîtil danîbûn, aspêja qeliya sêlê diqelandin, pelava goşt û kivav hazir dikirin.”³⁴⁵

“Li ser kuçikê êgir, di nav sîtileke mezin de qelî diqelandin, di beroşekê de jî birincîr³⁴⁶ çêdikirin.”³⁴⁷ Goşt, ewqas tê xwarin ku di taştê de jî goşt dixwin: “Taştê anîn, qeliya sêlê bi sîrmastkirî danîne ber wan.”³⁴⁸ Me li jor gotibû giyayên çolê jî di mutbexa Kurdan de ciyekî girîng digire. Niha jî em ê li mînakên vê rastiyê binêrin:

“Te ku li pêşên wan dinihêrî, gelo çi pincar tune bû: Pêqask³⁴⁹, silmask³⁵⁰, tirşo³⁵¹, siping³⁵², mendik³⁵³ û pincara mayîn berhev dikirin, dianîn malêd xwe. Ji wan pincaran hinek bi rûn û bi hêkan ve diqelandin, dixwarin, hinek jî paqij dikirin û ji bo zivistanê hişk dikirin. Hinek jî dikirine nava xwarinê, hinek jî wekî din bi rûn ve diqelandin dîsa ji bo xwarinê.”³⁵⁴

Şîva wan îşev nan, toraq û hine pincara teze û pûng³⁵⁵ bû.”³⁵⁶

³³⁸ Rûyê wî geş dibû.

³³⁹ *Dimdim*, r. 22.

³⁴⁰ *Dimdim*, r. 22.

³⁴¹ Pîlav, birinc.

³⁴² *Hopo*, r. 258.

³⁴³ *Dimdim*, r. 213.

³⁴⁴ Cureyekî şîrnayiyê ye. Ji şerbet û arê qelandî tê çêkirin.

³⁴⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 54.

³⁴⁶ Mehîr, meyre, şorbeşîr, bi Tirkî sutlaç.

³⁴⁷ *Hopo*, r. 63.

³⁴⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 33.

³⁴⁹ Pê qaz: Cureyekî nebat e.

³⁵⁰ Nebateke ku dema ter be tê pijandin û xwarin.

³⁵¹ Nebatek e. Navekî din yê wê ye Kurdî guhê berxikê ye.

³⁵² Nebateke ku ter û pijandî tê xwarin. Weke dermanê Kurmancî jî tê bikaranîn ku bikêrî xwînbestiyê tê.

³⁵³ Nebateke tê xwarin e.

³⁵⁴ *Hopo*, r. 58.

³⁵⁵ Ji cureyeke naneyan e ku qemçikê wê kin e û bîna wê xweş e.

“Ewlê biharê me pincara xwarina xwe tenê berev dikir; lê wextê çayir gur bûn, hêşnayî êpêce bor bû, dîya me dîsa mera çend roja hate çolê û em hînî pincarne mayîn kirin, yê ku têne kelandinê dikne nav xwarinê. Ew pincar spîka, gulik, mendik û yê dinê bûn. Ew pincar me li çolê diçinî, dikire torbê xwe û danî mal.

Dîya me jî tev temîz dikir, dikire gewlaz, hişk dikir, hildida bona zivistanê. Her yêkê me zarêd çolê gerekê para xwe banîya.”³⁵⁷

Helbet xwarinên tê çêkirin tenê ne xwarinên goşt û giyayan bûn. Di pelên romanên de qala hinek cure din jî xwarinên tê kirin:

“Zînê çû şîv anî da ser texte. Wê tolme amade kiribû bi cureyê bajariyan. Goştê hêrayî kiribû nava belgên tiriyan, keleman, nava sêvan, nava balçanan, nava bamedolan û ên mayîn.”³⁵⁸

“Kurmanca zadê beranberdanê çêkiribûn: kade³⁵⁹, mirtoxe, hewle.³⁶⁰ “Yê ku qelya wan tune bû, çêdikirin sîrmast, hêkerûn. Gulik nav rûn da diqelandin, xaşîl³⁶¹, devşewitî³⁶² û xwarinêd mayîn, mînanî avê rûn tijî ser dikirin, dişandin cotkarê xwe ra.”³⁶³

“Me sozê xwe kire yekî wekî ez herim. Dîya min gerekê mira kiloçek bipata, çend hêk bikelanda û kincê min hazir bikira.”³⁶⁴

“Gundîkî kesîb gote min:

“Min hebê simil top dikir, danî mal, ew hebê genim min diqeland, dikire qelînok, dida ser destêr, hûr dikir, dikire qawût. Ew qawût jî tev şîr dikir, dida zarê hûr, wekî ji xelayê nemirin. Me mezina jî pincara çolê dixwar.”³⁶⁵

“Di kelê de gelek firne hebûn. Di van firneyan de, nanê sêlê, loşê tenûrê bokkan³⁶⁶, totik³⁶⁷, kiloç³⁶⁸, kade, mirtoxe, şilik³⁶⁹, bîşî³⁷⁰ û cureyên mayîn dipehtin.”³⁷¹

Di romanên xwe de Erebe Şemo behsa tenûrê jî dike ku niha jî li gelek herêmên Kurdistanê nan di wan de tê pehtin:

³⁵⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 45.

³⁵⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 58.

³⁵⁸ *Hopo*, r. 252.

³⁵⁹ Nanê bi rûn, hêg û penîr, kadik.

³⁶⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 74.

³⁶¹ Serbidew, cureyeke xwarinê ye ku bi savara hûr, dew û rûn tê çêkirin.

³⁶² Cureyeke xwarinê ye ku bi dims û nan tê çêkirin.

³⁶³ *Jiyana Bextewar*, r. 135.

³⁶⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 156.

³⁶⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 190.

³⁶⁶ Nebateke hişk û bîn ne xweş e.

³⁶⁷ Borek, kilor, nanê tenûrê yê kun.

³⁶⁸ Kulîçe, paste.

³⁶⁹ Nanê sêlê, nanê şikeva.

³⁷⁰ Pîşî, nanê sêlê, borek.

³⁷¹ *Dimdim*, r. 23.

“Steyra sibê ra ji mala Emerîkê dû dikişîya. Herro mala wî du tendûr dadidan. Ser tendûrekê xwarin çêdikirin, li tendûra dinê nan dipetin.”³⁷²

“- Li vir, li vî welatî, hem Ermenî, hem jî Kurd, gişan nanê tenûrê dipatin.”³⁷³

2. 1. 12. Dara Miraza

Şemo, di romanên xwe de cih dide gelek baweriyên betal³⁷⁴ ku bi sedan sal in di civakê de cihê xwe girtine. Yek ji van bawerîya jî Dara Miraza ye. Tê bawer kirin, ew kesa/kesê ku parçeyek ji kinçekî xwe bi vê darê ve girê bide û du‘ayekî bike, ewê dua‘ya wê bê qebûl kirin û tiştê ku dixwaze³⁷⁵ wê pêk bê:

“Mexlûqet wê darê ra digotin “dara miraza”. Gilî dikirin, wekî kê qurbanê bîne ber wê darê şerjêke, çi bixwaze mirazê wan wê biqede. Ew dara ji serî heta binî cûre- cûre kincika da xemilî bû. Hebûn pîne sor, sipî, qîçik, kesk û rengêd mayîn. Merfîyê ji gundêd dûr, bihara û havîna dihatne ber darê, lê roke meha gulanê hebû, wekî wê rojê ji hemû gunda dihatin ber wê darê, qurban şerjê dikirin û mirazê xwe jê dixwestin.”³⁷⁶

2. 1. 13. Remildarî

Yek ji baweriyên ku Şemo, di romanên xwe de cih didiyê remildarî³⁷⁷. Remildarî, xebata ku ji bo hînbûna paşerojê, fêhmkirina bext û nesîb tê kirin.³⁷⁸ Hinek kes bawer dikin ku ew kesên ku ji bo xwe dibêjin remildar, ji xeybê xeber didin, hêzên wan ên awarte hene û dikarin tiştên awarte bikin. Bo nimûne, dema pezekî bavê Erebe Şemo winda dibe, ev pêşniyar lê tê kirin: “Şemo, here cem koçek,³⁷⁹ bira³⁸⁰ koçek pezê undabûyra binêre, çika kê ew pez birîye.”³⁸¹ Lê belê, mijara sereke ya remildaran evîn û evîndarî ye û piraniya muşteriyên wan jî qîz û jin in: “Bi pêş de were, keça min, şerm neke, ev mala remildara navdar e! Kî tê, dilê wê çi

³⁷² *Jiyana Bextewar*, r. 19.

³⁷³ *Hopo*, r. 100.

³⁷⁴ Batil.

³⁷⁵ Zarok, zewicîn, dewlemendî û hwd.

³⁷⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 137.

³⁷⁷ Faldariyê.

³⁷⁸ Toparlı, h. b., r. 677.

³⁷⁹ Faldar.

³⁸⁰ Bila.

³⁸¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 113.

dixwaze, meyser dibe, paşê diçe.”³⁸² Di nav civakê de bawerî heye ku koçek yan jî mela dikare bi riya nivişt û falan dilê yekî/ê ji bo yekî/ê bike evîndar:

“Wan rojan li çarsiya Kela Dimdimê, kes nizane ji ku tîn, fehldar, derwêş, koçek û mele tijî dibin. Wan rojan karê wan zehf e, ji ber ku gelek xort û ciwan têne cem wan, velikan vedikin, çi ka gelo wê dilketiyên xwe bistînin, an na. Hinekan jî ji cem meleyan ji Qur’anê nivişt çêdikirin, wekî dilketiyan li ser xwe bengî bikin. Melayan qestana hêdika di guhên wan da digotin:

“Tu gerek vê niviştê biwî, li binê şêmika mala bavê keçikê çahl bikî. Ewê xwe bi xwe bide pey te, bê. Lê gerek tu bikî, wekî kesek nebîne.”³⁸³

Her wiha kesên zarokên wan çênabin jî çareseriyê di nivişt nivîsandinê de dibînin:

“Wan rojên ezîz, heke zuriyeta kê tunebû, an kurê wî tunebû, wî jî diçû li cem mele, koçek û dewrêşan fehl vedikirin û nivişt li cem meleyan didane nivîsandin, wekî ewledê wî hebe. Hinek nexweş jî dihatin, ji bo silamet bûna xwe nivişt dikirin.”³⁸⁴

Tê bawerkirin ku niviştên hatîn çêkirin, dikarin di şer de şervan ji derbên dijmin biparêze:

“Min ji tere li cem meleyê ku ji Hekariyê hatiye, meleyekî gelekî zana ye, ji te re nivişt kiriye, wekî derba dijmin tiştêkî li te neke. Giş dibêjin: “Niviştên ku ev mele dike tilismeke wisa ye, wekî ne tîr û kevan, ne şûr û rim nikarin tiştêkî pê bikin, wekî ew nivişt bi bazbenda milê wî mêrî ve girêdayî be.”³⁸⁵

Remildarî, bi awayekî xwezayî bê pere nabe û ji bo vê xizmetê! teqez pêwîst e pere bê dayîn: “De wekî dixwazî merama te bê sêrî û remil ji te re rast bibêje, tu pere bavêje ser remilê.”³⁸⁶ Ji aliyê din ve tê bawerkirin ku kapa³⁸⁷ guran jî mirov ji derban diparêze: “Li eşîra Beroderan baweriyek hebû: Kî kapa guran bi ser kevçika dilê xwe ve bidirû, tu derb li wî nakevin.”³⁸⁸

³⁸² *Dimdim*, r. 141.

³⁸³ *Dimdim*, r. 42.

³⁸⁴ *Dimdim*, r. 42.

³⁸⁵ *Dimdim*, r. 205.

³⁸⁶ *Dimdim*, r. 142.

³⁸⁷ Kap: Hestûyekî kêbiran e ku di gozekên ajalên cot neynok de, di lingên pêşiyê de ye.

³⁸⁸ *Dimdim*, r. 254.

2. 1. 14. Bijîjkî (Hekîmtî, Tib)

Bijîjkî, Hemû teknîk û xebatên zanistî yên bi armanca baş kirin, sivik kirin yan jî asteng kirina nexweşîyan e.³⁸⁹ Ew, mîna dîroka mirovahiyê kevn e. Bijîjkiya gel jî, di nava gel de bi riya ‘adetan û bawerîyan cî girtiye. Pertev Naîlî Boratav (1907- 1998) jî balê dikişîne ser bijîjkiya gel û wiha dibêje:

“Dema gel, ji ber bê derfetiyê yan jî bi sedemeke din nikare yan jî nexwaze biçe cem bijîjk, ji bo tespît kirin û derman kirina nexweşîyan serî li hinek rêbaz û kirariyan dide. Ji bo van hemû kirariyan bijîjkiya gel tê gotin.”³⁹⁰

Civaka Kurdan a ku Erebê Şemo di romanên xwe de vedibêje hinek rêbazên bijîjkiya gel bikar tîne. Di vî warê de, sê mînakên girîng ji romanên Wî tînan zanîn:

1. Ji bo şîfayê çûyîna cem şêxan
2. Ji bo şîfayê avêtina nexweşî/ê nava postê pez.
3. Ji bo şîfayê, bikaranîna gezoyê ji daran tê top kirin.

Em ê pêşîn lê binêrin ka gelo çawa ji bo şîfayê hinek kes diçin cem şêxan: “Ji kê dera xwe gazine xwe dike?”

“Dilê wê diêşe. Dilê wê ji zûde diêşîya, lê guh nedidayê, îcar wisa bedhal e, wekî êdî di nava cî de pal daye. Min jê re hingivê beyanî bir. Hekîm dibêjin: “Her hingivê beyanî komekê (alîkariyê) bide wî, tiştêkî din tu karê nade.”

“Ê hûn çima neçûne ser Koçek Gulê. Dibêjin, Koçek Gulê û Şêx Qasimê, kesek mîna wan merivan sax nakin. Kî diçe ber ocaxa Şêx Qasimê, silamet dibe. Par na pêrar, kirîvê me nexweş ket, bavê min ew bire ocaxa Şêx Qasimê, mehek nekişand silamet bû, çû mala xwe. Du zêr danîn ber ocaxê, pezek qurban şerjêkirin, yek jî hema wisa sax kirin nav pezê wî.”³⁹¹

Li vir jî em ê li ser cureyeke lêgerîna şîfayê bidin. Di du romanên xwe de Şemo cih dide vê pêk anînê ku gava kesek nexweş dikeve, bizinekê yan jî miyekê şerjêdikin û wî nexweşî dikin nava postê wî pezî:

“Wê zivistanê heya biharê Îbrahîm ji nav cîya ranebû. Seyrana belengaz gazî hekîma kir, bi gotina wan hekîm bizin şerjê kir, Îbrahîm avîte postê bizinê. Gazî mella kirin, kaxez

³⁸⁹ Toparlı, h. b., r. 1976.

³⁹⁰ Boratav, h. b., r. 122.

³⁹¹ *Dimdim*, r. 147.

nivîsîn, nivişt jê ra kirin, lê tiştêk jê çênebû. Çiqas diçû, roj bi roj, Îbrahîm diha xirab dibû.³⁹²

“Roj bi roj Dewrêş paşde diçû, nikaribû pey dêwêr saskar bibe. Belengazî himangî dêwêr ra kaş dibû. Axrîyêda kete nav cîya. Bavê min gelle du- dermana gerîya, nebû tiştêkî. Rojekê bavê min çû, gazî hekîmekî kir, anî. Ewî pezek da kirînê, şerjêkir, Dewrêş avîte postê pezê. Dewrêş dîsa silamet nebû.”³⁹³

Jiyana Kurdan, di romanên Şemode weke jiyaneke pastoral tê teswîr kirin. Loma jî ji xwezayê sûd tê wergirtin. Bo nimûne, ji daran gezo tê komkirin û ew gezo him ji bo xwarinê him jî ji bo şîfayê tê bikaranîn:

“Carna havînê, wextê di mêşe³⁹⁴ de te digot bêhna hewê jî ji wan dara xweş dihat. Lê wî çaxî, gava ku bagî germ dihat, tu ku sivetirê radibûyî, berê dara mînanî giravîkê gezo girtîye, çiqêd bin darê çûk hemangî tewîyane, gezo dilop dike, dikeve erdê. Wî çaxî jin, zaro, xort û pîrêd hurmet beroş, qasik û elb hildidan lez diçûne mêşe gezo top dikirin, dilezandin, wekî zû top kin hela xirab nebûye, nehelyaye... Gezo mînanî hingiv şîrîn e. Bi wî gezoyî kade, kiloç dipetin; mirtoxe û hewle çêdikirin. Ji wî gezoyî pîrêd şareza dermanê dila, kuxikê û pişikreşe çêdikirin. Gele merî bi wan dermana silamet dibûn.”³⁹⁵

2. 1. 15. Xwîndarî

Di civaka Kurdan de, xwîndarî rastiyeke sosyolojîk e. Kesek bi zanebûn yan jî bi qezayê dema tê kuştin, di hinek bûyeran de, mirovên wî dixwazin wî kesê ku birayê wan, bavê wan û hwd. kuştî, bikujin. Dema yek bi awayekî tê kuştin, ger kujer neyê kuştin jî, pêwîst e ew heqê xwînê bide û mala xwe ji wî gundî yan jî ji wî bajarî bar bike û biçe warekî din. Lê dîsa jî garantiya rizgar bûna ji kuştinê tune:

“Silêman Xan hebekî fikirî, got:

“Wî Kurdî li gundê xwe mêr kuştibû. Wî belengazî xwîn jî dabû lê ew qebîleya ku mêr jê hatibû kuştin, qebîleyeke zor î xurt bû. Wan de’w kiribû û berê wan ew Kurd ji eşîra xwe derxistibû. Lê çawa ku edetên we Kurdan dibêjin: “Merivê ku ji eşîrê berdanê derxistin, êdî tu

³⁹² *Jiyana Bextewar*, r. 83

³⁹³ *Şivanê Kurmanca*, r. 117.

³⁹⁴ Daristan.

³⁹⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 12.

eşîr û tu qebîleyêd Kurd wî hilnadin nava xwe. A bi vî tehrî ew hatibû gihiştibû me û li cem me dima.”³⁹⁶

“Îsal çend sal derbasbûye, wekî qezîyek qewimî, min mêrek ji wan kuşt. Niha ez hatim, evî gundê hanî jêrîn, evana pismamê wî ne rastî min hatin dixwazin min bikujin, heyfa xwe vekin. Ez ber direvîyam, min pakî digot: “Heyran, tu karê we min neketîye.”³⁹⁷

2. 1. 16. Lîstik

“Lîstik, xebata ku li derveyî demên şixulînê tê kirin û ne bi armanca hilberînekê, yan jî pêkanîna xizmeteke mecbûrî; tenê ji bo şahiyê tê kirin e.”³⁹⁸ Di romanên Şemo de tenê li du ciyan qala lîstikan tê kirin ku me ew beş li jêr neqil kirine:

“Cahil derva digerîyan: Hine cahila li mehela jorîn govend girtibûn, dilistin. Zarêd hûr bîşkorî tepotaşî³⁹⁹ dilistin.”⁴⁰⁰ Kolxozvan dihatine klûb, gazêteya Riya Teze dixwendin. Hinekan tame⁴⁰¹ dilîst, hinekan jî kişik⁴⁰² dilîst.”⁴⁰³

2. 1. 17. Mêrxasî

Ji romanên Erebe Şemo ya herî zêde cî dide mêrxasiyê Dimdim e. Ji ber ku Dimdim qala bûyereke lehengiyê dike. Ji ber vê sedemê di piraniya rûpelên Dimdimê de nîşanên mêrxasî, cesaret û şervaniyê tînin dîtin. Bo nimûne, dema ehlê kelê dibîne ku ji destê dujmin derfeta rizgarbûnê tune, şêwrekî mezin dîkin û biryara xwe kuştinê didin. Xano jî wiha vî emrî dide leşkerên xwe:

“De êdî bi destsivikî tevbigerin,

Ji koncalan derxin barûdên xwe,

Kela Dimdimê bi hewa xînin,

Bila bibîne dijmin ku hûn radest nabin.”⁴⁰⁴

³⁹⁶ *Dimdim*, r. 80.

³⁹⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 138.

³⁹⁸ Boratav, h. b., r. 295.

³⁹⁹ Lîstikeke zarokan e. Heft kevîran datînen li ser hev û ji dûr ve kevîr diavêjin wan. Kesê kevîran hildiweşîne ew bi serdikeve.

⁴⁰⁰ *Jiyana Bextewar*, 218.

⁴⁰¹ Dame.

⁴⁰² Şetranç.

⁴⁰³ *Hopo*, r. 38.

⁴⁰⁴ *Dimdim*, r. 6.

Hemze Çawîş, fermandarê leşkerê Xano ye. Mîrê Şemzînanê li hember Dewleta Osmaniyan şer dike û ji Xano alikariyê dixwaze. Xano jî di bin femandariya Hemze Çawîş de hinek leşkerên xwe dişîne hewariya Mîrê Şemzînanê. Şer diqede, artêşa Osmaniyan neçar dimîne û bi paş ve dikêşe. Mîrê Şemzînanê jî xelata mêrxasiyê dide Hemze Çawîş: “Mîr Sadiq bi destê xwe qapûtekî mîrtiyê li Hemze Çawîş kir, çawa nişana mêrxasiyê.”⁴⁰⁵

Di rûpelên Dimdimê de evîna Kurdan a ji bo welatê wan û fedakarî û bi biryariya wan a ji bo parastina xak û azadiya wan gelek bi hostayî tê vegotin. Bo nimûne, leşkerên Xano, govenda xwe jî bi şûr, qeme û mertalan digirin û naveroka kilamên wan ên di ber govendê re dibêjin jî behsa parastina welat dike:

“Cewzo çû gote miraz, wî bi qaydeyê şêranî lê xist. Xortan destên hevdu girtin, ketin govendê, carekê çep lê xistin, du caran rast lê xistin û qeme kişandin, bi pêş de çûn, gotin: “Nave, nave, nave...! (nabe, nabe, nabe) Paşê qeme bi lez kirine qilifên wan, destên xwe li hev xistin, dîsa carekê çep lê xistin, du caran rast, qeme dîsa kişandin, bi pêş de çûn, gotin: Nave, nave, nave...! Cara sisiyan ku govend zivirî, du caran çep lê xistin, lê gava ku dîsa rast lê xistin, dîsa qeme kişandin, sê caran bi hev re gotin: Nave, nave, nave...! Qemeyên xwe dîsa xistin qilifên xwe û govend gerandin. Gava ku wan wisa bi teqil bi qemeyên tazîkirî di destên wan de û bi pêş de diçûn, te digot qey dijmin li pêş wan e. Xanoyê ku ev lîstika wan dît û dengê wan bihîst, “Nave, nave, nave...!” di dilê xwe de got: Eşed bila, tu caran nave, wekî em welatê xwe bidin Şah Ebas, bidin wan merivan.”⁴⁰⁶

Şerê parastina welat bi hemû şideta xwe didome. Dengbêj jî bi kilamên xwe cesaret û alikariyê didin leşkeran:

“Carekê li ser me qewimiye ser Kela Dimdimê van beyaran

Qalekê li Kurdan qewimiye berê van zinaran

Ezê divînim cinyazê eskerê Îranê û nalenala birîndaran

Weleh nabe, bileh nabe, alçaxiya Kurdan Şah Ebas re qe nabe

Birano lê xin, hev ra lê xin, heyfa Postoyê simêl hûn jê derxin...”⁴⁰⁷

⁴⁰⁵ *Dimdim*, r. 143.

⁴⁰⁶ *Dimdim*, r. 210.

⁴⁰⁷ *Dimdim*, r. 233.

Di romana Şivanê Kurmanca de jî, gava behsa karakterê Kurdan tê kirin, mêrxasî madeyeke sereke ye:

“Hevalê Şpak zaf mi ra kêfxweş bû, got:

“Ha, ez Kurmanca pak zanim, li welatê Îranê min Kurmancara kirîye şer. Ez jî wextekê esker bûm. Hûn, Kurmanc mêrxasin.”⁴⁰⁸

“Wê rojê, wextê hê êvar ne bibû, qumandarê me, hevalê Şpak gazî min kir, ji mira dizîkava got:

“Hevalê Şamîlov, ez zanim, - Mêrê Kurd zafe mêrxasin û wekî soz dan, tu carî xayîntîyê nakin.”⁴⁰⁹

2. 1. 18. Jinxasî (Wêrekiya Jinan)

Di romana Dimdim de, behsa leşkerên jin jî tê kirin ku di demên klasîk de mînakên wê kêr in. Demên klasîk de şer, hertim weke karê mêran tê qebûl kirin. Mêr diçin şer û jin li benda wan dimînin. Ev yek îro jî hema bêje ne guheriye. Şer niha jî, pîranî, karê mêran e. Lê di Dimdimê de jinên şerker jî hene û bi perwerdehiya leşkerî tîr perwerde kirin: “Wexta ku ji nava vî mexlûqetî derket, ber bi esker çû, wî dît li jêrê, li bintara esker, li hafa gêlî taxbûreke jinan sekinibû, giş bi tîr û kevan kîp sekinibûn.”⁴¹⁰

Jin, bi sedemekî din jî diçin şer. Li gorî adetên Kurdan, dema mêrek di şerê welat parastinê de bê kuştin, kurê wî dêbila wî diçe şer. Lê ger kurê wî kesî nebe, wê demê hevsera wî dikare dêbila wî biçe şer:

“Zadine Xanimê got:

“Tu dizanî malxerab⁴¹¹ kur tunene, wekî dewsa bavê bê şêr. Wexta ku malxerab kuştin, min sond xwar, ez her tim li dewsa wî herim şêr.

Wexta ku Şah Ebas esker şand ser eşîra Şîkaka bi wan re kir şer, Zadine Xanimê jinxasiyeke wisa kir, degme mêran nikaribû bikira.”⁴¹²

⁴⁰⁸ *Şivanê Kurmanca*, r. 166.

⁴⁰⁹ *Şivanê Kurmanca*, r. 169.

⁴¹⁰ *Dimdim*, r. 198.

⁴¹¹ Behsa mêrê xwe yê di şer de hatiye kuştin dike. Ji şerma navê wî nabêje. Ger mêrê wê saxbûya wê demê wê yê ji bo wî bi gotiya malxwê.

⁴¹² *Dimdim*, r. 231.

Ev taybetiya jinên Kurd, gotina pêşyan a Kurdî tîne bîra mirov ku dibêje: Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e.

2. 1. 19. Zêmar, Şîn, Mersiye

Zêmar ew gotin in ku piştî yek dimire, ji aliyê merivên wî/wê tîne gotin û tîde qala bedewî, baş bûn, nirxên wî kesî/wê kesê li pey xwe hiştî û êşa ji mirina wî/wê tî hîs kirin tî bilêv kirin.⁴¹³ Zêmar, qêrîn û gaziya piştî mirî tî kirin e. Xizmên mirî, bi riya zêmarê, êşa ji mirinê hîs dikin tînin ziman. Zêmar, yek ji ‘adetên Kurdan e. Bazîdî jî vê yekê destnîşan dike:

“Wekû mirovek fewt bûyî (dimire) feryat û girîn peyda dibî. Îcarê ehlê mala meyyîtî berhev cihekî dikin û jinêd dengbêj heyîn. Lawjok û siwaro dibêjin û dikine qurrî.”⁴¹⁴

Dema yek dimire, jin dikin axîn û nalîn. Her wiha li pey wî/wê beyitan dibêjin û sotina dilê xwe tînin ziman:

“Rojek derbas bû, paşê jina Xano pê hisiya, wekî kurê wê yê lap î mezin, Sêvdîn kuştine. Bû qîrîniya wê, serçavên xwe qelaşt, porê xwe verût, hate dîwanxaneyê û dilûband:

Lawo, lawo, lawo min nediyo

Kes nizane cinyazê te li kû mayo...”⁴¹⁵

Di çanda Kurdan de, gava yek dimire, ji bajar û gundan gelek kes, kom bi kom diçe li ser taziya wî/wê: “Çiqa gundê Kurmanca li wê nehîyê hebûn, Eşîrêd Sîpka, Rêdika, Dilxêra, Cemaldîna û êd mayîn gişk hatibûne hewariyê, cî tune bû, mal tune bû, merî lê cîbûna.”⁴¹⁶

“Rojeke meha Hezîranê ya germ, Emerîk wefat bû. Ew ji bo hemû Kurmancan cabeke nebixêr bû, gişan şîn gerand. Ji hemû gundan mirov hatin hedkin û serxweşiyê bidin mala wî, wekî Emerîkê gelekî di ber wan de çetînî û zehmetî dîtibû. Hingî roja ku gund hatibû avakirin, hê ewqas cimaeta giran di nava xwe de nedîtibûn. Ji Tibîlsê, Têlavê, Batûmiyê, Lêningradê, Êrîvanê, Elegezê, Talînê, Erdeşarê, Hoktêmbêryanê û ji ciyên mayîn hatibûn.”⁴¹⁷

⁴¹³ Toparlı, Recep û yê din: *Türkçe Sözlük*, Weşanên TDK, Ankara, 2005, s. 34.

⁴¹⁴ Bazîdî, h. b., r. 110.

⁴¹⁵ *Dimdim*, r. 243.

⁴¹⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 78.

⁴¹⁷ *Hopo*, r. 240.

“Wekî merîk dîmir, gundî tev top dibûn, şîn dikirin, kotel girêdidan, digerlandin, mêra û jina reş girêdidan, kilamê şînê digotin, dilûbandin. Erdek- kotel ser mezêl û binîya gund da digerlandin, pizmam- lêzim û ji gundên din merî dihatine serxweşîyê digotîne malxwê malê: “Em kor bin, sed korayî, bira hûn sax bin, pizmam- lêzimê sax bin. Mirin emrê Xwedê ye, her kes ji me jî ser wê rê ye.”⁴¹⁸

“Çiqas mêr gund da hebûn gişka karê xwe kir, herne hewarîya Xudêda. Çend merîyê gund li çolê bûn, cab dane wana, ew jî hatin rêketin çûn. Rêva kifş kirin wekî Reşîdê Ecem qeydê mirîya bêje. Wextê gihiştne gundê wan, bayraq girêdan, Reşîdê Ecem bi dengê zîz got:

“Weylo sîyaro... Ezê li sîyara dinêrim...”

Navda tune... Xudêdayê bejin zirav...”

Teva hevra got:

“Wey li min birayo...! Wey li min birayo...! Bi desta serê xwe xistin.”⁴¹⁹

Gava ji malbatekê yek dimire, cîran û gundî ji malbata wî/wê şerm dikin, dawetê bikin. Loma jî pêwîst e demeke dirêj, bo nimûne çar pênc meh, li ser mirina wî/wê re derbas bibe. Lê ev jî têrê nake. Divê ew malbata ku dixwaze dawetê bike, biçe ji malbata wî/wê kesê/kesa mirî destûrê bistîne:

“Sehîd, ez hatime bona, kur, bona Hesên. Em dizwazin daweta wî bikin lê hûn jî di şînê de ne.

Zelêxe, tu dizanî, an ne te bihistiye, wekî şîn û şayî hevalrêwî ne. Here bi serfînyazî dawetê bike. Bimbarek û pîroz be.”⁴²⁰

Şemo, di hemû beşên zêmariyê de hinek biwêjan bikartîne, bo nimûne: Em kor bin, sed korayî, sed heyf, weyla li min porkurê....

“Sîyarek ji binya gund dihate nava mala. Lez ajote ber derê Sertîb, ewî cab anî wekî Xudêdayê kal mir. Sertîb, Xezalê û Cemîla qîza wan, bû axe- axa wan, dest çokê xwe dixistin û digotin:

“Sed korayî, sed heyf, em kor bin seva te mêrî. Wê sehetê reş girêdan. Cava mirina Xudêda zû nava gund bela bû gişka ax dikir, digot:

⁴¹⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 55.

⁴¹⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 77.

⁴²⁰ *Hopo*, r. 251.

“Em kor bin seva te mêrî, sed heyf mêrê mînanî Xudêda nav me da kême heyê.”⁴²¹ “Merîyê ku diçûne mala xwe, ber Sibhanê û kur va disekinîn, digotin:

“Sibhan, Mîrze, em kor bin, sed korayî, wele mirina Xudêda pişta me teva şikênand, bira tu û kur sax bin. Bira pizmam- lêzime sax bin.”

Sibhan û Kur caba wan da, digot:

“Bira dijminê we kor bin, bira hûn kura va sax bin, bira bona me hûne sax bin, hûn ser çava û ser sera hatine.”⁴²²

“Wey Xwedê, te çima wiha kir? Weyla li min porkurê, xwezila ez li dewsa te bûma. Xwezila ez li dewsa te biçûma erdê sar, hewî... wey... gidîno!...”⁴²³

Ev li xwe nifir kirina li jor jî di zêmaran de tê kirin. Jê mebest ew e ku xwediya gotinan ji mirina wî/wê kesî/ê gelek xemgîn bûye.

Navê din ê zêmarê reş girêdan e. Wateya wê jî ew e ku dema yek dimire, lêzimên wî/wê cilên reş werdigirin: “Seyranê kur jî çal kir, reşa wî jî da serê xwe.”⁴²⁴ Di qêrînên zêmaran de di gotinên jinan de biwêja “porkurê” gelek caran tê bikaranîn. Ev biwêj, bingeha xwe ji adetekê distîne ku gava yek dimire, jinên lêzimên wî porê xwe kur dikin û guliyên xwe davêjin ser tabûta wî/wê. Bi vê tevgerê dibêjin ku: Bi te re em jî mirin, em êdî xemilandin û kêfa dunyayê naxwazin. Loma jî ev por û gulî ji me re ne lazim in:

“Li Çelayê, gundê Ermenîya, tabût dabûne çêkirine. Wextê Xudêda kirine tabûtê, bîst û neh gulî ser jina jê kiribûn, anîn danîne ser tabûta wî. Xort ketne bin tabûtê, ber bi gorê çûn.”⁴²⁵

Di birina mirî ber bi goristanê de, wêneyeke sosyolojîk derdikeve holê. Li pêşiyê di tabûtê de mirî tê birin, li pey wî şêx û kal diçin ku ev tê wê wateyê ku ev civak di bin rêveberiya van kesan de ye yan jî ji bo van kesan rêz tê girtin. Li pey wan jî lêzimên mirî tên ku ev mafê wan e, li piştî hemûyan cemaet tê.

“Pêşiya gişka tabûta Xudêda bû, pey wan ra şêx, pîr bûn. Qewl digotin, pey wan dihatin: Sibhan kura va, pizmam, lezima va, pey wan gişka ra cemaeta Kurmanca bû. Xortekî hespa

⁴²¹ *Jiyana Bextewar*, r. 77.

⁴²² *Jiyana Bextewar*, r. 79.

⁴²³ *Hopo*, r. 95.

⁴²⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 86.

⁴²⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 78.

wî destkêş dikir. Gor bi qaydê edetê eşîrê hatibû kolanê: Bejneke du buhist kurayî. Anîn kevre selim e (kêlegor). Dane ser devê tabûta wî, berê wî ber bi qulbê kirin. Tabût hêdika bi werîsa daxistine gorê, paşê xwelî avitne ser. Bû kure- kura jina, lûbe- lûba wan, xwe dikutan, ser çavê xwe diqelişandin, xwîn ser xwe dixistin.^{»426}

Di zêmaran de gelek behsa li xwe xistin, xwîn ji xwe anîn, hawar û qêrnan tê kirin: “Bû kure- kura jina, lûbe- lûba wan, xwe dikutan, ser çavê xwe diqelişandin, xwîn ser xwe dixistin.”^{»427}

“Ji nişkê ve derî vebû, qûjîniya Zozanê bû ji der de hat. Wê ser çavê xwe wisa qelaştibû, xwîn jê dihat. Porê wê yê spî bi ser de hatibû, got:

“Wey eza bêxweyî, wey eza belengazê, çawa te ez bêxweyî hiştim.”^{»428}

Şemo, vê digihijîne wê astê ku heta Çiyayê Elegezê jî şîn dike:

“Gava kû tabûta Emerîkê kirin mezel, êdî girîn, hêsir, axîn, bavokirin çû gihişte serê Çiyayê Elegezê, te digot qey Çiyayê Elegezê jî şîn dikir. Ewrekî reş hat, xwe da serê Elegezê, nixaft.”^{»429}

Di goristanan de li ser her gorê kêlegorek heye. Her kêlegor jî xwedî wateyekê ye:

“Ji hespê peya bû, gem ji devê wê derxist û destkêş kir. Bire nava mezelê biçêrîne, ji ber ku çêre li wê derê pirr e. Wî hespa xwe çêrand hate nava mezel. Kete bîra Şebab, dema ku ew bi diya xwe re diçû ser mezelên wan ên li Kelê, dê yeko yeko jê re şîrove dikir. Niha jî, wî xwe bi xwe di fikra xwe de digot:

“Ev kumbetê beran î stûkêr kifş e mezinê qebîleyekê ye, an jî mêrxas e. Ew mexberê şêr li serê hatibû çêkirin, kifş e mezinê eşîreke mezin bûye û gelekî bi Şahê Îranê re şer kiriye, zor daye wan. Ev mezelê ku hesp li ser heye, ew jî, kumbetê mêrxasan e, lê ev mezelên colan li serê, ev bê miraz bûne û hê zarok jî neketiye destên wan.”^{»430}

⁴²⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 78.

⁴²⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 78.

⁴²⁸ *Hopo*, r. 37.

⁴²⁹ *Hopo*, r. 241.

⁴³⁰ *Dimdim*, r. 98.

2. 1. 20. Piştî Mirina Mêrê Wê Rewşa Jinê

Gelek caran gava mêrê jinekê dimire, ger zarokên wê hebe, ew jin êdî nazewice û zarokên xwe xwedî dibe “Sadiq mir, Hesên wê çaxê hê du salî bû. Zelêxê li ser cinyazê mêrê xwe sond xwar êdî mêr neke û kurê xwe mezin bike.”⁴³¹ Lê ji bo qelen standinê carna dê û bavê wê dixwazin wê bizewicînin: “Di pey mirina Sadiq re hê salek temam nebû, Xwezgîniyên Zelêxê çûn mala bavê wê, digotin:

“Apê Dûko, bi edetên me Kurdan, tu dikarî qîza xwe dîsa bidî mêr û qelenekî din jî bistîni.

Wî bersiva wan dida:

Giliyên we heq in, ez dikarim Zelêxa xwe bidim mêr, lê hê saleke mirina mêrê wê temam nebûye. Hema saleke mirina mêrê wê temam be, paşê ezê wê bidim mêr.”⁴³²

2. 1. 21. Mêvandarî

Mêvandarî yek ji taybetmendiyên karakterîstîk ên neteweya Kurd e. Kurd, ji mêvanan û mêvandariyê gelek hez dikin û ji bo mêvanan xizmetxweş in: “Ê çi dibe, mêvan mêvanê Xwedê ye. Ser çeva û ser sera. Çiqas dilê we dixwaze bira mala min da bimîne.”⁴³³ “Wey tu li ser çavan bêyî, mêvanê ezîz! Mala min pêşkêşî te. Mal bi xweyî be, xwişka Zelêxe.”⁴³⁴ Ewqas ji mêvanan hez dikin ku, ji bo mêvan hinek caran di nava kes û malbatan de şer jî derdikeve:

“Eva gilîya li cemaetê gişkî xweş nehat, Emerê Şêxo got.

“Wekî tu zef xeberdî, ezê vê qemê zikê tera kim. Çi heqê te heye, tu li mêvanê min xeberdî? Kê dîtîye, wekî merî berê mêvana de? Evê sibê jinê me ji me bistîne.”

Gişka ev yek qebûl nekirin, hevra gotin:

“Xalî nav me Kurda da, tu zanî, mêvan- mêvanê Xudê ye, seba mêvan em serê xwe didin.”⁴³⁵ Bazîdî jî balê dikişîne li ser mêvandariya Kurdan û comerdiya wan a ji bo mêvanan destnîşan dibe:

⁴³¹ *Hopo*, r. 119.

⁴³² *Hopo*, r. 121.

⁴³³ *Jiyana Bextewar*, r. 198.

⁴³⁴ *Hopo*, r. 141.

⁴³⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 115.

“...Ekrađ egerçî hinde xweyî pez û rizq in, lakîn ji boy xwe mexsûsen pezan serjênakin. Meger mêvanekî maqûk bêtin û yaxo pezekî nexweş hebitin, ewî şerjêdikin, lakîn bi xwe dimrin, pezekî ji boy xwe serjê nakin.”⁴³⁶

Li gorî adetan, ew ê mêvan bivê nevē (!) nan bixwe:

“Wê çaxa ku goma pêz çêdikirin, mihendiz kir ku here, lê Sertîb û gundiyan pêşî lê birrîn, gotin.:

“Hevalê mihendiz, hûn çî dîkin? Meriv şixulê wisa dike? Ne hûn li gundê Kurmanca nin? Qe dibe ku mêvanên me nan li mala me nexwin û herin? Îlahîm ew merivê ku av anî malêd me, qe tiştê wisa dibe? Wele heta tu nanê me nexwî, em nahêlin tu li otoyaya xwe rûnê!”⁴³⁷

“Emerîkê pêşî li profesor girt û got:

“Profesor, tu çî dikî, qe dibe, wekî mêvan di malên me de nê nexwin?

Ez zehf razî me, bawer bike wexta min qe tune.

Emerîk ji pêşîya profesor neçû, rêndayê. Profesor veşerîya li Sehîd nihêrî. Sehîd got:

Profesor, bi edetên me Kurdan, gerek mêvan erhede nanê me bixwe...”⁴³⁸

“Xortê delal, kerem bike pariyekî taştê bixwe, firavîn hê ne hazir e.

Metê, ez zef razî me, ezî ne birçî me.

Na lawo, wisa dibe? Ne tu ji rê hatî? Çawa dibe, wekî tu li mala me pariyek nan nexwî?

Lawo, tu dizanî edetên me Kurdan, mêvan bêyî nanxwarin nabe.”⁴³⁹

“Bi vê çûyîna xwe ya bi lez tu pakiyê nakî. Gotine min, tu Ermeniyê welatê Mûşê yî. Tu edetên me Kurdan dizanî, her dijmin di mala me de nê naxwe. Ez rastiye bibêjime te, min cab daye malê û nan êdî hazir e. Ma dibe tu nê nexwî û hema wisa herî?”⁴⁴⁰

Mêvandarî, weke yek ji taybetmendiyên malbatên Kurd tê teswîr kirin, ewqas ku kesê li ber mirinê, ji bo zarokên xwe qewîtiya mêvandarîye dike:

“Mêrê ahil mêranîya wî bîr danîn, hurmeta wî, camêrîya wî. Hineke gilî dikir, wekî rojeke berî mirinê Xudêda gazî kur, nebîya û kulfetê malê kiribû, gotibû:

“Lawêd min, ezê bimirim, hûn gerekê bi tifaq bin, mala bêtifaq xirabe ye. Mêranîya xwe paşda nedin mêrê Kurd carekê dimre, sed cara namire. Mala we gerekê dîsa mala ber mêvan

⁴³⁶ Bazidî, h. b., r. 97.

⁴³⁷ *Hopo*, r. 173.

⁴³⁸ *Hopo*, r. 105.

⁴³⁹ *Hopo*, r. 79.

⁴⁴⁰ *Hopo*, r. 106.

be, lê ev gişk girêdayê xebata we ye. Wekî hûn rind û helal bixebitin, tendûra we tu carî vênase, nanê we jî qe kê mabe.”⁴⁴¹

Xwedîkirina mêvanan di nav civakê de xwedî girîngiyeke pir mezin e. Ji bo vê taybetiyê di nav gel de çîrokeke wiha tê gotin:

“Wextekê li Cizîra- Bota qaçaxekî derketibû, ewî gele xirabî kiribû: Dikanê bajarê Cizîra- Bota derevedikir, davîte ser kerîyê pêz, talan dikir. Mîr dît, wekî ehlê bajarvanê wî nikare ji destê wî qaçaxî rihet bimînin, Mîr hukum kir wekî wî qaçaxî bigrin. Zabtîyêd Mîr ew qaçax girtin. Navê wî qaçaxî Xidir bû⁴⁴². Jê ra digotin Xidirê Pîrê. Deng li hemû olka bela bû, wekî Xidirê qaçax girtine. Ji hemû alîya merî hatne şîkyat. Mîr lê nihêrî rastî jî Xidir mexlûqet vejandîye, xirab kirîye, dizekî betere e. Mîr hukum dike ser qazî: Qirareke usa derxe, ku Xidir bişewitînin, wekî yekî dinê idî xeletîkî usa neke. Xidir tînin darekê va girê didin, agir didine binî. Wextê alava agir tê digihîje lingê Xidir, Mîr pêş wî disekine, jê pirs dike:

“Xidir, te qet rojê ji vê rojê xirabtir dîtine?”

“Belê Mîr, tê bîra min, rojekê mêvan hatne mala min, wê rojê nan mala min da tune bû, wekî min nan bida mêvana... a, roja lape çetîn ew bû, eva çiteva ye anegorî wê rojê.”⁴⁴³

2. 1. 22. Nêçîr

Di romanên Jiyana Bextewar û Dimdim de behsa adeta Kurdan a çûyîna nêçîrê tê kirin. Di van beşan de tê gotin ku pêwîst e ew ajala ku mirov diçin nêçîra wê, hêjayî be wî zehmetî û wan guleyan: “Were em herin nêçîra bizinê kûvî, pezê kûvî. Nêçîr ew nêçîr e, werdek çî terane, heyfa gula meriv wanda xerc ke.”⁴⁴⁴

Her wiha behsa hinek qaîdeyên nêçîrê jî tê kirin ku pêwîst e nêçîrvan li gorî van qaîdeyan tevbigere:

“Xano, her sal payîzê diçû nêçîrê, wî digot, nêçîra havînê bê kêr e, ji ber ku wê çaxê çêjik, cûcîkên wan hê virnî ne, guneh e lêxin. Lê payîzan karên xezalan, golikên gakuviyan, kudikên hirçan êdî bi têra xwe givrik dibûn, goştê wan xweş e, her vê çaxê divê meriv nêçîrê bike.”⁴⁴⁵

⁴⁴¹ *Jiyana Bextewar*, r. 70.

⁴⁴² Di wêrsiyonekê ev kes weke Elo Dîno tê vegotin.

⁴⁴³ *Jiyana Bextewar*, r. 171.

⁴⁴⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 22.

⁴⁴⁵ *Dimdim*, r. 47.

2. 1. 23. Newroz

Her çiqas Newroz cejna Kurdan a netewî be û Erebe Şemo jî bi nîrxên neteweyî ve girêdayî be jî, di romanên xwe ew hindik cî dide Newrozê û pîrozkirina wê. Şemo, tenê di Dimdimê de behsa Newrozê dike û wê weke cejna sersalê nîşan dide:

“Rojek mabû, wekî cejna serê salê bikin. Ji wê cejnê re Kurd dibêjin: Newroz. Ehlên Kela Dimdimê karê xwe dikirin, wekî wê roja ezîz bi eşq derbas bikin. Pez şerjêdikirin, qeş, helîse, kifte û xwarinên mayîn çêdikirin, fêkî amade dikirin, kuloçên serê salê dipehtin. Nîşanek, gustîl, an morî, an jî pereyê zîv dikirine nava kuloç, dema ku kuloç parve kirin, wekî ew nîşan ji neferên malê ji kê re derket, dêmek dewleta wê malê di serê wî de ye.”⁴⁴⁶

“Nêzîkbûna wan rojên ezîz, gimîn ji bajarê Kela Dimdimê dihat; li çarsiyê, li dukanan, di xanan de, li meydana dêwêr gelek eşya, mal, dewar dihatine firotane, biçûk û mezin, kesîb û dewlemend karê xwe û roja eydê dikirin. Li kuçeyan, li çarsiyên, li ber derê malan, li ser serê xaniyan û li axpînan agir dadidan, xort û ciwanan li dora êgir govend digirtin, dilîstin. Ew eyd bi eşq derbas dikirin. Ne ku bi tenê li bajêr, wisa jî eşq derbas dikirin li hemû gundan, li qijleyan. Heta şivanan jî, ên ku li ber kerî û sûriyên pêz li çolê bûn, ew eyd dikirin.”⁴⁴⁷

Newroz weke cejna sala nû tê bi nav kirin û tê bawerkirin ku kesên bi kincên nû û paqij têkevin sala nû, ew ê tevahiya sala wan bi kincên nû û paqij derbas bibe:

“Şevêkî beriya roja cejna serê salê, divê erhede biçûk û mezin avê li xwe bikin, herin hemamê, wekî paqij têkevine sala nû. Hinekan kincên nû dikirîn, wekî her gav û her sal kincên wan ên nû hebin.”⁴⁴⁸

2. 1. 24. Çavînbûn

Di nava gel de baweriya nezerê heye. Tê bawerkirin ku awirên hinek kesên niyet xerab, dikarin ziyandar bin. Boratav jî nezerê bi vî rengî rave dike û wiha dinivîse:

“Nezer, hêza ziyandar a awiran e. Tê bawerkirin ku xwediya/xwedyê wê awirê dikare bi hêza wê nêrîne li ser mirovan û ajalan nexweşî, seqetî yan jî mirinê pêk bîne; li ser tiştan jî şikestin yan jî xerabûnê pêk bîne.”⁴⁴⁹

⁴⁴⁶ *Dimdim*, r. 41.

⁴⁴⁷ *Dimdim*, r. 42.

⁴⁴⁸ *Dimdim*, r. 41.

⁴⁴⁹ Boratav, h. b., r. 104.

Di civaka Kurd de bawerî bi nezerî tê kirin. Bazîdî jî vê yekê destnîşan dîke û wiha dibêje:

“Û nezer heye. Ekrad nezerê rast dizanin û gelek jê ihtirazî (parastin) dîkin. Goya mirovê ku kose û mûzer û çav hişîn bibe, ji nezera wî mirovî elbette ditirsin. Wekû mirovê bi vî sûretî bibînin ji wî zaf ihtirazî bikin.”⁴⁵⁰

Şemo jî di romanên xwe de cî dide çavîni bûnê: “Zinê du salî bû, diya wê ji nişkê va mir. Bêzê qet bi nexweşiya wisa berk neketibû, digotin, ji çavan bû.”⁴⁵¹ Li hemberî nezerê nivîşt tên çêkirin û bi vî awayî tedbîr tê standin: “Wekî çav bi guliyên wê nekevin, çend nivîstên melê ji Qur’anê nivîsî ji bo tilismê bi guliyên wê de dardakiribûn.”⁴⁵² “Heyşt guliyê wê yê çûk hûr vegirtibûn, nav gulîya da morî û tilizme hebûn, wekî çav lênekeve.”⁴⁵³

2. 1. 25. Dewrêşên Gerok

Di nava civakê de, dewrêşên oldar gund bi gund, bajar bi bajar digerin û ji bo gel qesîde û îlahiya dibêjin. Gel jî, ji bo vê xizmeta wan, xwarin û pereyan dide wan dewrêşan:

“Em dewrêşên Xwedê ne, qulixdarên Mihemed pêxember in, li welatê Îslamê kê derê em bixwazin, destûra me heye em bigerin, bi keşkûlan lavayî dîkin û îdareya xwe dîkin.”⁴⁵⁴

2. 1. 26. Rojên taybet

Tê bawer kirin ku ew kesê ku di navbera van rojan de ne li mala xwe be ew ê belayek bê serê wî/wê: “Orta xêç û xidirnebî de kî ne li mala xwe be, wê xenîmê serê xwe be.”⁴⁵⁵

⁴⁵⁰ Bazîdî, h. b., r. 57.

⁴⁵¹ *Hopo*, r. 93.

⁴⁵² *Dimdim*, r. 29.

⁴⁵³ *Jiyana Bextewar*, r. 76.

⁴⁵⁴ *Dimdim*, r. 65.

⁴⁵⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 18.

2. 1. 27. Hêmayên Olî

Di nava civakê de baweriya bi Ye'cûc Me'cûc, Roja Axretê, Ava Heyatê û hwd. heye:

“Pêş malê kanîyeke mezin bû, ava çemekê ji wê kanîyê dikişîya. Kê ku ava wê kanîyê vedixwar, digot: “Eva ava, welleh avilheyat e.” Çîrokê me Kurmanca dibên: Heya avilheyatê, kê vexwe wê avê, idî namire.”⁴⁵⁶

“Bagereke usa, wekî cînar nikaribû biçûya mala cînêr. Hineka digot: Eva idî roja “axirzemanê” ye, çimku qetla îsal çû gihîşte ezmana, lema jî Xwedê li însên hatîye xezebê. Hinekan jî digot: Axrîya însan hatîye, wê koka merîya bê, pey wan merîya ra wê rabin, “hacûcmacûc”, ewana merîne hur in, lê wekî dest bi qurbana bikin şerjêkin, xêr xêrata bidne kesîba û koçeka belakin, Xwedê wê li we bê rehmê...”⁴⁵⁷

2. 1. 28. Cejna Beranberdanê

Şemo, di romanên xwe de behsa du cejnan dike. Yek ji wan Newroz e ku me di rûpelên borî de behs kiribû, a din jî cejna beranberdanê ye. Ev cejn, salê du caran tê pîroz kirin û dema pîrozkirinê jî li gorî çûyîn û vegeirîna ji zozanan tê diyar kirin:

Ev cejn salê du caran tê pîroz kirin: “Rojêd ussa ezîze rind dibûn her salê du cara. Carekê, wextê pêz teze diçe zozana, carekê jî paîzê- derengî, wextê koçer ji zozana vedigerin, têne malê xwe.”⁴⁵⁸

Bazîdî jî vê balê dikişîne li ser vê ‘adetê û taybetmendiyên wê:

“Wekû payîz nivî dibitin adet li nik wan kadan çêdikin û dibin diçine nik keriyêd mihan. Û beranan jî dixemilînin û dibine wê derê. Îcarê ewan kadan belav dikin û dixwin. Dikine şayî. Îcarê paşê beranan tevî keriyêd xwe dikin. Weqtê ko sed rojê beranan tamam dibîtin, dîsanî kadê û xwarinê çêdikin û şayî dikin, ji boy selametiya pezêd xwe.”⁴⁵⁹

Di Şivanê Kurmanca de tê gotin ku ev cejn, di nav gelên Kafkasyayê de cejneke xasî Kurdan e:

⁴⁵⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 13.

⁴⁵⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 131.

⁴⁵⁸ *Şivanê Kurmanca*, r. 99.

⁴⁵⁹ Bazîdî, h. b., r. 96.

“Gava ku min pirsî, - Ev çima ussa ne?, xortekî mezin, kêleka min sekinîbû, wa bin çava li min nihêrî, got.

“Çima tuyî korî, tu nabînî wekî îro beran- berdane, xelk tev karê xwe kiriye?

Ez nêzîkî wî bûm jê ra salixê xwe da û gotê, - sî û pênc sale, bavê min eşîrat hiştîye, çûye bûye rênçberê Melegana, Huruma û Ermenîya, loma jî em nizanin qeyde- qanûnê eşîratê.

Xort dîsa li min nihêrî got:

“Îro daweta pêze. Wê wanra dawetêke rind bikin, gulla agir kin, hemû şaya wê wanra bikin.

Roja îroyîn dinya tev şadibe, çiqas eşîr heye li dinyayê, tev îro şadibin, daweta pêzê dikin. Xortêd cahîl radibin, gulaşê digrin, hila gelle oyîna tuyê bibînî.”⁴⁶⁰

Carînan, şer, xela û hwd dibe sedemê betal kirina pîroz kirina cejna beranberdanê:

“Şer ji zûde xelas bûye, lê em eyda beranberdanê nakin? hevalê Sertîb.

Dedo, emê îsal eyda beranberdanê erhede bikin. Çawa kalan gotiye me, vê eydê ji dewran û vir de ye Kurd dikin û wê eşqeke rind têke nava kolxozvanan.”⁴⁶¹

Her wiha, di van rêzikan dê tê dîtî ku ev cejn kevneşopîyeke kevn e û bi sedan salan e tê pîroz kirin. Şemo, di Şivanê Kurmanca de behsa beranberdana havînê dike:

“Min dîya xwe pirsî:

Dayê kengê wê bibe bero-dan?

Dîya min mira digot:

Ewê bibe meha hezîranê.

Ro bi ro min dijmart, çika kengê wê bibe bero-dan.

Hewa ku îdî germ bû, berx givrik bûn, berx îdî karîbûn biçêrîyana, berfa çîya jî helîya bû, xwe dabû jorê, serê çîya, pîgar kivş bûn, kesîba jî pezê xwe coltî da dewletîya.”⁴⁶²

Amadekariyên ji bo pîrozkirina vê cejnê wiha tînin vegotin:

“Ew çend roj bûn karê cejna beranberdanê dikirin. Serwêrtiya kolxozê destûr dabû ji bo cejnê du pezan şerjêbikin. Bêrîvanan jî, kade, mirtoxe, hewle û kiloç pehtibûn. Kevaniyan jî, qeliya sêlê bi sîrmast amade kirin; kivav, birincê lapek î bigoşt û xwarinên mayî. Lê hinek

⁴⁶⁰ *Şivanê Kurmanca*, r. 108.

⁴⁶¹ *Hopo*, r. 160.

⁴⁶² *Şivanê Kurmanca*, r. 98.

malan jî, bi edetê berê xwarinên başqe çêdikirin û anîbûn ser textê, wekî tevî kolxozvanan bixwin.^{»463}

“Wê rojê ku wê berana berî nav mîya din, sibê şebeqê tev dixemilin, kincê teze xwe dikin, şivan bilûrêd xwe rûn dikin, hazir dikin, wekî lêxin. Hinek def, zurne û tulûmê dibine çolê, nava pez didine lêxistinê.”^{»464}

“Her obekêda obebaşî kivş bûn ji merîyê dewletî. Çimku xweyê wara, çêrê zozana dewletî bûn. Zozan zozanê wan bûn, war jî ser navê wan dihate navkirinê.

Obebaşîyê me Kelhan bû. Ewî rojekê gazî pîgara û şivana kir, got,

“Filan rojê wê bibe bero-dan û emê herne zozana.”

Roja çûyîna zozana, sibê- şebeqê teva karê xwe dikir. Xorta qîz û bûka kincê xwe teze xwe kiribûn. Reng- rengî xwe xemilandibûn. Ewê ku dewletîbûn, qîz û bûkê wan xizem-qerefil dikirne pozê xwe, şirikê qerefilê wan dihatin, ser piştê wane xemilandîda diketin. Hineka jî kimberêd zîv zêr kildayî didane piştê xwe.”^{»465}

Piştî amadekariyan beranberdan destpê dike:

“Obebaşî ser xanî sekinîbû, dikire gazî, digot:

“Pezê dora gund gerekê bileqe!”

Serkarîya bero-danê dabûne şivanê mezin î pispor. Ewî jî kulavê xwe yî teze xwe kiribû. Şivdara xwe berşivka kulêvra kiribû; bilûr destada, hey lê dixist. Cara jî, mîna qumandarekî, li cahila dikire gazî, digot:

“Miqatî berxa bin. Çavê we li wan mîya be, yê ku guh nedne berxê xwe.”

Pey şivên diçû nêrikî mezinî xemilandî. Stuyê wî nêrîda zengilekî mezin dardakiribûn, xinge- xinga zengilê wî bû, pez jî hînê dengê zengilê wî bibûn, xwe li nêrî digirtin, kêş girtibû, diçû.

Wextê meyê pêz rêxista, kûlakê, xweyê pêz hatne cem me, şivan- berxana, em xewle kirin. Gelle cimet dora me top bû û wan kûlaka mera got:

⁴⁶³ *Hopo*, r. 160.

⁴⁶⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 110.

⁴⁶⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 98.

“Me pezê xwe teslîmî we kirîye, me hûn jî teslîmî Xwedê kirîye, wekî hûn pakî, helalî û rind miqatî malê me bin û pak biçêrînin.”

Kerê pêz dabûne pey hevdu, cahîla xwe dabûne dora pêz, pêzra dihatin, dîna xwe didane pêz, wekî yek ji yekî neqete. Herkê hinek jî ji hev bela dibûn, wan lawika çirpî şivdara dixist, dikir reqe- req, ew pezê ji hev bela bûy, dikirne nava kêşa pêz, yan jî hîre hîra wan bû, ne dihişt yek ji yekê biqete.”⁴⁶⁶

“Berê êvarê, dema ku hemû tişt êdî amade bûbû, kolxozvan giş li mêrga li biniya gund civiya bûn. Bi hukmê serşivên, Fêro, xortan beran ber bi miyan ajotin. Gava ku beran çav bi miyan ketin, ber bi miyan ve beziyan, hema ku xwe gihandin miyan, şivanê ku nava miyan de bû, gulleyek agir kir. Wî bi wê gulle agirkirinê re nîşan da, wekî beranberdan e, wekî beran êdî di nav miyan de ne.”⁴⁶⁷

“Kolxozvanan, hebekî ji wan dût, li nav mêrgan, dest bi xwarinê kirin, xuya bû ku cejin dest pê bû. Çawa ku niha kal dibêjin: “Daweta beranan û miyan kirin, beran berdan.”⁴⁶⁸ Ji bo koçer û gundiyan, beranberdan xwedî wateyeke mezin e, ji ber ku wê rojê di jiyana wana rojane de guhertinên mezin pêk tên:

“Roja beran- berdanê ji rojêd ezîze dinê zaftir tê hesabê, çimku havîn derbas dibe, gişk têr û qewat in, yekê jî tev zanîn, wekî hazir dikin zêdebûna malê xwe û pezê xwe. Şivan, gavan û dûajo wê rojê ji teva zaftir şa dibin, wan roja idî heqê wan didinêda.”⁴⁶⁹

Cejin, ji bo xort û keçan jî dibe derfeteke hevdu dîtînê:

“Rastî jî wê rojê beran teve biskirî bûn, cûre- cûre biskêd rind ser beranada dihatin. Biskêd rengkirî, zengilêd rind, darikê, tayê, kawike rind didane berana. Qîzêd cahil temezî ji serê xwe vedikin, davîtne stuyê berana; xort tên wan temezîya vedikin, dibin, lê yê ku temezîyê vedike, xwe kivş dike, wekî wê qîzkê, qe bistîne. Dê û bavê qîzê dûrva, bin çavara, pak texmîn dikin, çika kîjan xortî temezîya qîza wan vekir, bir çika xortî hêjaye yan na. Çika xortî dewletîye, wekî qelenekî rind bistînin.

Temezî vekirin jî dibe wa: Xort û qîzik hevdu berbangê dibînin, qewil didine hevdu, wê rojê yê temezîyê vedike, dibe.”⁴⁷⁰

⁴⁶⁶ *Şivanê Kurmanca*, r. 98.

⁴⁶⁷ *Hopo*, r. 161.

⁴⁶⁸ *Hopo*, r. 161.

⁴⁶⁹ *Şivanê Kurmanca*, r. 109.

Ji ber ku beranberdan weke cejnekê tê pîroz kirin, xort û keç jî cil û bergên xwe yên herî xweşik li xwe dikin. Keç xwe dixemilînin:

“Kincêd xorta: oyme, arxalix, bîşmêt û çêrkezî bûn, kolosêd serê wan tijî şar- şimaqî bûn. Rîşêd şar- şimaqîya dihat, dikete ser çavê xorta. Qîz bûkê wan jî xwe pak xemilandîbûn: dêre, xirxal, enterîyê rind û teteriyê Ezurmê. Qîz û bûka serê xwe jî xemilandîbûn kofî – kitan, fînoyê kotikkirî, serê fîno û kofiyê wan tijî dirav bûn, bercênik, morî- mircanê stuyê wan da meriv heyran hijmekar bû lê binihêrîya. Xorta simêlê xwe ba dabûn. Qîza jî çavê xwe kil da bûn. Meriv tirê dawetê teze ji hev berdaye. Qîz û xortê dilketî ber hevra derbas dibûn, çav dikirine hevdu, kêleka hevda diçûn, xwe ber hevra davîtin diçûn.”⁴⁷¹

Ev roja xweş, qet bê govend û bê stran nayê derbas kirin: “Bû ringiniya def û zurneyê, keç û xortan îcar hê bieşqîr destên hev girtin û govend gerandin.”⁴⁷²

“Siheta beran- berdanê nêzik bû. Şivana dest bi kilama kir. Xort ketne koçerîyê. Def zûrne û tulûmê deng dane hevdu. Ew newel û gelî ussa tijî deng û hêwerze bibû, meriv nizanbû kîderê çî diqewime. Wê siheta wê berana berdîn, govenda xort, qîza hat, çarnîqalî kerê pêz sekinîn, bû xirmînîya gulla û ringînîya defê beran berî nav mîya dan.”⁴⁷³

“Xort û ciwanan hê ji sibehê de, beriya xwarin amadekirinê, li mêrga li pêş gund govend girtibûn û xwe ra direqîsîn. Xortekî bejin bilind î porkurîşkî destmala li destê xwe bilind kir, got:

Gelî bi dar e, lê Meyrê Meyrê, ha Meyremê, ha Meyremê...

Çolî bi dar e, lê Meyrê Meyrê, ha Meyremê, ha Meyremê...

Ger tu hatî xwar e, erdikê rûmenî, ha rûmenî, ha rûmenî...

Pezî bela ye, lê Meyrê Meyrê, ha Meyremê, ha Meyremê...

Gur hat, xwar e, erdikê rûmenî, ha rûmenî, ha rûmenî...

Gelî bi dar e, lê Meyrê Meyrê, ha Meyremê, ha Meyremê...

Çolî bi dar e, lê Meyrê Meyrê, ha Meyremê, ha Meyremê...

⁴⁷⁰ *Şivanê Kurmanca*, r. 110.

⁴⁷¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 109.

⁴⁷² *Hopo*, r. 161.

⁴⁷³ *Şivanê Kurmanca*, r. 109.

Gur hat, xwar e, erdikê rûmenî, ha rûmenî, ha rûmenî...^{»474}

Di cejnê de xwarin jî nayê ji bîr kirin: “Wê rojê gelle xwarin- êmek tê çêkirinê, pêz tê şerjêkirinê.” Şivanê Kurmanca, 109. “Kolxozvanan, hebekî ji wan dûr, li nav mêrgan, dest bi xwarinê kirin, xuya bû ku cejin dest pê bû. Çawa ku niha kal dibêjin: “Daweta beranan û miyan kirin, beran berdan.”^{»475}

Piştî beranberdanê jî ji bo şivanan û xwediyê pez dewreke nû ya salê destpê dike:

“Rojekê pey beranberdanê ra me heqê xwe stand. Serşivan, nava berxa berxeke rind dibijêre çewa desteka (destheq, pereyê şivantiyê) xwe; qeydê Kurmanca ewe, wekî xweyê pêz derheqa berxa bijare desteka qe xeber nede. Lê kûlaka (axayên Rûs) dikire qalme- qalm, nedida, hineka jî girt heqê me dibirî. Bega û axalera heqê şivana tamam nedida. Ji nava heqê şivana pêşkêşa xwe yek berx digirt, nedidan. Ewana hila têr nedibûn wê yekê, wekî em nivheq wanra dixebitin.”^{»476}

Ev cejn, gelek bandor li Şemo dike û ew roj qet ji bîra wî naçe: “Îsal çend sal derbas bûn, min ew roja ezîze nava kurmancê koçerda dît, hetta niha hila hê bîra min ne çûye. Ew ken, ew şabûna cahila, kilam û listka wana.”^{»477}

“Kale kala mîya, berxa, kilamêd qîz û xorta tev hev bibûn, ew best û newal tijî kiribûn, meriv wê şabûnê têr nedibû. Gundî tev ji hundirê mala derketibûn, rabûne ser xanîya, sekinîbûn dîna xwe ji dûrva didane kerêd pezê xwe, yê îdî ji gund êpêce dûr ketibûn, hinek jî sekinîbûn ber derîya û axila, dîna xwe didanê, çewa malê wan ber bi zozana eşq şayî diçe. Şaya wa du pa (par, qîst) dikir dewletîya, çimku kesîb tiştêkî wan tunne bû, pezê wan hindik bû, kincê wane teze jî tunne bûn.”^{»478}

Şemo, sedema girîngbûna vê cejnê jî wiha şîrove dike: “Hebûna Kurmanca her pêzdane û malxweykirinêdane, çimku ewana ji pez û dêwêr him hasilê top dikan, him jî nêr dikirin, parçe û hûr mûrê dinê.”^{»479}

⁴⁷⁴ *Hopo*, r. 161.

⁴⁷⁵ *Hopo*, r. 161.

⁴⁷⁶ *Şivanê Kurmanca*, r. 110.

⁴⁷⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 109.

⁴⁷⁸ *Şivanê Kurmanca*, r. 100.

⁴⁷⁹ *Şivanê Kurmanca*, r. 100.

2. 1. 29. Cotkarî

Civaka ku jiyana wê di romanên Jiyana Bextewar û Hopo'de tê vegotin, civakeke gundî ye, loma jî xebata wan a sereke ya aborî cotkarî û ajalvanî ye. Di van qadan de jî gelek tecrubeyên gel hene. Bi taybetî di romana Hopo de gelek mînakên zanyariyê yên derbareyî cotkariyê de tên dayîn. Ji ber ku ew roman, qala serdema rejîma civakparêz dike û di wê serdemê de ji nav gundiyan hinek kes, bi derfet dayîn û piştgiriya rejîmê di zanîngehan de beşa endezyariya çandiniyê xwendine û vegeyriyane gundên xwe, di gundan de jî xebatên çandiniyê li gor zanista çandiniyê tên kirin.

“Emerîkê ku ev giliyên Sertîb bihîst, got:

“Rast e, erd hê zêm e (dêm, ziwa), lê ji bîr meke wexta çandinê bermede; wisa bizanibe çandin jî mîna miyekê ye, wekî heywan di wextê xwe de nezê, ew berx jarik î hûrik e, zû givrik nabe. Nan (genim) jî wisa ye, lawo, wekî di wextê de çandinê nekî, tu yê di axiriyê de poşman bibî.”⁴⁸⁰

Di karê cotkariyê de cure cure alav tê bikaranîn: “Biro, hacetê giha dirûnê pak hazir kiribû: Kêland, destiyê wanî tirmix, xarê tûjkirinê, dezge û çakûç, wekî pê kêlendîya bikutin-tûjkin, hemû tişt wextê da hazir bû.”⁴⁸¹

Karê cotkariyê, bi rêya karbeşiyê tê kirin. Helbet di vir de bandora sîstema Bolşevîkî heye: “Ewî mêr kiviş kiribûn, kê gihê bidrû, kê xurûma û gurza girêde, qîz û bûkê cahil jî gerekê tirmix bikin.”⁴⁸²

2. 1. 30. Esmanasî

Civakê, hinek nav li stêrkan kiriye û hinek wate li wan stêrkan bar kiriye:

“Heta ku Emerîk bi wê kaltiya xwe ber bi vî hevrazê Elegezê yê tîk, ber bi zomeya xwe hat, êdî tarî kete erdê, ew westiya, hêdîka rê diçû, carinan disekinî, li esmanê şîn î tijî stêrk dinihêrî û xwe bi xwe re digot: “Ew stêrkên han “Pêwr- Mêzîn in”, li biniya wan, stêrkên hûr

⁴⁸⁰ *Hopo*, r. 45.

⁴⁸¹ *Jiyana Bextewar*, r. 206.

⁴⁸² *Jiyana Bextewar*, r. 206.

in, dibiriqin, tu dibêjî qey ew genimê me yê qîçik e. Ew stêrka han jî ya Bereketê ye, lê stêrka han a bextewariyê ye, lê kanê stêrka ‘emirdirêjiyê, ez çima nabînim?’⁴⁸³

Stêrk, ji bo tespîtkirina dema rojê jî tên bikaranîn:

“Ez texmîn dikim êdî sibeh nêzîk e. “Helbet nêzîk e, çima tu nabîni Pêwr û Mêzîn êdî li rûesmên tunene, xuya ye sibeh nêzîk e...”⁴⁸⁴

2. 1. 31. Jiyana Aborî

Civaka Kurdan a Erebe Şemo vedibêje, weke me li jor jî got, civakeke paşdemayî ye. Debara xwe bi ajalvanî û cotkariyê dike. Nemaze di Şivanê Kurmanca de, hema bêje, cotkarî jî tune û yekane rêya debara civakê ajalvanî ye. Lê di romanên Jiyana Bextewar û Hopo de rewş diguhere. Civak, li gel ajalvaniyê cotkariyê jî dike. Di dimdimê de jî civak, debara xwe piranî bi ajalvaniyê dike. Li vir hêjayî gotinê ye ku ajalvanî nayê wateya tenê goşt û şîrê ajalvanî û mast û penîrê ji şîrê wan tê çêkirin. Di gel van berhemana ji hiriya pez cûre cûre berhemên weke werîs, kulav, xalîçe, cil û berg û hwd. tê çêkirin û ji welatên cîran karwan tînan van berhemana dikirin û dibin welatê xwe. Loma jî civaka ku di romanên Erenê Şemo de tê vegotin, debara xwe piranî bi ajalvanî û cotkariyê derbas dike: “Mala Emerîkê maleke dewletî bû. Xebata wî malê her kê ekin bûya, gihadirûn bûya, pez û dêwar çêrandin bûya ew xebat gişk xwexatîya malê dikir.”⁴⁸⁵ “Nanê mala Emerîkê berî gişka hate dirûnê û kutanê, genimê xas kirine çala, derî ser girtin her ma zimêrê zivistanê.”⁴⁸⁶ “Heqê pêz bavê min distand. Cara peretî, cara jî genim. Serê pezekê yan dewarekê diket nîv kîlo yan kîlok genim. Ji ewlê biharê hetta paîzê.”⁴⁸⁷ Xebatên aborî ger ne rasterast ajalvanî û cotkarî be jî, bi wan qadan ve girêdayî ne: “Dîya min diçû, mala de dixebitî: hirî dişûşt, şe dikir, dirist, tevn çêdikirin.”⁴⁸⁸

“Hinek ji wan diçûne mêşe (daristan) . Dar dibirrîn, bi piştan dianîn çarsiyê difirotin an diçûne mêşe, dar dişewitandin, dikirine komir (rejû), dianîn difirotime hostexaneyan, xwarinxaneyan û malan.”⁴⁸⁹

⁴⁸³ *Hopo*, r. 108.

⁴⁸⁴ *Dimdim*, r. 242.

⁴⁸⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 12.

⁴⁸⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 18.

⁴⁸⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 58

⁴⁸⁸ *Şivanê Kurmanca*, r. 56.

⁴⁸⁹ *Dimdim*, r. 23.

Axa û beg, kesên feqîr deyndar dikin û deynê xwe bi faîz ji wan distînin: “Selef (faîz) meh bi deh zêde dibûn, mînanî nîrekî diketine stuyê kesîba.”⁴⁹⁰

2. 1. 32. Jiyana Koçeriyê

Di her çar romanên de jî, bandora koçeriyê li ser jiyana mirovan xûya dike. Ji ber ku ebatên wan ên aborî hema bêje tenê ajalvanî û cotkarî ye, bi tevgera pez demsal tên hesab kirin: “Gava ku serê pêz dikeve, pêz dizê, Kurd wê wextê hesab dikin êdî bihar e.”⁴⁹¹ Xebatên Kurdan ên aborî, heya dîrokeke nêzîk, piranî ajalvani û cotkari bûn. Sedemekî vê yekê taybetiya erdnigariya welatê wan jî bû. “Li vir, li serê van çiyayên bilind î bêwar kê dikaribû hîmê avahiyên xwe çêbike û bijî li nava guran, hirçan, keftaran û gakûviyan? Her Kurd...”⁴⁹²

“Kurmanca a va çiyadanin. Li wan çiya heye çêrê rind. Li wan deran diçêrin û kok dibin kerî- sûrîyê wan. Zivistanê çiyayê wan berfeke kûr lêdikeve, lê gava ku bihar tê, berf dihele, şînayî şîndibe, wan dera cûre cûre pincar, kulîlk, ormex û tiştê mayîn lê şîndibe. Hine şînayî unda dibin, dewsa wan hineke dinê şîndibin. Kulîlk jî ussa ber hev têne guhastinê.”⁴⁹³

Silêman Xan got:

“Lewma dibêjin, Kurd mêrivên çiyê ne. Em hê li Tehranê bûn, Bekîr Beg dizanbû li vir êdî berf ketiye.

Belê ez xulam, em dek û dolabên hewayê dizanin, çimku em timî li ber hewayê ne û hê di zarokatiyê de texmîn dikin guhestina wê, lewma jî, wekî Kurd li tavê binihêre, an li heyvê binihêre û li esmên binihêre, ew êdî dizane çî guman dide ew roj û rojtira din, çî ka wê sayî be, an baran be.”⁴⁹⁴

“Beledî li pêşiyê bû, merî li Pêwr- Mêzîna⁴⁹⁵ dinihêrî nava wan çiya û mêşa bê rê diçûn.”⁴⁹⁶ “Jîyîna gundê Kurmanca tiherekî dinê bû. Meriyê melegana, gişke ekîncî bûn. Lê Kurmanca gişke koçerîn, dêwêr xwey dikin, gundê wan du pa li çiyadanin.”⁴⁹⁷ Ji ber ku xebata wan a aborî li ser ajalvanî û cotkariyê bû, di van qadan de bûne pispor: “Ew berxê ku di wextê de têr şîrê xîç (firo) dimêje, zû qewet digire û ew berx li ber nexweşiyên

⁴⁹⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 59.

⁴⁹¹ *Dimdim*, r. 87.

⁴⁹² *Dimdim*, r. 238.

⁴⁹³ *Şivanê Kurmanca*, r. 96.

⁴⁹⁴ *Dimdim*, r. 79.

⁴⁹⁵ Pêwr û Mêzin: Stêrk in, Kurdên koçer şevê bi van stêrkan rê nas dikin.

⁴⁹⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 38.

⁴⁹⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 96.

xurt dibe.”⁴⁹⁸ “Meriyê ahil, wekî sibe radibûn, li çiyayê Sîpanê- Xelatê dinihêrin; zanibûn ew roj wê çawa derbazbe, baranê bê, yan na. Jiyana Bextewar, r. 85. “Gur zaf ji êgir ditirsin.”⁴⁹⁹ Şivanekî rindî serwaxt wê dengê Qewreşra bizanbîya,- ew dengê ji sê dihat her dengê seyê diçine gura bû, ne dengê seyê here merîya.”⁵⁰⁰ “Lao, pez carna jariyê dikeve. Xûnê gerekê jê bidne berdanê, wekî heywanet telêf nebe.”⁵⁰¹ “Ewlê biharê pezê qira diçêre, timê şoreketê dikeve, hûn wî çaxî miqat bin, nehêlin pez şoreketa ewline biharê zaf bixwe, bavê çêrê gengezê ji hemûkan çêtire.”⁵⁰² “Gava ku miyek dikale, ji şivana re eyan e çima dikale. Tî ye, birçî ye, an bêriya berxa xwe kiriye.”⁵⁰³ “Roja pêşîn em gellekî neçûn, me pez hêdî dileqand, wekî berx xam nebin û bikarbin herin, derkevne zozana bi serê çîya.”⁵⁰⁴ Bazîdî jî balê dikişîne li ser pisporiya Kurdan a di warê ajalvaniyê de:

“Û ekradan da jî pispor heyîn. Ko hezar berxan tevî hevdu dikan, ew pispor têtin û li wan berxan yeko yeko vediqetînin û davêne ber dayê (miyê), yekî nahêlin.”⁵⁰⁵

“Wekî cara jî em rojê radizan, me danî nêrî bi destê xweva girê dida, wekî pez bileqe, em pê bihesin. Çimku pez xwe nêrî digirt, dûr nediket. Alîkîva jî, wekî pez bi tiherekî ji vî bileqîya, biçûya, nêrî radibû, pey pêz here, em kaş dikirin, dest xweda em pê dihesîyan.”⁵⁰⁶

“Ca bibêje, te çawa nêrî hîn kiriye, wekî radibe ser dikê, li ser kulavê te mexel tê?”⁵⁰⁷

“Sibeh ku safî dibû, Emerîk derdikete derve û li esmên dinihêrî. Gava ku wî li esmên dinihêrî, dizanibû bihara îsalîn wê çawa bibe. Di gund de, mirovên wekî emerîkê kal dizanibûn qanûnên tebetê: Heke zivistan be, heke bihar be, heke havîn be û payîz be.”⁵⁰⁸

“Lawikno, aqilê min î birî, bihareke rind ber bi me tê. Havîn jî xerab e, her wisa bikin bi paş de nekevin.”⁵⁰⁹ “Ku bihar hat, her sibeh radibû, li esmên dinihêrî. Ji ber ku hê di xortaniya wî de Çiyayê Sîpanê Xelatê ji wî ra bibû mîna defterekê, wî her gav li Çiyayê Elegezê dinihêrî û

⁴⁹⁸ *Dimdim*, r. 88.

⁴⁹⁹ *Şivanê Kurmanca*, r. 69.

⁵⁰⁰ *Şivanê Kurmanca*, r. 70.

⁵⁰¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 57.

⁵⁰² *Şivanê Kurmanca*, r. 58.

⁵⁰³ *Hopo*, r. 75.

⁵⁰⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 101.

⁵⁰⁵ Bazîdî, h. b., r. 83.

⁵⁰⁶ *Şivanê Kurmanca*, r. 104.

⁵⁰⁷ *Hopo*, r. 22.

⁵⁰⁸ *Hopo*, r. 177.

⁵⁰⁹ *Hopo*, r. 178.

tê derdixist wê rojê hewa wê çawa be.”⁵¹⁰ “Bila erd hinekî zuha bibe, xwe em di nav heriyê de trextoran nadin xebatê!”⁵¹¹

Kurd, ji demên berê de bi ajalvaniyê mijûl bûne. Loma jî ji goşt gelek hez dikin. Ev yek di rûpelên romanên Şemo de jî tê dîtin ku gava behsa xwarinê tê kirin, di serî de behsa goştê tê kirin: “Nançandin hemû pak e, xêr û bereketa heywanê çarpê zêde ye. Em Kurd bê goşt û şîr nikarin bijîn. Mêrê Ecem dikare bi pincara bostanan jî bijî.”⁵¹²

“Timî dema ku li meclîsa Xano diciviya, wê çaxê li dîwanxaneyê bo hurmetê nanê meclîsê didan. Îro jî, çend pez hatin şerjêkirin, cara pêşîn kivavên şîşan da, paşê taskivav, di pey wan re qeliya sêlê bi sîremastê bolme û sînî tijî li ser texteyan belav dikirin. Xulaman şerbet bi gumuman belav dikirin.”⁵¹³

Di jiyana koçeriyê de gelek adet hene. Dema bûyerek pêk tê li gorî van adet û rêbazan têv digerin:

“Gelle şixul û gilî- gotinêd Kurmanca min nizanbû. Bavê min ez hîn dikirim, ji mira digot:

“Lao, ev eşîrin, evana ne Meleganin. Berêda halê wan dewar xwey kirine. Gerekê tu bizanbî çewa xweyê pezra xeberdî...”

Qeydê Kurmanca ew bû, wekî em dihatne dolga û wexta serê pêz diketê, her Kurmancekî zadê serê pezê xwe çê dikir; mirtoxe, kuloç, pez şerjêdikirin. Gazî cînara, şivana dikirin, nanê serê pêz didan. Malxwê mala û kulfetê wan dihatin, ser mêvana ra disekinîn, lava dikirin, wekî mêvan şerme nekin, nan bixun. Pey nan xwarinê ra cahilên wan û şivanan govend digirtin, dilîstin, kilam digotin; ji kilama tevî rindtir kilama serê pêz bû. Xorta dor bi dor, qîza lê vedigerand û dilîstin. Gelle kêf, henek, laqirdî dikirin, hetta dibû êvar. Wexta ew kêf, henek, laqirdî kutta dibûn, teva izna xwe ji malxwê malê, kulfetê malê dixwastin, diçûn. Hema izin xwastin jî, tiştêkî way meşqûl bû, çimkî min hê nedîtibû; min dîna xwe dayê, û pak tê bîra min, - axê min û kulfeta xweva sekinîbûn, xelk diçû û wa digotin:

“Kevanî belkî (Îşile) destê te ji eyarê rûn dernekeve. Belkî yeka bibe hezarî. Belkî hûn silametî derbas kin li zozana, malê we silametî ji zozana dagere, bê.”⁵¹⁴

⁵¹⁰ *Hopo*, r. 177.

⁵¹¹ *Hopo*, r. 23.

⁵¹² *Dimdim*, r. 97.

⁵¹³ *Dimdim*, r. 163.

⁵¹⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 97.

“Wan rojên ku serê pêz diketê, şivan jî firnaq dibûn, ji ber ku wan rojan şivanan ji berxên virnî yên teze zayî ji xwe re berxên rind dibijartin, dikirin destek, êdî mezin dibûn, dibûn kavir, şivanan ji xwe re dibirin û xwediyê wan kaviran qet dengê xwe nedikir, ji ber ku ew edet û adaba Kurdan bû.”⁵¹⁵

“Rêda her kevanîk parê xwe dide, çiqas rûn, penêr, toraq girtine. Mêr jî rêda hesab dikan, çîqa çiqas digre rûn, penêrê firotanê, pezê goştî, wekî bifroşin, xwera genim, ceh, birinc, şekir, çay, niftê û hûr mûrê dinê bikirin. Hîla hê rêda hinek îdî çolê xwe zivistanê û pîgara kivş dikan. Bûkêd teze, jinêd cahil payê xwe didin, çiqas rûn, hirî dane çerçîya, xwera morî, bişkuk, neynik, derzî û sedef kirîne. Xort û qîz rêda dizîkava hev mukur tên, gilîyê xwe dizîkava hevra dikan. Xorta paya didine xwe, çewa qewil- kirîyar dane hevdu, wekî ew dilketîyêd xwe hevdu bistînin. Hinek xort jî yê soz dane hevdu, wekî xuşkê xwe hevra têne berdêlî. Cahil hevra dibên, çewa havînê li zozana wan ra pak dihat, eşq derbas dikir. Tê bîra wan, ber tume soyê wan tumê kulîlka çewa ew û dilketîyê xweva cem hev rûniştibûn, çewa li cîkî ava kanîya sar dixwarin. Pak tê bîra wan, çewa wana xwe ji ber çavê dê û bavê xwe vedişartin, diketne ken, henek û laqirdîya, çewa destê hevda sond dixwarin, wekî xên ji hevdu kesekî nestînin. Xorta ji cêvê xwe derdixist dezmalê ser desta neqîşandî, dest, zendik, berstu û teliqê neqîşandî, yê ku dilketîya wan ji wanra dirûbûn, neqîşandibûn û dabûne wana, wekî hevdu bîr nekin.”⁵¹⁶

“Îro guran hindik mabû kavirek bidiziyana bibirana. Kelb pê hisiyar, ji guran standin û kavir wisa birîndar kiribûn, êdî silamet nedibû. Emerîkê izin da şivên, şerjêkir. Bi qeydeyê şivantiyê, dil û hinavê wê dan kelban, herçî mayîn jî kirin qelî, wê niha bidin rênçberan.”⁵¹⁷

Beriya gişan serşivên çîtiyê pêşîn hilda, paşê xortan dest bi xwarinê kirin.”⁵¹⁸

“Lawo, kareke ji ser zinêr da baz da bû. Tu dizanî kar çiqase nehs in. Lingên wê yên pêşîn sikestîbûn. Min lê nihêrî ku ew ling nacebirin, min şerjêkir. Çawa edet bû, min hinek da berxvan, ê din jî kire qelî.”⁵¹⁹

“Evana ne mîna eşîra me, Kurmancanin yê ku pezê gura xwarî ji şivana nestînin.”⁵²⁰

⁵¹⁵ *Dimdim*, r. 94.

⁵¹⁶ *Şivanê Kurmanca*, r. 108.

⁵¹⁷ *Hopo*, r. 65.

⁵¹⁸ *Hopo*, r. 110.

⁵¹⁹ *Hopo*, r. 141.

⁵²⁰ *Şivanê Kurmanca*, r. 69.

Şivan, bi mehan li zozanan dimînin. Ji gund û bajaran, ji dê û bavan û ji jin û zarokan dûr dijîn. Ji bo mijoldariyê, roj borandinê hinek lîstik pêwîst in. Loma jî li zozanan, li ber pez hinek lîstik jî tên lîstin:

“Em dûajoyê şivana, şivanêd cahilê çolê, gelle cara xwera dilîst. Me pezê xwe nêzîkî hev dikir û dilîst. Lîstika me govend bûn. Kilam bûn û qeydê şivana bûn. Carna jî her yekî danî beran berî hev didan; beranê kê zor didayê, ewî oyîn dibir. Ji lîstka tevî bîna me bi bilûrê derdiket, me dor bi dor qeydê rind bilûrê dixist û bîna me pê derdiket, me rojbihêrîya xwe pê dikir.”⁵²¹

“Hinek xortên henekbaz, kulavên şivanan ji wan didizîn, vedişartin, paşê digotin: “Tu çawa şivan î? Te kulavê li ser milê xwe winda kiriye, sibehê tu yê keriyê pêz jî winda bikî.”⁵²²

Ji ber ku av û zozan ne malê tukes e, û ji bo her eşîrê xwedî girîngiyêke di asta man û nemanê de ne, her tîm li ser wan şer tê kirin. Mirovê kîjan eşîrê zêdetir be, kîjan eşîr xurt- tir û bihêztir be, ew zozan û av wê salê digihîje wê eşîrê:

“Ji ber ku biharan berf heliya, li quntarên çiyayan heşînayîya teze şîn dibû, li deştê jî germ diqijilîne, pez êdî nikare biçêre, wê çaxê Kurd pezê xwe bere bere dibin nêzîkî berfê, ciyên hênîk û ciyên çêrexweş. Ew qijle hem wisa ji biharê heta payîzê vala dimîne, qet piyekî heywanekî pê nakeve, heta payîzê çêre û mêşe lê şîn dibe. Wextekê, li ser van qijle û zozanan gelek caran şer û d’ew diqewimîn, heta mêr jî dihatin kuştin. Gelek xwîn dirijiya. Çêreyê rind, heke qijleya rind, an jî zozan be wî merîvî zeft dikir, mêrên kê zehf bûn, qeweta wan zêde bû, ew yek diqewimî.”⁵²³

“Li zozanan, bû şerê me û eşîra Şîkakan. Şerê me li ser zozanan bû.”⁵²⁴

Jiyana koçeran, li gorî demsalê tê sazkirin. Ew ê kengî biçin zozanan, kengî vegerin deştê û hwd.:

“Biharda koçer mîna eskerekî, pey berfê dikevin, diçin, her berf dihele, dewsa hine wan ra reş dibe, koçer diçin, lê datînin; wexta hine berf dihele, dîsa bar dikin, pey berfê dikevin diçin; wî tihêrî ew diçin derdikevne serê çîya, çîyê dûr. Paîza jî berf dide ser wana, ewana jî ber berfê bere- bere direvin, têne deşta, li qijlê xwe datînin. Eva yeka dibe wî çaxî, wextê li deşta paîz dikeve, îdî baran tîmê dibare, li qaxa tijî av dibe. Serê çîya jî îdî teyrok û berf

⁵²¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 105.

⁵²² *Dimdim*, r. 94.

⁵²³ *Dimdim*, r. 154.

⁵²⁴ *Dimdim*, r. 104.

dibare, dewar û însanet îdî ji sermê teyax nake. Paîzê jî kêfeke rind, şayîke pak nava Kurmancada heye, çimku wexta dagêrê malê wan goşt digre, şivan û gavan jî şa dibin, îdî heqê wan nêzîk dibe, gerekê heqê xwe bistînin. Ew roja ezîze paîzê dibe beran- berdan. Ne notla roja eyda beroberdanê bû, wexta biharê dibû. Niha eşqe kême.”⁵²⁵

“Her sibe dîya me nan û xwê dadigirt û digot: - Lao, nanê we hindike, lê îdî hûn biharê ketine, xwe ra pincarê biçinin, pêz bidoşin, pê nanê xwe bixun.”⁵²⁶

“Ma du heftê wekî reşêle (reşemî, sibat) bên, hema hatina reşêlera eme xilasîn, çimku roj bi roj av ji berfê dixwe, îdî berf dihele. Bavê min jî hesab dikir, - çika çend ro man, wekî îdî em xwera rênçberfê bigrin.”⁵²⁷

“Bihar hat, îdî belekî ketne erdê⁵²⁸. Me jî karê xwe dikir, wekî ber bi gundekî dinê herin.”⁵²⁹ Şivantî karekî gelek zehmet e. Bi mehan li çolê dimînin û di destpêka paîzê de di rewşeke perîşan de vedigerin gundan: “Wextê baran û teyrok dihat, em diketne qefê zinarâ, şikevta; wekî ew jî tunne bûn, em diketne kendala û newala.”⁵³⁰

“Ji çîya em hatne deşta pêxwas, çarixê lingê me qetîya bûn, ser wan kevira û zinarara em nêzîkî hevtêkê şev – ro rê dihatin. Kinc li me lape peritî bûn. Me pezê kuleka jî cara ser piştâ xwe dibir, çimku pêzra askar nedibûn. Ji hirîya berxa kevn, bavê min mira kolosek çê kiribû, lê kolosê minî zafî hişk bû, kevîyê kolos guhê min û stukura min dikutan.”⁵³¹

2. 1. 33. Naskirina Giyayan

Di jiyana koçeriyê de, naskirina giyayan û xwe bi wan têr kirin gelek girîng e. Ji ber ku li çolê carînan ji xeynî giyayan tu xwarin tune û şivan neçar e wan giyayan ji hev nas bike. Divê şivan bizane kîjan giya tê xwarin û kîjan nayê xwarin. Loma jî, ên ku nû dest bi şivantiyê dikin, yekî pisporek bi wan re diçe ber pez û giyayan hînî wan dike:

“Rojâ ewilne em çûne ber pêz. Wê rojê dîya min jî me ra hat, nîşanî me dida pincara çolê: Siping, tirşo, mendik û yên mayîn. Bi wê pincarê me, rênçberê çolê gerekî nanê xwe bixwara.

⁵²⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 107.

⁵²⁶ *Şivanê Kurmanca*, r. 57.

⁵²⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 90.

⁵²⁸ Berf dihele û ax ji bin berfê hedî hedî xuya dike.

⁵²⁹ *Şivanê Kurmanca*, r. 93.

⁵³⁰ *Şivanê Kurmanca*, r. 104.

⁵³¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 104.

Dîya me mera nêzîkî heftêkê dihat, her carê du sê seheta zêde nedima. Me ku pincar ji pincarê nas kir, îdî diya me mera nedihate çolê."⁵³²

Di şivantiyê de naskirina giyayan ewqas girîng e ku ew îşareta pisporiyê ye:

“Êvara, wextê em dihatine mal, diya me şîv dida me; ser şîvê dibû xebardan derheqa nanxwarinê û pincara çolê. Lawika digot:

“Kesek notla Ereb pincarê nas nake, em bîr dikin. Ereb pincarê nîşanî me dide, me hîn dike.

Dîya min şa dibû û digot:

Kurê min aqile, wekî mezin be silametî, kurê minê bibe serşivanekî pispor.”⁵³³

2. 1. 34. Kon

Koçer di konan de dijîn. Biharê dema bar dikin diçin zozanan, konê xwe radikin û bi rê dikevin, koç dikin zozanan û konên xwe li wir vedigirin. Payîzê jî konên xwe radikin û tèn deştê, vê carê konên xwe li wir vedigirin. Mezinbûna konan bi hejmara stûnê wan tê zanîn. Di nav konan de jî kona herî têr stûnê konê serokê wê eşîrê ye:

“Konên ekra dan jî derece derece dibin. Ji du istûnan heta neh istûnan kon heyîn. Ji neh istûnan zêdetir kon nabîtin. Ê ko gelek jar e, du istûnî sê çar. Êd ewset⁵³⁴ jî pênc û şeş û heft. Ê ko axa ne û bi zêde dewlet in konê neh istûnî dibin.”⁵³⁵

Bi vî awayî kon dibe xaniyê koçeran:

“Emerîk fesal çû pişt kon, lê ecêbmayî ma, ewî konê usa mezin emra xwe da qe nedîtibû, her çîroka da bihîstibû. Konî neh stûnî bû, usa mezin û bilind bû, wekî merî karibû sîyara hespê xwe tê da bigeranda. Cîyê mêvana çît û perde mînanî koşkekî mezin bû.”⁵³⁶

2. 1. 35. Avahî

Di romana Hopo de tê destnîşankirin ku xaniyên li gundan pêşîn di bin erdê de bûn û dûvre xaniyên nûjen hatin çêkirin:

⁵³² *Şivanê Kurmanca*, r. 57.

⁵³³ *Şivanê Kurmanca*, r. 57.

⁵³⁴ Wasat, navîn.

⁵³⁵ Bazidî, h. b., r. 123.

⁵³⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 151.

“Wî dît di nava wan pênc salên ku ew çûbû Êrîvanê de, gund lap hatibû guhestin. Êdî ew xaniyên berê yên bin erd qe tune bûn. Xanî giş ji kevirên tûfê yên birrî hatibûne avakirin.”⁵³⁷

“Ji bo xebata Hopo ya pak kolxozê ji wî re xaniyekî teze ji kevirên tûfê yên sor çêkiribû.”⁵³⁸

Di xaniyên Kurdan de dîwar, bi cûre cûre alavan tên xemilandin:

“Li dîwarên dîwanxaneya Xano, giş xalîçe pê de dardakiribûn. Çek û sîleh bi ser wan xalîçeyan de dardakiribûn, te digot qey ev cebirxaneya Xanoyê Çengzêrîn e. Ê çi tunne?! Gurz û kebend, tîr û kevan, cure cure şûr û mertal, rimên movikkirî, pîsto, çend heb jî kirasê zirxî dardakiribûn. Di nava wan çekan de, cureyekî gelek mezin î biber hebû û hebekî kêr bû. Destiyê şûr zîv bû, lê bi zêr kilda bûn, tetikê şûr tamam ji zêr hatibû çêkirin û dibiriqî. Li fêza wan sîlehan, dîsa li dîwêr, li ser xalîçeyan bi cêrge gelek serên dehbeyan dardakiribûn. Li vir serên guran, hirçan, kurebeşkan, xirnikan, şêran, pilingan, gakûviyan, bizinên kûvî, beranên kûvî bi strûyên wan ên badayî, roviyan û kêwrîşkan hebûn.”⁵³⁹

“Li wan dîwarê odê da hatibûn darda kirinê struyê gakûviya, struyê biznê kûvî, pencê hirça; alîkî dîwarê dinê darda kiribûn, perê teyrekî zef mezin bû, ew per te digot konekî mezinî şêş, hevtê stunî bû, ewqas mezin bû, pencê wî ji bêhûde mezin bûn, ji ber wî teyrî, çawa Resûl begê gilî kir, tişteke xilaz nabe, ne berx ne jî rûvî û kêwrûşk, hila carna li gura dixê cendekê pêz jê distîne.”⁵⁴⁰

Li cem xaniyan, di gundan de ji bo ajalan jî axur hatine çêkirin: “Alîyê rohilatê gomek (axur) mezin bû, kêleka mala mîna tewla dêwêr bû, cîyê çêleka, ga, gamêşa û hespa ewqas mezin bû, ew jî bêndera wa bû.”⁵⁴¹

Li gorî pêwîstiyê hinek beş li xaniyan hatine zêde kirin:

“Li wê derê orta malê û gomê da çalêd nan bûn. Dora çala sûreke mezin î bilind çêkiribûn. Alîkî vê sûrê vekirî bû, ew jî bona ereba: wî derî ra nan dianîn, dikirine çala, yanê jî wextê lazim bû, li ereba bar dikirin derdixistin.”⁵⁴²

Di nava malê de jî, cure cure alavên jiyanê hene:

⁵³⁷ *Hopo*, r. 78.

⁵³⁸ *Hopo*, r. 33.

⁵³⁹ *Dimdim*, r. 126.

⁵⁴⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 54.

⁵⁴¹ *Jiyana Bextewar*, r. 13.

⁵⁴² *Jiyana Bextewar*, r. 13.

“Oda Resûl axa, odeke fire, mezin bû, fêza begirê li dîwêr, qasî bejna merîkî bilind, du peltik hebûn. Wan peltika da misînê qawê, fincanêd qawê, conîyê qawê te da dikutin, wê derê hebûn qotîyêd çûk bona şeker, çayê mêxik û darçînê danîbûn. Li erdê û dîwara xalîçe bûn. Li ser xalîçe dîwara da şûr, qeme, mertal, piştî û du tîfing darda kiribûn.”⁵⁴³ “Orta odê vekirî bû, binpîya odê du dîke ji darê gûzê mînanî qutîya hatibûne çêkirinê. Kesperê kirivê wî ewana kaw (xweşik) nexş kiribûn. Yekî da qelûnê cîgara, serîk cîyê koxîdanga, desteşo, pêşgir û sabûn, ya din da jî tijî barût, gule û fîşekê vala bona nêçîrê danîbûn.”⁵⁴⁴

Di malan de tenûr, him ji bo nan pehtinê him jî ji bo germ kirina malê tê bikaranîn:

“Berev kirina pincarê û topkirina sergîna hevekî halê me xweş kir. Wê zivistanê, wextê me pez li mala bela kir, xanîyê- em têde diman, îdî germ bû. Ardûyê êpêce hebû. Dîya me eşq û dil tendûr dadida. Wextê tendûr gur dibû, em dora tendûrê rûdiniştin. Lê çaxê dîya me nan dipat, kutta dikir, danî pot û palasê me davîte ser tendûrê dinixamt. Wekî, tendûr sar nebe, em şevê serma nekin. Êvara em tev rûdiniştin dora tendûrê, nivînek jorda davîte ser tendûrê û lingê xwe têda germ dikir.”⁵⁴⁵

2. 1. 36. Xalîçe û Kulav

Di romana Dimdim de bi berfirehî behsa xalîçe û kulavên Kurdistanê tê kirin. Ji ber ku di aboriya Kurdan de xwedîkirina pez cihekî mezin digire, çêkirina berhemên ji hiriya pez gelek pêşketiye. Kurd, bi hiriya pez cure cure alavên malê çêdikin: “Dîlberê li ber derî bû, wê di wê roja tava xweş de, xalîçe, emenî, zilî, kulav derxistibûn derve, ji toz û xubara zivistanê paqij dikir.”⁵⁴⁶ Ev xalîçe û kulav di hostexaneyan de bi awayekî pisporî tîr çêkirin: “Cêrgeke hostexaneyan giş dençî bûn; di wan hostexaneyan de, rîs rengrengî dikirin ji bo xalîçeyan, emenîyan, ziliyan, berran, xurcan, piştên jinan û tiştên mayîn.”⁵⁴⁷ Xalîçe ji aliyê jinên Kurd ve bi nîgarên xweşik tîr nexş kirin:

“Cêriyê xalîçe anîn, li ber Eyšê Xanimê danîn. Wê xalîçe raxistin û nîşanî Nenê dan. Çavê Nenê ku bi nexşên xalîçeyêd kaw ket, ecêbmayî ma: Gakûvî, çilape kiribû direviya, nêçîrvên jî, çok danibû erdê, ku tîr û kevanê bavêje gakûvî.”⁵⁴⁸

⁵⁴³ *Jiyana Bextewar*, r. 54.

⁵⁴⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 54.

⁵⁴⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 59.

⁵⁴⁶ *Dimdim*, r. 27.

⁵⁴⁷ *Dimdim*, r. 21.

⁵⁴⁸ *Dimdim*, r. 146.

“Çû kete dîwanxaneyeke mezin î fireh. Li erdê vê dîwanxaneyê, xalîçeyeke mezin raxistibûn. Di vê xalîçeyê de, nexşên gakuviyan, karên gezealan û dehbeyên mayîn hebûn.”⁵⁴⁹

Sedema pêşketina Kurdan a di çêkirina xalîçe û kulavan de, xwedîkirina pez e:

“Kurdan ji pêz kar didît, ne ku bi tenê çawa ji ên kok, goşt, şîr û rûn, kareke mezin jî distandin ji hiriyê pêz. Ew hirî dihate firotanê. Xên ji firotanê ji wê hiriyê xelîçeyên xas, emenî, zîlî, lop, carcîm, xurc, têt, çewal, werîs û tiştên mayîn çêdikirin.”⁵⁵⁰

Kulav, ewqas di çanda Kurdan de cî digre ku, dema artêşa Îranê ber bi Kela Dimdimê ve têt, mezinên eşîran ji bo şewra mezin, di baxçeyê dîwana Xanoyê Çengzêrîn de li ser kulavan rûdinin:

“Serdîwan ji der de hat, got:

“Maqûl, hinek mezinêd qebîleyên me, ji hêlêd dûr hatine, giş li vir bi cî nabin. Em herin bêxçe, êdî bihar e, hewa xweş e. Berê pêşîn Xano rabû, di pey wî re cimaet rabû û derketin. Gava ku ew hatin bêxçe, li wê derê ji sed kulavî zêdetir raxistibûn. Li ser kulavan balgiyên tenik û nerm danibûn, ji bo ku mêvan bidine ber pala xwe.”⁵⁵¹

Ew xalîçeyên ku li Kurdistanê têt çêkirin, li gelek welatên cîran miştêrî dibînin û xalîçeyên Kurdistanê li gelek welatan têt firotan:

“Xelîçeyên Kurdistanê li Tehranê, Bexdayê, Dumuşqê (Mûsilê), Beyrûdê û Stenbolê zehf bûha dikirin. Lewma her sal ji wan welatan bazirgan dihatin, ne ku bi tenê hiriyê bikirrin, wan xalîçe, emenî, zîlî û tiştên mayîn kurrîn, bi barên deve û qantiran dibirin.”⁵⁵²

2. 1. 37. Seyrana Bindarokê

Di Jiyana Bextewar de behsa seyranekê têt kirin û têt gotin ku ew seyran di nav Kurdan de bûye adet:

“Nava êla Sîpka da, çawa nava hemû Kurmanca da, bû bû edet, havînê wextê mêrg- çîman kulîlka didan, pincar zêde şîn dibû, qîz û xort diçûne bindarûkê. Qîza ji mal rûn, ar, hêk, gezo û tiştêd mayîn danî. Li bindarûkê, çolê du sê qîzan xwarin çêdikirin, çend xorta jî pesarî top

⁵⁴⁹ *Dimdim*, r. 249.

⁵⁵⁰ *Dimdim*, r. 177.

⁵⁵¹ *Dimdim*, r. 100.

⁵⁵² *Dimdim*, r. 177.

dikirin, yê mayîn jî govend digirtin, dilîstin, laqirdî dikirin heta êvarê. Li êvarê mirtoxe, hewle, yanê jî hêkerûn dixwarin, paşê vedigerîyan dihatne gund. Rê va tulum lêdixistin heta nav mala.”⁵⁵³

2. 1. 38. Zibare (Palûte, Îmece)

Ji bo kombûn û şixulîna gelek kesan a di civakên gundewarî de ku karê kesekê yan jî malbatekê, bi yekîtiya kedê tê pêk anîn û bi vî awayî karê her kesî bi dorê tê kirin, zibare tê gotin.⁵⁵⁴ Di gundan de gelek xebat bi rêya zibareyê tên kirin. Gundî, di rojêke diyar kirî de diçin mala yekî/ê yan jî zeviya yekî/ê û ji bo wî/wê belaş dişixulin. Ev yek bi dorê û ji bo hemû malbatan tê kirin û bi vî awayî xebat li ser gundiyan sivik dibe:

“Ehlên Eşîra Beroderan li kelê di gundan de jî gazî zibareyan dikirin, wekî hiriyê veçirin, paqij bikin, şeh bikin û birêsin. Li kelê, malên wisa hebûn, du hefte an sê hefte zibarê di malên wan de dixebitîn. Mala Adî jî, gazî zibareyan kir.”⁵⁵⁵

Pêşiya destpêkirina şixulîna ji bo zibareyê, xwediyê/a malê di nav kesên hatîn bişixulin de karbeşiyê dike:

“Ne îro roja ewilîn î zibarê ye. Roja ewilîn, çawa diyar e, keç timî hebek dereng tên, çimkî wê êvarê xweyiya malê, wê bibêje çend keçê li ser veçirandina hiriyê bin, çend keçê li ser şehkirinê bin û çend keçê wê hiriyê birêsin. Lê roja din, wê êdî her roj ji sibehê de bîn.”⁵⁵⁶

Her wiha bi hinceta zibareyê mirov tên cem hev û ji bo sohbetê, kêfê û govendê derfet çêdibe:

“Ji berê de bibû edet: Wexta ku zibareyan xebata mala kê kuta dikir, li def û zurneyê dixistin, xort û keç diketine govendê dilîstin, kêf dikirin heta nivê şevê. Paşê kevaniya malê malavayî digote wan û xort û keç bi def û zurne lêxistinê di kuçeyan re diçûn malên xwe.”⁵⁵⁷

⁵⁵³ *Jiyana Bextewar*, r. 13.

⁵⁵⁴ Toparlı, h. b., r. 962.

⁵⁵⁵ *Dimdim*, r. 178.

⁵⁵⁶ *Dimdim*, r. 178.

⁵⁵⁷ *Dimdim*, r. 180.

2. 1. 39. Xwedîkirina Hespan

Ji demên dîrokî û vir ve, pesna hespên Kurdistanê tîn dayîn. Bazîdî jî vê yekê piştrast dike û wiha dibêje: “Û hespêd spehî û cîns di nêv wan de heyîn. Çar cîns hesp heyîn: Kehêl, Hed, Seglawî û Mî’enneg.”⁵⁵⁸

Romana Dimdimê, vegotina destaneke klasîk a mîrxasiyê ye. Loma jî di vê romanê de behsa karakterîstîka hespên Kurdan tî kirin û taybetiyên hespên baş tîn rêz kirin:

“Bekirê esnafê hespê Kurdan wiha qise dikir:

“Hespên Kurdan ên kihêl, guhên wan kin in û biçûk in, simên wan girover î ne mezin in, singên wan fireh in, serên wan biçûk in, stuyên wan kêr in, ew hesp timî jar in, qet kok nabin, ji meriv tirê êlif kêr didine wan heywanan, ev hesp jî debrê kêr dixwin, dikarin gelek rojan bê av û bê debir teyax bikin. Ji kêhilê Kurdan re riya kevir î zinar, çiya, gelî yan jî qumqumasîtan yek e. Tu ruhberê çarpê jî, ji ber beza wê xelas nabe, heta karêd xezalan jî xelas nabin. Ew heywan gelekî famdar e, her gav siwarê xwe li xwe dike.”⁵⁵⁹ Piştî van agahiyan jî tî gotin ku ji gelek welatan kes tîn Kurdistanê û hespên Kurdan dikirin: “...Lewma ji hemû welatan, bi hewes dikirin û diwin (dîbin).”⁵⁶⁰

2. 2. Wêjeya Devkî

2. 2. 1. Gotinên Pêşiyên

Gotinên pêşiyên, di nava civakê de weke tecrubeya bav û kalan tî zanîn. Dema behsa biryar standinekê tî kirin ev gotin tî bibîranîn ku tecrube bêbikaranîn. Yan jî ji bo îspat kirina ramenekê serî li gotinên pêşiyên tî dayîn. Ensar Aslan (1944-) jî balê dikişîne li ser van taybetiyên gotinên pêşiyên û wiha dibêje:

“Gotinên pêşiyên, gotinên girîng, gotinên puxtedar in. Ev cûre gotin, raman, dîtin û şîretên sedan salî yê derbareyî bûyerên hatine jiyîn de, bêtî ku biguherîne, radigihîne roja me.”⁵⁶¹

⁵⁵⁸ Bazîdî, h. b., r. 61.

⁵⁵⁹ *Dimdim*, r. 21.

⁵⁶⁰ *Dimdim*, r. 21.

⁵⁶¹ Ensar Aslan: *Türk Halk Edebiyatı*, ç. 2., Weşanên Maya Akademi, Ankara, 2010. s. 21.

Piştî van agahiyan, em ê li ser gotinên pêşiyên ên di romanên Erebe Şemo de cî digrin bisekinin:

Tu yê piştâ xwe an bidî mêrxasekî eseh an jî bidî çiyayekî bilind: Bila baweriya te bi tu desthilatan neyê, bila baweriya te bi te û hêza te bi xwe bê.

“Dibên ku bapîran ji hezar sal û vir ve ev şîret li wan kirine: *Tu yê piştâ xwe an bidî mêrxasekî eseh an jî bidî çiyayekî bilind.*”⁵⁶²

Yê ku porê xwe bi gûzan jêke, liber tuncikan nakeve: Berdêla her tiştî heye. Ê ku biryara kirina tişteki da, tê wê wateyê ku wî/wê berdêla ku pêkan e bide, qebûl kiriye.

“Di êrîşa dawî de, Xano digihîje wê baweriyê ku êdî xelas nemaye. Xanoyê Çengzêrîn bi qerara hevbeş a nişteciyên kelehê ya tev li nişteciyan dide. Dide ser şopa peyva pêşiyên Kurd, *Yê ku porê xwe bi gûzan jêke, liber tuncikan nakeve.*”⁵⁶³

Berê nanxwarin, paşê pirs û hewal kirin: Li gorî adetan şerm e mirov hema bêje mêvan, tu ji bo çi hatî? Bila pêşîn xwarina xwe bixwe dûvre bila sedema hatina wî/wê jê bê pirskirin.

“Qurban, bi qaydeyê me eşîran: *Berê nanxwarin, paşê pirs û hewal kirin.*”⁵⁶⁴

Xîret avêtine ber kelb, wî jî qebûl nekiriye û xîret xwedî kiriye: Xîret, karê mêran e, divê mêr ji ber xîret xwe ne de paş.

“*Xîret avêtine ber kelb, wî jî qebûl nekiriye û xîret xwedî kiriye.* Xîret kubariya mêran e.”⁵⁶⁵

Her teyr bi refa xwe re dijî: Her cure jîndar, çi mirov be, çi ajal be, bi cinsê xwe re şadibe û ji welatê xwe hez dike.

“Ew çawa mala Kurd e tenê hatibû, gihîşte we? *Her teyr bi refa xwe re dijî.* Heke ez hatim gihîştim Şahê Şah, min qebîleya xwe anî, lê bawer bike, heke ez tenê bi mala xwe ve bihatama, min nikaribû teyax bikira.”⁵⁶⁶

“Şukir, wext hat, ez êdî dikarim herim welatê xwe, *her teyrek ji wetenê xwe hez dike.*”⁵⁶⁷

⁵⁶² *Dimdim*, r. 6.

⁵⁶³ *Dimdim*, r. 8.

⁵⁶⁴ *Dimdim*, r. 44.

⁵⁶⁵ *Dimdim*, r. 74.

⁵⁶⁶ *Dimdim*, r. 80.

Firra mirîşke, hetanî kadînê ye: Ê/a ku derfetên wî/wê tune ne ji bo ger û geştê, tenê ciyên nêzîk dibîne.

“Dibe ku hinek ji wan heta Tilbîsê çûne, lê ji wê derê dûrtir qe tiştek ne dîtine. Çewa meseleya me dibêje: *Firra mirîşke, hetanî kadînê ye.*”⁵⁶⁸

Wan rojê sibatê yê berfê, kê ne li mala xwe be, ew dijminê serê xwe ye: Berfa sibatê ewqas zorê dide mirovan ku, di wan rojan de yê ji mala xwe derkeve, ewê serê wî têkeve belayê.

“Bona rojêd usa tîpî- bager nav kurda da mesele tê gotinê: *Wan rojê sibatê yê berfê, kê ne li mala xwe be, ew dijminê serê xwe ye.*”⁵⁶⁹

Çi qas tu gur xweyî bikî lê dîsa çavê wî li mêşe ye: Tu jîndar, zû bi zû dest ji xûy û xesletên xwe bernade.

“*Çi qas tu gur xweyî bikî lê dîsa çavê wî li mêşe ye.*”⁵⁷⁰

Gur oxir e, lê meriv nebîne ji hemû çêtir e: Ger ji yekî/ê îhtîmala feyde hatinê hebe jî, ji ber ku ew xetere ye, a herî baş ew e mirov qet li rasta wî/wê neyê.

“Eva hatina milazim, qeymeqaym, Silêman begê û zabitan va qet ji fikra Emerîkê dernediket. Hêdîka mesela Kurmanca got: *Gur oxir e, lê meriv nebîne ji hemû çêtir e.*”⁵⁷¹

Hêla axlêve ye, neketîye havînê: Axlêve dewreya salê ya di navbera zivistan û biharê de ye. Hinek caran ev dem bi xelayê derbas bûye. Di vê demê de kar û xebat hinekî disekine. Loma jî gotineke wiha hatiye bikaranîn.

“Silêman beg, tu serê me yî, em lingê te ne... Lê çi bêjim wextekî mine teng e. Çawa em Kurmanc dibêjin: *Hêla axlêve ye, neketîye havînê.*”⁵⁷²

Ya dest dike, dê û bav nake. Xebatçiyê xwe be, lê şêrînê dilê evdan be!: Ya herî baş ew e ku mirov xwe bi xwe karê xwe bike, nehêle bi hêviya tu kes din ve.

⁵⁶⁷ *Hopo*, r. 91

⁵⁶⁸ *Hopo*, r. 90.

⁵⁶⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 222.

⁵⁷⁰ *Dimdim*, r. 185.

⁵⁷¹ *Jiyana Bextewar*, r. 22.

⁵⁷² *Jiyana Bextewar*, r. 34.

“Heyran ev gilî tamam rast in, berêva mesela me Kurda dibê: *Ya dest dike, dê û bav nake.*”⁵⁷³

“Cimo ez ji te ra jî saxî, silametî û xebata rind dixwazim. Em Kurd dibêjin: *Xebatçiyê xwe be, lê şêrînê dilê evdan be.*”⁵⁷⁴

Neke serê kesê kesa, bira neyê serê pîsê pîsa: Kî çi xerabiyê bike, zû yan dereng, ew ê rojekê cezayê xwe bibîne.

“Ew ku hate mal, wê êvarê kurê wî mir. Lê ew cînarê ji bêbextîya Salih begê zîrar dîtibûn, digotin: Misteheq wî ra usa lazim e, me geleka hêsir barandine ji şer û şiltaqê (bêbextî, îftîra) wî, bira ew jî hêsira bibarîne. Hineka jî digotin;- *Neke serê kesê kesa, bira neyê serê pîsê pîsa...*”⁵⁷⁵

Wekî meriv ji orta meydanê ji hespa xwe peya be, ew eybeke zaf mezin e: Dema mirov destbî xebatekê kir, çi bibe bila bibe, divê mirov wî karî bibe serî.

Biro ji cotkaran ra dibêje:

“Em gerekê pak bixebitin, ewê beyraqa lecê ji destê me bibe, ji destê me derxe, pêşya me keve û me paşde bihêle, wî çaxî çawa mesela Kurda dibê:

Wekî meriv ji orta meydanê ji hespa xwe peya be, ew eybeke zaf mezin e.”⁵⁷⁶

Mêr xuliqîne bona mêrxasiyê, bona mirinê: Mêrxasî, mirin û kuştin karê mêran e. Ev yek rastiya jiyânê ye û divê herkes vê yekê qebûl bike.

“Meta Bêzê, megirî. Tu çi qas bigirî, tu çi qas porê xwe verûyî tu êdî Filît venagerî. Bila gunehê te bi êtîma neviya te, Zînê bê. *Mêr xuliqîne bona mêrxasiyê, bona mirinê,* tu edetê me Kurdan dizanî.”⁵⁷⁷

Jin bedewiya ‘emr e: Jin xweşikî û bedewiya jiyânê ye.

“Keçikan çadira xwe paqij xwedî dikir. Her yekê nivînê xwe paqij û rind danibû. Li kêleka her nivînekê, baqên gulên rind danîbûn. Emerîkê ku ev yek dît, di fikra xwe de got: Lewma dibêjin, *jin bedewiya ‘emr e.*”⁵⁷⁸

⁵⁷³ *Jiyana Bextewar*, r. 113.

⁵⁷⁴ *Hopo*, r. 20.

⁵⁷⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 139.

⁵⁷⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 216.

⁵⁷⁷ *Hopo*, r. 96.

2. 2. 2. Biwêj

Biwêj, vegotinê dewlemend û bedew dikin. Raman û bûyeran bixeml û rengîn dikin. Şükrü Elçin (1912- 2008) balê dikişîne li ser taybetiyên biwêjan û wiha dibêje:

“Biwêj, gotinên qalibgirtî ne ku ji wateya xwe ya bingehîn dûrketîne. Ji dudo yan jî zêdetir peyvên pêk tên. Bi riya biwêjan, hest û raman bi awayekî balkêş tên ragihandin.”⁵⁷⁹

Şemo, di çar romanên xwe yê me nirxandî de bi dehan biwêj bikaranîne. Bi vî awayî mabesta xwe gelek bandordar aniye ziman. Her wiha dewlemendiya zimanê Kurdî jî derxistiye holê. Me li vir biwêjên wî di pirtûkên xwe de bikaranîne rêz kirin û ew rave kirin:

Daweta gur û rovi: Ji bo barana ku di roja tav de dibare tê gotin.

“Wê sibehê piltek ewr ji ser çiyê derket, li ser Kela Dimdimê, hebekî baranê reşand, toz û xubar bi erdê de kuta û dîsa vekir. Tava xweş vê biharê dîsa pencê xwe da erdê. Vê baranê bêhn û buzza hewayê hê pak kir. Ji barana wisa re em Kurd dibêjin: *Daweta gur û roviyê.*”⁵⁸⁰

Simbêlê yekî nû xwê dan: Ji bo lawikên nû ketine ciwantiyê tê gotin.

“Ew qîseyaya ku ezê ji we re bibêjim, ji zû de qewimiye. Wê çaxê ez hê sivik bûm, lê êdî xortekî lap mezin bûm, berên simbêlên min jî êdî, çawa dibêjin, *simbêlê min nû xwê dabûn.*”⁵⁸¹

Kizîn ji dilê yekî/hê hatin: Dilşewitîn,

“Qurşûtê ku çavê wî li Dilbera bedew ket, *kizzîn ji dilê wî hat.*”⁵⁸²

Tu ji min re li ser şeş kuran kurê heftan î: Tu li ber dilê min gelek bi qedr û qîmet î.

“Hemze Çawîş giliyên xwe kuta kirin. Xano got:

⁵⁷⁸ *Hopo*, r. 110.

⁵⁷⁹ Şükrü Elçin: *Halk Edebiyatına Giriş*, ç. 2., Weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığı, Ankara, 1986, r. 642.

⁵⁸⁰ *Dimdim*, r. 15.

⁵⁸¹ *Dimdim*, r. 17.

⁵⁸² *Dimdim*, r. 27.

Lawê min, ew şîrê ku diya te daye te li te helal bibe. *Tu ji min re li ser şeş kuran kurê heftan î.*⁵⁸³

Şîrê xwe lê helal kirin: (Dê dibêje kurê xwe/qîza xwe) Tu ewladekî/e baş î, ez ji te razî me.

“Ez dinêrim tu xortekî pak î, lê xişîm î, her kê gunê te cahîltîya te nayê kerem ke!
Ozman dengê xwe nekir, her got:

“Dê lava kir, Şako nivîsî:

“Lao, ez Rihana Dîya te, *şîrê xwe li te helal dikim.*”⁵⁸⁴

Mîna bayê biharê belav bûn: Di demeke kin de balav bûna gotinekê.

“*Ew gilî mîna bayê biharê yê gur di nava bajêr de belav bû.*”⁵⁸⁵

Bangdana dîkan: Ji bo demên şevê tê bikaranîn.

“*Hema dîkên nivê şevê bang dan, hûn rabin, ezê bê, we bi rêkim.*”⁵⁸⁶

Hêlîn hedimandin: Malwêrankirin.

“*Lawo, ê ku hatiye hêlîna me bihedimîne, li wir çi pirs, çi lavayî kirin? Ji wan re her lazim e qirkirin.*”⁵⁸⁷

Firşikên yekî/ê rabûn: Gelek hêrs bûn.

“Wezîrê eskeriyê ku dît *firşikên Şah Ebas ji hêrsa rabûne, wî got:*
Belê ez xulam, ezê sibehê esker bidim Silêman Xan û bi rê bikim ser Kela Dimdimê.”⁵⁸⁸

Pêparê yekî li kesekî/tiştê hatin: Di heman demê de yek tê ciyekê û tiştê baş diqewime.

“*Ev pêparê te ye li miyan hatiye, lewma mî îsal cewî dizên.*”⁵⁸⁹

⁵⁸³ *Dimdim*, r. 45.

⁵⁸⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 242.

⁵⁸⁵ *Dimdim*, r. 62.

⁵⁸⁶ *Dimdim*, r. 241.

⁵⁸⁷ *Dimdim*, r. 67.

⁵⁸⁸ *Dimdim*, r. 78.

Xwezî li wê malê ya tu lê bibî bûk: Tu qîzeke gelek baş î, di karên malê tu serkeftî yî.

“*Xwezî li wê malê ya tu lê bibî bûk.*”⁵⁹⁰

Heke serê wî li wir şilkirî be, bila bê li vir kur bike: Bila demildest were.

“Nenê temul nekir, wê cab şande malê, wekî Şebab nesekine û zûtirê bê. Temî li qêsid kir, wekî ew bibêje Şebab:

Heke serê wî li wir şilkirî be, bila bê li vir kur bike.”⁵⁹¹

Bûn çavê yekî/ê: Ji bo wî/wê gelek biqîmet bûn.

Bûn bextê mêrê çê de: Daxwazkirina alîkariyê bi ser navê mêrê baş ê ku diçe hewariya kesên zorê de.

“Ebdilrezaq got:

Belê maqûl, tu rast dibêjî. Mîr Sadiq ez û Şêx Zade şandin hizûra te. Wî got: “Bibêjine Xano, ew çavê min e, bila eskerê xwe hilde, em di tengasiyê de ne, *ez di bextê mêrê çê de me*, bila eskerê xwe hilde, bê hewariya me.”⁵⁹²

Wekî derzî/ xwelî bê avêtin li serê kesê nekeve: Qerebalixeke pir mezin.

“Li ber derê koşka Mîr Sadiq, cimaet wisa hatibû, *wekî te xwelî bavêta, nedikete erdê.*”⁵⁹³

“Ew çend roj bûn, ji hemû çiya, qeza û gundan siwar û peya dihatine Kela Dimdimê. Li besta li pêş Kela Dimdimê mexlûqet wisa tijî bibû, *wekî te derzî bavêta erdê nediket.*”⁵⁹⁴

Avêtina dê ya ewladî: Şer yan jî tevlîheviyeke wisa ku tu kes nikare bi yekî/ê bibe xwedî, herkes ketiye derdê canê xwe.

“Qîre- qir, zare- zareke ussa ketibû nava şêher, *dê ewladê xwe davît.*”⁵⁹⁵

⁵⁸⁹ *Dimdim*, r. 88.

⁵⁹⁰ *Dimdim*, r. 89.

⁵⁹¹ *Dimdim*, r. 94.

⁵⁹² *Dimdim*, r. 128.

⁵⁹³ *Dimdim*, r. 143.

⁵⁹⁴ *Dimdim*, r. 197.

⁵⁹⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 171.

Nekarîn çûna cîran mala cîran: Ji ber şert û mercên xirab tu kes nikare ji mala xwe jî derkeve.

“*Tîpî û bagerne ussa radibûn, cînar neduçû mala cînara.*”⁵⁹⁶

Nekarîna bi du çavan li yekî/ê nêrîn: Ewqas bedew e ku bi mabesta parastina ji nezerê pêwîst e mirov tenê bi çavekê li binêre.

“*Qîzeke zefe rind bû. Meriv nikarbû du çava li Xezalê binihêrîya.*”⁵⁹⁷

Têr nanê zikê xwe nexwarin: Ji ber sedemekê mîna nexweşî, xizanî û hwd. lawaz bûna laş.

“*Silêman beg merîkî xarî telaşî dirêk bû. Te digot ev merî têr nanê zikê xwe naxwe.*”⁵⁹⁸

Heyfa kevn û nû hev ra rakirin: Dema mirovek ji demek dirêj û vir ve xerabiyê dike û yek dixwaze heyfê ji wî/wê rake.

“*Emerîk can, hûn newêrek in, te ne hişt, ez heyfa kevn û teze jê hildim.*”⁵⁹⁹

Çivîk ji ber çavê yekî/ê winda nebûn: Gelek baldar bûn.

“*Teselîya wan hemû newala şaxa dike. Çivîk jî ji ber çavê wan wunda nabe.*”⁶⁰⁰

Ji pîran pîr, ji hindikan hindik çûn: Tişteki ku em winda bikin tune.

“*Werin em hevra hucimkinê, ji pîra pîr diçe, ji hindika hindik diçe.*”⁶⁰¹

“*Wextê ew hatin, ketne newalê, em wana têxne orta xwe û lêxin. Ji pîra pîr, ji hindika hindik. Emerîkê got:*

De ez îro mêrê Kurda egît binihêrim, çika çawa şer dîkin.”⁶⁰²

Mêvan mêvanê Xwedê ye: Ê/a ku hat li ber derê mirov, pêwîst e ji ber derî neyê zîvirandin û qedrê wî/wê bê girtin.

⁵⁹⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 136.

⁵⁹⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 14.

⁵⁹⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 24.

⁵⁹⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 35.

⁶⁰⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 41.

⁶⁰¹ *Jiyana Bextewar*, r. 125.

⁶⁰² *Jiyana Bextewar*, r. 42.

“Xezal û qîza wê hê xeberdanêdabûn, siyarekî ajote ber derê wan.

Xezal ber bi suwar hat, got:

- Xortê delal, *mêvan mêvanê Xudê ye*, kerem ke, peya be.”⁶⁰³

Yeka yekî/ê/hinekan nebûn dudo: Karê wî/wê/wan baş naçe. Bela û pirsgirêk tên pêşiya wî/wê/wan.

“Wan çend salêd paşîn wanra lev nehat. Kes nizane çawa nexweşî kete mala wan: mêr û jin alîkî dimirin, pez û dewar alîkî qir dibû. Te digot tebîyetê ew raçev kiribû. *Yeka wan nedibû dudo.*”⁶⁰⁴

Ne dilekî, bi hezar dilî hebandin: Gelek jê hez kirin.

“Lê ew kincê kevn nikaribûn veşartana bedewîya Cemîlê. Kê çav bûrîyê wê diket, çawa çîroka dibêjin: *dilekî na, hezar dila diheband.*”⁶⁰⁵

Ji yekî/ê ra mal kirin: Baş şixulîn, bi şîr helalî xebitîn.

Ya nebûyî anîn serê yekî/ê: Gelek bi ser de çûyîn.

“*Hûnê malê ji min ra bikin? We çima ev kavirê kewîkur şerjê kir? Kura re dikire şer, ya nebûyî danî serê wan.*”⁶⁰⁶

Ji bo kula qederê: Ji bo pêkhatina qederê hatina yekî/ê ku ew hatina wî/wê nedihat hêvî kirin.

“Wê rojê çawa em Kurd dibêjin: *Kula qedeyê ra*, Elî axa hatibû mala Hesencano.”⁶⁰⁷

Bûn di bextê yekî/ê de : Ji bo alîkariyê hêvî kirin.

Min kurê we kuştî be: Ger min xerabiyek mezintirîn jî li we kiribe hûn alîkariya min bikin.

⁶⁰³ *Jiyana Bextewar*, r. 46.

⁶⁰⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 47.

⁶⁰⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 48.

⁶⁰⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 58.

⁶⁰⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 73.

“Ez bextê we da me, min kurê we kuştibe, hûn gerekê komekê (alîkariyê) bidne min.”⁶⁰⁸

Bila mirina te li min bikeve: Bila şûna te ez bimirim.

Dûrî Mihemed: Bila mirin ji bo wî jî neyê û mirina ji bo te û wî tê bila ji bo min bê.

“Rojekê Îbrahîm gazî Seyranê kir, got:

“Evda Xwedê ez idî ranabim, ez zanim, ezê bimirim, lê temî û wesîyeta min li te heye.

Seyranê got:

“Bira mirina te dûrî Mihemed (kurê wê ye) li min keve, çima usa dibêjî?”⁶⁰⁹

Gunehê gurê serê çîyan lê hatin: Bûn gelek jar û belengaz.

“Ew û kur tenê man, Seyranê xwe hala ra dilûband, digirîya, *gunê gurê serê çîya pê dihat.*”⁶¹⁰

Şalê yekî ketî nava lingên wî: Tirsîn.

“Çi şalê we kete nava lingê we, bira bîn, çima sîleha me tune.”⁶¹¹

Bûna serê mirovekî û pîvazekî yek: Rewşa bêewlehiyê, bêqîmetiya jiyana mirovan.

“Vê çeçeçeqê kî dikare derkeve çolê, ga jî, nan jî qaçaxê jê bistînin. Wî jî wê bikujin, çima tu navînî (nabînî), çawa mesele dibêje: *Serê merîkî û serê pîvazekê bûye yek.*”⁶¹²

Ma simbêl ber pozê me tune!: Em mêr in, mêrxas in, em ê şer bikin û li ber xwe bidin.

“Hawara wan eskerê Êris bû, ew jî çûbû. Dîwan ketibû destê Daşnaka.

Lê wê sibehê Sertîb, Emerîk, Cindiyê Êso û çend merîyê dinê kirne gazî digotin:

Çima em ne mêr in, *simêl ber pozê me tune*, erz heyalê me roda diçin, em jî sekinîne, kî xwey tiving e, hazirbin, emê emrê xwe bidne bona namûsa xwe.”⁶¹³

Ling li yekî/ê bûn avildank: Ewqas geriya ye ku lingên wî/wê werimîne.

⁶⁰⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 82.

⁶⁰⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 83.

⁶¹⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 85.

⁶¹¹ *Jiyana Bextewar*, r. 128.

⁶¹² *Jiyana Bextewar*, r. 132.

⁶¹³ *Jiyana Bextewar*, r. 145.

“Sehîd bavê ra ancax dibû sazkar, *ling li wan bibûne avildank.*”⁶¹⁴

Min çi kiriye, ez wê difroşim: Derewan nakim, tiştê ku min dîtî yan jî bihîstî ez wê qise dikim.

“Heyran min çi bihîstîye ez wê dibêjim. Em Kurd dibên: *Min çi kiriye, ez wê difroşim.*”⁶¹⁵

Bûn ji gewrên berê: Xwedî tecrube bûn, gelek bûyer dîtî bûn.

“Sehîd wê xeberdana kalê ra texmîn kir, wekî ev kal ji *gewrê berê ye.*”⁶¹⁶

Roja/rojên mirin û jiyînê: Rojekî/rojên gelek girîng, gelek krîtîk.

“Tu dizanî niha çi wexteke lazim e? Niha em Kurmanc çawa dixebitin: *Roja mirin û jiyînê ye.*” Bihar e, wexta ekin e, lê ez vê sibehê di berbangê de, li van deran, ciyê belesebeb digirim.”⁶¹⁷

Çav li rêya yekî/ê qerimîn: Ji bo demeke dirêj li benda hatina yekî/ê mayîn.

“Bavê got:

Lao, *çavê me li rêya te qerimî,* tu çima usa dereng hatî.”⁶¹⁸

Derba enîşkê: Derba xedar, derba kujer.

“- Dîwana me dîwana edlayê bû, faşîsta bi xaynetî ser me da girt. Lema Rojêd ewilîn qewat alîyê wî bû. Lê wî şerî da, çawa Kurd dibêjin *derba enîşkê dît* ji tevayê eskerê sor?...”⁶¹⁹

Stuyê xwe li ber xelkê de xwar kirin: Ji yekî/ê dazwazkirina mal, alîkarî û hwd.

“Rastî jî bêbarbir halê me çetîn bû. Seva ceme genim yan ceh me *stuyê xwe ber xelkê xwar dikir.*”⁶²⁰

Kela girî dayîna qirika yekî/ê: Mexdûr bûyîn, kesirîn, bihestiyarbûyîn.

Ber dilê yekî/ê da hatin: Teselî kirin.

⁶¹⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 156.

⁶¹⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 166.

⁶¹⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 203.

⁶¹⁷ *Hopo*, r. 230.

⁶¹⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 213.

⁶¹⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 238.

⁶²⁰ *Şivanê Kurmanca*, r. 60.

“Nizam ji şabûna bû, *kela girî da qirka min*. Hevalê Topûnov rabû, dest stuyê mira bir, *ber dilê min da hat*.”⁶²¹

Nanoziko: Xebata bêpere ku xwediyê kar tenê nanê rojê yê karker didiyê.

“Lazekê şûnda Îvanov derket, hat û dikene:

Ezê te bigrim, lê tu heqî peretî nadme te. Nanê te, xwarina te stu min.

Ezî razî bûm, wekî min *nanoziko* bigrin.”⁶²²

Ji şabûna lingê yekî/ê li erdê neketin: Gelek kêfxweşbûn.

“Dema Marûsiya kîtaba alfabeyê da min, *ji şabûna lingê min erdê nediketin*.”⁶²³

Çermê pişta yekî jêkirin tijeh xwe kirin: Cezakirineke mezin û biêbret.

“Çend sala pêşda ezî gavanê Qizilqeqçeçê bûm. Li wêderê jî dima prîstavê (qeymeqam) wê nehîyê. Carekê mihîna wî unda bû. Ez digerîyam, min mihîna wî nedidît. Ewî gazî min kir, got:

Heftek tera molet, wekî tu mihîna min nebînî, neyînî, *ezê çermê pişta te jê kim, tijî xwê bikim*.”⁶²⁴

Nanê destê yekê (jinekê) xwarin: Gelek caran bûn mêvanê malêke û di wê malê de xwarina wê xwarina ku kevaniya malê çêdike. Ev biwêj tenê ji bo jinan tê bikaranîn.

“*Min gelle nanê destê Werdekê û Bezê xwarîyê*.”⁶²⁵

Diranê yekî/ê hev xwarin: Xwarin lê pir xweş hatin.

“Min zûda goşt nexwaribû, *diranê min hev xwarin*.”⁶²⁶

Bûn qurbana yekî/ê: Gelek ji yekî/ê hez kirin. Ji bo wî/wê amadebûna kirina her fedakariyî.

Bayê yan jî bagerê/baranê yekî/ê anîn: Dema kesek tê û mirov ne li benda hatina wî/wê ye.

⁶²¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 175.

⁶²² *Şivanê Kurmanca*, r. 74.

⁶²³ *Şivanê Kurmanca*, r. 88.

⁶²⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 93.

⁶²⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 94.

⁶²⁶ *Şivanê Kurmanca*, r. 116.

“De bêj, xalê te qurbana te be, *bayê tu anî, baranê tu anî*, çewa tu hatî, derketî vira.”⁶²⁷

“Begê min çawa bû xalîfî ber bi holika me hatî, *yan ba û bagerê tu anî*.”⁶²⁸

Mîna aveke sar di serê yekî/ê de kirin: Gelek şaş bûn, ecêb mayî man.

“Ewa gilîyana mîna *aveke sar rojêke paîza hişk meriv serê merivda ke*, ussa ez russa bûm, sekinîm.”⁶²⁹

Mîna pezê gêj li dora xwe çûn: Bi zanîn yan jî bihîstina bûyereke şaş û metal mayîn.

“Ez ku derketme berderî, *mîna pezê gêj dora xwe diçûm*, dihatim, min rîya xwe nedidît.”⁶³⁰

Kula te li vira çî ye: Tu karê te li vir tune, neyê vir.

Bicehme: (berteka hêrsbûnê ye) Rêya xwe bigre here, li vir nemîne.

“Ketxuda ku dît Emerîk wê derê ye, tilîya xwe serda hejand, kev li dêv ket, got: Hila bêje tu li vira çidikî? Çima naçî gundê xwe? *Kula te li vira çîye?* Ma tu jî meraqlîyê erdê milkedarani? *Bicehme* ji gundê me derkeve...!”⁶³¹

Bila êdî piyê te li pişt şêmika min nekeve: Tu car din neyê mala min.

“Bicehime, *bila êdî piyê te li pişt şêmika min nekeve!*”⁶³²

Bila ev roj reş bûbûya: Xwezî ev roj qet ne hatiya jiyandin.

“Ev giliyên dê yên bêteşe wisa Zelîxa qiçqiçand û hêrsa wê rabû, wekî hêsir ji çavan hatin. Wê xwe girt û di fikra xwe de got: *Bila ev ro reş bibûya*, wexta ku te îro lingê xwe avête pişt şêmika min.”⁶³³

Mîna biznê kal dotina yekî/ê: Binpêkirina mafên yekî/ê. Li hemberî yekî/ê mêtîngerî kirin.

⁶²⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 125.

⁶²⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 50.

⁶²⁹ *Şivanê Kurmanca*, r. 165.

⁶³⁰ *Şivanê Kurmanca*, r. 165.

⁶³¹ *Hopo*, r. 105.

⁶³² *Hopo*, r. 192.

⁶³³ *Hopo*, r. 191.

“Ev gilfîyana ez lap bêguman kirim. Ez teze ser wan xebera ketim, wekî Sefo eva sal- nîvekê min dixapîne, *mîna bizna kal (bêquloç) min didoşe, şîrê min dixwe.*”⁶³⁴

Kes nabêje serê çarixê te xwar e: Eleqeya tu kesî bi te re tune. Tu kes nabêje tu çi dikî yan jî çima dikî. Tu kes têkildarî te nabe.

“Ew gundê Sûsîzî, ku em hatibûnê, zaf gundekî rind bû, meriyê têda tev yek ji yekî çêtir bûn û xêrxwaz bûn. Tu gunda, tu cîya me ussa rihet derbaznekir. Me qe nizanbû wî gundîda eme xerîbin. Yekî ji mera nedigot: *Serê poza çarixe te xware.*”⁶³⁵

Devgerm bûn: Perê xwe standin. Standina tama pereyan.

“Dîwanê lê nihêrî kesek ser xebatê nemaye paşê xwe xwa nava mêşe ket, pale bi lava û dîleka top kir, rojheqê wan jî zêde kir. Ji wê rojê şûnda, pale îdî *devgerm* bûn.”⁶³⁶

Çavê yekî/ê ji hev vebûn: Çav vekirî bûn. Têgihîştina birêveçûna karekî.

“Bi vî tihêrî *çavê minî bere- bere jev vebûn*, xebata firqê li min xweş hat û ez ketme firqa Bolşêvîka.”⁶³⁷

Deng çûna erşê ezmana: Qêrîn û gaziya mezin.

“Meznê wan kulmek li serê min xist, ez ketim, bû qîrînîya min, *dengê min çû erşê ezmana.*”⁶³⁸

Bîna şîrê dayîkê ji devê yekî hatin: Filankes hêja zar e, negihîştiye.

Ew ê bê dîtîna kî berx e kî beran e: Ew ê derkeve holê ku kî mêrxas e û kî bêzirav e.

“Cahila cara laqirdî pê dikirin, digotin:

Xalo, ne wexta te û razanê ye?

kal jî, hêrsa wî radibû, digot:

Lao, hûnê hîla zarin. *Bîna şîrê dîya we ji devê we tê*, lê ez eskerê kevnim, min waqa şer dîtine. Bira bê bîna barûtê, çika emê binêrin- *kî berxe, kî berane.*”⁶³⁹

⁶³⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 130.

⁶³⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 142.

⁶³⁶ *Şivanê Kurmanca*, r. 145.

⁶³⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 146.

⁶³⁸ *Şivanê Kurmanca*, r. 150.

⁶³⁹ *Şivanê Kurmanca*, r. 180.

Kuxîn ji yekî/ê nehatin: Bêdengî. Xebernedana tukesî.

“Em şev ji Stavropol derketin. Şeve ker bû, *kuxîn ji yekî nedihat*.”⁶⁴⁰

Bûn sîqîniya diranê yekî: Ji bo şer amade bûn. Şer xwestin.

“Esker ketibû hazirbûn bona şêr. Tevî eşk bû. *Sîqîniya diranê wan bû*. Dixwastin tene şer.”⁶⁴¹

Tilî çavê yekî/ê ra kirin û ew nedîtin: Tarî û zilmata ku tu mirov serê pozê xwe jî nabîne.

“Şevereşeke ussa bû, - *wekî meriv tilîya xwe çavê hevra kira, hevdu nedidît*.”⁶⁴²

Rûnê li ser helîsê: Para herîbaş a xwarinekê yan jî malekê.

Nebûna neynokê ji bo xwe xwerandinê: Feqîrî û belengaziyeke mezin.

“Herekê yekê rûşêt dida Ûsib begê, xilaz dibû, dihate mala xwe, îcar Egîd begê birazîyê Ûsib begê digirt, ewî jî herçê ber derê wî hebû, top dikir, distand. Eva yeka malê kesîba wanra çewa *donê ser helîsê* kîjanî ji xwe şerm nekira, diçû malê kesîba, jê distand. Egîd beg xelk ussa talan kir, idî *neynok tunne bû, wekî xwe bixuranda*.”⁶⁴³

Mar bin zikê yekî da ne çûn: Lêxistina yekî ku tu mecala wî ya livînê nahêle.

“Me hevra hêlan dayê da. Lawika tê dahatin. Me şûr– qemê Egîd begê studa danîn, qetandin. Lawika ew ussa kutta, *mar bin zikê wî ra nekişîya*.”⁶⁴⁴

Bila filan tişt neyê serê kevirê ker î lal: Ew tişta ku behs tê kirin ewqas xedar e ku bila tukes wê belayê û wê nexweşiyê nebîne.

“Bavo! Ya bega danî serê me, *bila neyê serê kevirê kerî lal*, hila kevirê kerî lal jî guneye.”⁶⁴⁵

Bûn heyva li bin ewr: Ji nişkê ve wendabûna kesekî/ê

Ew êdî venegeriya, *mîna heyva ku têkeve binê ewr*, heta niha jî em nizanin çî hat serê wî û bi kû de çû.”⁶⁴⁶

⁶⁴⁰ *Şivanê Kurmanca*, r. 181.

⁶⁴¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 181.

⁶⁴² *Şivanê Kurmanca*, r. 182.

⁶⁴³ *Şivanê Kurmanca*, r. 189.

⁶⁴⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 197.

⁶⁴⁵ *Şivanê Kurmanca*, r. 198.

Bê serî û bê berate çûn: Ji nişkê ve û bê agahî wendabûn.

“Gelo çi hate serê Hopo, Kê bir? Bi kû de çû? *Ev belengaz hema wisa bê serî û bê berate çû.*”⁶⁴⁷

Ji ewladê xwe xêr nedîtin: Şertekî gelek mezin e ku ji yekî/ê tê xwestin ku bersiveke rast bê dayîn ji bo pirsê wî/wê.

“Wê berê xwe bi cemaetê de kir, got:
Bibêjin, *hûn xêrê ji ewladê xwe nebînin*, heke rast nebêjin.”⁶⁴⁸

Bûn çivteçivta yekî/ê wekî çivikê biharê: Axaftina beletewş û beredayî.

“Sertîb li wan hilhat: “Hûn qe li ber devê xwe nasekinin, *şivêta çivikê biharê çivteçivta we ye!*”⁶⁴⁹

Zarê berbîstan: Zarokê hêja di dergûşê de.

“- Lawo, *zarê berbîstanan* nahêlin di maşînê de biwin, wekî zarê te xwe lewitand, tu yê paşê çawa biki?”⁶⁵⁰

Kulfeta destdergûş: Jina ku zarê wê yê berbîstan heye. Jina zaroşîr.

“Tu şerm nakî derewan dikî? Çawa nahêlin *kulfetêd destdergûş* di wagonan de herin.”⁶⁵¹

Qewl û qerarê par van çaxan: Daxwazkirina li ser soza xwe sekinînê.

“Ez ji te hez dikim, me her duyan înstîtût jî kuta kir. Çawa di kilaman de tê gotin: *Kanê qewl û qerarê par van çaxan?*”⁶⁵²

Filankes şilet e, ez wî/wê nastînim: Ew kesê/a ku dixwaze bi yekî/î ra bizewice û dizane ku hêvîdariya wî/wê beletewş e wiha dibêje. Bi vê gotinê dixwaze bibêje ku ez li wê/wî razî nabim lê di rastiyê ew li wî/wê razî nabe.

⁶⁴⁶ *Hopo*, r. 94.

⁶⁴⁷ *Hopo*, r. 35.

⁶⁴⁸ *Hopo*, r. 37.

⁶⁴⁹ *Hopo*, r. 60.

⁶⁵⁰ *Hopo*, r. 69.

⁶⁵¹ *Hopo*, r. 69.

⁶⁵² *Hopo*, r. 85.

“Zînê min gelek qîz li Sîbîryayê dîtin, wexta ku ezî li wir bûm, wekî min dil bikira min dikaribû qîzek ji wan bista.

Tu rast nabêjî, berê ewilîn mezinên me dibêjin: *Ew şilet in, em wan nastînin*. Ya duduyan, ka ew qîz bi te qayîl in? Tu wisa dibêjî.”⁶⁵³

Nezanîna destê rastê û yê çepê: Ji bo negihîştina yekî/ê tê gotin. Armanç gotina ecemîtiya yekî/ê ye.

“*Ew keçik hê nizane destê wê yê çepê û rastê kîjan e*, hatiye me hîn dike em çî biçînin.”⁶⁵⁴

Di zaroktiya xwe de dêya yekî/ê jê hez kirin: Bûn xwedî şans. Wersiyoneke din a vê biwêjê ev e: Xesûya te ji te hez dike.

“De were rûnê, tevî me şîvê bixwe. *Kivş e di zarokatiyê de diya te tu hez dikirî*, lewma tu gihiştî vê şîvê.”⁶⁵⁵

Kurê malê /keça malê: Ne biyanî. Ê/a ku ji malê ye; ne ji bajar, gund, eşîreke cuda ye.

“Ew teze hatiye, helbet eme şa ne wekî Hesên agronomê me ye, çawa em dibêjin, *kurê malê ye*.”⁶⁵⁶

2. 2. 3. Şibandin

Şibandin, ji bo vegotina wêfên tişteke, mînak nîşandayîna tişteke din e ku wê wêfê bêkêmahî dihewîne.⁶⁵⁷ Ev hunera wêjeyî, ji bo zelalkirin û xurtkirina wateyê tê bikaranîn. Şemo di romanên xwe de ev huner li gelek ciyan bikaraniye. Şibandinên wî piranî wiha ne: Nivîskar, mirov, ajal yan jî tişteke ku ji aliyê taybetiyekê ve li paş e dişibîne mirov, ajal yan jî tişteke din ku di heman taybetiyê de ew li pêş e. Em ê niha li mînakên şibandinan ên Erebe Şemo romanên xwe de bi cî kirine binêrin:

Te digot qey ne mirov e, gogercîn e, qubequba wê ye: Keçê bi peyivîna wê ya nazik dişibîne kevokê.

⁶⁵³ *Hopo*, r. 89.

⁶⁵⁴ *Hopo*, r. 99.

⁶⁵⁵ *Hopo*, r. 109.

⁶⁵⁶ *Hopo*, r. 143.

⁶⁵⁷ Toparlı, h. b., r. 245.

“Xên ji wê bedewiyê, gava ku Dîlberê xeber dida, xulqekî wisa şêrîn lêbû, *te digot qey ne mirov e, gogercîn e, qubequba wê ye.*”⁶⁵⁸

Te di got qey ew shebeyekê dewra berê ye: Di nava gel de baweriyek wisa heye ku shebeyên Hz. Muhemmed (S.X.L.) mirovên gelek bejin dirêj û gir bûn. Loma jî ji bo kesên gir û bilind ev şibandin tê kirin.

“Xano mirovekî bilind î mezin bû. Li gorî wê bilindahiyê gewdeyekî gir lê bû. Kê dest û lepên wî û midasê wî didît, *digot qey ew shebeyekê dewra berê ye.*”⁶⁵⁹

Te digot qey ew çav tîr in ji kevanê berdane: Awirên keçê dişibîne tîrên kevanan.

“Çavên gir î sût lê bûn. Gava ku wê bi wan çavan li mirovan dinihêrî, *te digot qey ew çav tîr in ji kevanê berdane*, li mirovan dihingivin.”⁶⁶⁰

Mirov dibêje qey hirçê har e: Çemî, bi liv û tevgera wî dişibîne hirça har.

“Di vî geliyê de, çemekî kûr dikişiya û gurregurreke wisa jê dihat, ji mirov tirê *hirça har e.*”⁶⁶¹

Te digot xalîçeke rind e: Mêrg û giyayan dişibîne xalîçeyên keçên Kurd çêdikin.

“Dora çemê Feratê dora wan çevkanîyan mêrg û çîman bûn. Her sal bi kulîlkan dixemilîn, *te digot xalîçeke rind e; qîzêd Kurmanca neqîşandine, xemilandine.*”⁶⁶²

Mirov dibêje qey tu bûkeke tezeyî: Lawikî dişibîne bûkeke nû ku bûka nû hê şermok e û biste nebûye. Loma jî bi tirs dest davêje karê malê.

“- Kuro, tu xuroma ussa dipêçî, *tu dibêy bûkeke tezeyî.*”⁶⁶³

Agir li bejna çiyê ketin: Çiyayî dişibîne mirovan.

“Ew roj rojêke sayî bû, ewr li ezmin tune bû. Her serê çiyayê Gerîdaxê mij- dûman bû, *te digot agir li bejna wî ketîye*, dihele, lema ussa hilme germ girtîye.”⁶⁶⁴

⁶⁵⁸ *Dimdim*, r. 28.

⁶⁵⁹ *Dimdim*, r. 127.

⁶⁶⁰ *Dimdim*, r. 232.

⁶⁶¹ *Dimdim*, r. 238.

⁶⁶² *Jiyana Bextewar*, r. 12.

⁶⁶³ *Jiyana Bextewar*, r. 18.

Xulam bûne rusas: Mirovan, bi sekinîn û bêtevgeriya wan dişibîne risasiê.

“Welehî kî ji we nêzikî min be, ezê bikujim. *Xulam bûne rusas* yek ji çiyê xwe neleqîya.”⁶⁶⁵

Mîna tajiyê nêçîrê hildana bînê: Mirov bi awayekî mecazî, bi bîn standinê dişibîne tajî ku tajî, di bîn standinê de ajalê herî baş e. Ji bîn standinê mabest rêyeke berjewendî û xerabiyê ye.

“Lê Nîkole idî ser text ketibû, ewî wan rojêd çetîn *mînanî tejîyê nêçîrê bîn hilda*, wekî ji padşê Romê jî kare karê bivîne, herkê dîsa destbi cesûsiyê bike.”⁶⁶⁶

Li ser hevde çûna mîna mêşên hungiv ên di pêtekan de: Mirovan bi liv û tevgera wan dişibîne mêşên hungiv ku mêşa hungiv bi liv û tevgerbûna xwe navdar e.

“Esko dest xweda tê derxist, wekî ew ne merîyê xêrê ne, zû cab da gundîya çeka hildin, lê usa fesal bikin, wekî ewana pê nehesin. Gundî *mînanî mozê hingiv li pêteka da ser hevra çûn*, hatin.”⁶⁶⁷

Roj êdî du bejnan bilind bibû: Rojê dişibîne mirovan û hiltîna wê jî dişibîne bejna mirovan.

“Cemîle usa ketibû mitala, qe nizanbû çawa xewra çû. *Ro idî du bejna bilind bibû*.”⁶⁶⁸

Tav ji mala xwe teze derdikeve: Tavê dişibîne mirovan.

“*Tav ji mala xwe teze derdikeve*, lema ew xwane nake (xûya nake), lê ronkaya wê daye serê çîya.”⁶⁶⁹

“*Tav idî nêzikî mala xwe bibû, lez dikir*, wekî ew jî ji rêya dûr hatî rihetbe.”⁶⁷⁰

“Êvar bû, *royê (rojê) deynê xwe diqedand ber tebîyetê, çimku idî wext hatibû*.”⁶⁷¹

Tavê pençê xwe ji pişt çîya va derxistibû: Tavê dişibîne ajalekî xwedî pençe.

“Rojekê xweş bû. Qe bîna bê nedihat. *Tavê pençê xwe ji pişt çîya va derxistibû*, ber bi rasta Samgorîyê dikir.”⁶⁷²

⁶⁶⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 53.

⁶⁶⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 128.

⁶⁶⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 139.

⁶⁶⁷ *Jiyana Bextewar*, r. 139.

⁶⁶⁸ *Jiyana Bextewar*, r. 46.

⁶⁶⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 209.

⁶⁷⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 156.

⁶⁷¹ *Jiyana Bextewar*, r. 160.

Te digot qey mêşek e bi fil re şer dike: Danberheva du hêzên li hember hev dike ku di nava wan de ji aliyê mezinbûn û xurtbûnê ve bêhevsengiyeye mezin heye.

“Dîwana Daşnaka eskerê dişand pêşîya eskerê sor şer, lê qe xema eskerê Êrisê mêrxas nînbû, serfînyaz dihat, *te digot mozeke (mêş) fil ra dike şer*, lê fil wê mozê qe nabîne û rêya xwe de tê.”⁶⁷³

Mîna kerîyê pez, ku ji ber gura rev pê bi keve: Leşkerên ku direvin dişibîne keriyê pez î gur ketî nav.

“Li rasta binya gund eskerê Daşnaka revî, *mînanî kerîyê pez, ku ji ber gura rev pê keve*.”⁶⁷⁴

Mîna hestîya şivdar daqurtandine û ew şivdar di gewrîya wan da maye: Mirov ewqas çik disekinin ku tê bibêjî şivdar di gewriyan wan de ye.

“Gava rêva diçûn ji kubarîya usa serê xwe bilind dikirin, *te digot ewê jarikê mînanî hestîya şivdar daqurtandine û ew şivdar di gewrîya wan da maye*.”⁶⁷⁵

Mîna gurê dev bi xûn: Mirov dişibîne gur.

“Li destê minî rastê qumandarê meyî mezin bû. Li avtomobilê suyar bû, *mîna gurê dev bi xûn*, diçû- dihat, hukum dikir.”⁶⁷⁶

Mîna takara stuyê xinzirê: Mirov dişibîne beraz ku beraz xwedî wateyeye neyînî ye di nava gel de.

“Xulamê bin pîya de sekinîne. Yek şixulê wî ewe- her, cîgara wî dadigre û cîgara jê re dipêçe, yê dinê jî qawê jêra çêdike, yek jî sekinîye, qamçiyê wî hazirî destdane, sîqînîya diranê wîye, çika begê çî hukum bike, kê bikute (lêbixe), yan gazî kê ke, yan jî malê kê jê bistîne. Tu li takara stuyê xulama dinêrî, *mîna takara stuyê xinzirê* nava qemûşda beyanî – terxan diçêre.”⁶⁷⁷

Tariyê mîna konekî Kurda erd dinixamt: Tariyê dişibîne konê Kurdan.

⁶⁷² *Jiyana Bextewar*, r. 184.

⁶⁷³ *Jiyana Bextewar*, r. 162.

⁶⁷⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 175.

⁶⁷⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 185.

⁶⁷⁶ *Şivanê Kurmanca*, r. 170.

⁶⁷⁷ *Şivanê Kurmanca*, r. 96.

“Ro ji zû de di pişt çîyayan ve qulibîbû, *tariyê mîna konekî Kurda erd dinixaft.*”⁶⁷⁸

Rozgara çivîka wîtwîtanî: Bayê dişibîne çûkê.

“Ji rozgara mîna îroyîn re dibêjin, *Rozgara çivîka wîtwîtanî.*”⁶⁷⁹

Mîna dîkê kurkurkan xwe gupevedike: Mirov dişibîne dîkê kurkurkan ku dîkê wisa gelek bi liv û tevger e.

“- Tu dibînî çima Dirbo *mîna dîkê kurkurkan xwe gupevedike?*”⁶⁸⁰

Guhdirêj: Li vir hunera îstî‘areya girtî hatiye bikaranîn. Dêbila ker de guhdirêj hatiye gotin.

“Wê axriyê *guhdirêj* hate kirinê.”⁶⁸¹

2. 2. 4. Dua

Dua, bangeke li bal Xwedê ye ku mirov ji bo xwe û ji bo civaka ku têde dijî xweşhalî û bextewariya madî û manewî dixwaze.⁶⁸² Du‘a, bi baweriya gel ve girêdayî ye. cureyekî wêjeya devkî ye. Di folklorê gelan de cihê xwe digre. Şemo jî, di romanên xwe de du‘a bikaranîne. Emê niha li va du‘ayan binêrin. Hêjayî gotinê ye ku Şemo, di hemû romanên xwe de peyva “belkî”yê di wateya “Îşile” de bikartîne.

Belkî şêrînayîya wiha timî li mala we be û li mala xêrxazan be!: Di nîşankirinê de du‘aya kêfxweşiyê ji bo dergistiyan û kesên niyet baş tê niyaz kirin.

“Mezin dibêjin, berê wexta nîşankirinê, bi kasa şerbet vedixwarin. Xezalcan, ez jî vê şêrînahiyê hildidim, *belkî şêrînayîya wiha timî li mala we be û li mala xêrxazan be!*”⁶⁸³

Belkî destê te ji eyarê rûn dernekeve. Belkî yeka te bibe hezarî. Belkî hûn silametî derbas kin li zozana, malê we silametî ji zozana dagere, bê: Du‘aya bereket û selametiye tê kirin.

⁶⁷⁸ *Hopo*, r. 17.

⁶⁷⁹ *Hopo*, r. 29.

⁶⁸⁰ *Hopo*, r. 126.

⁶⁸¹ *Şivanê Kurmanca*, r. 60.

⁶⁸² Elçîn, h. b., r. 662.

⁶⁸³ *Hopo*, r. 210.

*“Kevanî belkî destê te ji eyarê rûn dernekeve. Belkî yeka te bibe hezarî. Belkî hûn silametî derbas kin li zozana, malê we silametî ji zozana dagere, bê.”*⁶⁸⁴

Belkî ocaxa min bi oxira te re be û te xweyî bike ji derbêd ji dijminan. Belkî şûrê te ji wan re bibe roja Heşer Neşerê: Ji bo kesê diçe şer du‘a tê kirin ku ew serkeftî ji şer vegere.

“Şêx Celad got:

*Maqûl, belkî ocaxa min bi oxira te re be û te xweyî bike ji derbêd ji dijminan. Belkî şûrê te ji wan re bibe roja Heşer Neşerê.”*⁶⁸⁵

Belkî tu di ‘emrê xwe de tu xerabiyê nebînî, xweyî zar û kulfet bî: Ji bo bûkê du‘a tê kirin ku ew şad û bextewar be.

“Ew kesên li wê derê gişan bi hev re digotin:

Here, *belkî tu di ‘emrê xwe de tu xerabiyê nebînî, xweyî zar û kulfet bî.”*⁶⁸⁶

“Oxir be ji te re Zînê! Bi bextewarî û bi ‘emrekî rind bijî..!”⁶⁸⁷

Dewleta Xwedê li ser Xanoyê Çengzêrîn be: Bila Xwedê dewlemendî, kêfxweşî û bextewariyê bide wî.

*“Dewleta Xwedê li ser Xanoyê Çengzêrîn be.”*⁶⁸⁸

Bira hema tu sax bî: Saxî û selametiya kesê/a pê re tê axaftin tê xwestin.

“Megrî, çima digrî? Hûne sax silamet in?

Rihanê hêsir paqijkirin got:

*Bira hema tu sax bî, kul me hatîye, dûrî Sehîd, em gişke silamet in.”*⁶⁸⁹

Bila emrê te û Cimoyê min hevra bigihîje: Bila temenê te û nîşaniyê te dirêj be.

“Destpê kirin, nan xwarin, paşê jî şerbet vexwarin, bona pizmamtîya (eqrebatiya) wan şîrnayî derbazbe. Wextê nan xwarin kuta kirin, dê bistan (mijmijok) ji devê qîza xwe derxist

⁶⁸⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 97.

⁶⁸⁵ *Dimdim*, r. 206.

⁶⁸⁶ *Hopo*, r. 260.

⁶⁸⁷ *Hopo*, r. 261.

⁶⁸⁸ *Dimdim*, r. 67.

⁶⁸⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 152.

anî cem Xudo. Ewî temezîke hevirmişê Îranê ji paşla xwe derxist, bi destê xwe serê Cemîla yek salî va girêda, paçkir (maçkir) û got:

*Bûka min, de bira emrê te û Cimoyê min hevra bigihîje, mîna kulîlka ber çavkanîya, ew kulîlkê ku heta berf jî dikeve ew naçilmisin, bira hûn herdu jî usa bin.*⁶⁹⁰

Bila Xwedê mertalê xwe bide nav mila, ji çavan û qezayan xweyî bike: Du‘a tê kirin ku Xwedê wî kesî ji qeza û nezerê biparêze.

“Dîya Sehîd jê re dibêje:

*Ax- ax her bira Xwedê mertalê xwe bide nav mila, ji çava û qeda xweyîke.*⁶⁹¹

Bila neyê serê kevirê kerî lal: Li vir bi riya hunera mubalaxayê zilma beg û axayan tê dest nîşan kirin.

“Bavo! Ya bega danî serê me, *bila neyê serê kevirê kerî lal*, hila kevirê kerî lal jî guneye.”⁶⁹²

Hey malavabûyo: Malavabûn tê wateya kêfxweşî û selametiye.

“Ez dibêjimê, “*Hey malavabûyo,*” tu hebekî dîn jî razayî, saetek tune tu razayî.”⁶⁹³

Mal bi xweyî be: Bila xwediyê malê her tim sax û selamet be.

“Wey tu li ser çavan bêyî, mêvanê ezîz! Mala min pêşkêşî te.

*Mal bi xweyî be, xwişka Zelêxe.*⁶⁹⁴

Deriyê we timî şên be: Bila mala wê her tim bibe ciyê kêfxweşî û şadiyê.

“Bêmal gote bûkê û ên bi wê re biçin:

Ez diwekilînim, malî ava, em ji we razî ne, *deriyê we timî şên be..!*⁶⁹⁵

2. 2. 5. Nifir

Nifir, bertekeke tund e ku mirov li hemberî wan kesan nîşan dide ku, pêkan e ew kes zerarê bidin wî/wê bi xwe, malbata wî/wê, yan jî civaka wî/wê. Nifir gotinên

⁶⁹⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 172.

⁶⁹¹ *Jiyana Bextewar*, r. 212.

⁶⁹² *Şivanê Kurmanca*, r. 198.

⁶⁹³ *Hopo*, r. 33.

⁶⁹⁴ *Hopo*, 141.

⁶⁹⁵ *Hopo*, r. 260.

neyînî ne ku nalet, bela û xezebê îfade dikin.⁶⁹⁶ Ew, yek ji cureyên herî balkêş ên wêjeya devkî ne. Bi riya nifiran, niyet û daxwazên neyînî yên li hemberî yekî/ê têtên bilêv kirin. Mirov dikare nifir û du'ayê weke dijberên hev binirxîne. Du'a jî nifir jî bêtir ji aliyê jinan ve têtên gotin. Bi taybetî jî nifir, weke di mînakên hîlbijartî de jî xuya dîke, em dikarin bibêjin tenê ji aliyê jinan ve têtên gotin.

Lawo, ew şîrê ku min da te, belkî li te heram be, belkî tu xêrê nebînî, belkî tu ayîkê şevê bi dest nexî, li dûrî vî tîfalî: Di Kurdî de xîtaba "lawo" jî bo mêran têtên bikaranîn lê Şemo, di romanên xwe de vê xîtabê jî bo jinan jî bikartîne. Şîrê xwe li ewladê xwe helal nekirin, di nav gel de nifireke gelek mezin e. Dê, nifiran li qîza xwe dîke lê naxwaze neviyê wê ji wan nifiran zerer bibîne. Loma jî wî dûrî nifiran digire.

"Dê rabû, bû bilebila wê, ber bi dêrî çû, paşê sekinî li keçê nihêrî, got:

Wekî tu neyê ezê nifiran li te bikim!

Zelêxê got:

Bila ew nifir li we bin, li mala we bin!

Dê dest da ser singê xwe, got:

*Lawo, ew şîrê ku min da te, belkî li te heram be, belkî tu xêrê nebînî, belkî tu ayîkê şevê bi dest nexî, li dûrî vî tîfalî.*⁶⁹⁷

Belkî Xwedê textê wî welgerîne, wî têke erdê: Li vir behsa Şahê Îranê têtên kirin û rûxîna textê wî û mirina wî ji Xwedê têtên niyaz kirin.

"Dîlberê got:

*Belkî Xwedê textê wî welgerîne, wî têke erdê.*⁶⁹⁸

De bi cehennema wî kirî: Tu qîmeta wî kesî tune, ew ne hêjayî rêzê ye.

"*De bi cehennema wî kirî, - Dîlberê got, - tu yê bidî xatirê Xwedê, qet behsa wî kûçikî neke. Wekî ew meriv bûya, ew bi erdê sar bikeve, wê biçûya şêr.*"⁶⁹⁹

Weyê êş nav ketana... Ev nan berê çavê we bigre: Hûn baş naxebitin, gerek hûn cezayê wê, weke êş, nexweşî û hwd. bibînin.

⁶⁹⁶ Elçin, h. b., r. 663.

⁶⁹⁷ Hopo, r. 124.

⁶⁹⁸ Dimdim, r. 204.

⁶⁹⁹ Dimdim, r. 236.

“Weyê êş nav ketana, çima hûnê kor in, van simla dihêlin, ne nan e? Ev nan berê çavê we bigre.”⁷⁰⁰

Weylê şepe ser te de hatî: Cureyekî nifiran a navdar e. Bila kar û barê te û jiyana te serobîno bibe.

“Di nav wan da bibû deb, çewa nifir dikirin:
Weylê şepe ser te hatî.”⁷⁰¹

Bila Mîrza Beg li mala te bikeve: Mîrza Beg ewqas şeddad û zalim e ku mirov bi navê wî nifiran li hev dikan.

“Mîrza Beg hela ji qaymeqaymê Romê xerabtir bû, bona milletê Kurda derheqa zilma wî da digotin: *De bira Mîrza Beg li mala te keve.*”⁷⁰²

Berazê ji beraza, minafiq: Di nava gel de beraz xwedî wateyeke neyînî ye. Loma jî kesên xerab tèn dîtin, dişibînin berazan.

“*Berazê ji beraza, minafiq, tê idî hetka min birîye.*”⁷⁰³

Wey lê porkurê. Weyla li me porkuran: Jin bi mabesta şaş bûnê vê biwêjê bikar tînin. Ne ku dixwazin porê wan kur bibe.

“*Wey lê porkurê, lê- lê bihîstîye, dibên kurê Şemo çûye patşê bikuje. Hîla tu lê binêr, ha...*”⁷⁰⁴

“Weyla li me porkuran, em bi erda sar de biçûna xwarê, ji van giliyan çêtir bû, weleh şerm e.”⁷⁰⁵

Weyla bi erda sar de çûyê, weyla min porê te kurkirê: Nifira yekemîn ji bo mêran jî tê bikaranîn û mirina yekî/ê tê xwestin lê nifira duyemîn tenê ji bo jinan tê bikaranîn û tê wê wateyê ku ewa behs tê kirin qebahetek pir mezin kiriye.

“Jinêd pîr li wan dinihêrîn û digotin:

⁷⁰⁰ *Jiyana Bextewar*, r. 18.

⁷⁰¹ *Jiyana Bextewar*, r. 18.

⁷⁰² *Jiyana Bextewar*, r. 50.

⁷⁰³ *Jiyana Bextewar*, r. 81.

⁷⁰⁴ *Şivanê Kurmanca*, r. 157.

⁷⁰⁵ *Hopo*, r. 59.

*Weyla bi erda sar de çûyê, weyla min porê te kurkirê, hela lê binihêrin, bi rex mêrekî xerîb ket, çû!*⁷⁰⁶

“Xezalê li keçikê qîriya, got: Cemîle, *weyla korbûyê, zû, Sakoyê Cimo bîne, ne ji ber sermayê hatiye!*”⁷⁰⁷

Belkî Xwedê te her du çavan kor bike, belkî zarokên te mal bi mal bigerin û ayîkê şevê nebînin: Îşîle tu kor bibî û tu û zarokên xwe rezîl û perîşan bibîn.

“Zozanê digiriya û nifir li Cimo dikirin, digot:

Belkî Xwedê te her du çavan kor bike, belkî zarokên te mal bi mal bigerin û ayîkê şevê nebînin.”⁷⁰⁸

Xwezî ez li dewsa te biçûma erdê sar: Ev mînak “li xwe nifir kirin” e û di zêmaran de tê gotin. Jê mabest ew e ku xwedîya gotinan bi mirina yekî/ê gelek xemgîn bûye.

“Wey Xwedê, te çima wiha kir? Weyla li min porkurê, xwezîla ez li dewsa te bûma. *Xwezîla ez li dewsa te biçûma erdê sar, hewî... wey... gidîno!*”⁷⁰⁹

2. 2. 6. Sond

Sond, bi riya şahit nîşan dayîna Xwedê, mirovek yan jî tişteke pîroz, piştrast kirina gotinekê yan jî bûyerekê ye.⁷¹⁰ Di civakê de sond, ji bo nîşan dayîna bibiryariyê yan jî rastiya agahiyekê tê gotin. Şemo, di romanên xwe de cî dide sond xwarinan.

Sond xwarina li ber erd û ezman: Di romana Dimdim de du caran cureya sond xwarinê ya li ber “erd û esman” tê bikaranîn. Ev cure sond, tê wateya bibiryariyeke mezin.

“Di pey wan giliyên Xano re, *gişan li berd erd û esmên sond xwarin*, bi qesemên mêrê berê ve, serên xwe bidin, lê erdê xwe nedin kesekî.”⁷¹¹

“Werin em giş li ber erd û esmên sond bixwin: Heta ku yek jî ji me sax be, em şer bikin, erdê xwe nedin dijmin! Xanoyê ku ev giliyên xwe xelas kir, serê xwe bilind kir û li cimaeta

⁷⁰⁶ *Hopo*, r. 85.

⁷⁰⁷ *Hopo*, r. 19.

⁷⁰⁸ *Hopo*, r. 35.

⁷⁰⁹ *Hopo*, r. 95.

⁷¹⁰ Toparlı, h. b., r. 104.

⁷¹¹ *Dimdim*, r. 235.

xwe nihêrî. *Gişan sond xwar bi erd û esmên*, wekî heta ku yek jî ji wan sax be, şer bikin, ‘emrê xwe bidin, lê erdên xwe ji dijmin xwedî bikin.’⁷¹²

Bi qirar û qesema mêrê berê be: Cureyeke sond xwarinê jî “bi qerar û qesema mêrê berê” ye. Li vir mêrê berê, nîşaneya mêrxasî û baweriyê ye ku gava mêr sond xwar, baweriyê herkesî li wî tê ku ew wî tiştî bike. Teqez, soza xwe bi cî bîne.

“Paşî û pêşîya koçê ku gihişte hevdu, hîv teze derket, li wê derê gire- girê Êla Sîpka dîsa gihiştne hevdu: Ber erdê û ezmana sayî dest hevda sond xwarin: “*Qirar û qesema mêrê berê be*” wekî qewimî Rom pey me ket serê xwe bidin koka xwe biqelînin, erz- eyalê xwe nedne destê Romê û herne Ûrisetê.”⁷¹³

“Di pey wan giliyên Xano re, gişan li berd erd û esmên sond xwarin, *bi qesemên mêrê berê* ve, serên xwe bidin, lê erdê xwe nedin kesekî.”⁷¹⁴

Hemû Kurdistan bi serê hemze Çawîş sond dixwe: Di nava civakê de hinek kes, bi serê hinek kesên pêşeng, mezin, rêzdar sond dixwin. Ger bi serê yekî sond bê xwarin, ew ji bo wî kesî rûmeteke pir mezin e.

“Lawê min, tu dizanî, *welê hemû Kurdistan bi serê hemze Çawîş sond dixwe*.”⁷¹⁵

Ez bi serê te kim!: Cureyekî din a sond xwarinê ew e ku ew kesê mirov pê re dipeyive, bi serê wî/wê sond bixwe, ev sond ji ya jorê cuda ye. Nayê wê wateyê ku ew kesê ku bi serê wî/wê sond tê xwarin di nava civakê de xwedî cîyeke girîng e lê dîsa jî bi serê wî kesî sond tê xwarin. Ev sond xwarin tê wateya jê hez kirin û qîmet dayînê. “Ranezabûm, Sertîbcan, *ez bi serê te kim!*”⁷¹⁶

Ez bi Dara Mirazan kim: Carînan bi tiştên ku di nava civakê de xwedî girîngiyekê ye, yan jî di baweriyên de cî digre jî sond tê xwarin:

“Dîlber sekinî, gava ku Şebab hat nêzîk bû, wê got:

⁷¹² *Dimdim*, r. 105.

⁷¹³ *Jiyana Bextewar*, r. 39.

⁷¹⁴ *Dimdim*, r. 235.

⁷¹⁵ *Dimdim*, r. 155.

⁷¹⁶ *Hopo*, r. 20.

“Heke tu dixwazî em timî hev bibînin, niha li pey min neyê! Wekî tu bi gurra min nekî, bêyî, ez bi Dara Mirazan kim, ez êdî dernakevim, nayê m cem te!”⁷¹⁷

2. 2. 7. Dengbêjî

Di romana Dimdim de behsa dengbêjan û ciyê wan ê di civakê de têkirin. Dengbêj, vebêjên bûyerên dîrokî ne. Bi riya kilamên wan, gel ji dîroka xwe agahdar dibe û ji dîrokê ders distîne:

“Li wan dolgehan, kalan qise dikirin ji bo wî şerê afatî, ku Xanoyê Çengzêrîn kiribû. Dengbêjan kilam digotin, beytogan beyt derdixistin li ser vî şerê afatî yê ji bo azadiya Kurdistan.”⁷¹⁸

Çanda dengbêjiyê ewqas di nava gel de pêşketiye ku dengbêj ji bajarên cihê tên cem hev û dor bi dor kilaman dibêjin. Çanda dengbêjiyê ya beramber hevdu kilam gotinê didin jiyandin:

“Dengbêjên Kurdistan ên teze hatî ji Hekariyê, Diyarbekirê, Silêmaniyê, Cizîra Botan û ciyên din gelekî bi hurmet dihatine qebûl kirin. Wexta ku dengbêjên rind î hoste berê xwe didane hev du, bi hev re diketine hucetê û laqirdiyan, kilamine qerfî davêtine ser hev du, lê dilê wan ji hev du nedima, yekî digot:

Te li bejnê bejin çend e,

Mîna stûna li ezmên bend e.

Tu li dev mînanî kar î,

Wextê tu distrêyî devî xwar î.

Dibû pirqîniya guhdaran, dikeniyar, hevalê din digot:

Ez te hevalî nav dikim Êzo

Kuro bejna te kûzo,

Tu ku distrêyî mîna tejiyan, kûzekûzo.”⁷¹⁹

⁷¹⁷ *Dimdim*, r. 150.

⁷¹⁸ *Dimdim*, r. 253.

⁷¹⁹ *Dimdim*, r. 237.

2. 2. 8. Stran

Şemo, di romanên xwe de cî dide şex stranan. Em ê li vir yek bi yek li ser wan bisekinin:

“Gava ku xort û keç nerm û kaw ev qeydeyê Gulê Nêrîmê bi çend fetlan çûn hatin, ji nişkêve dengê tuluma Miraz hate birrîn, wê çaxê wî dest kire pelenguşka xwe, stra:

Kurdistan e, ha Kurdistan e, Kurdistan e, ha Kurdistan e,

Ciyê te çiya, mêşe, deşt, mêrg û çîman e.

Ciyê ‘emra delal, kef henekan e,

Ciyê şayîya cahilan, keç û xortan e.

De bira Xwedê xirav ke textê padşê Romê û Şahê Îranê,

Her sal tê ser me şêr bi d’ewa ne.

Timê şinginiya şûran, mertal û kosemisriyan e...

Belkî em Kurd wan ra bivin destan e.

Lewma her sal me şinginiya şûran û kosemisriyan e...

Wan gelek mal birine ber mîratan e,

Lê wana hîla tu xêr nedîtine ji wan şeran e.

Kurdistan e, ha Kurdistan e, miskenê kal û bavê Kurdan e.”⁷²⁰

Ev stran, straneke mêrxasiyê ye. Di şert û mercên şer de hatiye gotin. Ji dîrokê agahiyan dide. Pesnên welatê Kurdan dide û dixwaze ji bo azadiya wî welatî şer bê kirin. Dixwaze ku bi çî awayî be ew welat ku meskenê bav û kalan e, neyê berdan ji bo dijmin.

“Xudêda ew şer dûrva dîbû. Sekinî lê temaşe dikir. Sibhanê helan dane birê xwe, kilamek digot:

Mihê ha Mihê ye, tu mayî tenê ye,

Mihê ha Mihê ye, serê min qurbana birê ye,

Xûşka xwe nede merîyê zulmê ye, zorê ye,

⁷²⁰ *Dimdim*, r. 181.

Peyayo, ha peyayo!
Şûr- mertalê mêrxasa li piştêyo,
Were hewarîya Mihêyo,
Tu dibînî Mihê maye tenêyo.”⁷²¹

Di vê stranê de qêrîn û hawara qîzekê tê vegotin. Yekî axa dixwaze bi Sibhanê re bizewice, tê wê ji birayê wê dixwaze lê ne dilê wê ne jî dilê birayê wê li ser vê zewacê tune. Axa zorê dide wan, ew jî neçar dimînin direvin. Lê axa bi xulamên xwe ve digihîje wan û dixwaze Sibhanê bi darê zorê bibe. Mihê jî li ber xwe dide û naxwaze xwişka xwe bide.

“Gund idî lap nêzîk bû, Cimo kilama ku carînan digot dest pê kir stra:

Kawa⁷²² kubar a dilê min şewitand,
Min kawa xwe bijartîye nava Êla Sîpka,
Nava êla giran, hezar hev sid malî,
Cabeke nexêr mi ra hatîye
Dibên: “Qaşa kembera wê şikestîye”
Wey sêfil halê min deyndarî.
Kawê, wele em îcar naçin cem şêx û mella,
Emê destê hev bigirin herne dîwana van Sovêta...
Dê û bavê te jî qayîl in vê qanûnê ra.
Kawa dilê min şewitand
Min kawa xwe bijartîye nava Êla Sîpka,
Nava êla giran, hezar hev sid malî.”⁷²³

Ev straneke evînê ye. Şkestina kembera yarê weke felaketekê tê dîtin. Stranbêj, çûyîna li cem şêx û melayan red dike û dixwaze biçe cem saziya Sovyetê. Dibêje dê û

⁷²¹ *Jiyana Bextewar*, r. 52.

⁷²² Kew.

⁷²³ *Hopo*, r. 18.

bavê keçikê jî bi biryara çûyîna saziya Sovyetê qaîl in. Ev yek bendora Şoreşa Cotmehê nîşan dide.

“Dema ku Sertîb hat derkeve gujmê, wî li besta li bintara xwe dît. Trextor li pey hev erdê vediqelêşin û diçin. Lê ji nişkê ve dengê Egît ê zîz î xweş li wî tesele bû. Wî hesp da sekinandin û guhê xwe da ser strana Egît û kilameke teze bihîst:

Şereke derketiye li welatê Ewporayê, çem e ha bi çem e,

Qalekê li me qewimiye Varşovayê, Çemê Volgayê,

Çem e ha bi çem e

Eskerê faşîsta giran e, ser me da tê ye lemelem e.

Heyfa min ringînî û teqîniya topê nîne,

Heyfa min tê wê yekê,

Hêsirê belengazî, ser berfê ye.

Semendê bavê Tîtal, mêrxasê dewletê, kire gazî:

Wele nabe, bile nabe, alçaxiya faşîsta qomunîsta ra qe nabe!

De hûn bavê min kiribin lê xin, hev ra lêxin.”⁷²⁴

Ev stran di dema şerê cîhanê yê duyemîn de hatiye gotin. Behsa şerê Almaniyaya Hîtler a Faşîst û Rûsyaya Komunîst dike. Stranbêj, li dijî dagirkerî û êrîşkeriya artêşa Almaniyayê nerazîbûna xwe nîşan dide.

“Gava ku dîsa dest bi xebatê kirin, xortekî bi qeydeyê govendan bi teqil got:

Kurê kerê, ker kanê?

Kera me kera boz e, ser bûye dewe doz e,

Kurê kerê, ker kanê?

Ker diçêriya li meydanê,

Ker kîrîne li Rewanê,

Kurê kerê, ker kanê?

Guhê kerê bi niçik e

⁷²⁴ *Hopo*, r. 50.

Çûne cem neçelik e,
Kurê kerê, ker kanê?
Neçelik dixwaze ruşwetê,
Kurê kerê, ker kanê?⁷²⁵

Ev stran di ber durîna genim de hatiye gotin. Ev çand li gelek herêman heye ku pale, di ber durînê ra stranan dibêjin.

“Ji Şûretê xwestin ku ew stranekê bêje.

Şûretê got:

Ez çawa bistrêm, ne şerm e?
Jineke hebekî sere got: Çima şer me, ne em tenê li vir in!
Şûretê jî hebekî bejna xwe ya zirav a delal tîk kir û serê xwe hebekî bilind kir, dev û lêvên xwe yê naziq ji hev vekir, nerm got:

De wayê, wayê, wayê, wayê...

Te li bextê min sêwiyê, min têwiyê

Ketiye darekê darê ve debiyê

Malê me danîne zozana zozanên vê Gêxîyê

De bira bibe mirazê miraxweza

Mirazê min û mirazê Qulîxanê kurap

Minê çend salekan derbas kira qar û bêgarê vê hêwiyê.

De wayê, wayê, wayê, wayê...

Hetanî ezê xweş bim rû hewata dinê

Tu carî derdê Qulîxanê kurap ji dilê min dernayê...

De wayê, wayê, wayê, wayê...

Bejna Qulîxanê kurapê min zirav e mînanî dara ketê

⁷²⁵ *Hopo*, r. 129.

Hemûşka va eyan e û besîl e, temoriya Qulîxanê kurap
Fenanî diçe hevirmûşê nav kaxetê...

De bira bibe mirazê miraxzweza
Mirazê min û Qulîxanê kurap
Bira ser me derketa mor û kaxezê vê dewletê.
De wayê, wayê, wayê, wayê...
Hetanî ezê xweş bim rû hewata dinê
Tu carî derdê Qulîxanê kurap ji dilê min dernayê...⁷²⁶

Ev stran jî di ber paletiyê de hatiye gotin. Mijara xwe ji evîndarî û hesretê dîstine. Kul û keserên di dilên evîndara de derdixe holê.

“Nêzîkî nivê şevê bû, zava bi def û zurneyê, du birazava li dorê, anîn kirin govendê. Govend bi fetlekê, dudyar geriya, dengê defê hate birrîn, xortekî dest bi kilamên govendê kir, got:

Kuro, tu berdêlî Evdalo lo
Kuro, tu berdêlî kuro Mendo lo
Xwedê, tu bihêlî Evdalo lo
Xwedê, tu bihêlî kuro Mendo lo
Kilê min dizîne, kuro Mendo lo
Kilê min dizîne, Evdalo lo
Keçka dest da dîne kuro Mendo lo
Keçka dest da dîne, Evdalo lo
Xortekî dinê bejinorte ev qayde guhast, got:
Lo mişko, mişko, mişko, mîrkê mişkano
Lo mişko, mişko, mişko, axê êlano
Evî mişkî çî kir çî kir, mîrkê mişkano

⁷²⁶ *Hopo*, r. 130.

Evî mişkî çî kir çî kir, axê êlano...

Vî mişkî embar qul kir, mişkî mişkano

Vî mişkî embar qul kir, axê êlano

Vî mişkî bigrin bînin, mişkî mişkano

Vî mişkî bigrin bînin, axê êlano...

Têkne kodê bivne odê, mişkî mişkano

Têkne kevçî, para defçî, mişkî mişkano

Rûviya dirêj, para dengbêj, mişkî mişkano

Rûviya dirêj, para dengbêj, axê êlano...⁷²⁷

Di demên berê de alavên elektronîk ên deng ên weke hoparlor tune bûn. Di dawetên ku bi rojan û bi şevan dewam dikirin de, bi devkî stran dihatin gotin. Di nav govendê de du kesan li ber hev didan, li hevdu werdigerandin. Yan jî govend dibû du beş û beşekê digot beşa din lê werdigerand. Bi vî awayî bi rojan, hetanî sibehê govend û stran berdewam dikir.

2. 2. 9. Helbest

Di romana Dimdim de, dema leşkerê Îranê Kelhê dorpêç dike û ava kelehê dibire, di destê nişteciyên kelhê de tu derfetê rizgar bûnê namîne, Xano bi serokên eşîran re şêwr dike. Di şêwra giran de biryara teqandina kelhê û xwekuştinê tê dayîn. Piştî şêwrê jî Xano wiha ferman dide leşkerên xwe:

“De gidîno, bikin bilezînin,

Barûtê zû ji çelan derînin,

Kela Dimdimê hemû bihedînin,

Bila dijmin bibînin teslîma we tunînin...

Zû kirin û lezandin,

⁷²⁷ *Hopo*, r. 263.

Barût ji çelan derandin,
Kela Dimdimê teqandin,
Hemû Kurdistanê nîşan din...

Miyasera Şah Ebas nebû,
Xano ji dîne xwe dernebû,
Teslîmî Şah Ebas jî nebû,
Ew li hemû dinyayê eyan bû...

Bila hemû Kurd bizanibin,
Heke xayîn di nava wan de peyda bin,
Ewê her gav bê erd û bê war bin
Her gav jî stûxwar bin,
Wê di binê destan de bin...⁷²⁸

Di Jiyana Bextewar de çîroka Şêxê Steanî yê dibe mêvanê Padşê Gurcîstanê û li wir dibe evîndarê keça Padşê cî digre. Lewra ji bo keça padşê vê helbestê dibêje:

“Wextê te nan anî,
Te sot dilê şêxê Siteanî.

Tu dihatî dest da tava,
Min tirê milyaket e ji hewa.

Tu delal î, bejin zirav,
Tu husnî cemal î û cenav...

⁷²⁸ *Dimdim*, r. 247.

Keçke delal, dilî ji surê,

Were rastî min mukurê.

Tu hizdikî kurê Kurda,

Yê dimîne li serê çîya...

De rast bêje, tu zû bêje,

Dilê minî mîna têj e...⁷²⁹

2. 2. 10. Xeberoşk

Xeberoşk, bûyerên awarte radigihîne. Di nava gel de nifş bi nifş tîn neqil kirin. Piraniya xeberoşkan, bûyerên di serê mirovan de derbas dibin vedibêjin.⁷³⁰ Ji aliyê dirêjbûnê ve xeberoşk kin in, dema diqedin, tama wan dimîne li ser lêva mirov. Piştî bidawîbûnê xeberoşkê jî xwendevan yan jî guhdar, jiyana lehengan mereq dîkin û bi qedandina xeberoşkê xemgîn dibin.⁷³¹ Xeberoşk, yek ji cûreyên wêjeya devkî ye. Şemo, di romanên xwe yên bi navê Dimdim û Jiyana Bextewar de cî dide şeş xeberoşkan:

“Kevotka cahil ê, nezan e

Teze ji hêlînê derket ji xwe re bigere...

Lê teyrekî sere yî atmece

Ew girt, bire hêlîna xwe.”⁷³²

“Heyv û tav xwişk û bira ne, dilê wan kete hev du, ew yek guneh e. Xwedê pê hisiya, Wî ew her du avêtin jorê, hewayê. Niha her du li pey hev digerin, wekî bigihîjin hev du, lê dîkin

⁷²⁹ *Jiyana Bextewar*, r. 159.

⁷³⁰ Toparlı, h. b., r. 1349.

⁷³¹ Ensar Aslan, h. b., r. 278.

⁷³² *Dimdim*, r. 75.

nakin nikarin bigihîjin hev du. Xwedê neke ew bigihîjin hevdu, lê wekî ew bigihîjin hev du, wê koka dinyayê bê, erdê welgere, wê mirovahî di bin bikeve, kesek namîne.”⁷³³

“Terzî mala barkir, tu paş da mayî lezke! Terzî caba wan da: Ezî hergav hazir im, derzîya min ber kumê mira ne.”⁷³⁴

“Hatîye nizama⁷³⁵ Mûşê ye,
Top qumandare li pêşyê ye,
Ezê dikim xwe bavême qumandara
Belkî delalîyê min nebne nîzamîyê ye,
Nizamo, fino sore,
Qotike pê da xweş ordam e...”⁷³⁶

“Hinek tucar diçine hecê, wexta ku ew diçine Mekeyê, parçe jî bi xwe re diwin, li çarsîya Mekeyê difiroşin. Wexta ku ceba wan tijî pere dibe, paşê diçine hec, dua dikin û ziyaretî dibin, vedigerin, têne malêd xwe, êdî dibin merîvêd ziyaretî. Lê gava ku merîvekî bineliyê Mekeyê digote wan: “Hûn şerm nakin, hûn nehatîne ziyaretî bin, hûn hatine mexlûqet bixapînin, cêbên xwe tijî pere bikin. Hûn ne meriyê ziyaretê ne?” tucaran digot: “Çi firqî heye, hem ziyaret, hem jî ticaret.”⁷³⁷

“Şebab li wê derê hesp çêrand, hat jorê, wî dît, di fêza wî de, li ser kevirekî bilind şivanek rûniştiye, pezê wî li dora wî ji hev belav bûye diçêre, ew jî, ji xwe re li bilûrê dixê. Şebab guhê xwe da ser, wekî bizanibe bi kîjan qeydeyê lê dixê. Wî bihîst û xwe bi xwe hêdfika ew qayde aha wiha stra:

Bêjingbirê, bêjingbirê,
Bêjing ser bavê da xiravkirê,
Zû cabê bide malê,
Pezê bavê te diza birê.

⁷³³ *Dimdim*, r. 138.

⁷³⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 133.

⁷³⁵ Nizamiye, artêşa bejahiyê.

⁷³⁶ *Jiyana Bextewar*, r. 180.

⁷³⁷ *Hopo*, r. 58.

Kete bîra Şebabî çawa di vê qiseyê de tê gotin, “Axê li şivanê xwe re kire bêbextî, keça xwe neda şivên.” Ev serhatî li ser wê qewimandinê hatiye gotin.”⁷³⁸

Ev xeberoşk, di nava gel de tîn zanîn. Dema bûyerên ku dişibin van xeberoşkan diqewimin, ev xeberoşk ji bo zelal kirin û baş fêhm kirin dayîna bûyerê tîn gotin.

2. 2. 11. Çîrok

Çîrok, bûyerên bûyî yan jî dikare bibe di xwe de dihewîne. Di çîrokê de bûyer û leheng kêr in. Her wiha dem jî kin e û ne diyar e.⁷³⁹ Çîrokên gelêrî binbeşek ji çîrokan e. Mijarên xwe ji serpêjhatiyên gel digre. Di çîrokên gelêrî de têkiliyên civakî tîn vegotin, têkiliyên mirovan ên bi hev re û pevçûnên wan tîn ragihandin.⁷⁴⁰ Van çîrokan, di nava gel de bi awayê devkî bi sedan, bi hezar salan cî girtine û belav bûne. Şemo jî, di nav civakê de ev çîrokên gelêrî bihîstine û di romanên xwe de cî daye şeş çîrokên gelêrî:

1. Kaniya Bûkê

“Ew kanî zivistanê qet nediqerimî. Havînan jî, ava vê kaniyê gelekî sar bû. Derheqa wê kaniyê de di nav cimaetê de wiha qise dikirin: Ji zû de, wexteke zivistanê, bûkekê di wê riyê de tînin. Wexta ku tîn ser wê kaniyê, ji bo eşqê dengbêj destpê dike bistrê, hema ku ew devê xwe vedike û diqîre, ji nişkê ve dibe xuşîniya şepeyê, ji jorê de dişiqite tê, lê wisa zû tê wekî pêncî siwarên bûkê, bûk, du berbû, defvên û zurnevên di berfa kur de dinixême, ji wan qet yek jî xelas nabe. Di mala zavê de jî, karê xwe kiribûn, pez û dewar şerjêkiribûn, her tişt hazir kiribûn û li hêviya bûkê bûn. Gerek wê rojê bûk bianiyana. Disekinin heta êvarê, lê bûk wê rojê nehat. Ji wan tirê mala bavê bûkê siwêr bernade. Li hêviya wan disekinin, lê rojtira din dîsa bûk nehat. Roja sisyan çend mêt siwar dibin û diçin mala bavê bûkê, wekî pê bihisin çima bûkê naynin. Gava ku ew tîne nav wî geliyî, li kê derê Kaniya Bûkê lê, dibînin şepeyê ew gelî wisa tijî kiriye û xitimandiye, rastedûz kiriye, wisa jî berf lod kiriye, wekî mirov nikare di ser wê şepeyê re derbas bibe. Qet rê tune. Ew dizivirin malê û di riyêke din re diçin mala bûkê. Li wê derê pê dihisin bûk wê roja ku siwar hatine pey bûkê, hema wê rojê birine. Gelekî li bûkê digerin, diçin nava qebîleyan û eşîran lê bûkê nabînin û wisa dimînin. Her wexteke biharê, êdî ketibû meha havînê ya ewilîn, koçer tîn ser wê kaniyê, dibînin ecêbeke reş e, cinyazeyên mirovan û cendekên hespan. Cabê didin merivên wan û ew jî tîn merivên

⁷³⁸ *Dimdim*, r. 98.

⁷³⁹ Cahit Kavcar û yên din: *Yazılı ve Sözlü Anlatım*, Weşanên Anı, Ankara, 2004, s. 94.

⁷⁴⁰ Kavcar, h. b., r. 97.

xwe nas dikin. Mele dibêje: Hûn wan gerek hema li wê derê jî hed bikin, çimkî Xwedê li eniya wan wisa nivîsîbû, wekî wan li wê derê ruh dan.

Çawa ku mele dibêje, hema wisa jî dikin; li wê derê nêzîkî pêncî mezêfî dikolin û wan cinyazeyan çal dikin.

Lewma di nava hemû eşîran de bûbû edet, rojên zivistanê, ku di vê riyê re dihatin, gava ku her di wê kaniyê re derbas dibûn, devên xwe digirtin, qet xeber nedidan heta ku ji kaniyê derbas dibûn û ji gêlf derdiketin, paşê devên xwe vedikirin û xeber didan. Lewma jî ji vê kaniyê re digotin, Kaniya Bûkê.⁷⁴¹

Li vir bal tê kişandin li ser erdigarî û avhewayaya Kurdistanê ya tund û encameke wê ya dilsoj.

2. Meymûna Reqsvan

“Digotin, carekê li Îranê, Xan gazî Likoyê mirtiv dike, dibêje:

“Liko, min bihîstîye tu sazbandekî usan î, wekî tu defê, yanê zurnê lêdixî, ne ku însanet, hesp jî xwe xwe direqîsin. Were lêxe, herkê meymûna min ber defa te reqîsî, ezê hespekê bidme te, wekî meymûna min nereqîsî ezê te dardakim.

Wê rojê mala xan da kêf û eşq bû, gele xanêd Îranê li wê derê top bibûn, kêf dikirin, gişke serxweş bûn. Liko zurnê dide ser lêva û lêdixe. Birazîyê wî jî li defê dixê. Berê meymûn qe ji cî naleqe, qe guh nade def- zurna Liko. Xan li Liko dinêre, dikene dibêje mêvana: “Ezê celad bînim vî Kurdî îro dardakim.” Liko vedigere qeydê “lîzê” lêdixe. Wextê dengê zurna Liko û teqla defê dikeve guhê meymûnê meymûn radibe, direqîse, serîkî diçe, tê. Paşê diçe destê xweyê xwe digre, kaş dike, wekî ew jî rabe reqasê. Dibe pirçe- pirqa mêvana dikenin. Xan gazî xulama dike hespekî zînkirî didin Liko.”⁷⁴²

Ev çîrok, balê dikişîne li ser pisporiya sazbandên Kurd û hunera wan.

3. Riya Kadiz

“Yekî pirsî: Çima vê rêça hane rû ezmin ra dibên “Rîya kadiz”? Kesekî caba wî neda, her kalekî tarîyê da got: Rastî em jî pak nizanin, lê mezinê me wê ji mera gilî kirine. Wextekê axlêve bûye. Bihar wê salê dereng hatibû, debara dêwêr û pezê hineka xilaz dibe. Debara

⁷⁴¹ *Dimdim*, r. 82.

⁷⁴² *Jiyana Bextewar*, r. 69.

pezê şêx jî xelaz dibe. Şêx diçe kayê cînarê didize lê ji timayê sepeta xwe usa tijî dike wekî rêva dirêje. Ew merîyê xweyîyê kayê sibetirê radibe dinhêre kaya wî dizîne, vaye kivş e, hema wê rê digire diçe çika diz kîye? Xweyîyê kayê rîya kadiz da tê, rê wî tîne dûz ber derê şêx. Xweyîyê malê tê ber derê şêx dibêje: “Heyran te çima kaya min îro dizîye, ne tu ebadetê Xwedê dikî. Me ra tu dibêjî, eteka te em paç dikin, tu şerm nakî!” Şêx înkâr dike dibêje:

Evdê serreş, qûlê Xwedê, tu şera davêjî min, devê teyê xwar be, mala te wê xirab be.

Xweyîyê kayê û şêx dikne şer. Xweyîyê kayê merîkî qewet bûye, dest davê rûyê şêx, kaş dike dibe wê rîya ku ewî kayê dizîye, nîşan didê, heta ber derê mereka xwe, têr wî dikute, paşê berdide. Dibên: Xwedê ew rê ussa hişt.⁷⁴³

Di çanda Kurdan de gelek nav, piştî bûyerekê hatine dayîn/hatine standin. Ev jî mîna keke wisa ye ku bûyerê navê rê eşkera kiriye.

4. Şêxê Senanî

“Şêxek ji bajarê Ste‘anê yanê Bidlîsê, koçber bûye, hatîye Gurcîstanê. Wî şêxî, li hemberî Romê mêranîyeke mezin kirîye. Bona wê mêranîya ku şêx kiribû, Padşê Gurcîstanê gazî şêx dike û hurmetekî mezin jê ra digire. Qîzeke wî padşayî hebû, wê rojê ew qîz berdestê mêvana qalix dike, xwarinê û şerabê tîne. Şêx wê keçikê dibîne, dilê wî dikeve wê qîza padşê. Eva beyta çend sebeq bîra min tê, li ser wê keçikê tê gotinê:

Wextê te nan anî,

Te sot dilê şêxê Siteanî.

Tu dihatî dest da tava,

Min tirê milyaket e ji hewa.

Tu delal î, bejin zirav,

Tu husnî cemal î û cenav...

Keçke delal, dilî ji surê,

Were rastî min mukurê.

Tu hizdikî kurê Kurda,

Yê dimîne li serê çîya...

⁷⁴³ *Jiyana Bextewar*, r. 93.

De rast bêje, tu zû bêje,
Dilê minî mîna têtj e.”⁷⁴⁴

Gelek evîndaran, evîna xwe bi rêya stran û helbestan vegotiye. Bi vî awayî evîna wan di nava gel de deng daye. Şêx jî evîna xwe bi rêya helbestê aniye ziman û evîna wî di nava gel de hatiye zanîn. Wersiyoneke din a vê çîrokê ji aliyê Feqiyê Teyran ve jî bi navê Şêxê Sen‘anî hatiye gotin. Şemo bi awayê herêmî gotiye Şêxê Ste‘anî.

5. Xidirê Qaçax

“Wextekê li Cizîra Bota qaçaxekî derketibû, ewî gele xirabî kiribû: Dikanê bajarê Cizîra Bota derevedikir, davîte ser kerîyê pêz, talan dikir. Mîr dît, wekî ehlê bajarvanê wî nikare ji destê wî qaçaxî rihet bimînin; Mîr hukum kir wekî wî qaçaxî bigrin. Zabîfyêd Mîr ew qaçax girtin. Navê wî qaçaxî Xidir bû. Jê ra digotin Xidirê Pîrê. Deng li hemû olka bela bû, wekî Xidirê qaçax girtine. Ji hemû alîya merî hatne şîkyat. Mîr lê nihêrî rastî jî Xidir mexlûqet vejandîye, xirab kirîye, dizekî betere. Mîr hukum dike ser qazî: Qirareke usa derxe, ku Xidir bişewitînin, wekî yekî dinê idî xeletîkî usa neke. Xidir tînin darekê va girê didin, agir didine binî. Wextê alava agir tê digihîje lingê Xidir, Mîr pêş wî disekine, jê pirs dike:

Xidir, te qet rojê ji vê rojê xirabtir dîtine?

“Belê Mîr, tê bîra min, rojekê mêvan hatne mala min, wê rojê nan mala min da tune bû, wekî min nan bida mêvana, a... roja lape (gelek) çetîn ew bû, eva çiteva ye anegorî wê rojê?”⁷⁴⁵

Di wersiyoneke din a vê çîrokê de navê qaçax Elo Dîno ye. Ev çîrok mînaekeke girîng a mêvanperweriya Kurdan e.

6. Siyabend û Xecê

“Em hatin nêzîkî çîyayê Sîpanî- Xelate bûn. Mezinata wî çîyayî ussa mezine, bawerke-tiştêkî ji Egrî- Daxê danaxe. Derheqa wî çîyayê Sîpanî- Xelatê de Kurmanca kilameke rind dibêjin û şîro dikin:

Xwedê giravî zaf zûda serê wî çîyayî digeriya xortekî zafî bedew û êgin, Siyabendê Silêvîn. Siyabend xwe ji Êla Zîllîya bû. Dilê Siyabendê Silêvîn ketibû Xecê. Siyabendî xwe kesîb bû, waqa malê wî tunne bû wekî qelenê Xeca bedew bida, ji xwera banîya. Xecê jî qîzeke zaf bedew bû, çîqa eşîreta dora wan hebû, wekî çavê kê li Xecê keta, aqilê serê wan

⁷⁴⁴ *Jiyana Bextewar*, r. 159.

⁷⁴⁵ *Jiyana Bextewar*, r. 171.

diçû. Dilê Xecê jî pir ketibû Sîyabendê Silêvîn. Bavê Xecê Kurmancekî orte bû, zanbû, wekî dilê Xecê û Sîyabendê Silêvîn hevda heye. Ewî jî Sîyabend rind qebûl dikir, lê ji timaya dinê, nedixwast, qîza xwe bide Sîyabendê Silêvîn. Ewî dixwast qîza xwe bide, qelenekî pir bistîne. Mêraya Sîyabend, jê hatina wî, hurmeta wî û bedewîya wî meriv jê têr nedibû. Sîyabend û Xecê ji emrê tebiatê herdu jî dengbêj bûn. Sîyabend û Xecê dizîkava rastî hev dihatin, diketne kêf û heneka, lê gava dibû besa qelen, Xecê digrîya, Sîyabend ber dilê wê da dihat, nedihîşt Xecê bigrî û sond dixwar, wekî- çewa hebe, hergê kuştin be, bi zor be yan xweşî be- destê wî tu carî ji Xecê nabe û wê Xecê xwera bistîne. Carekê qîz bûkê Êla Zîliya top dibû, diçine bindarûkê. Xecê û Sîyabendê Silêvîn jî diçûn, ji serê çîyayê Sîpanî- Xelatê waqa qîz- bûk top dibin, ji hesaba tê der. Gava ku Xecê û Sîyabendê Silêvîn têne wê derê, devê teva xwar dibin, zûr dibin, li wan herda dinêrin. Gava ku dibû listik yan dengbêjî, dîsa kesek mînanî wan tunne bûn.

Gelle kurêd bega, axalera û dewletîya dihatine xwezgînîyê Xecê. Xecê ew nedistandin.

Çend sal ketne ortê. Rojekê Sîyabend Xecê revand. Bire serê Çîyayê Sîpanî- Xelatê. Sê roj û sê şeva Sîyabend û Xecê hev şa dibûn û zafe razî bûn, çewa emrê wan gehişte hevdu. Roja çar, nava rojê, nav kulîlkada herdu rûniştîbûn. Sîyabend, xewa wî hat, serê xwe da ser çoka Xecê, xewra çû. Wî çaxî ringe- ring hat. Xecê binîyêda li bestê dinêrî, gakûvîke rinde delal wê direve, du- sê gakûvîya daye pey. Lê gakûvîkî mezinî xalû xalî ew gakûvî tek kirîye, dibe, yê dinê newêrin, serda herin. Wextê eva yeka Xecê dît, Xecê digrîya, hêsir ji çavên wê dilop kir, hate kete ser sûretê Sîyabend. Sîyabend ji xewê banzda ser xwe, lê nihêrî, Xecê digrî, Sîyabend pirs kir.

Xecê, çima tu digrî? Divek tu poşman bûy?

Xecê gote Sîyabend:

Na, eze ne poşmanim. Hetta roja mirinê ez ji te dûr nakevim.

Lê tu çima digrî?" Sîyabend ji Xecê pirs kir.

Hêşka gakûvîkî, yeke gakûvîya rind dabû pêşîya xwe dibir, du sê heba ji dûrva pey diçûn, newêr bûn, xwe bidane ser. Ew gakûvî mêrxaskî mîna tebû, ji şabûna ez girîyam.

Ka, Sîyabend pirs kir: Kîalî çûn?

Xecê nîşanî Sîyabend da, got:

A, vî alîyê han çûn, - destê xwe dirêj, gerê kir.

Sîyabend rabû ser xwe, şûr û mertala xwe girêdan, tîr û kevanê xwe hilda, got:

-Serê vî çîyayê Sîpanî- Xelatê kesek ji min mêrxastir tunne, ez jî nêçîrvanim. Çewa cem min gilîyê ussa bibe, - û rabû, pey ket, çû.

Sîyabend nêzikî gakûvî bû, tîrkevanê xwe dirêj kir, wekî lêxe, gakûvî xwe dirêjî Sîyabend kir, sturuyê xwe li Sîyabend xist, Sîyabend avîte gelî.

Lazekê şûnda Xecê pey çû. Wî alî- wî alî Sîyabend, Sîyabend tunne. Xecê gellekî gerîya, hate hafa qeyê lênihêrî nale naleke wê ji binê gelî tê. Xecê qûz bû. Lê nihêrî çî binêre. Sîyabendî wê qeyêda binê gêlî, nale- nal jê tê. Xecê vira dest bi kilama kirî got:

Serê çîyayê Sîpanî- Xelatê wa bimije,

Binê çîyayê Sîpanî- Xelatê wa bimije,

Kê dîtîye, kê bînaye,

Wekî nêçîr- nêçîrvan bikuje?

Gakûvîyo, te stru dirêje wekî bejna mino,

Çawa te ji hev kir destê jin û mêro?

Stru dirêje weke dara sûkê,

Çawa te xirab kir bextê xort û bûkê?

Sîyabend got:

Xecê, Xeca mine delal,

Çewa nebû mirazê min te,

Me yê xwera serê Sîpanî- Xelatê,

Çêkira konekî rindî delal,

Xecê, meke melûrîne,

Hêsira ser sûretê sorda nebarîne.

Sîyabend û Xecê gelle kilam gotin. Xecê kilamê xwe da nifir dikir li çîyayê Sîpanî- Xelatê, kanîyê wê, pincara wê û meşê wê. Xecê nifir dikir wê şînayê, ya ku lê çêrîya ew gakûvî... Xecê xwe ji zinêrda davêje.⁷⁴⁶

Çîroka Sîyabend û Xecê di nava gel de bi sedan salan e tê vegotin. Şemo jî li vir, cî daye wersiyoneke vê çîrokê

⁷⁴⁶ Şivanê Kurmanca, r. 135- 138.

ENCAM

Erebê Şemo, bi berhemên xwe û jiyana xwe yek ji girîngtirîn nivîskarên Kurd ên sedsala XXan e. Wî di jiyana xwe de, li gel milletê xwe, him dema zext û bindestiyê, him jî dema dilşadî û azadiyê dîtîye.

Wî, bi berhemên xwe, ji bo gelê xwe jiyaneke azad û wekhev destnîşan kiriye û jî bo bidest xistina vê jiyane jî têkoşîn daye. Tevahiya jiyana wî di nav van xebatan de derbas bûye. Ew, weke rewşenbîrekî çalak, dem hatiye nozdeh salan li Sîbîryayê sirgûnî jiyaye, dem hatiye bi çalakvanî û serkeftina xwe xelata Yekîtiya Sovyetan a mêrxasiyê standî ye. Wî rengên reş û spî yên jiyane dîtine.

Erebê Şemo, gelek girîngî daye xwendinê. Him daye xwendina xwe bi xwe, him jî daye xwendina ciwanên Kurd. Bi vê armancê xwe bi xwe hînî xwendin û nivîsandinê bûye û dûvre jî perwerdehiya bilind dîtîye. Wî, bi xêra têkiliyên xwe yên bi dewletê re, gelek ciwanên Kurd ji bo xwendinê şandiye bajarên mîna Moskowa, Êrîvan û Tiflîsê. Ew ciwan, piştî ku perwerdeya xwe qedandin, hatin nava gel û weke Erebê Şemo ji bo pêşketina gel xebitîn.

Şemo, çar romanên hêja nivîsîne. Romana wî ya pêşîn a bi navê Şivanê Kurmanca, di heman demê de romana Kurdî ya yekemîn e. Bi vê taybetiyê ew bûye “Bavê Romana Kurdî”. Wî bi çar romanên xwe jiyana, çand û dîroka gelê xwe derbasî nivîsê kiriye. Ew di qada wêjeyê de bûye berdevk û nûnerê gelê xwe.

Romanên Erebê Şemo, ji aliyê hêmayên folklorê ve gelek dewlemend in. Wî, hema bêje tu kevneşopiyên gelê Kurd li derveyî romanên xwe ne hiştine. Ji keç xwestin û revandinê bigre heya berdêl û niqirkirinê, ji qelen bigre heya dawet û govendê, zibare, jiyana koçeriyê, cejna beranberdanê, çavînî bûn, nêçîr... Di romanên wî de cure cure bawerî tên dîtin: Remildarî, dara miraza, bijîjkiya bi nivîştan û postê pezan... Pirsgirêkên civakî nivîsîne: xwîndarî, zordariya desthilatan, ne wekheviya çînan, dijraberiya perwerdeyê, dijraberiya guherînê... Di romanên wî de lîstikên zarokan, wêrekiya jinan û mêran, nêçîrvanî, xwedîkirina hespan, kulav û konên Kurdan, alavên xemla jinan, xwarin, cejna newrozê ya netewî, mêvandariya Kurdan, cî digrin. Berhemên çanda devkî ya hezar salan: gotinên pêşiyar, biwêj, dua, nifir, sond, dengbêjî, çîrok, helbest û stran... Bi van taybetiyan romanên Erebê Şemo ji bo

lêkolîneran weke deryaya ne. Romanên Wî, him wêneyên zindî yên dewra xwe dide pêşberî xwendevanan him jî ji pêşerojê agahiyên girîng dide ku xwendevan, ji wan agahiyên derbareyê jiyana demên berê de haydar dibe. Şemo, bi van taybetiyan bûye pêşengekî wêjeya Kurdî. Wî gelek bandor him li hevçaxên xwe him jî li nifşên piştî xwe kiriye. Bûye nimûneyekî serkeftî yê di xizmeta gelê xwe de. Ji ber van sedeman berhemên wî hêjayî gelek lêkolînên bi mijarên cûr be cûr in.

Şemo, di rojnameya Riya Teze de jî peywîr standiye. Li herêma Kurdan gund bi gund geriyaye û hejmarên vê rojnameyê bêpere li gel belav kiriye ku gel ji pêşketinên rojane haydar bibe û xwendina rojnameyê zêde bibe. Wî, di Radyoya Êrîvanê de jî peywîr standiye û piştî Şoreşa Cotmehê, bi pişthgiriya dewletê, ji bo dibistanan alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî amade kiriye.

Belê, Şemo ji ber ku ne li Bakûrê Kurdistanê jiyaye, li vir, ji aliyê hindik mirovan ve tê zanîn. Ji ber vê sedemê, di gel ku wî ji gelek nivîskarên navdar ên Kurd bêtir berhem dane û zehmetî kişandiye lê dîsa jî kêmtê nas kirin. Şemo, heja ye ku li ser wî konferans û civîn bînin kirin. Jiyana wî û berhemên wî bînin nîqaş kirin û nasandin. Erebe Şemo, bi hemû xebatên xwe li gorî gotina xwe ya weke “Ew kesê ku jiyana xwe ji bo gelê xwe derbas dike; ew ê tu cara neyê ji bîr kirin” tev geriyaye. Wî jiyana xwe ji bo gelê xwe derbas kiriye û ew ji bîr nekirinê heq dike.

ÇAVKANÎ

Adigüzel, Sedat: “Elçin Efendiyev’in Romanları Üzerine Bir Çalışma- Oluşumsal Yapısalcı İnceleme” Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Atatürk Enstîtuya Zanistên Civakî, Erzurum, 2001.

Ahmedzade, Haşim: “Di Romana Kurdî de Guherînên Şêweyî û Babetî.” Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011.

Ahmedzade, Haşim: *Romana Kurdî û Nasname*, wer. Fahriye Adsay, Weşanên Avesta, İstanbul, 2011.

Ahmedzade, Haşim: *Ulus ve Roman*, wer. Azad Zana Gündoğan, Weşanên Pêrî, İstanbul, 2004.

Akboğa, Hasan: “Radyoya Êrîvanê”, Kovara Kürt Tarihi, h. 4., Kanûn 2012- Çile 2013, İstanbul, 2013.

Aksan, Doğan: *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1., ç. 4., Weşanên TDK, Ankara, 2007.

Aksoy, Erol: “Ahmet Hamdi Tanpınar’ın Eserlerinde Halk Bilimi Unsurları” Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Erciyesê Enstîtuya Zanistên Civakî, Kayseri, 2005.

Alakom, Rohat: *Kars Kürtleri*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2009.

Alan, Remezan: *Bendname*. Weşanên Avesta, İstanbul, 2009.

Alan, Remezan: “Kürt Halk Şarkıları İçin Küçük Bir Poetika”, Kovara War, h. 2., Payîz, İstanbul, 1997.

Allison, Cristine ve Kreyenbroek, Philip: *Kürt Kimliği ve Kültürü*, wer. Ümit Aydoğmuş, Weşanên Avesta, İstanbul, 2008.

Alver, Köksal, *Edebiyat Sosyolojisi*, ç. 2., Weşanên Hece, İstanbul, 2006.

Anderson, Benedict: *Hayali Cemaatler*, ç. 6., wer. İskender Savaşır, Weşanên Metis, İstanbul, 2011.

Aristova, Tatyana Feodorofna: *Kürtlerin Maddî Kültürü*. wer. İbrahim Kale û Arif Karadağ, Weşanên Avesta, İstanbul, 2002.

Arî, Arjen: *Destana Kawa*, Weşanên Elma, İstanbul, 2003.

Aslan, Ensar: *Türk Halk Edebiyatı*, ç. 2., Weşanên Maya Akademi, Ankara, 2010.

Aydoğan, İbrahîm Seydo: Hin Nirxandin û Îstatîstîkên li ser Romana Kurdî.

http://www.amidakurd.net/nuce/75_sal_%C3%BB_197_roman%C3%AA_n_kurd%C3%AE_kurmanc%C3%AE, (20 Adar 2012.)

Aydoğan, İbrahîm Seydo û Ergul, Selîm Temo: *Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê 15- 18 Tîrmeh 2010*, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011.

Baqir, Abdurahman: “Ji Şivantiyê Ber bi Zanyariyê ve”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, Diyarbakır, 2007.

Bazîdî, Mela Mehmûdê: *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, Amd. Jan Dost, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2010.

Bedirxan, Ezîzê Ziyô: *Kızıl Kürdistan*, çev. Hejarê Şamîl, Weşanên Pêrî, İstanbul, 2010.

Bender, Cemşîd: *Kürt Mitolojisi*, ç. 3., Weşanên Berfîn, İstanbul, 1999.

Berman, Marshall: *Katı Olan Her şey Buharlaşıyor*, ç. 14., wer. Ümit Altuğ û Bülent Peker, Weşanên İletişim, İstanbul, 1994.

Bloch, Jen Rechard: *Kürdistan'da Bir Gece*, wer. Nice Damar, Weşanên Avesta, İstanbul, 2003.

Bolat, Betül: “Mustafa Kutlu'nun Hikayelerindeki Halk Edebiyatı ve Halk Bilimi Unsurlarının İncelenmesi”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Selçukê Enstîtuya Zanistên Civakî, Konya, 2007.

Boratav, Pertev Naili: *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, ç. 9., Weşanên Gerçek, İstanbul, 1999.

Boratav, Pertev Naili: *Folklor ve Edebiyat*, c. I- II, Weşanên Adam, İstanbul, 1982.

Boyik, Eskerê: “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Diyarbakır, 2007.

Boyik, Eskerê: “Nihêrîna li Ser Edebiyata Kurdên Sovyetê”, Gotarên Konferansa Ziman û Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Hekariyê, Weşanên Zanîngeha Hekariyê, Hekarî, 2011.

Boyras, Şeref: “Surname- i Hümayun’da folklorik Unsurlar”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Erciyesê Enstîtuya Zanistên Civakî, Kayseri, 1994.

Bruinessen, Martin Van: *Ağa, Şeyh ve Devlet*, ç. 7., wer. Banu Yalkut, Weşanên İletişim, İstanbul, 2011.

Cabur, Ayşegül Kılınç: “Tarık Buğra’nın Romanlarındaki Halk Bilimi Unsurları Üzerine Bir İnceleme”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Selçukê Enstîtuya Zanistên Civakî, Konya, 2006.

Can, Hüseyin: *Sosyalist Sovyetler Birliği’nde Kürtler*, Weşanên Pêrî, İstanbul, 2005.

Celîl, Celîlê: “Radyoya Kurdî li Yerîvanê û Bingehdanîna Wê”, Kovara Bîr, j. 3., Payîz, İstanbul, 2005.

Cewerî, Fîrat: *Hawar*, c. I- II., Weşanên Nûdem, Stockholm, 1998.

Cindî, Hacıyê: *Epîkên Kurdî*, amd. Memo Yetkîn, Weşanên Indvandrarfêrlaget, Swêd, 1985.

Conoğlu, Salim: “Türk Şiirinde Folklor Dönüşte Meyve”, Kovara Turkish Studies , h. 3. Payîz, 2008.

Çaçan, Xelîlê: “Miletê di Heyra Wî de Bû”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Diyarbakır, 2007.

Değirmenci, Hakan: “Şerif Benekli’nin romanlarında Kültürümüzün Unsurları”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Dumlupınarê Enstîtuya Zanistên Civakî, Kütahya, 2001.

Denîz, Serwet: “Her Ew Hesret û Ew Xwezî”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Diyarbakır, 2007.

Derwêş, Hesên: “Ber bi Romana Kurdî ve”, Kovara W, j. 31., İstanbul, 2010.

Dewran, Omer: “Roman”, Kovara W, j. 30., Rêbendan- Reşemî, İstanbul, 2010.

Dikmen, Özge: “Adalet Ağaoğlu’nun Romanlarında Sosyal Yapı”, Teza Lîsansa bilind a çapnebûyî, Zanîngeha Cumhuriyetê Enstîtuya Zanistên Civakî, Sivas, 2008.

Dildar, Receb: “Hevpeyvîna bi Tosinê Reşîd re: Li Welatekî Azad Rûmeta Merîv Heye”, Kovara Bîr, j. 2., Havîn, İstanbul, 2005.

Dorson, M. Richard: *Günümüz Folklor Kuramları*, wer. Selcan Gürçayır û Yeliz Özyay, Weşanên Geleneksel, Ankara, 2006.

Düzgün, Dilaver: “Ziyaeddin Fahri Fındıkoğlu’nun Folklor ve Halk Edebiyatı ile Çalışmaları” Teza Lîsansa Bilind a çapnebûyî, Zanîngeha Atatürk Enstîtuya Zanistên Civakî, Erzurum, 1990.

Eker, Gülin Ögüt û yê din: *Dünya Halk Bilimi Çalışmaları Tarihi*, Weşanên Milli Folklor, Ankara, 2003.

Elçin, Şükrü: *Halk Edebiyatına Giriş*, ç. 2. , Weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığı, Ankara, 1986.

Ergül, Selim Temo, Kürt Şiiri Antolojisi, c. I, II, Weşanên Agora, İstanbul, 2007.

Eroglu, Yunus: “Muzexaneyê Kulan û Vegotina Banî”, Kovara W, j. 31., Adar-Nîsan, İstanbul, 2010.

Eronat, Kamuran: “Kemal Tahir’in Sağırdere ve Kör Duman Romanlarında Halk Bilimi Ögeleri”, Kovara Milli Folklor, h. 65., Ankara, 2005.

Evdal, Emînê û Cindî, Hacıyê: *Folklorê Kurmanca*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2008.

Farqînî, Zana: *Ferhengê Kurdî- Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2005.

Feyzioğlu, Nesrin: “Atilla İlhan’ın İki romanında Halk ve Halk Kültürü”, Kovara Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, h. 2., Erzurum, 2005.

Gadamer, H. G. û yên din: *Hermenutik Üzerine Yazılar*, wergêr û edîtor Doğan Özlem, Weşanên Inkılap, İstanbul, 2003.

Galip, Özlem û Abidin Parıltı: *Kürt Romanı*, Weşanên Sel, İstanbul, 2010.

Geverî, Ayhan: “Ji Koleksiyona Basîl Nîkîtîn Sê Çîrokên Kurdî”, Nûbihar, j. 108., Havîn, İstanbul, 2009.

Goldman, Lucien: *Roman Sosyolojisi*, wer. Ayberk Erkay, Weşanên Birleşik, İstanbul, 2005.

Gökçimen, Ahmet: “Kara Yıldırım Romanında Türkmen Halk Kültürü”, Kovara Zanîngeha Atatürk Enstîtuya Zanistên Civakî, h. 23., Erzurum, 2004.

Güçlü, Ayşe: “Selim İleri'nin Romanlarında Kültür Unsurları”, Teza Lîsansa Bilind a çapnebûyî, Zanîngeha İstanbulê Enstîtuya Zanistên Civakî, İstanbul, 2008.

Gürsu, Uğur, “Sebit Mukanov ve Botagöz Adlı Romanının Dil Özellikleri”, Kovara İstanbul Üniversitesi Türk Dili ve Edebiyatı, , h. 44., İstanbul, 2011.

Hança, Beki Bora: “Bir Folklorcu Olarak Yusuf Ziya Demircioğlu”, Teza Lîsansa Bilind a çapnebûyî, Zanîngeha Muğlayê Enstîtuya Zanistên Civakî, Muğla, 2001.

Hassanpour, Amir: “Stalîn, Qeyrana Şoreş û Rûxîna Komara Azerbaycan û Kurdistanê”, Kovara War, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, İstanbul, 2004.

Hassanpour, Amir: *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2005.

Hesen, Şikoyê: *Payîz û Ba*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2008.

Irmak, Yılmaz: “Milli Olandan Evrensele: Cengiz Aytmatov'un Dağlar Dervrildiğinde Ebedi Nişanlı Adlı Romanına Akseden Folklorik Unsurlar”, Kovara Karadeniz, h. 2., Pûşber, Ardahan, 2010.

İnam, Ahmet ve diğêrleri: *Edebiyat Sosyolojisi*, editor Köksal Alver, Weşanên Hece, Ankara, 2006.

Jameson, Fredrich: *Modernizm İdeolojisi*, wer. Kemal Atakay û Tuncay Birkan, Weşanên Metis, İstanbul, 2005.

Jusdanis, Gregory: *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, wer. Tuncay Birkan, Weşanên Metis, İstanbul, 1998.

Kavcar, Cahit û yê din: *Yazılı ve Sözlü Anlatım*, ç. 5., Weşanên Anı, Ankara, 2004.

Kaya, Fethullah: *Kürt Basını*, Weşanên Hîvda, İstanbul, 2010.

Kaya, Muharrem: “Gönül Hanım, Bozkurtlar ve Ağrı Dağı Efsanesi Romanlarında Köken Miti, Kovara Folklor/Edebiyat, h. 26., Lefkoşa, 2001.

Kekeç, Nuran: “Karnavalın Büyülü Gerçekliğe: Berci Krispin Romanları”, Kovara Milli Folklor, h. 91., Payız, Ankara, 2011.

Koç, Canan Olpak: “Destan Geleneğinden Tarihi Romana: Tölögön Kasimbek ve ve Kırılan Kılıç I, II”, Kovara Turkish Studies, h. 7., Havîn, 2011.

Koluçolak, Adem: “Mehmet Niyazi’nin Romanlarındaki Halk Bilimi Unsurları Üzerine Bir İnceleme”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Selçukê Enstîtuya Zanistên Civakî, Konya, 2007.

Konak, İsmet: “Sovyet Kürtlerinin 1937- 38 Sürgünü”, Kovara Kürt Tarihi, h. 4., Kanûn 2012- Çile 2013, İstanbul, 2013.

Koyî, Hacı Qadîrê: *Dîwan*, Edîtor: Arîf Zêrevan, Weşanên Nefel, Stokholm, 2004.

Krohn, Julios û Krohn Kaarle: *Halk Bilimi Yöntemi*, ç. 2., wer. Günsel İçöz, Weşanên TDK, Ankara, 2004.

Kundera, Milan: *Roman Sanatı*, ç. 3., wer. Aysel Bora, Weşanên Can, İstanbul, 2009.

Kurt, Emine: “Faik Baysal’ın Romancılığı”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Çukurovayê Enstîtuya Zanistên Civakî, Adana, 2009.

Kutlay, Nacî: “Kafkas Halkları- Kürt Edebi İlişkisi”, Kovara War, j. 10- 11., Payız-Zivistan, İstanbul, 2001.

Kutlay, Nacî: “Romana Kurdî”, Kovara War, j. 5-6., Havîn- Payîz, İstanbul, 1998.

Lescot, Rogert: *Memê Alan*, ç. 2., Weşanên Avesta, İstanbul, 1997.

Loran, Elîxan: “Bi Romanûsan Re Guftûgo, Edîp Polat, Lokman Ayebe, Menaf Osman, Omer Dilsoz, Şener Ozmen”, Kovara W, j. 30., Rêbendan- Reşemî, İstanbul, 2010.

Loran, Elîxan: “Hevpeyvîn Bi Helîm Yûsiv Re”, Kovara W, j. 30., Rêbendan- Reşemî, İstanbul, 2010.

Man, Paul De: *Körlük ve İçgörü*, çev. Ferit Burak Aydar û Cem Soydemir, Weşanên Metis, İstanbul, 2008.

Meretowar, Ayhan: “Kesayetiya Edebî ya Ereb Şemo”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Amed, 2007.

Mihemed, Mamoste: “Kurdistana Sor”, Kovara Bîr, j. 2., Havîn, İstanbul, 2005.

Moran, Berna: *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*, ç. 19., Weşanên İletişim, İstanbul, 2009.

Moran, Berna: *Türk Romanına Eleştirel Bir Bakış*, 19. b., İletişim Yayınları, İstanbul, 2007.

Morkoç, Ayvaz: “Sevinç Çokom’un Hilal Görününce Romanında Kırım Türkleri”, Kovara Turkish Studies, h. 6., Payîz, 2011.

Nazê, Bavê: “Hevpeyvîna bi Erebê Şemo re ya Berî 25 Salan”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Diyarbakır, 2007.

Nikitine, Basil: *Kürtler*, ç. 2., çev. E. Karahan, H. Akkuş, N. Uğurlu, Weşanên Örgün, İstanbul, 2010.

Ong. Walter J.: *Sözlü ve Yazılı Kültür*, ç. 5., wer. Sema Postacıoğlu Banon, Weşanên Metis, İstanbul, 2010.

Özmen, Rukiye: *Çîrokên Şevbihûrkan*, Weşanên Doz, İstanbul, 2002.

Özteke, Volkan: “Türkiye’de Halk Biliminin Mimarları” Kovara Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih- Coğrafya Fakültesi, h. 50., 2010.

Öztürkmen, Arzu: *Türkiye’de Folklor ve Milliyetçilik*, ç. 3., Weşanên İletişim, İstanbul, 2009.

Parla, Jale: *Don Kişot’tan Bugüne Roman*, Weşanên İletişim, İstanbul, 2010.

Pelister, Ayşe Özge: Safiye Erol’un Romanlarında Sosyal Hayal, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Marmarayê Enstîtuya Lêkolînên Turkiyatê, İstanbul, 2007.

Polat, Edîp: “Ji Aliyê Teknîka Romanê Ve Dimdim û Erebe Şemo”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Dîyarbakır, 2007.

Propp, Vladimir: *Folklor/ Teori ve Tarih*, wer. Necdet Hasgöl, Tolga Tanyel, Weşanên Avesta, İstanbul, 1998.

Rahman, Fuad ve Galletti, Mirella: *Kürt Yemek Kültürü*, wer. Fuat Serdaroğlu, Weşanên Avesta, İstanbul, 2010.

Resûl, Îzzeddîn Mûstafa: *Lêkolînewey Edebî Folklorî Kurdî*, Weşanên Aras, Hewlêr, 2010.

Reşan, Nevin Güngör: *Navdarên Kurd*, Weşanên Doz, İstanbul, 2008.

Reşîd, Tosinê: “Kurdên Yekîtiya Sovyetê: Berê û Niha”, Kovara Bîr, j. 12., Zivistan, İstanbul, 2010.

Roj, Cîhan: “Pirên Şikestî û Îzolasyona Gewr”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Amed, 2007.

Sagniç, Feqî Huseyn: *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî, İstanbul, 2002.

Shakely, Ferhad: *Modern Kürt Öykü Sanatı*, Weşanên Avesta, İstanbul, 1998.

Sezer, M. Abdulbasit: “Murathan Mungan’ın Mensur Eserlerinde Halk Bilimi Unsurları”, Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Dicleyê Enstîtuya Zanistên Civakî, Diyarbakır , 2007.

Seyidođlu, Halil, *Bilimsel Arařtırma ve İnceleme El Kitabı*, ç. 10., Weřanên Kurtiř, İstanbul, 2009.

Sontag, Susan: *Sanatçı: Örneđ Bir Çilekeř*, ç. 3., wer. Yurdanur Salman û Müge Gürsoy Sökmen, Weřanên Metis, İstanbul, 2008.

řemo, Erebe: *Dimdim*, Weřanên Lîs, Diyarbakır, 2007.

řemo, Erebe: *Hopo*, Weřanên Lîs, Diyarbakır, 2007.

řemo, Erebe: *Jiyana Bextewar*, ç. 2., Weřanên Deng, İstanbul, 1994.

řemo, Erebe: *řivanê Kurmanca*, Weřanên Lîs, Diyarbakır, 2009.

řen, Semra: “Hüseyin Rahmi Gürpınar’ın Romanlarındaki Folklor Unsurları” Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Zanîngeha Atatürk Enstîtuya Zanistên Civakî, Erzurum, 2005.

řentürk, Osman: “Evliya Çelebi Seyahatnamesi’nde Folklorik Unsurlar”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Niđdeyê Enstîtuya Zanistên Civakî, Niđe, 1999.

řîrîn, Enîse û Zal, Azad: “Dosye- Erebe řemo”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Diyarbakır, 2007.

Taels, Herman: *Eski Sovyetler Birliđi’nde Kürtler*, çev. Nadire Iřık, Weřanên Pêrî, İstanbul, 2001.

Tan, Sami û yê din: *Ortaöđretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Weřanên Tarih Vakfı, İstanbul, 2010.

Temur, Nezir: “Folklor- İdeoloji- Edebiyat Üçgeninde Suat Tařer’in Deli Dumrul’u”, Kovara Turkish Studies, h. 6., Payîz, 2011.

Toparlı, Recep û yê din: *Türkçe Sözlük*, Weřanên TDK, Ankara, 2005.

Türktaş, Metin: “Kerkük Folklorundan Örnekler”, Tez lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Pamukkaleyê Enstîtuya Zanistên Civakî, Denizli, 1997.

Verroj, Seîd: “Folkloru Kurdî”, Kovara War, j. 1., Havîn, İstanbul, 1997.

Watt, Ian: *Romanın Yükselişi*, wer. Ferid Burak Aydar, Weşanên Metis, İstanbul, 2007.

Wigram, W. A. û Wigram, E. T. A.: *İnsanlığın Beşiği Kürdistan’da Yaşam*, wer. İbrahim Bingöl, Weşanên Avesta, İstanbul, 2004.

Xanî, Ehmedê: *Hemû Berhem*, Amd. Kawa Nemir, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2008.

Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, Weşanên Nûbihar, İstanbul, 2011.

Xelîl, Temûrê: “Erebê Şemo Rûspitiya Gelê Kurd”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh-Gelawêj, Amed, 2007.

Xweşhêvî, Zulkîf: “Hevpeyvîna bi Dr. Efrasyab Hewramî be: Sovyetê Kurd li Ser Axa Xwe Nehiştin”, Nûbihar, j. 107., Bihar, İstanbul, 2009.

Yağcı, Murat: *Yazılı Kültürün Düşüşü*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Ankarayê Enstîtuya Zanistên Civakî, Ankara, 2005.

Yildirim, Qedrî: “Ehmedê Xanî”, Kovara Bîr, j. 9., Havîn, İstanbul, 2008.

Yılmaz, Marûf: “Serbilindî û Serkeftina Romana Kurdî”, Kovara War, j. 5-6., Havîn, İstanbul, 1998.

Yûsiv, Helîm: “Nifşê Bêjî, Qeyikên Romana Kurmancî di Nav Pêlên Siyasetê de”, Kovara W, j. 31., Adar- Nîsan, İstanbul, 2010.

Yûsiv, Helîm: *Romana Kurdî*, Weşanên Ronahî, Diyarbakır, 2011.

Yıldız, Kanat: “Fakir Baykurt’un Romanlarında Sosyal Hayat”, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Cumhuriyetê Enstîtuya Zanistên Civakî, Sivas, 2008.

Zinar, Zeynel Abidîn: “Hunera Folklorê Kurdî”, Nûbihar, j. 99., Havîn, İstanbul, 2006.

Zinar, Zeynel Abidîn: “Nivîskarê Kurd, Kedkar û Sûxrevanê Wêjeya Kurdî Erebe Şemo”, Kovara W, j. 15., Tîrmeh- Gelawêj, Amed, 2007.



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

EREBÊ ŞEMO'NUN ROMANLARINDA KÜRT
FOLKLORU

Ebubekir GÖREN

10711008

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin 2013